.

- 

# Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê -3

- 

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên soran*

.

.

.

. **Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê -3**

*Abdusamet yigit*
*@Abdusamet yigit*
*Çap 3*
*Berlin/adar-2016*

.

email: han-grafik@hotmail.de

.

Çap û Grêdan :
Concept medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
ISBN 978-3-98166-86-1

**Li ser jenosîda kurd a ku di sedsale 21´min de ku hê didomê -3**

Li vir, divê ku mirov di dewama vê konsepta şer a jenosîde ya rejima tirk de werênê ser ziman ku ne tenê şer û hêrîş li civate kurd dihat kirin. Bi wê re jî weke ku li Şirnaxê, cizîra bota, hezex, sûr û hwd dihat dîtin, zaroyên piçûk, weke ku çawa ku di dema komkujiyên dersimê de ku ji malbatên wan dihatina standin û bi xwe re dibirin, di vê demê de jî zaroyên piçûk ji malbatên wan dihatina standin û dibirina deverên nedîyar. Di nava pêvajoya hêrîşê de ev jî, dihat ser ziman. Lê li deverna weke şirnaxê, dema ku asta hêrîşên leşker û polîstên tirk kêm dibû, êdî malbatên ku zaroyên wan ji wan dihatibûbûna standin û biribûbûna deverek ne dîyar, bidest hanîna berteke xwe dikirin.

Ev rewşa qatilkirina dêûbavan , bi xwe re birina zaroyên piçûk û pitikan, weke kirineka rejima tirk a dema komkujiya dersimê de pirr zêde derketibûbû li pêş. Di vê demê de jî di sale 2016´an de rejima tirk heman kirin dihanî serê civate kurd li berçavê hemû cihanê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku armanca vê kirinê hebûna civatê bû. Di çerçoveyeka ku wê çawa hebûna civate kurd bi nirx, çand û jîyane wê re tûna bikin, di vê çerçoveyê de ew kirin dihatina pêşxistin. Ew zaroyên ku ji malbatên wan dihatina dûrkirin, wê bi zimanê tirkî û weke ´mirovekî tirk´ wê bihatan mazin kirin. Armanc jî, ji xwe ev bû. Di vê çerçoveyê de bi vê armancê ew zarok ji malbata wan dihatina dûrkirin. Bi gotinaka din, ev rêbaz, rejimaka hovane a rejima a bişavtinê bû.

Ew zaroyên ku di birin, weke ku di sale 1937an ku di dema komkujiya dersimê de ku ew zaro dibistana şevborîn de bicih kirin û weke tirk dixwestin ku mazin bikin. Pêvajoya hêrîş û şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd de ev carek din weke rêbazeka ku bi wê civatek kurd bişikênin hatibû pêşxistin. Gelek zaroyên kurd ên piçûk ji malbatên wan dihatina dûrkirin û di wan dibistanên bi navê ´dibistanên şevborîn´ û ankû ´yatili-okul´an de bicih dikirin ku wan weke tirk mazin bikin. Di pêvajoya hêrîşên hêrîşên rejima tirk ên li şirnax, silopî, Cizîra-bota, sûr û hwd de, bi van bajarên wan li kîjan bajarên din rejima tirk hêrîş li civate kurd pêş dixist, bi wê re zaroyên kurd ên piçûk jî berhev dikirin û bi xwe re dibirin.

Di **çerçoveyva** pêvajoyên bişavtinê ên ku rejima tirk û rejimên din ên ku kurdistan di nava wan de hatîya beşkirin ku li ser serê civate kurd meşandin de di wê de Xwendingeha bi şevborîn û ankû dibistanên bi şevborîn, dibina dibistan in yên ku rejim heya îro di wan de zaroyên kurd û ankû ên xalkên din ku di wan de di bişivênê(asîmle dike) û bi wê hîmê programa dewletê ya asîmlasyona wê dimeşênê, mirov divê ku di vê çerçoveyê de li ser wê bisekinê. Rastîya van dibistanan çî ya ku em divê ku hinekî li ser wan di destpêkê bisekin in. Di vê demê de hanîna wan ya rojevê di çerçoveyên pêvajoyên hêrîşê ên ku li ser serê civate kurd hatina pêşxistin de wê ev dibistan xwediyê çi wateyê bin, em divê ku wan fahm bikin. Di

Çerçoveya pêvajoyên bişavtin û bi qadaxaya ku hatîya danîn li ser ziman zimanê kurdî de bi wan hêrîşên ku bi leşkerî û şîyesî û hwd ku li hebûna civate kurd tên kirin de divê ku em li van dibistanên şevborên û ankû weke ku rejima tirk bi tirkî bi navê ”yatili-okul´an fahm bike. Di çerçoveya bernemeyên bişavtinê ên rejimê de herî zêde ev dibistanên şevborin û ankû ´yatili-okul´ li kurdistanê hatina pêşxistin.

Li Kurdistanê, li ser dibistanan divêt ku mirov xwedi zanebûn û fêrbûn bêt. Ji ber ku ev yek pir girînge. Ji ber ku ew dibistanin ku iro hîmê programa dewletê ya asîmlasyona wê diafirêne. Zimanê kurdî tê qedexe kirin, bi bi zimanê din bi mecburî kurdî, zarokên wan têne perwerde kirin. Ciwanên kurd ji divêt ku vê yekê pir baş fahm bikin, Iro ciwanên kurd yên ku di bistanên tirkan de xwandina ji sadî 80 ên wan zimanê xwe yê dayikê ji bîr kiriya. Gelek ji wan ji piştî dibistanê an ji di deme dibistanê de bidest fêrbûna zimanê dayika xwe weke zimanekî beyenî ddike. Piştre ku çend fêr ji dibin, êdî nikarîn zimanê dayika xwe weke ku bê bi kar anîn an ji weke zimanê jiyanê nikarê bi kar bêne. Ciwan ku li ser vê yekê, ne bi zanebûn bin û xwedi têgihiştin bin, wê ev rewşê berdewam bike. Divêt ku di vê xalê û astê de li ser bê sekinandin. Ciwan, divêt ku zanibin ku zimanê dayikê nasname û rûmete miorva. KU mirov ji zimanê dayikê dûrket, mirov ji wê rûmet û ji nasmane xwe dûr dikeve. JI ber vê yekê divêt ku mirov pir mazin li ser zimanê dayikê û ew dibistanên ku têne gotin cihê xwandinê ne li ser bê sekinandin. Bi dîroke asîmlasyonê re divêt ku mirov li ser bisekinî û fahm bike û nas bike, wan dibistanan. Zimanê mirov qedexe kirin, sucekî mirovahiyê ya. GUnahakî mirovahiyê ya.Ji ber ku ciwan karibin li ber wî gunahê mirovahê bisekinin, divêt ku xwedi zanebûn bin. Divêt ku rastiya xwe û dîroke xwe zanibin. Divêt ku xwe pêşî nas bikin. Emê bi serekê pêvajoyên bişavtinê

bênine ser ziman.

Ji ber vê yekê divêt ku mirov pir li ser bisekine. Divêt ku mirov fahm bike. Bi tirkî re iro sûrî û îran ji dixwezin ku weke tirkî vê saziya dewletî bi kar bênin li hevberê kurdan. Iro asîmlasyonaka(bişavtin) mazin li hevberê tê meşandin. Bi armanca ji hole rakirina wan û dawiya wan di dîrokê de anîn, hinek hewldan bi saziya perwerde têne kirin. Iro, di deme me de teknoloji ji pêşketiya. Teknoloji ji bi wê pêşketina xwe ji bişavtina li hevberê kurdan ya ku bi saziya perwerde tê meşandin, bingihekî mazin diafirêne.

Di roje me de, demên bişavtinê û pêvajoyên wêWeke sê pêvajoyên girîng ji roje me, mirov bi ber demên berê herê, wê çêtir rasti were fahmkirin. JI ber ku rasti, di iro de tê ser ziman. `Iro di dîrokê de dîrok ji di iro de veşartiya`.Bi vê yekê, em nêzîkatiyê bênine ser ziman. Dem pêşî, girînge. dibistanan de bicih kirina. Deme duyemin ji deme perwerdekirina. Deme sêyamin ji deme ku dîrok çawa jîn bûya û çawa pêvajoya bişavtinê pêşketiya. Deme sêyêmin dîrokê têne ser ziman. Bi hersê pêvajoyan, pêşî wê bê kişandin ser "Oto-asîmlasyonê". Oto asîmlasyon, mirov ku zimanê xwe bikar neyêne ya. An ji guh nediyê de ya. Mirovê ku guh nede zimanê dayika xwe bêrûmete. Ji ber ku pêşiya wê bêrûmetiyê bêgirtin, divêt ku mirov li ser vê yekê pir bi sekinê.

Xwendingeha bi şevbirîn, dibistana ku têde dayîm tê mayîna. Mirov, ji deme ku bidest dibistanê dike ya ku mirov têde dimêne haya ku mirov bidawi dike ya.Li Kurdistanê, iro gelek ji wan hene. Lê ji ku asîmlasyona li ser serê kurdan bibina serî kar dibînin. Iro li kurdistanê zarokên kurd ji zaroktiya xwe ji malê têne hilandin û dibin û di wan dibistanan de bicih têne kirin. Di wan dibistanan de ji rastiya xwe û dîrokê xwe û civaka ûr têne mazin kirin. Kurdekî ku di wanderan de mazin bû, êdî dibê tirkek û derdikeve. Kurdî ku di wanderan de mazin bû, êdî mirov ni karê jê re bêje kurd, ew dibe kurdekî wilo ku karê êdî li hevberê gelê xwe ji şer bike û wan bikujê û komkujiyên mazin bêne serê wan.

Li kurdistanê iro ev dibistanên ku hene û ji wan re bi tirkî dibêjin " YATILI OKUL", weke cihê ku mirov di wanderan de ji rastiya wan tê dûr kirin in. Di wanderan de mirovên ku dimênin, ku her sibeh di rabin ji xweê, bi xwêndaya ku bi tirkî jê re dibêjin "and" her sibe bi wan tê gotin ku bêjin "em tirkin".Ji wan re zaroriya ku rojê sê çar caran bêjin em tirk in.Bi vê yekê, ku mazin dibin, êdî têne tiştên di wan dibistanan de xwandina di seê wan de hene. Ji wan pêve ti tiştekî dî nayê hiştin. Pirtûkên ku di wanderan de têne xwandin ji, yên ku hertimî tirkitiyê bi

aşq tênine ser ziman in. Ji xwe, ji wan pirtûkên wilo pêve ti pirtûkên din nayêne xwandin û dewlet nahêle ku bikevine hundur de ji. Li wir, rastiyên wan yên ku hene, ji wan têne standin û binardkirin. Hinek "rastiyên din" weke radtiyên wan ji wan re têne vegotin û dikina rastiyên wan.

Li kurdistanê, pêşî bi vî awayî ji aliyê sistemê ve rasti tê kuştin. Piştî ku rasti hata kuştin, êdî pêre dîrok û hê gelek rastiyên din ji di mirin. Lê ya rasti divêt ku mirov bêje ku mirovê ku di wanderan de mazin bû, êdî bi tememî ji rastiyê xwe ya ku heya dûr dikeve. JI zimanê dayika xwe dûr dikeve. Ev yek, ji aliyê sisteme tirk ve bi sistemî tê kirin. Bi sisteme perwerde ev yek tê kirin. Ji aliyekî dî ve ji di jiyanê de gelek kirinên ku vê timem dikin têne kirin. Axiftin bi kurd û nirxên kurdi anîn ser ziman bi navê kurdî, qedexe ya. Nirxên kurdi ji bin, bi navê tirkî têne ser ziman. Ev yek, weke pêdivîyaka ku wê perwerde temem bike tê kirin. Bi vê yekê, tê xwestin ku mirovekî kurd, bi xwe û nirxên xwe ve xwe weke yekî tirk nasbike, çi pêdivî pê heya tê kirin û tê bicih anîn. Bi vê yekê, divêt ku mirov bêje ku ji aliyê sistemê ve ji pir mirovên ku têne ji bo vê yekê kar dikin û dibêjine xwe em mirovên znaistê ne, têne bi kar anîn

Bi bişavtinê ji ji hole rakirin û windakirina rastiyan re dest pê dike. Li kurdistanê, bi vê yekê ve girêdayî divêt ku mirov bêne ser ziman, sisteme zilamên xwe çêkirine yên ku vê yekê bi rê ve dibin. Dîrokê ku heya ji bo ku were ji bîr kirin hertişt tê kirin. BI vê yekê dîrok û pêşketinên de û bi ber bi şavtinê ve çûna pêvajoyan, fahm kirina wan girînge. Bi sereke em divir li ser wan deman bisekinin. Ev yek ne tenê bi aliyekî tê kirin. Bi gelek aliyan tê kirin. Minaq weke ku ji aliyê olî ve ji tê kirin. Ji aliyê olî ve gelek metne kurdî û nivîs yên orjînal hatina windakirin û vegerendina wa ya tirkî bi navê tirkî weke ya rast têne nîşandin. Weke nivîsên Bedîuzzeman. Weke wî hê gelek hene yên nivîsên wan yên rast hatina windakirin û li gor ku "ew kirina tirk tênine ser ziman".

Li kurdistanê, ji bo ku kurd her weha bibine tirk iro ji ev yek tê kirin. Zimanê kurdi iro ji qedexe ya. Iro ji ev yek tê kirin. Nirxên kurdî û dîrokê kurdi bi nêzîkatiya bi sistemî ji aliyê tirkan, Îraniyan û arabên Sûrî ve bi gelek piştgiriyan tê berdewam kirin. Kurd iro hinekî gihiştine têgihiştine vê yekê, JI ber vê yekê ji, li ber xwe didin.

Divêt ku mirov li dîrokê dimeyîzenê, mirov pir kirinên ku li hevberê kurdan pêk hatina mirov dibîne. Di dîrokê de li hevberê kurdan ji bo ku ew xwe ne ênine ser ziman, pir kirina hatina kirin. Axlaba ji deme ku mirov dîrokeke bişavtinê li kurdistanê bi nivîsêne, divêt ku mirov ji

demên piştî deme Medan bidest pê bike û binîvîsêne. Piştî deme Medan hinekî bi vir de ku Kurd ji aliyê Rêzanî(siyesî) ve ji rêveberiyên herêmên xwe ketin, êdî li ser serê wan her weha pêvajojên bi şavtinê dest pê kirin. Hemû kiirnên di vê xalê yên ku hatina kirin ji, ji ber ku yên ku li ser serê wan xwediyê serweriya rêzanî bûn, wê serweriya xwe mayinda bikin û demdirêj bikin.

Deme ku ku mirov li demên piştî Medan dimeyîzenê, mirov dibîne ku hinekî bi pişt wan re û bi vir ve serdestiya persan li ser kurdan dest pê dikê. Ew ji ku serdestiya xwe mayinda bikin, du tiştên girîng li hevberê kurdan dikin. Ya pêşî, bi nêzîkatiya ku aqil bikar bênin, li hizir û nirxên kurdan weke yên xwe xwedî lê derdikevin. Bi vê yekê re li herêman ji mafê serdestitiyê didin. Bi vê yekê deme ku mirov li herêman dimeyîzenê, mirov dibîne ku kurd weke ku serdesti xwe ne. Li herêman persan ev yek li pêştira ji herêmên kurdan yên ku tirk li ser serdestin. Lê ji aliyê rêzanî ve hemû tişt kirina bin destên xwe de. Deme ku li hevberê vê yekê rabûn, êdî li ber wan ketina şer de. Îran ku mirov bêje, xwediyê çand û nirxne wilo ya ku dayika wan gelekan ji çand û nirxa kurda ya. Ziman ji di nav vê yekê de ya.

Berî demên Îslamê, her weha bi xwedi derketina li nirxan serwer kirin. Vê yekê, di nav kurdan de ji cih girt. Kurdan bi wan re demeke dirêj bi hev re jîn kirin. Weke dewletekê û du gelan bi hev re têde jîn bibin jîn bûn. Kurd, lê piştî deme ku Îslam hat pêde, êdî guharandin çêbû. Deme ku Îranê ola Îslamê erê kir, êdî mecbur ma ku dev ji nirx û pêşketinên berê berde û li gor wê olê ku nû derketin xwe ji nû ve ava bike û çêke. Lê ev yek, hesanî ne bû. Gelek şer ji bûn. Şerên navxweyî bûn. Lê di dawiyê de bû. Îran, bi ole Îslamê xwe ava kir. Kurd, deme ku îranê her weha kir, êdî bi nirxên xwe bi tenê man. Wan zû bi zû ole Îslamê erê ne kir. Ji ber ku ole wan ji xwe, di pêşktin û rêxistina xwe de ji ya Îslamê ne şûn ve mayî bû. Şer êdî di nav kurda û navendên Îslam de dest pê kir. Lê di wê navberê de hin bi hin misilmanti ji li Kurdistanê bicih dibû.Êdî mirovan erê dikir. Lê ew erê kirin, bi pevçûna bi rê ve diçû.

Li aliyê îranê li kurdistanê di wê wan deman de û piştî wan deman ji pir serhildan ru didin. Li berxwadan pir mazin dibin. Kurd dizwezin ku nirxên xwe bi parazên. Ev dem, mirov karê karê bêje ku demeke nû ya, j ibo kurdan ji her weha demeke nû ya. Di sadsala PIştî ku Îslam bû, piştre ne bi gelekî re êdî bi çend sadsalan piştre mirov karê bêje ku nîvê kurdan bûbû misilman. Lê vê yekê ji, şerên ku di nav kurdan û navendan de bi dawî ne kir. Şer berdewam kir. Ji ber ku piştre şerê serdestiya di nav

navendên Îslamê de j dest pê kiribû. Kurdan di serî de Li gor çand û hizire xwe awayekî olî di misilmantiyê de ava kir. Têde bidest anîna ser ziman ya nirxên xwe ji kirin. Bi vê yekê êdî hin bi hin bi îslamê di nav kurdan pêşketin derketina hole. Lê vê yekê, şerê di nav kurdan û navendan de bidawî ne kir. Kurd, li ser axên xwe biazad û bidilê xwe jîn dibûn. PIştre xwe xwestin ku vê yekê bi xwe re berdewam bikin. Lê ne bû. Ji ber ku Di serî de ziman arabî weke yê Kur´an´ê û pêre ji weke yê îslamê hata dîtin, êdî hin bi hin li ser vê yekê pêşketinên nû derketin. Lê zimanê kurdan ji ber ku pir xurt bû û rûniştî bû, zêde vê yekê zimanli şûn ne hişt. Kurdan ole îslamê di zimanê xwe de pir baş û mazin anîn ser ziman. "Qasîde" tneê di kurdî heya. Pêşî wan pêxist. Bi vê yekê ziman di cih de ma. Bi vê yekê, ji aliyê civaknasî û hizrî ve kurdî pir bi pêşket.

Dem, haya ku hata deme sadsala 15 û wan, êdî mirov karê bêjê ku kurdî mazin dise li gor demê pêşketibû. Di kurdî de kurdan, hê pergala deme Gutî û Mîtanî û Huriyan bi kar dianî. Hê pergala zimanê wan ya vê demê bû. Lê li gor demê û herêman devên nû ji hê ji dema Medan bidest pêşketinaka bi pergal kiribûn. Bi vê yekê, kurdî di parast û dewlemend dikir. Di sadsala 15 û piştre de, êdî hin bi hin li hevberê kurdan pêşketinên mazin derdiketin. Di wê demê de, weke demeke ku şiyarbûna ji mirov karê ji bo îraniyan bi navkê, weke ku bixwezin vegerihine hizir û nirxên wê demê di wan de hinek pêşketinan xwe dide berçavan. Şaxê îranê yê wê demê, dixweze ku çareke din niivsên zerdest bide hevdû. JI bo bê yekê pir zanistan ji bi pirsiyar dike. Ew ji li herêman li wan digerihin, Ev yek, ji bo kurdan ji dibe, demeke nû. Kurdên ku hata wê demê nirxên xwe parastina rastî êrîşan tên û bi komî têne kuştin. Lê di wê demê de derketina osmaniyan û bi piştgiriya kurdan mazinbûn û bilind wan ji kurdan ji komkujiyên wan xilas neke. Hin bi hin têne bi ser kurdan de. Piştî ku ew têne serdestiyê, êdî bi olê, ew serdestiya xwe li herêman kurdan didina erêkirin. Kurd pir civakaka bi nirx û bawermenda. Osmani ku serdestiyên xwe çêdikin, piştre êdî dikin ku vê yekê, bi olê berdewam dikin, hata demeên berdewam dikin ji. Lê piştî demekê pêde ku kurd, li kevneşopî û nirxên wan û jiyana wa mudahala tê kirin, êdî di rabina ser xwe û serî li ber rêveberiya osmaniya di hildin. Di vê demê de li ber persan ji serî tê hildan. Dergahên ku haya wê demê nirx ku kevneşopiyên kurdan li ser lingan hiştina weke Dergahan ji dikevine bin denstê wan de û gelek ji wan ji li ber kurdan bi navê wan di sekînin. Ev yek, rêwşeke nû diafirêne. Dem ku haya ku tê deme sadsala 17 û 18 wan deman ev yek berdewam dike.Lê ligelek herêman ji li berxwadan ji

dibin. Serî hildan ji dibin.

Li aliyê tirkan pir seri hildan dibin. Piştî sadsala 16 û wan pêde, dem hemû dibine demên serî hildanê li kurdistanê li hevberê osmaniyan. Osmani ji, di wê demê de(sadsala 16 û 17 de) dem ne weke demên berê ya. Êdî ew ji bi hêzin. Her cihê ku êrîş lê kirina û ketinê de li wan deran, navende "devşîrmê" ku ji wan re dibêjin "ocak" ava kirina. Di wan deran de têne lêskeran ji bo xwe diafirênin. Kurdistanî ji gelek ni wan her weha ji herêmên ku hatina êrîşkirin, ji wanderan zarok hatina hildan û di wanderan de hatina mazin kirin. Bi van navendan di demeke kin de artişaka mazin ya osmaniyan tê avakirin. Êdî her weha ji bo ji aliyê rêveberî ve hebûna bi domênin, êdî serweriya xwe dixwezin ku ji her alî ve bicih bikin, BI vê yekê, êdî li gelek herêman herêmên kurdan yên ku weke ku bi serê xwe ne û yên ku bi "şancaq"in û yên bi "hukumet" in, têne tesfiyakirin. Yên li ber xwe didin ji êdî diçina ser wan. Bi vê yekê, êdî li kurditanê demeke nû dest pê dikê.

Di sadsala 18, û piştre de, dem hemû ji bo kurdan, demên seri hildan û li berxwadanê ne. Di van deman de kurd êdî fahm dikin ku nêhte dewletê ewê ku kurdan ji hole rakê.Kurd vê yekê fahm dikin. Bi vê yekê re, êdî li ber xwe didin.Li berxwadanên wan de mazin dibin. Lê gelek li berxwadanên wan tên parçiqandin. Bi riya olê gelek gerêmên kurdan bi êlên xwe di hildina cem xw eli ber herêmn ku li ber xwe didin didina şerkirin. Bi vê yekê, êdî mirov karê bêje ku demeke nû li kurdistanê ji kurdan û xalkê din yên ku jîn dibûn yên xalkî û yên olî dest pê dike. Gelek ji wan xalk û koman di vê demên ji hole ji têne rakirin. Yên ku têne ber ji hole rakirina weke kurdan, li berxwe didin. Deme ku tê demên piştre êdî hertişt bi nav tirkitiyê tê kirin. Hertişt bi tirkî tê tarifkirin.Yên ku li ber wê ji dirabin êdî dijmin têne hasêbe û diçina ser ziman.

Deme sadsala 19 û piştre, ev yek, pir bi pêşdikeve. Di kurdistanê de li ser navê kurditiyê çi heya tê ji hole rakirin. Zarokan di xwendingehên ku wan jê re digot **"Islah okulu"** de têne tirk kirin. Di vanderan de rojê sê an çar caran mecburî bi didina gotin ku ew bêjin "em tirkin". Zimanê, nû tê afirandin. Armanc ewe ku wê herkesek bê tirk û wê bê tirkkirin. Di sala 1923an de deme ku komara tirk tê avakirin, bi nav kurd û tirkan tê avakirin. Lê piştre hemp tişt tê tirkkirin.

Kurd, di deme komarê de hemû mafê wan tê qedexe kirin. Zimanê wan tê qedexe kirin. Pirtûkên wan yên ku hatina nivîsandin, têne guharandin bi tirki û orjinalê wan yên kurdî têne windakirin. Di wan pirtûkan de bêjeyên "kurdî" ji bi bêjeye "tirkî" têne veguharandin. Bi

navê kurditiyê û li ser navê kurditiyê ti tiştek naye hiştin. Hemû tişt ji hole tê rakirin. Zarok ji di cihên ku ji wan re dibêjin "Islah"ê de têne tirkkirin. Di deme komarê de, piştre ev cihên ku ji wan re têne gotin islah, bi dibistanên ku ji wan re dibêjin "imam hatip"ê têne pêşxistin. Ol ji di vanderan de tê bikar anîn. Di wan deran zimanak heya ku mirov fêr bibe û dîrokek heya ku mirov bixwanê. Ew ziman ji tirki ya û ew dîrok ji dîroka tirki ya ku hati nivîsandina.

Ev yek, her weha berdewam dikê. Weke demeke ji berdewam dike. Bi van kirinan, êdî li kurdistanê, li ser navê kurdî tê demeke ku mirov ni karê ti tiştekî bêne ser ziman. Hemû tişt weke ku winda bû ya. Ji kurdên ku ji ber nirxên xwe li ber xwe didin ji weke Şêd Riza, şêx saîd û hwd ser hildanên wan têne parçiqandin û mirovên ku bi wan re serî hildana têne kuştin û yên ku mana ji dibina cihê ku wan jê re digot cihê Islah´ê.Li wanderan wan bi navê tirkî perwerde dikin.

Lê her çend ku her weha tê kirin ji, hê ji bêje "kurd"î ji hole ne rabûya. Ew li gor xwe vê re ji çareseriyeke dibînin. Yên ku dibêjin "em kurdin", ew dibêjin "ne win ne kurdin, win tirkên serê çiyê ne". Li gor profesorekî tirk an ji nivîskarekî wan, bêje "kurdî", deme ku pêl berfê kirina û di bin lingên wan de gotiya **"kart kurd",** hingî wan ji xwe re gotiya em kurdin. Li gor wan kurd ew in. Bi vê yekê, komarê "bernemaya Asimlasyone" li ser serê civate kurd meşand. Bingihê vê yekê ji di destûra xwe ya bingihin de bi çêkirin. Li gor destûra ya bingihin, yên ku li tirkî jîn dibin " hemû tirkin". Di nav vê yekê navbendî nîne. Ji xwe, de ku siyesetmedarên wan diaxivin ji dibêjin, li ber destûrê "herkes wekheve". Bi vê yekê ev program tê bi rê ve birin.

Li îranê, ji deme ku mirov li kirinan dimeyîzenê, mirov dibîne ku heman rêbaz tê bi kar anîn. Li wir ji destûr û ol pir baş tê bikar anîn. Nirx û çanda kurda li wir ji qaxada ya. Her çend ku di destûra wan ya bingihin de Navê kurdan hebe ji û têde mafê perwerde hatibe bicihkirin, haya iro ev yek ne hatiya bicih anîn. Li wir ji heman rêbaz bi tirkan re weke wan tê bi rê ve birin. Li ser navê kurdî hemû tişt hatiya qedexe kirin. Yên ku ji hole ne rakirina ji dibêjin "çand û dîrok ya persana". Her weha tê nîşandin. Li ser navê kurdî qedexeya ku yek tiştekî bike û bêje. Bahsa kurd kirin qedexe ya.
Li îranê rastiya kurd û pêşketina wî nîne. qedexe ya. Deme ku mirov li wir dimeyîzenê, mirov di çend qedexekriin heya. Kurd li wir ji, di medresan de têne perskirin. Mafê wan ya ji yê ku ji hebûna wan tê hemû qedexe ya. Zimanê wan qedexe ya. Di vê yê de îran olê pir baş bi kar

têne. Li wir j di medresan de kurd têne perkirin.Mafê perwerde bi zimanê dayikê qedexe ya ji bo kurdan.

**Li Îraqê pêvajoyên bişavtinê û ankû asimîlasyonê li ser serê civate kurd**.

Li îraqa kevn ji hemû tişt weke îran û tirk dimeşî. Zimanê kurd qedexe bû. Li îrakê zimanê arabî serdest bû. Têne mafê araban hebû. Kurdî li wir ji qadaxe bû. Deme ku kurdan dixwest ku nirxên xwe bênine ser ziman dihatina kuştin, weke ku li tirkî û Îranê. Li wir ji zimanê kurdi qedexe bû. Li îraka kevn, dijberiya kurdan û xwestina kurdan ji hole rakirin, derkete asta herî bilind. Kurdan li wir li ber xwe da, Li wir ji, zarokên kurdan ji wan dihatina standin û dihatina arabkirin. Gelek zarok, bi sedhezaran hata iro ji winda ne. Zarok ji wan dihatina standin, didana malên araban û bi arabî mazin dikirin. ravandina zarokan li wir pir li pêş bû.

Li îrakê, deme ku mirov bahsa wê bike divêt ku mirov ji bîrneke û bêne ser ziman ku çawa saddam huseyin li hevberê kurdan gaza kimyawî bi kar anî. Gaza ku li hevberê kurdan bi kar anî ji ji Hollanda kirî û bi kar anî li hevberê kurdan. Almanya ji ji aliyê çekên kîmyewî ve hinek piştgiriyên wê kiribû, hin çêkên kîmyewî almanya dabûbûna saddam.Tirkiyê vê demê piştgiriyeke mazin dabû Irakê, di deme Saddam de.Bi sadhezaran kurd hatina kuştin. Weke ku li tirkî û îranî bû, bi milyonan bazdan û li cihanê bûna pênaber. Li îraka kevn ku mirov bi sereke bêje weke tirkî dibistanên arakirinê hatina vekriin û bikar anîn. Weke wan, li wir zarok, hê di biçûkatiya xwe de ji dê û bavê xwe dihata standin û dihata arabkirin.Vê rewşê heya deme ku saddam huseyin li hevberê kurdan di 16 adarê 1988an de gaza kimyewî bikar nîn berdewam kir.

**Li Sûrî pêvajoyên bişavtinê û ankû asimîlasyonê li ser serê civate kurd**. .

Li sûrî, ku mirov bahs bike, ji tirki, îrakê û îranê ne cudetir li kurda nêzîkati kir. Sûrî ji weke Iî îrakê, xwediyê rejîmeke ku jê re digotin "baas". Wê rejîme baas, li îrakê tij ji kurdan kir, wê ji heman tişt kir. Wê ji zarokên wan ji wan dibistandin û dikirina arab. Zimanê kurdi li wir ji qedexe bû. Perwerde kirina bi zimanê dayik ye bi kurd hê j haya iro qedexe ya. Ew ji zarokan di dibistanan de ji bo ku bibina arab tişte ku tirkan arabên îrakê û îranan kir, wê ji kir.

Weke ku li wan herêmên din yên kurdan heya, li wir ji kurditi û li ser

navê kurditiyê hertişt qedexe ya. Mirovên ku dibêjin ez kurdin yan tê kuştin ya ji tê girtin û bi êşkence û zindanan re ru bi zu dimene. Ew rêbazên ku tirk îraniyan bi kar dianîn, lê piştre sûrî ji dest avête wan rêbazan li hevberê kurdan. Li wî herêmê kurdistanê, gelek dîrokeke kurdan ya weke ku pir pir kevne heya. Ev ji weke dîrokê sûrî tê nîşandin. Sûrî ji weke tirkî û îranê olê pir mazin li hevberê kurdan bi kar têne. Tirkanî, iraniyan û araban, ol kriiya hizreke bîrdozî ji bo van kirinên xwe yên ku dikin. Olê weke bîrdozîyekê bikar tênin. Ji bo ku kurd li wir ji ne bêjin em kurdin, çi pêdovî pê heya tê kirin.Li wir ji weke tirkî û îranê, iro ji zimanê kurdi û perwerde bi zimanê kurdi qedexe ya. Li wir ji divêt ku herkese bi arabi bi peyive û weke araban be. Ji wê pêve ti tiştek naye erê kirin, weke tirk û îraniyan.

Li sûrî, weke rêbazakê li dîjî kurdan ku tê bi karê anîn, mafêtiya hemwelatî ji wan re nîne. An ji ku hebe ji ji wan tê standin. Iro li Sûrî bi sadhezaran kurd bê mafê hemwelatî jîn dibin. Ti mafê wan yê mirovahî ji nîn e.

**Heya î ro li bakûrê kurdistanê, pêvajoyên asimîslasyonê ku rejima tirk li ser serê civate kurd dimeşênê**

**Haya** iro tirkan ev qata kurditanê ya ku di nav sînorê wan de ya, maya.Lê haya îro ji li kurditanê mafê kurdan yê ji hebûna wan tê yê zimanê wan yê dayikê û perwerde bi zimanê dayikê nîn e. Hertişt li ser navê kurdî qedexe ya. Ji bili vê yekê, iro kurd ji ber ku mafê xwe yê bingih weke mafê perwerde bi zimanê dayikê dixwezin têne kuştin û girtin. Têne dibêjine wan, "mafê yê ku win bibina tirk heya". ji wê û pê de, ti mafê wan wê nebe. Ku mirov li kirinên wan dimeyîzenê, mirov dibîne ku vê yekê bicih ji tênin. Ti mafê insanî û mirovahî ji bo kurdan nîne. Li ser navê wan hertişt qedexe ya. Dîroke wan xwandina wê qedexe ya. Zarokên kurd, iro ji di dibistanan de têne bi tirk mafê wan heya. gelekan ji wan ji, dibin û dikina dibinstanên ku ji wan re dibêjin " yatili okul", di wan de bicih dikin û teêne mafê fêrbûna tirkitiyê j iwan re dihêlin. Dîroka wan ji wan re qedexe ya ku fêr bibin.

Dî tirk de du saziyên girîng yên ji bo komarê ku herine ser kurdan de hene. Yek Artişa û ya din ji saziya perwerdê ya. Li gor xwe, weke ku ew dibêjin, bi artşê wan "ahl" dikin û bi perwerde ku zimanê wan yê dayik dide ji bîr kirin û dike tirk dike "mirov".Deme ku mirovek haywanakî digirê ji bo wî alimêne xwe ahl dike, piştre bi talîm kirina wê bi fêr dike. Her weha li kurdan ji nêzîkatî tê kirin.

Li qata kurditanê ya ku di nav sînorê tirkî de hatiya hiştin de nêzîkî 20 milyon kurd jîn dibin. Lê mafê yekî ji ji wan yê ti tiştekî nîne. Hemû ji mafê xwe yê perwerde yê bi zimanê xwe dixwezin û li ser ard û warê xwe bê hatina ser wan û şer jîn bibin. Ev tenê xwesteka wan heya. Lê heya nahaka ev xwestaka wan bicih ne hatiya. Kurd ji ji ber ku wê mafê xwe bistênin, iro i ber xwe didin, Ji ber ku li ber didin, êdî j wan re tê gotin "terorîst".Ji ber ku mafê xwe yê mirovahî dixwezin ew terorîst têne denazandin. Li kurdistanê, ji bo kurdan iro, di mafê ku j bo mirovan heya nîne. Ji bo wan ti maf nîne. Rêz û hûrmet ji hebûn û nirxên wan re nîne. Dîroka û zimanê û pêşketina wa ya bi kurdî qedexe ya. Hemû, li gor dewletê divêt ku bibine tirk û jîn bibin. Wekî di ji ti mafê wan nîne. JI bo ku ev yek pêk were ji, saziya perwerde tirkî di tenê ji kurdan mafê tirkî û perwerde dide nîaşndin. Kurd bi her awayî hatiya qedexe kirin.

Kurd li wir, li aliyê tirkî çawa ne li wir ji wilo ne., Wekî dî ti mafê wan yê xwe perwerdekirinê bi zimanê dayikê tine ya. Li wir ji hertişt tê xwestin ku bibe pers. Ji wê pêve ti mafê nîne ji kurdan re. Deme ku kurd bahsa mafê xwe yên mirovahî dikin yan têne kuştin û yan ji tê girtin û darizandin û piştre têne bi darve kirin. Sêdar her weha li pêşiya wan û xwestina mafê yên mirovahî ne.Li îranê ciwanên kurd ku bahsa mafê xwe yên mirovahi dikin û dixwezin, weke ciwanên kur Ihsan fattahiyan têne darizandin û bi dar ve kirin. Diçina sêdar ê.

Li îranê, ti mafê kurdan nîne. Her çend ku hinek saziyên mafên mirovan dibêjin ku li îranê mafê mirovan nîne ji, mirov karê bêje ku ji bo mirovên pers ku ne hemûyan be ne wilo ya. Ji persan heya. Mafê bingihin yên wan yen perwerde bi zimanê dayikê heya. Yê xwe bi pêxistin bi zimanê xwe yê dayikê heya. Pirsgirêkên wê yên ku iro hene, yên demokratize kriinê ne. Lê ji bo kurdan mirov nikarê têne bêje ku ew pirsgirêk hene. Ji bo wan pirsgirêkên bigihin hene. Yên ku xwe perwerde kirinê bi zimanê dayikê hene. Li wir, mirov karê bêje ku qirkirinaka bi çandî û felsefî û siyeseî weke ku li tirkî heya li wir ji heya. Kurd iro li îranê bêmaf in ji her mafê xwe yên mirovahî û insanî. Ew ji weke ku tirk dikin têne mafekî ji kurdan re didine nîşandin, ew ji her weha mafê ku weke ku tirk dikin ku kurdên li aliyê wan bibine tirk, yên li aliyê wan ji mafê yên ku bibine pers heya. Ji wê pêve ti mafê kurdan li wir ji nîne. Li wir ji weke tirkî ti mafê avakirina dibistanên kurdi bi zimanê kurdî nîne.

Li qata kurdistana li aliyê sûrî ji divêt ku mirov bêje ku weke aliyê tirkî û îranê ti maf nîne ji bo kurdan. Li sûrî ji weke ku li îranê û tirkî hene pirsgirêkên, pirşgirêkên demokratizekirina welat heya. Lê wir ji, ji

bo kurdan ne tenê ew pirsgirê heya. Li wir ji weke tirk û îranê pirsgirêkên bigihin ji bo kurdan hene. Li wir, iro ji weke îranê û tirkî zimanê kurdî hê qedexe ya. Hê perwerde bi zimanê dayikê mafê wê ji kurdan re nîne. Li wir ji hemû tişt bi navê arabî heya. Rejima baas, tişte ku berî vê demê di îraka kevn de saddam dixwest dibike ew ji dixweze ku wê li hevberê kurdan bike. Iran ji û tirkî ji di heman nêzîkatiyê de ne li hevberê kurdan. Deme ku mirov li dîrokê sûrî dimeyîzenê, mirov dibîne ku di destpêka demazirandina xwe de bi kurdan re ava bû. HIngî fransî berî damazirandinê li serwer bûn. Di wê demê de dema ku ew bi şûn ve vekişiyan, hukumete kurdan ji li wir hata damazirandin. Her weha mirov karê bêje ku gelek mafên wan hebûn. Lê dimeên piştre wan ji, çawa ku tirkan weke ku di konfaransa lozanê de gotin em li ser naê kurd û tirkan li virin, û piştre komar tenê kirina komarak tirk, wan ji wilo kir bi heman rêbazî li hevberê kurdan. PIştre zimanê kurdî bitimî hata qedexe kirin. Iro, ji kurdan re mafê xwe xwestin ji, tê qedexe kirin. Weke ku tirk û îran dikin, ku mafê xwe dixwezin ku şaradar û perlamenter ji bin digirê û diavêje girtigahê, ew ji hemna rêbazê bi kar têne. Bi ti awayî mafê mirovahî yê perwerd bi zimanê dayikê naye dayîn. Li tirki ji û li îranê û li sûrî ji, iro, kurd ji mafê yê mirovahî û insanî bêparin. Saziyên perwerde yên van welatan têne ji bo ku kurdan bike tirk, pers û arab tevdigerihê. Bi hev re iro li hevberê kurdan di şerekî tinekirinê de ne. Bi hev re biryara qirkirina kurdan ya çandî siyesî û ziman û hê gelek aliyên din dana û iro bi rê ve dibin wê biryarê.

Iro gelek kurd zimanê dayika xwe bikar nayênin. Deme ku mirov dibêje wan çima bi kar nayêne, dibêje ez nizanim. Oto-asîmlasyon, weke xwe bi xwe, xwe kuştina, Nirxên xwe kuştina. JI bo ku otoasîmlasyon pêk were pêşî yên ku dixwezin asîmle bikin, zimanê ku bi kar tênin pir popular dikin, zimanê ku wê bi kujin ji pir biçûk didina nîşandin. Dikin ku yên ku diaxifin, wî zimanê xwe biçûk bibinin. Hertimî li ser nekêrhatina wê diaxivin û tênine ser ziman. Nirxên wê ji û dîrokewê biçûk didina nişandin. Ev xosletên oto-asîmlasyonê ne.

Divêt ku mirov li ser asîmlasyona oto-asîmalsyonê bi sekinê.Iro li kurditanê ji ber gelek sedeeman ji bê ev yek heya. Gelek kurd zimanê xwe yê dayikê bi kar nayênin. Dibêjin em kurdin lê zimanê xwe bi kar nayênin.Dibêjin ku "em zanin, lê em karin xwe baş bi zimanê din bênine ser ziman". Ev ji ya rasti amcamaka metingeriyê ya.

Ziman kurdan bi dîroke xwe re xwediyê dîrokeke ku ne bin 12 hezar salan re ya. Lê kurd vê yekê nizanin. Bi zanebûn ev yek ji ber çavan tê

ravandin. Nahêlin ku mirov li ser vê yekê bi sekinî. Kurd haya ku wê oto-asîmlasyona ku li ser xwe ne buhurênin wê ne gihine rûmete xwe. Rûmetî li nirxên xwe xwedi derketina. Li zimanê xwe xwedi derketina. Di jiyanê de divêt ku kurd zimanê xwe bi kar bênin. Kar û barê û axifinên xwe bi zimanê xwe bikin.Zimanekî zanin ne tiştekî xiraba. Lê belê ji zimanê xwe yê dayika dûrketin tiştekî pir xiraba. Di her qada jiyanê de divêt ku hewl bidin ku zimanê xwe bi kar bênin. Bi vê yekê wê karibin wê asîmlasyon û oto-asîmlasyonali ser xwe bişikênin. Miorvên ku zane be, wê li zimanê xwe xwedi derkeve. Lê yên ku nazan bin wê ji dêla zimanê xwe li zimanekî dî xwedi derkevin.

Divêt ku mirov baş zanibe, pêşketine her mirovî di zimanê dayikê wî de ya. Ziman, ne tenê ji hinek bêjeyan pêk têt. Ji aliyê genetikê ve ji ev yek bi wate ya. Deme ku zimanê dayikê bi ne hata nîn, hingî, saxsiyat dimire. Oto asîmlasyon xwe bi xwe, xwe qatilkirina. Xwe kuştina. Saxsiyata xwe kuştina. Ji miorvahiya xwe dûrketina.

Ziman bi asîmlasyonê re tê kuştin. Çand tê tinekirin. Dîrok tê windakirin. Li pêşketin û nivîsandin hizir û raman tê girtin. Yên ku di nivîsên ji bi gelek awayan çûna ser wan çêdibe. Kî wê rastiya ku tê xwestin ku ji hole were rakirin bêne ser ziman, weke dijmina. Li tirkî iro ya ku tê kirin ev e. Zimanê kurd qedexe ya. Yên ku tênin ser ziman ji weke dîjmin têne ser ziman. deme ku kurd bahsa ziman xwe dikin, weke "parçakirina tirkî" têne gunahbarkirin. Bi vê yekê, dikin ku bi şûn ve gav biavêjin. Ev gotina "parçakirina tirkî" divîr de, karakî mazin ji bo sistemê dibîne. Kî serê xwe ji bo zimanê xwe rakê rastî wê tê.

Bi vê yekê, mirov karê bêje ku ziman tê kuştin, û li pêşiya bi kar anîna wî ji astang têne afirandin. Astanga pêşî li tirkî bi vê yekê, destûra wan ya bingihine. Ku kirin hatina kirin, bi sedeme ne li gor destûrê ya têne astang kirin. Lê weke xalaka destûrî têne mafê axiftin û bi karanîn tirkî ji mirovan re dihêlin. Bi vê yekê dixwezin bêjin têne mafê yê tirkitiyê heya. Ji wê pêve ti mafê wa nîn e.

KUştina zimanê kurdî bi tekoşîna sisteme tirk ya li hevberê zimanê kurdî pêk têt. Ji her alî ve bi hêze xwe ve diçê ser kurdî. Yên kurdî bi kar tênin ji bi kuştinê re ru bi run ne. Mafê yên jiyanê nayê hiştin. Sistemê iro "dij-kurditi" mazin bi pêş xistiya. Li ser vê yekê destûra xwe ya bingihin ji ava kiriya. Li gor destûra tirkî ya bingihin, ti carî bi zimanê kurdî perwerde nayê dayîn. Divêt ku hemû tirk bi tirkî were kirin. Divêt ku di jiyanê hertimî tirk bi kar bê anîn. Gelek kurd ji weke lanetliyên sadsala 21 ê vê yekê erê dikin. Zimanek deme ku di perwerde de nehata bi kar

anîn wê mire. Kurd bi xwe ji bi xwandinên xwe yên di bistanên tirkî de zimanê xwe dikujin. Ev asîmlasyona **oto-asîmlasyona**. Kurd kengî gotin,e ne me divêt ku bi zimanê xwe perwerde divêt ku bikin, hingî wê bi sazi û hemû tiştên xwe ve wê, wê asîmlasyona li ser xwe bişikênin.

.....

**Bêdengîya sazîyên navnetewî û neteweyên yekbûyî li hemberî komkujiyên ku rejima tirk dihêne serê civate kurd.**

Ev ser 40 salî re ya ku rejima tirk hêrîşî civate kurd dike û komkujiyan dihêne serê civate kurd. Tenê di hundurê van 40 salên ku derbasbûna de rejma tirk ser 200 hezarî re kurd qatil kirina. Bêgûman, komkujiyên ku berê vê demê jî ku rejima tirk hanîna serê civate kurd, hena. Komkujiya koçgirîyê, komkujiya agirîyê, komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd, çend ji wan komkujiyên ku rejima tirk di wan de bi hezaran kurd qatil kirina na. Tenê ji dema şerê cîhanê ê duyemin û heta roja me, dem bi dem û ankû roj bi roj, rejima tirk komkuji hanîna serê civate kurd. Di nava herdû şerê cihanê de ji sale 1915´an û heta salên 1945´an û hwd, bi deh hezaran kurd bi komî hatina qatil kirin. Piştre jî, komkujiyên mazin ên ku rejima tirk, hanîna serê civate kurd bûna. Pêvajoya komkujiyên ku rejima tirk ji dema şerê cihanê ê duyemin û heta roja me hanîya serê civate kurd, li demê hatîya belav kirin û hatîya dayîn meşandin. Pêvajoya ji şerê cihanê ê duyemin û heta roja me, wê rejima tirk, pêvajoyek ku di wê de komkujiyên mazin dihêne serê civate kurd, wê bimeşêne.

Ji wê demê û heta roja me, pêvajoya komkujiyên ku têna serê civate kurd, wê bidomê. Piştî komujiya dersimê, li kurdistanê bêdengîyek ji ber komkujiya pêşket. Hingî mirov qatilkirin, herêmên kurdan bêmirov man. Kurdên mana li jîyanê jî, ji aliyê rayadarên tirk ve weke ”bermehiyên ku ji ber komkujiyan mana” dihatina binavkirin. Pêvajoya komkujiyên kurdan, wê piştre jî bidomê. Ji salên 1970´î û pê de, wê bi bandûra tekoşînên azadiyê ên li cihanê, wê li kurdistanê, tevgera azadîya kurd, hin bi hin şîn bibe û pêşkeve. Piştre jî, wê rejima tirk giraniyê bidina komkujiyan. Ji ber ku tirkiya andamê NATO bû, wê tirkiya alikariyê di şerê xwe yê li hemberî civate kurd de ji NATO´yê bigirê. Her wusa, bi alikarîya NATO´yê, tirkiya li kurdistanê şerê yê bi kurdan re da

meşandin. Di vê şerê ku rejima tirk bi kurdan re ji vê demê û pê de, da meşandin bi kurdan re, herî hindik, nêzî 200 hezar kurdî qatil kir. Lê ji ber ku tirkiya andamê NATO bû, di çapamaniya rojava û ankû ´ewropa û amerika de, ti bahse van komkujiyan newê kirin. Bi heman rengî, wê nêzîkbûn li pêvajoyên şer ên ku di dawîya sale 2015´an û destpêka sale 2016´an û pê de kiribû de jî wê bibê. Her çendî ku rewşa pênaberan weke ”hêncet” ji wê bêndegîyê re dihat dayîn nîşandin jî, lê di aslê xwe de rastî ji wê cudatîrî bi vê rewşê re şîrovekirina wê, wê rasttir bibê. Dadgehên mafê mirovan û navnetewî jî, bêdeng bûn. Çend biryarên di çerçoveya tekakesî ku ´dadgeha mafê mirov a ewropa´ girtibû de jî, ti çareserî ji kurdan û komkujiyên ku rejima tirk dihanîn serê wan re ne **dihanî**. Wê rêxistinên kurdan û ku tekoşîna maf û azadîya civate kurd didin, wê bên xistin listeyên terorê ku hatina pêşxistin de. Êdî çend kurd dihatina qatilkirin, wê weke mirovên ku di ancama şerê û ankû tekoşîna bi terorê re wrê hanîn li ser ziman.

Bakûrê kurdistanê di nava sînorê tirkiya hatiya hiştin. Her wusa, li ser vê rewşê jî wê çend gotin werina gotin. Her şerê rejima tirk ê bi civate kurd re wê bi gotina ´mafê tirkiya heya ku xwe biparêzê´ re wê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê herkesek li hemberî komkujiyên kurdan, di vê çerçoveyê de wê hêncetan ji bêdengîya xwe re bibînin û bêdeng bimênin. Heta roja me, di vê çerçoveyê de li ser mijara kurd, ti saziyên navnetewî ku neteweyên yekbûyî jî di nav de, bertek nedaya nîşandin. LI hemberî komkujiyên ku rejima tirk hanîna serê civate kurd, bêdeng maya. Bandûra, andamtîya tirkiya a di NATO de jî, di vê de heya. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku li ser mijara kurd û komkujiyên kurdan bêdengî domîya ya.

Her wusa, di pêvajoya şerê ku rejima tirk ê ku di sale 2015 û heta sale 2016´an ku li hemberî kurdan da destpêkirin, wê li hemberî wê jî dunya li hemberî wê bêdeng bibê. Di kewçera 2015´an de gera serokwezirê Alman Angela Merkel li tirkiya bû. Piştî vê gerê re di dawîya hefteya pêşî a sibate 2016´an de carek din Angela merkel diçê tirkiya û bi rayadarên tirk re hevdîtinê dike. Di hundûrê vê demê de jî, rejima tirk û rayadarên wê pêvajoyek şer li hemberî civate kurd dabûbûna destpêkirin û komkuji dikirin. Lê rayadarên ewropî û welatên ewropî jî li berê wê bêdeng bûn. Di hevdîtinên ku bi vî rengî dihatina kirin de hem şer rejima tirk ê li bakûrê kurdistanê ku li hemberî civate kurd dihat

rojevê û bi wê re politikayên wê ên li dijî rojava dihatina rojavê. Rayadarên tirk, di çerçoveyeka ku bi wê li dijî statûya şer dikirin de gotin digotin û politika dikirin. Heta ku di vê çerçoveyê de bahse kirina amedekarî û **oparasyonên leşkerî ên li hemberî rojava jî dihat kirin**. ..

Di gera Angela Merkel de weke ku li ser çapameniyê re dihê gotin ku wê ”wê mijara pênaberan hildina li dest.” Li vir, bi vi ve girêdayî divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Politikaya rejima tirk a li ser pênaberan re jî divê ku mirov di çerçoveya pirsgirêka kurd de hilde li dest. Her wusa, her roj, nûçeyên ku ji herêmê tirkiya tên û ku di wan de tê gotin ku ´kiştîya pênaberan noqî avê bûya û bi dehan jîyane xwe ji dest daya jî, vê rewşa mirina pênaberan di nava avê de jî divê ku miirov bi teybetî hilde li dest. Di serî de ev jî, tê pêşxistin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hemû pênaberên ku di kiştîyan de jîyane xwe ji dest didin, çendî ku bê gotin ku ”sûrîyayî na” û ankû ”îraqî na” jî, divê ku miirov bi teybetî werêne ser ziman ku hemû sadî 95´ê wan kurdên rojavayî û ên başûrî na. Bi nêzîkatîya ku li Cizira bota, Sûrê, Nisêbîn, Gever, Hezexê û hwd, çawa hêrîşî kurdan dike û komkujiyan dihêne serê kurdan, bi heman zihniyetê nêzîkî wan pênaberên ku kurd dibin û xiniqandina wan ya di avê de jî divê ku mirov weke kuştina kurdan li van bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Sûr, Nisêbîn, Hezex, geverê û hwd, divê ku mirov şîrove bike.

Gotina ´ew ji Sûrî na´ û ankû ´ji îraqê na´, divê weke maskeyekê ji wan qatilkirinên kurdan ên bi kiştîyan di pavarên ´bahre sipî´ de. Her wusa, li vir, politikaya kiştîyan, divê ku miirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ku li ser hemû mirovên ku ji destpêka şerê Sûrî û hwd ve ku di kiştîyan de hatina noqî avê kirin ku lêkolînek li ser wan were kirin, wê bi awayekî vekirî were dîtin ku ji sadî 95´ê wan kurd in. Bi teybetî, li gorî miirov ji devê hinek pênaberan dibihîzê ku di çapameniyê de hat ser ziman, bi teybetî kurdan dinaqênin û dikin ku wan bi kiştîyan bişênina mirinê. Her wusa, ew kiştî, bi awayekî bi gûman, çawa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku noqî avê kirina wan jî, di çerçoveyeka planaka şerê bi civate kurd re de dihê kirin û di wan noqî avê kirinê de kurdên ku bi hênceta şandina welatên ewropî ku hatina xapandin, di wan de jîyane xwe ji dest didin.

Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, divê ku mirov rewşa xaniqînên ku bi noqî avê bûna kiştîyan re ku dibin û di wan de bi dehan mirov jîyane xwe ji dest didin, divê ku mirov di çerçoveya politikaya şerê rejimê ê li hemberî civate kurd de ê weke li Cizîra, Sûrê û hwd de werenê ser ziman. Ew komkujiyên di wan kiştîyan de dihên kirin, ti kesek nikarê bi awayekî ji politikayên rejimê dûr werêne ser ziman.

Her wua li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku noqî avêbûna kiştîyên pênaberan, divê ku mirov weke rengekî komkujiyên rejima tirk ên di bin trejedîya pênaberan de dihê weşartin jî werêne ser ziman. Dema ku rewşa pênaberan bi awayekî vekirî û cidî were lêkolîn kirin, wê were dîtin ku bi konseptekê ew komkujiyên di kiştîyan de dihên plankirin û kirin. Di serî de divê ku mirov vê rastiyê fahm bike û werêne ser ziman. Rastîya pênaberan, bi trejedîya wan re, divê ku mirov bi politikaya pêşxistina dîyasporaya kurd ve girêdayî mirov hilde li dest û di wê çerçoveyê de werêne ser ziman. Rewşa pênaberan, ne rewşeka ku ji berxwe pêş dikevê ya. Di destpêka şerê sûrî de bi hêrîşên çeteyên DAÎŞê û hwd, zor didana mirovan ku goç tirkiya bikin. Bi teybetî jî, ew goçberkirin û ankû politikaya bi zorê dana goçberkirinê, bi teybetî li rojavayê kurdistanê hatibû pêşxistin. Bi teybetî, kurdên ji rojava goçberkiribûn, kêm ji wan derfet dît ku vegerihina malên xwe. Wekî din jî, piraniya wan, derfet ji wan re ne hat dayîn ku vegerihina malên xwe.

Politikaya goçberkirinê, di çerçoveya zihhniyeta ku bi wê dihat xwestin ku kurdan li herêmên wan bi hijmarî kêm bikin, dihat pêşxistin. Her wusa, bi teybetî, di politikaya goçberkirinê de kirina armanc a kurdên ku goçberkirina ji herêmê xwe, vê rastîyê piştrast dike. Di salên 1990î de rejima tirk li bakûrê kurdistanê, politikaya ´bêmirov kirinê´ meşandin. Di çerçoveya vê politikayê de ser 7 milyonan re kurd ji bakûrê kurdistanê, ji cih û warên wan hatina dayîn goçberkirin li rojavayê tirkiya û welatên ewropî. Her wusa, ev politikaya dayîna goçberkirinê kurdan ji herêmên wan, divê ku mirov, bi teybetî werêne ser ziman ku weke politikayaka teybet a rejima tirk û rejimên ên ku civate kurd û kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin a. Komkujiyên ku di kiştîyan de li paravên bahre sipî bi noqî avê kirina kiştîyan re ku dihê kirin jî, divê ku ku mirov di vê çerçoveyê de bi vê politikaya rejima tirk ve girêdayî hilde li dest û werêne ser ziman. Di nava çapameniya tirk de jî car bi car gotina ´trejedîya goçberan´ dihê hanîn li ser ziman. Li ser vê gotinê re

nivîsandin û sîyesetkirin jî bûya. Lê ev nivîsandin û sîyeset kirin jî, bo ku ser wan komkujiyên ku di kiştîyan de dikin ku ser wan binûxûmênin, dihên pêşxistin. Weke **Nîqaşên ser nûxûmandinê**, divê ku mirov wan nîqaşan jî werêne ser ziman. Heta ku mirov pêvajoya şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd ku ji destpêka komarê ve ku meşandiya baş ne hilde li dest û fahm nekê, mirov wê van komkujiyên di kiştîyan de jî baş nikaribê bi zihniyeta wê re fahm bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov divê ku van komkujiyên di kiştîyan de bi konsepta şer a rejima tirk li hemberî civate civate kurd ku bi wê re di dewama komkujiyan li Cizîra bota, Sûr, Hezex, Nisêbînê, gever û hwd de werêne ser ziman. Bi heman rengê vajî wê jî, wê rast bê ku miirov di dewama van komkujiyên di kiştîyan de van komkujiyên ku hêzên rejima tirk li van bajarên kurdan dikin ku werênina ser ziman.

Mijarên ku di hildina li dest, ji yên hevdîtina pêşî a berî vê ne cudatir in. Di vê gerê de pirr zêde hat ser ziman ku "bi tirkiya re peymane girtina pênaberan li tirkiyê´ hatîya mohrkirin. Ev peyman, pirr zêde di rojevê de ma. Bi wê re jî, beremberî vê girtina sînoran ku pênaber bi bûhûrina li ewropa ji tirkiya, alikarîya aborî, hat ragihandin ku wê bê dayîn li tirkiya. Lê bi wê re jî tirkiya, li pişt derîyan, di hevdîtinên xwe ên bi Angele Merkel û rayadarên din ên ewropî re ku dikir de doza alikarîyê li hemberî kurdan dikir. Bi gotinaka din, wê alikarî bidan tirkiya û tirkiya çi kiriba, wê ew ne hildaban rojeva xwe. Her wusa, piştre bi ser wê hevdîtina Angela Merkel re sê çer heyv bûhûrtin. Piştre konsepta şer a rejima tirk ku li hemberî civate kurd pêşxistî ji aliyê rejima tirk ve hat xistin meriyetê de û hêrîşên rejima tirk li dijî civate kurd dest pêkirin. Rejima tirk, weke rêbaza dorpêçkirina bajarên kurdan **”qadaxayên derketina li sûkê”** pêş dixist û bi wê re bajarên kurdan kavil dikir û bi deh hezaran kurd dixwest ku ji herêmên wan bide goçberkirin. Her wusa, komkujiyên mazin di vê demê de rejima tirk dihanî ser civate kurd. Lê li hemberî wê deng ji ti saziyên navnetewî û neteweyên yekbûyî derneket.

Li ber komkujiyên kurdan, bêdengîya saziyê navnetewî û neteweyên yekbûyî jî, di vê çerçoveyê de hatibû pêşxistin. Welatên ewropî, bêdeng bûn. Weke hêncet jî, ew girtina pênabaran li tirkiya didan nîşandin. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ev girtina pênaberan, di vê çerçoveyê de bi awayekî pirr bi bêahlaq hatibû îstismar kirin.

Li kurdistanê, di vê dema dawîya sale 2015´an û destpêka sale 2016´an de wê rejima tirk, komkujiyna mazin li kurdistanê bike. Her wusa, wê bajaran bi tememî kavil bike. Bajarên kurdan ên weke Silopî, Cizira bota, Nisêbîn, Sûrê û hwdê, wê bike ku kavil bike. Hêrîşên kavilkirinê wê bike. Hêrîşên mazin li hemberî civate kurd dikir. Lê mixabin, deng ji saziyên navnetewî û neteweyên yekbûyî derne diket. Her wusa, sazîyên ku digotin ´mafê mirovan´ diparêzên jî, li hemberî wan komkujiyan hwd, bêdeng bûn. Heta roja me, di derbarê komkujiyên ku hatina hanîn li serê civate kurd, ne hildana rojeve xwe û li hemberî wê bêdeng mana. Di derbarê ti komkujiyên berê hatina serê civate kurd de deng dernexistina.

Di vê dema ku hêrîşên mazin bi armanca jenosîdkirina civate kurd, li kurdistanê bi zihniyeta ´zagona şerq û îslahat´ dihatkirin de, bêdeng diman. Her wusa, rejima tirk, li ser navê civate kurd, çi hebû, ji xwe re kiribû armanc û hêrîşî wê dikir. Jin, zarok, ciwan, pîr û kal, di komkujiyên rejima tirk de dihatina qatilkirin. Mijara qatilkirina jina kurd teybet înan ku piştî ku ew li silopî hat qatilkirin û cenezeyê wê hefteyekê li sûkê ma, rastîya hêrîş û zihniyeta rejima tirk, pirr baş radixe li berçav û dide ravakirin. Her wusa, zarok, hê di zikê dayîka xwe de na, bi gûleyên leşker û polîsên tirk dihatina qatilkirin.

Li berçavê hemû cihanê, rejima tirk bi artişê dikeve bajarên kurdan bombabaranê dike. Hêrîşî malên kurdan dike. Her wusa, rewşa jîyane wan ya ku heyî bi tememî ji holê ra dike. Bi awayekî vekirî, rejima tirk û rayadarên wê dixwezin ku kurdan bitafisênin û bêdeng bikin. Ji her aliyê ve temenê maf û azadîya wan ji destê wan hatîya girtin. Di hêrîşên giran de bi vî rengî kurd, sale 2015´an bidawî dikin û dikevina sale 2016´an de. Bajarên kurdan ên weke sûra amedê ku dîrokî ya bi kirmanên xwe re bi hêrîşên artişa tirk ên weke tank û topên wê, hatîya tûna kirin û kavilkirin. Bi heman rengî, li Cizîra bota, Silopî û farqînê jî hatîya kirin.

Li ber vanqas hêrîşên hovane ku rejima tirk li kurdan dike, cihane derve, saziyên navnetewî û neteweyên yekbûyî di bêdengiyekê de na. Di aslê xwe de bi wê bêdengîyê re weke ku piştgirîyê bidina komkujiyên rejima tirk ên li ser serê kurdan jî. Di awayekî fiîlî de dikevina rewşek bi vî rengî de. Weke ku heta roja me, li hemberî komkujiyên kurdan bêdeng mana, î ro jî, bêdeng dimênin.

Rejima tirk, dixwezê ku li ser navê kurditiyê û civate kurd çi li bakûrê kurdistanê heya, tûna bike û ji holê ra bike. Hêrîşên wê, bi awayekî, hebûna civate kurd dike. Hêrîşên ku li civate kurd û bajarên kurdan dike, di vê çerçoveyê de divê ku mirov şîrove bike û werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi awayekî vekirî li berçavên cihanê jenosîda kurd dihê kirin û herkesek li ber wê bêdeng a.

**Li vir, di dewama mijarê divê ku miirov bi rewşa pênabera a ku dixwezin bi wê mudahaleyî demografiya civate kurd bikin û ´nîqaş û hewldanên rakirina destlênedana wekilên kurd´, hilde li dest.** Di rojevê de ya ku î ro tê nîqaşkirin, komkujiyên ku rejima tirk li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, sûr,, Hezex û bajarên din kurdan dikê, rakirina destlêdana wekilên kurd û rewşa pênabarên Sûrîyayî ya. Ev hersê serek, çendî ku weke ku ji hevdû cuda werina dîtin jî, lê di aslê xwe de bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na.

Rayaderên tirk, bo ku bala herkesekî ji ser komkujiyên ku li kurdistanê û bajarên kurdan dikin bidina alîkî û bidina devereka din, nîqaşên rakirina destlênadana wekilên kurd pirr zêde kirina rojevê de. Bi wê re jî, li bajarên kurdan ên din jî, her roj, oparasyonên qirkirina sîyesî li dardixin û di wan de bi dehan kurd digirtin û diavêjina zindanan. Rewşa rakirina destlênadena wekilên kurd, her wusa di çerçoveya sîyeseta jenosîdê a rejima tirk ku ew li ser serê civate kurd dimeşênê de divê ku mirov hilde li dest. Hemû komkujiyên hovane ên ku li bajarên kurdan dikin jî, divê çerçoveyê de divê ku miirov hilde li dest.

Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di pêvajoya şerê li Sûrî de rejima tirk bidestê çeteyan bi zor dida ku hemû mirovên herêmê goç tirkiya bikin. Di vê çerçoveyê goçberîya ku dana kirin, ji aliyekî ve weke ´kozek´ sîyesî li hemberî welatên rojava ên ewropa bikardihênin û weke ku di hevdîtinên Dawutoglu de ên di destpêka hefteya duyemin a adara 2016´an de ku hat dîtin, weke ku çawa ku rejima baasê a sûrî li rojava kir bi ´kembera arab´ re wa mirovên ku goçkirina, li bajarên kurd ên bakûrê kurdistanê ên rejima tirk bi hêrîşan xûrxandina, hemwelatiyê bidina wan û bicih bikin. Vê jî, di çerçoveya hewldana gûharandina demografiya civate kurd a herêmê de dixwezin ku bikin.

Rejima tirk, wê çawa vîna civate kurd bişêkênê, di wê çerçoveyê de van hêrîşên xwe dike. Ji aliyê sîyesî ve jî hewldana rakirina destlênadana wekilên kurd, divê ku mirov di çerçoveya politikaya rejima

tirk a berî hilbijartinên 1´ê mijdara 2015´an de ku çêkiribû de li wê bihizirê. Di wê demê de dixwestin ku sîyesetmederên kurd dervî sîyesetê bihêlin. Lê çi kirin û çendî ku hêrîş jî li darxistin, pêşîya bûhûrîna partîya HDP ji bende ji sadî 10 nekarîn bigrin. Partîya kurd, ew bende derbaş kir. Ya ku di hilbijartinan de nekarîn bikin, dixwezin ku bi rakirina destlêdanane wekilên kurd re bikin. Divê çerçoveyê de ji xwe, oparasyonên qirkirina sîyesî li bajarên kurd û sazîyên civate kurd dikin.

**Di hevdîtina Dawutoglu a li ewropa de ku qaşo tenê mijara pênaberan hatîya rojevê û xwestina ku levkirinê bikin û weke ku di çapameniya rojava a ewropa de dihê ser ziman ku ´levkirin çênebûya´ jî, di wê gerê û hevdîtinên ku kirin de jî ev mijara rakirina destlênadane wekilên kurd jî hatîya rojevê. Di serî de divê ku mirov balê bikişênê li ser vê. Ya ku di nava wan nîqaşên li ser rewşa pênabaran de ku dihê xwestin vêşarî were hiştin û newê rojevê jî ev a. Bo vê yekê ya ku çendî ku li kurdistanê û bajarên kurdistanê lezê didina oaprasyonên qirkirina sîyesî, bi wê re di awayekî hemwaxt de nîqaşên li ser rewşa pênabaran di çerçoveya ´bazarîya bi rayadarên ewropî´ re zêdetirî dihênina rojevê. Li vir, dema ku em dibêjin ku rewşa pênaberan weke ´kozekî´ bikardihênin, hinekî jî, ji vê aliyê ve jî rayadarên tirk, ji rayadarên ewropî dixwezin ku li hemberî kirin û kiriyarên wan ên dijmirovî ku li kurdistanî li dijî civate kurd dikin ku bêdeng bimênin. Aliyekî giring ê bazarîya pênabaran ku rayadarên tirk bi rayadarên ewropî dikin jî ev rewş a.**

Di vê dema de ku li bajarên kurdistanê ên weke Cizîra bota, sûrê, hezexê, geverê, nisêbînê û hwd, bi awayekî hovane û bêahlaq rejima tirk hêrîşî kurdistanîyan dike ûû komkujiyên mazin dike de hanîna rojevê rakirina destlênadana wekilên kurd, di vê çerçoveyê de bi wê politikaya komkujiyan re divê ku mirov wê hilde li dest. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê çawa kurdan bêvîn û îrede bihêlin, di wê çerçoveyê de hêrîşî kurdan û civate kurd dikin.

Li vir, politikaya pênaberan, çendî ku weke ´kozekî´ li hemberî rojava û ewropa dihê bikarhanîn jî, dixwezin ku vê rewşa pênebaran, li kurdistanê di çerçoveyeka ku bi wê mudahaleyê li demografiya civate kurd bikin, dixwezin ku li kurdistanê bikarbênin. Her wusa, vê jî, di wê çerçoveyê de dixwezin ku bikarbênin. Gotinên ku tên ser ziman, ew in ku ´rayadarên ewropî ji wan dixwezin ku ´hemwelatitiyê´ bidina pênabaran û wan li tirkiya bihêlin. Lê bi wê re jî, tirkiya dixwezê ku van pênaberan li bajarên kurdan bicih bike. Di aslê xwe de ew gotinên dawutoglu û T.

Ardogan ên bi rengê´ ´emê bajarên nû ava bikin´, çendî ku di çapameniyê de weke rewşeka ku li ser rewşa hêrîşên li sûrê, hezexê, nisêbînê, geverê, Cizîra bota, silopî û hwd re dihanîn li ser ziman jî, lê ev gotin, di çeçroveya li kurdistanê bicihkirina van pênaberan û ku bi wan mudahaleyê li deomgrafiya civate kurd bikin, di wê çerçoveyê de bi zihniyetê dihatina gotin. Di vê çerçoveyê de çendî ku dem, piştî hanîna van gotina a li ser ziman ve diçû, êdî bi politikayên rejima tirk ve girêdayî, ev rastî bi awayekî vekirî êdî hatina dîtin û ser ziman.

Weke politikayekê ku li ser wê re mudahaeleyî hebûna civate kurd bike li ser rewşa pênaberan re hê di dema şerê li herêma Ukrayna destpêkiribû. Ji wir jî, gelek malbatên tirkman ên bi navê ´ahiska´ hatina hanîn li herêmên bakûrê kurdistanê ên weke Erzincanê û hwd, li wan hatina bicihkirin. Di vê çerçoveyê de ew malbatên ku hanîna, ew jî hemwelatîtî dabûbûna wan. Nûha jî, li ser rewşa pênaberên ji Sûrîyê û bi teybetî ên arab re, dixwezin li herêm û bajarên kurd ên ku artişa tirk xûrixandina, heman rewşê di çerçoveya politikaya pênaberêyê de pêşbixin. Yanî, li vir, ew rewşa pêneberên Sûrîyê, di vê çerçoveyê de di çerçoveya mudahaleyên demografikî ên li hebûna civatê de dixwezin ku bikarbênin.

Şerê ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd pêşxistî, di vê çerçoveyê de weke şerekî jenosîdkirina civate ya. Divê ku mirov wê şerê di vê çerçoveyê de fahm bike. Dema ku zimanê civatekê werê qadaxakirin, mudahaleyên demografikî û hwd li hebûna wê werina kirin û her wusa newê hiştin ku ew xwediyê wîna xwe ya sîyesî bê û newê hiştin ku ew xwe pêşbixe bo barkirina pêşarojê, ew dibê hewldana biarmanca ji dîrokê birina wê civatê. Ev jî, divê jenosîd. Ya ku nûha kurd bi wê re rû bi rû na, ev a. Her wusa, rastîya di temenê nîqaş û hewldana rakirina destlênadanên wekilên kurd jî, di vê çerçoveyê de bi armanca şikandin û tafisandina vîna civatê divê ku mirov werênê ser ziman. Di çerçoveya şerê jenosîdê ê li hemberî hebûna civate kurd de di çerçoveya şikandina wê ya wê ya sîyesî ku nikaribê xwe bi navê xwe û zimanê xwe werênê ser ziman de ew hewldana rakirina destlênadana wekilên kurd dihê rojevê û dixwezin ku rabikin.

Kurdan, di hilbijartinên 1´ê mijdara 2015´an de bende ji sedî 10 derbas kir û çûna meclisê. Di aslê xwe de vê rewşa çûyina meclisê, politikaya rejima tirk a li hemberî hebûna civate ya bi armanca şikandina wê vala derxist. Piştî wê re pêvajoya hêrîşên mazin li hebûna civate kurd dana destpêkirin û bajarên kurd hatina talan û vêrankirin ji aliyê polîs û

leşkerên tirk ve. Dîmenên xûrîxandinê ku me li kobanê bi hêrîşên çeteyên DAÎŞê ên li kobanê û şengelê û hwd ku me didîtin êdî me li bajarê bakûrê kurdistanê didîtin. Di vê çerçoveya van hêrîşan de piştre bi wê pêvajoya hêrîşan a ku rejima tirk li hemberî civate kurd dabûbû destpêkirin bi wê re di ahengekê de dihanîna rojevê ku wê ´destlênedana wekilê kurd rakin´. Di vê çerçoveyê de nîqaş û hewldanên bi vî rengî ên bi nîqaşên li ser wekilên kurd re jî, divê ku mirov di çerçoveya wê pêvajoya hêrîşê ku rejima tirk û rayaderên wê ku li hemberî civate kurd daya destpêkirin, bi wê re hilde li dest û fahm bike.

Ji xwe bi dehan şaradar û rêveberîyên herêmî ên kurd, tevî di hilbijartinan de ji aliyê gel ve hatina hilbijartin jî hatina dûrxistin ji aliyê rejima tirk ve. Her wusa, gelek rêveberên kurd weke Mehmed Tunc û birayê û gelek kurdên din ên ku hatina qatilkirin û hwd, ji aliyê polis û leşkerên tirk ve hatin qatilkirin. Gelek ji wan jî, nûha di zindanan de na. Divê ku em van rewşan jî di çerçoveya wan nîqaş û hewldanên rakirina destlênedana wekilên kurd de bibîr bixin û werênina ser ziman. ..

….

**Denezene rewşenbîr û akadamisyanan ku bi gotina "emê nabîna hevkarê vê sûcê» û hêrîşên rayadarên tirk ên li hemberî wê.**

Piştî ser 1128 rewşenbîran re di 10ê rêbendana 2016´an de denezenek weşand û gotin ku **"emê nabîna hevkarê vê sûcê"** û pê de, hêrîşên rayadarên tirk û rejima wê jî, li wan zêdetir bû. Piştî ku denezen hat weşandin û pê de, wê çawa vala derxin û bandûra wê kêm bikin, li ser wê re manipûlasyonê dikin. Ew jî, têrênekir, pergale dadê xistina dewrê û di derbarê rewşenbîr û akadamîsyên ku îmzeya wan heya de bidest vekirina dozan kirin.

T. Ardogan, dibakê rewşenbîr û akadamîsyan, "em bi xîyaneta gelek rewşenbîrên ku maaşê xwe ji dewletê digirin re rû bi rû na." Piştre bi ser gotina xwe ve dike û dibêje ku "ey ´rewşenbîrên muswede´, win reş û cahil in." Piştî van gotinan re jî, bidest hêrîşkirina li rewşenbîran kirin. Bêgûman, denezene rewşenbîran, plana T. Ardogan a jenosîdê derbe kir. Hêrsa wî, ji vê yekê ya.

Li vir, em hinekî li ser gotinên T. Ardogan bihizirin. Ji rewşenbîr û akadamisyan re dibêje "win reş û cahil in." Rewşenbîrî, ronakbîrîya. Zanebûn a. Karê bizanebûnê re ya. Rewşenbîr, li ser dîrokê dihizirê û bi

rastîya dîrokê re li rastiyê dinerê. Her wusa, ya ku rewşenbîr û akadamisyanan bi wê denezenê kirina rast û di cih de ya. Ya ku Rewşenbîr û akadamisyanan bi wê denezenê kirîya rast û bizanebûnî ya. Rewşenbîr, dîrokê û rastîya civatan înkar nakin. Lê zihniyeta desthilatdarîyê ku bi çavika haspê dinerê, înkar dike. Lê rêveberîyên weke T. Ardogan înkar dikin. Yên ku hêrîşî hebûna civatan dikin, ew rêveberên weke T. Ardogan in. Yên zimanê civate kurd qadaxakirîya û hebûna civate kurd înkar dike, T. Ardogan û zihniyeta wî ya. Li vir, dema ku rastî ev bê, yên ku reş û cahil, ne rewşenbîr û akadamisyan in. Yên reş û cahil, yên ku ji wê denezenê û helwesta rewşenbîr û akadamisyanan re gotina reşîyê û cahilîyê bikardihênin in.

Li vir, hêrîşên li rewşenbîr û akadamisyanan, mirov dikarê weke beşek ji hêrîşên li ser civate kurd jî bihasibêne. Her wusa, yên ku hêrîşî bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Silopî, Şirnaxê, Nisêbînê, Farqînê, Amed û sûrê û hwd dike, û van bajaran bi tank û topan vêran dike, terorê dike. Ya ku teror a, ev a.

Heta roja me, weke ku birêz **Noam Chomsky** jî hanî ser ziman, ´ji her aliyê ve T. Ardogan alikariyê dide DAÎŞ û Cebetil-nasr´ê.´ Armanca dayîna vê alikarîyê, çi bû? Armanc, ew bû ku van bide hêrîşkirin li ser kurdan de. Ya ku ji xwe kir jî ev bû. Bi wê hêvî dikirin ku wê ev hov û terorîstên vê sedsalê wê derbeyek mazin li kurdan bixin. Lê her çendî ku kurdan zirarên mazin dîtin jî, têkneçûn. Ya ku plan û stretejîya T. Ardogan û rejima tirk têk bir jî ev bû. Piştî van re jî, li bakûrê kurdistanê, bidest dorpêçkirinên bi navê "qadaxaya derketina li sûkê" kirin. Piştre jî, êdî bajar ji hevdû felişandin.

Yên ku hêrîşî hebûna gelan dikin û nav û statûya wan înkar dikin û dikin ku ji dîrokê bibin, ew bi zihniyeta xwe re reş û cahil in. Mirov dikarê wan, bi zihniyeta wan re weke reş û cahilên sedsalê jî werêne ser ziman.

Î ro, hebûna kurdan ji her aliyê ve dibin hêrîşên polîs û leşkerên tirk de na. Bajarên mazin ên kurdan, bi van hêrîşan tên xûrixandin. Bi de hezaran kurdistanî ji herêmên wan tên goçberkirin. Bêgûman, ev sûcekî mazin ê mirovatiyê ya. Bêdengîya li hemberî vê rewşê û vê şerê ku rejima tirk li hemberî civate kurd dimeşêne, wê herkesekê bêdeng bike û bike hevkarê wê sûcê wê. Ji xwe, heta roja me, rejima tirk, şerê xwe yê ku bi civate kurd re meşandîya, civate tirk jî kirîya hevkarê wê û lewitandîya. Bo vê yekê ya ku civate kurd, ev 40 sale ku li hemberî vê şerê bêdeng maya. Çend dordorên demokrat ku dengên xwe derxistina jî,

ew jî, rastî hêrîşan hatina.

Li vir, di dewama vê de ez dixwezim ku vê gotina T. Ardogan a bi rengê "em bi xîyaneta gelek rewşenbîrên ku maaşê xwe ji dewletê digirin re rû bi rû na", di zane min de wê giring bê. Ber ku heta roja me, gelek nivîskarên ku di çerçoveya politikayên dewletê ên şer de nivîsandina, temenê vê şerê rejimê ê bi civate kurd re ku ev 40 sale didomê afirandina. Yanî, bi gotinaka din, hevkarê wê şûcê rejimê na. Rejimê û rayadarên wê jî, ev nivîskar weke ku wan xelat bike, maaşên mazin dana wan. Berika wan tişî pere kirina. Gelek ji wan, bi taksîyên teybet, tên ser kar û diçin malên xwe. Van pereyan, ber çi didana wan? Şerê rejima tirk ê ku gotina ´terorê´ ji wê re weke maske dihat bikarhanî û bi wê civate kurd di jenosîdê de dibir, wê bi dehan salan bidomê û wê bi pênûsa van dordoran temenê wê domandina wî şerî were çêkirin. **Mirovatîya** ku fêrek rast û baş ji komkujîyên nazîyan dernexist, wê bi komkujiyên rejima tirk û hwd, ên li ser serê civate kurd û hwd, ku dimeşênê re wê biheta biazmûnkirin. Bo ku di çerçoveya politikayên dewletê de binivîsênin. Çendî ku di çerçoveya politikayên dewletê de dinivîsandin, dewletê û rayadarên wê jî, şerê xwe yê bi civate kurd re û li herêmê didana meşandin.

Î ro, tenê di nava van nivîskarên ku bûna hevkarên sûcên rejimê ên li hemberî gelan, li ser vê denezene rewşenbîr û akadamisyanan, nîqaşên vala derxistinê û hwd, li ser zimanê denezenê re bê û ankû li ser gotinên navaroka wê re dikin ku bimeşênin. Î ro, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Mijar û mesele ne zimanê denezenê ya. Mijar û mesele, şerê rejimê ê li hemberî hebûna gelan a. Di serî de divê ku ji aliyê esasî ve di vê çerçoveyê de wê hilde li dest.

Bêgûman, di nava civatekê de ku rewşenbîr û akadamisyan, bi awayekî Azad karibin xwe werênina ser ziman û ne di bin kontrol û bandûra ti kesekî de bin, wê karibin, pêşevaniyek dîrokî bikin ji civakê re. Lê dema ku di çerçoveya politikayên rejimekê de nivîsandin, wê êdî bi politikayên wê yên ku ew dimeşênê re werêne ser ziman. Ev jî, çendî rast a ankû şaşa, wê rastî û şaşîya van nivîskarên ku di çerçoveya politikayên wê de dinivîsênin jî werêne ser ziman.

Î ro, ku em şerê rejima tirk ê li kurdistanê ku li hemberî civate kurd dimeşêne û ankû ku li herêmê dimeşêne, di çerçoveya wê de nivîskarên ku nivîsandina, temenê wê şerê wê yê bi demê re jî afirandina. Ji her kirin û şaşîyên wê re hêncet û sedem dîtina û hanîna ser ziman. Bi şaşî û xelatîyên wê re rejim û politikayên wê "mafdar" kirina ku bidina

nîşandin. Dema ku rejimê komkuji kirina, van nivîskaran, ew komkuji, yan ne hildana rojeve xwe û yan jî dema ku hildana rojeve xwe, bi armanca ku ji aliyekî ve rejimê "mafdar" derxin hanîna ser ziman. Ji aliyê civatê ve li mijarê ne nerîna.

Heta roja me, di vê çerçoveyê de nivîskarên tirk ên ku di çapameniya wê de nivîsandina, bûna hevkarên kirinên rejimê. Di vê çerçoveyê de gotina "em nabîna hevkarê vê sûcê", ku weke gotineka refarans werê hildina, ji vê dîroka xwe ya şaş û ku tişî xelatî na, dikarê xwe rizgar bike û pêşekêşîyek baş ji civate tirk jî bike. Ev gotina "em nabîna hevkarê vê sûcê", ji aliyekî gotina Jean-Paul Sartre a ku li ser şerê firansa a li Cezayirê hanîbû ser ziman û gotibû "em hemû kujarin" hanî bîra min. Ev berteka **Jean-paul Sartre**, weke berteke rewşenbîrî, wê pêşevaniyekê di nava firansa de li hemberî şerê firansa ê li dijî Cezayirîyan jî bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di serî de ku em di çerçoveya şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd li kurdistanê binerin, giringa ku ji nava civate tirk jî, çend miirovên zane derkevin û vî şerî bi vî rengî mahkûm bikin û bibêjin ku "em nabîna hevkarê vê sûcê." Li vir, ev aji aliyê civate tirk ve giring dibê. Di serî de, wê hemû komkujiyên ku rejima tirk, qaşo li ser navê civate tirk li ser serê civate kirina, wê pêşîya wan jî bigrê. Di vê çerçoveyê de biqasî ku ji aliyê civate kurd ve li hemberî vî şerê qirêj ku rejima tirk li ser serê civate kurd dimeşêne ku bertek tên dayîn nîşandin, bi heman rengî, wilqasî jî ji aliyê civate tirk û zaneyên wê ve jî, bertek divê ku werina pêşxistin.

Di serî de li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di serdemek weke vê serdema me de ku zanîn û ragihandin derketiya li pêş û pêşketîya de, ji tekoşîna çekdarî zêdetirî ya bi rewşenbîrîyê dibê weke aliyekî giring bo hebûna civatan. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku yên ku gotinê bizanebûnê re bibêjin yên ku wê serkevtî bin di nava rûpelên dîrokê de.

Hêrîşên ku T. Ardogan li akadamisyen û rewşenbîran dike, di aslê xwe de ji reşî û cahiliya zihniyeta wî ya. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku T. Ardogan bi gotina xwe ya bi rengê "em bi xîyaneta gelek rewşenbîrên ku maaşê xwe ji dewletê digirin re rû bi rû na" re dixwezê ku ji akadamisyan re bibêje ku "em maaşê we didin weê, Bo vê yekê, em çi bikin, winê rast bibînin û di gotina me de bin. Ev nêzîkatîyaka tîpîk a rêveberîyan a ku bi çend maaşan ku dikin nivîskaran û ankû mirovên ji civatê ku bi xwe ve girêbidin a. Yanî bi gotinaka din, mirov dikarê vê nêzîkatîyê weke ´koleketîya hemdem´ a sedsalê jî

werêne ser ziman.

Car bi car, gotina "kirîna mirovan" hatîya rojevê. Wateya vê gotinê jî ew a ku di berdêla pere û ankû maaşê ku standî de bi rêveberîya ku li ser serê wan serdest ve girêdayî bê. Ji wan re weke ´xûzmetkar´ bê. Yanî, bi gotinaka din jî, weke "efendî û xûlam" a. Di berdêla maaşê ku standî de ku ew nivîskar, bibê ´xûlamê´ wê rêveberîyê û weke wê biaxifê û werêne ser ziman. Ji aliyekî din ve vê gotina T. Ardogan a bi rengê "em bi xîyaneta gelek rewşenbîrên ku maaşê xwe ji dewletê digirin re rû bi rû na", wê gotina Machiavelli a ku di pirtûka xwe ya bi navê ´hikimdar´ de dihêne ser ziman û dibêje ku " di dema osmanîyan de herkes xulam a û li gorî gotina padîşah tevdigerihin", dihêne berbîra min. Ya ku î ro, T. Ardogan, li gorî gîyane wê tevdigerihê jî, ev gotina Machiavelli ya ku li ser dema osmanîyan hanîya ser ziman a.

Serokwezirê rejimeka weke rejima tirk ku zimanê civate kurd qadaxa kirîya, û hebûna civate kurd û statûya wê înkar dike û hêrîşî wê dike û li ser wê re dibêje ku "pirsgirêka kurd tûna ya", ji rewşenbîr û akadamisyana re dibêje ku "win reş in û cahil in." Her wusa, rejimek weke rejima tirk ku ji **mamosteyeka bi navê Ayşe di dawîya hefteya duyemin a rêbendanê de ku ew bixwe bi telefonê derdikeve bernemeyek TV a bi navê «beyaz şov» û** dibêje ku "bila zarok nemirin" re ku dozê divekê, çawa dibê ku serokwezirê wê weke T. Ardogan dirabê ji rewşenbîr û akadamisyanan re dibêje ´win reş û cahil in? Bêgûman, divê ku mirov weke rastîyê di vajîya van gotinan de bibînê.

Rejima tirk, şaredarîyên ku kurdan bi dengên xwe bidest xistina jî, di bin navê gotinên weke "**kayyum**"ê de dest didêne ser wan. `Kayyum´, bo destdanîna li ser şirketên ku deynê wan hena û ankû ku ne li gorî rêzikê birêve diçin a. Lê ew dxwezin ku vê jî, bi awayekî metingerî li ser serê kurdan pêşbixin. Ev şaredar, şaredarên kurdan in. Bi wê re jî, dema ku kurd dibistanekê bi zimanê xwe bi kurdî divekin, mifetişên tirk diçin û mohrê li devê wan dixin, weke ku çawa ku piştî 7´ê hezirene 2015´an li baxlare Amedê li dibistanan fersad kemanger´, li Cizîra bota ´dibistana berîwanê´ û li Geverê ´dibistana dayika uweyş´ ku hatibû kirin, hatibû kirin. Di vê çerçoveyê de di bin navê gotina "terorê" de li hemberî hebûna civate kurd rejima tirk şer dike û dibêje ku "pirsgirêka kurd tûna ya", .. "lê pirsgirêka terorê heya." Yanî bi gotinaka din, bi şerê ku bi civate kurd re dike, dixwezê ku pirsgirêka kurd bi tafisandina civate kurd û çermisandina wê re "ji holê ra bike." Şerê ku li hemberî hebûna civate kurd ku bi armanca ji dîrokê birina wê ku bi wê re dike, di bin navê

gotina ´terorê´ de jî dihêne ser ziman.

Denezene rewşenbîr û akadamisyanan, mirov dikarê weke mudaheleyekê li vî şerê rejimê ê li hemberî civate kurd ku di meşênê jî werêne ser ziman. Ji ber vê yekê ya ku rayadarên tirk, vê denezenê, weke "**xîyanetê**" û hwd bi nav dikin û hêrîşî wê dikin. Vekirina dozan li rewşenbîr û akadamisyanan, bi armanca, bi şûn ve gav dayîn avêtin a. Her wusa, mirov dikarê van dozên ku li wan akadamisyanan re ku tên vekirin, weke wan ragihandinên ku rayadarên tirk li ser wezereta perwerde ve dikin û dibêjin ku "kî aşîtîyê dixwezê wan kifş bikin" a. Ev tên çi wateyê? Ev tên wateya îsrare di şer de ya.

Akadamîsyen û rewşenbîrên ku îmzeya xwe avêtina wê denezenê, piştre ji aliyê rayadarên rejimê ve hatin xistin weke armanc. Heta ku di derbarê gelekan ji wan de doz hatina vekirin û hatina xistin binçavan de jî. Gelek ji wan jî, ji karê wan hatina dûrkirin. Lê tevî wê jî, piştre, bi denezenên nivîskî û ku îmzeyên xwe li binî xistina wê wêjevan, û piştre rojnemevan jî, cuda û cuda bi navên xwe denezenan di çerçoveya wê denezena rewşenbîr û akadamisyan de biweşênin. Piştî ku ew denezene rewşenbîr û akadamisyanan hatibû weşandin ji rayagiştî re û piştre jî, wê gelek rewşenbîr û akadamisyenên nû ên din jî, bi îmze û dengên xwe tevlî wê denezenê û yên ku îmze xwe pêşî avêtinê de wê bibin. Wê di dadgehan de dozan li dûv hevdû ji wan re vekin û gelek ji wan ji karê xwe werina dûrkirin. Lê ti sûcê ku van mirovan kirî jî nebû. Tenê sûcê ku van kirîya, ew a ku ´aşîtîyê dixwezin´ û dixwezin ku ev şerê lewitî ê ku rejima tirk ev ser 40 salî re ya ku li hemberî civate kurd li herêmê dimeşênê ku dawî li wê werêne. Denezen, rast û di cih de ya. Her kesê ku bêje ez mirov im û mirovatî pêre mabê, dengê xwe tevlî wê dengê wê denezenê dike. Ew deng, dengê mirovatiyê ya.

.**Bêgûman, denezene rewşenbîran, plana T. Ardogan a jenosîdê derbe kir, hêrsa wî, ji vê yekê ya**. Di vê demê de hêrîşên rayadarên tirk ên li ser pergale dadê, perwerde û artişê re ku li akadamisyen û rewşenbîran dibin di rojevê de na. Li vir, divê ku mirov di serî de vê yekê jî, werêne ser ziman ku hêrîş û hêrsa rayadarên tirk û ya T. Ardogan a li rewşenbîr û akadamisyan, di temenê wê de ´deşîfrebûn û teşîrbûna plana wan ya bi armanca jenosîdkirina civate kurd heya. Ji xwe, rayadarên tirk û T. Ardogan bixwe bi awayekî vekiriî dihênina ser ziman û dibêjin ku "em oparasyonên paqijkirinê dikin." Ev oparasyonên paaqijkkirinê li herêmên kurdan dikin.

Hêrîşên rayadarên tirk, ên ku hertimî li civate kurd bûna, bi armanca tûnakirina civate hatina kirin. Her wusa, hêrîşên ku T. Ardogan, weke hêrîşên "oparasyonên paqijkirinê" bi nav dike, divê ku mirov bi qadaxaya ku danîna li ser zimanê kurdî û her wusa, hewldanên wan ên bêstatû hiştina kurdan re bi hevdû re hilde li dest.

Li ser çapameniyê re hertimî, weke ku li hemberî hêzek ´leşkerî´ şer dikin, weşanan di nava rûpelên rojnemayan de dikin û di tv´yan de dihênina ser ziman. Lê ev ne rast in. Rejima tirk, her cure teknikê li kurdistanê li hemberî kurdan bikardihêne.

Dîroka komkujiyên ku rejima tirk li kurdistanê kirina, tenê ku em di çerçoveya dîrok û dema komarê de werênina ser ziman, wê heta destpêka wê herê. Her wusa, di dema komarê de, wê ji sale 1923´an û heta sale 1937´an, wê di hundurê vê pêvajoyê de komkukujiyên mazin ên weke komkujiya zilanê û komkujiya dersimê werênina hanîn li serê civate kurd. Bi wê re jî, wê bi demê re ku li demê hatî belavkirin, wê komkuji weina hanîn li serê civate kurd.

Komkujiyên ku di roja me de hikimeta AKP´ê dihêne serê kurdan bi fermana T. Ardogan, ji yên dema komkujiya zilanê û dema komujiya dersimê ne cûdatir in. Bi heman zihniyetê dihên kirin. Di wê demê de bi çi zihniyetê komkujiyên weke komkujiya zilanê û komkujiya dersimê hanîn serê civate kurd, di vê demê de jî bi heman zihniyetê komkuji li Cizîra bota, Silopîyê, Nisêbînê, Farqînê, Sûrê û bajarên din ên kurdistanê, dihên kirin. Ji xwe di dema komkujiya zilan û dersimê de jî rayadarên tirk, digotin ku ´ew oparasyonên paqijkirinê li dardixin.´ Î ro jî, biheman rengê dibêjin ku ´em oparasyonên paqij kirinê dikin.´

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku li kurdistanê di xatekê de ev komkuji hatina kirin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hemû komkuji di çerçoveyekê de dihên kirin û hanîn li serê civate kurd. Heta roja me, di vê çerçoveyê de komkuji hanîna serê civate kurd.

Î ro, şerê ku rejima tirk li hemberî civate kurd dimeşêne, şerê jenosîdê ya. Şerê bi armanca jenosîdkirina civate kurd a. Şerê bi armanca ji dîrokê birina civate kurd a. Ji xwe, dema ku rejimek, zimanê civateekê qadaxa bike û oparasyonên paqijkirinê li hemberî hebûna wê bide li darxistin û meşandin, ew dibê şerê bi armanca ji dîrokê birina wê civatê.

Di pêvajoya ku rejima tirk konsepta şer pêşxist û weke ku T. Ardogan jî dihêne ser ziman bi dest ´oparasyonên paqijkirina´ kurdan kirin û pê de, deng derxistina akadamisyen û rewşenbîran li hemberî wê û pêvajoya

şer a ku rejima tirk bi rêxistin kirî li hemberî civate kurd, wê rastî bertekên hişk ên rayadarên tirk were. Wê çawa wê helwesta akadamisyen û rewşenbîran vala derxin û kriminalize bikin, ketina nava hewldana wê de. Doz li hemberî akadamisyen û rewşenbîran vekirin. Gelek ji wan ji karên wan hatina dûrkirin.

Rayadarên tirk, weke ku hertimî ji xwe re kirina weke kevneşopîyeka qirêj a rêveberîyê ku her navê ku ji xwe re weke ´muxalif´ dîtin, li pêşîya wê gotina ´terorê´ danîna û bicih kirina. Piştî denezene rewşenbîr û akadamisyenan, gotina ´terorê´ li pêşîya gotina akadamisyenan jî danîna û gotina ´terora akadamisyenan´ hanîna ser ziman. Ev gotin, çendî ku weke gotinaka kriminalize kirinê ya ewçendî jî gotinaka weke ya T. Ardogan a ku wî ji rewşenbîran re hanîbû ser ziman û gotibû ”win reş û cahilin´ gotinaka aqla zîyan a cahîlane ya.

Di aslê xwe de ev rewşa hêrîşan a ku rejima tirk li ser rewşenbîran re pêş dixe, di derbarê dîroka rewşenbîrîya herêmê de jî wê gelek rastîya bide ravakirin. Heta roja me, li herêmê, rewşa rewşenbîr û akadamisyenan di nava jîyane civatî de xwediyê çi wateyê ya û çendî bi wate ya û çawa li wê hatîya nerîn jî, wê di derbarê wê de têgih û têgînekê jî bide me. Di aslê xwe de dema ku mirov dîroka osmanîyan dema ku mirov li wê dinerê, di sedsale 15´min de di dema ku rojhilat li ber pêşxistina ronasansekê bû, wê bi ´fetih´kirina îstembûlê re û ankû bi serdestîya osmanîyan re wê pirranîya rewşenbîr û akadamisyenên li rojhilat wê goçî rojava bikin. Êdî, bi wê goçe zanebûnê re wê rojava, ronasanse xwe bijî. Lê rojhilat jî, wê di nava reşîyekê û cahiliyeka ku rejimên herêmê li ser wê re xwe dijîn wê de wê, di nava şer û pevçûnan de wê heta roja me dîroka xwe werêne. Ew gotina ´reş û cahil´îyê ku T. Ardogan bo rewşenbîr û akadamisyenan bikardihêne, di aslê xwe de wan bixwe bi dîroka xwe re li herêmê li rojhilat pêşxistîya. Nûha jî, dixwezin ku wê reşî û cahiliyê bidina domandin û li ser wê re desthilatdarîya xwe bidna domandin. Yekî ku bizanebûn dîroka osmanîyan û rojhilat lêkolîn bike, wê wateya gotina ´reş û cahiliyê´ pirr baş fahm bike li rojhilat ku çawa bi destê rejimên li herêmê ku hatîya pêşxistin. ..

**Bêgûman**, ya ku rejima tirk bi şerê xwe yê li hemberî civate kurd dike re sûcekî li dijî mirovatiyê dike. Mirovên ku hinekî jî mirovatî bi wan re mabê, deng derdixin û dibêjin ku ´em ê nebina hevkarê wî sûcê.´ Ji ber ku herkesek, bi awayekî vekirî dibînê ku sûcekî li dijî mirovatiyê dihê

kirin. Êdî, herkesek, dengê xwe derdixe û dibêje ku ´emê nebina hevkarê vî sûcê.´

Bi teybetî, berteka rayadarên tirk, li vê gotina ´rewşenbîr û akadamisyana a bi rengê ´em ê nebin hevkarê vî sûcê´ ya. Ji ber ku heta roja me, li ser çapameniyê re çendî nîjadperestî weke bîrdozîyekê bikarhanîna û sûcên xwe kirina malê civatê û civat û hemû dordor bi bêdengîya wan bê û ankû bi piştgirîya wan bê, ku kirina hevkarên sûcên xwe, êdî heta roja me, ev şerê ku bi kurdan re rejimê daya, bi demê re hanîya heta roja me. Li vir, ev gotina ´em ê nebin hevkarê vî sûcê´, ku mirov rastîya wê baş fahm bike û wê bike malê civatê, wê bi wê pêşîya rejimê bikin ku sûcên xwe dike malê civatê û ankû ku civatê bi hemû beşên wê dike hevkarê sûcên xwe yên dij mirovatiyê.

Ji vê aliyê ve ev gotin, wê giring bê. Î ro, şerê ku rejima tirk, li hemberî civate kurd, meşandîya, bo çi nahêle ku di çapameniyê de cih bigrê? Bi wê re jî, bo çi rastîyan beravajî dike? Hinekî jî, têkiliya vê beravajî kirinê, bi wê kirina civatê hevkarên sûcê ve heya. Çendî ku civat û dordorên çalak ên civatê bêdeng dikir, dikarî wî şerê xwe yê bi armanca jenosîdê ku bi civate kurd re dide didomand. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku şerê rejimê ê bi kurdan re, bi bêdengîya rayagiştî a tirk a li hemberî wê û û hwd re, civat dikira hevkarê wê şerê yê bi armanca ji dîrokê birinê. Li ser gotinên nîjadperstîyê re jî, civat dikirina pozisyoneka dijber de.

Bi wê re jî aliyekî din jî hebû. Çendî ku kurd dihatina qatilkirin, di çapameniyê de digot ku ´me terorîst kuştina´. Weke ku çawa di dema komkujiyên zilanê û dersimê de digotin ku ´şakî´, di vê demê de digotin ku ´terorîst.´ Di vê çerçoveyê de jî dinivîsandin. Rojnemeyên wê demê, dema ku werina vekirin û li wan nerîn, wê ev rastî bi awayekî were dîtin. Rejima tirk, heta roja me, şerê jenosîdkirina civate kurd, li ser gotinên ku ji devê çend mirovên ku xwe weke rewşenbîr û ankû akadamisyen dida nîşandin re dihanî ser ziman. Van jî, gotina xwe di çerçoveya gotina ´terorê´ ku rayadarên tirk bikardihanî de dihanî ser ziman.

Di roja me de berteka akadamisyen û rewşenbîran ku vajî vê helwesta rejima tirk a kriminalizekirin û ji dîrokê birina civate kurd ku hatî dayî nîşandin, bûya armanca rayaderên rejima tirk. Hêrîşên li ser pergale dadê, perwerde û artişê re ku li wan dibê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Hêrsa T. Ardogan a li rewşenbîr û akadamisyenan, hinekî jî di temenê de ew derbe xwarina plana wî ya bi armanca jenosîdkirina civate kurd

heya. Di serî de divê ku mirov di vê çerçoveyê de li hêrsa wî binerê. Mirov nikarê wê hêrsê, tenê bi keseyetîya wî re werêne ser ziman.Ji wê zêdetirî, divê ku mirov bi armanca rejima tirk a jenosîdkirina civate kurd re werênina ser ziman. Di çerçoveya şerê xwe yê bi civate kurd re rejima tirk, rayadarên wê bertekê li dijî akadamisyen û rewşenbîran didina nîşandin. Denezene rewşenbîran, plana T. Ardogan a jenosîdê derbe kir, hêrsa wî, ji vê yekê ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev tevgera rewşenbîr û akadamisyenan, çendî ku weke tevgerekê pêşket û bû malê civatê, wê ancamên wê yên mayînda wê hebin. Her wusa, di serî de bo mayîndakirina ancamên vê denezena rewşenbîr û akadamisyenan jî, pêşxistina tekoşîna civatî wê giring bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hêrîşên rayadarên tirk ên li rewşenbîr û akadamisyenan û vekirina dozan li wan û hwd, hinekî jî aliyekî wê yê bi vî rengî jî heya. Rayadarên rejimê, bi van dozvekirinan û hêrîşên li ser rewşebîran û aakadamisyenan û hwd re, dixwezin ku di serî de amcamên wê  ji jîyanê tûna bikin. Bo vê yekê, bilindkirina tekoşîna civatî, wê giringtir bê. Bi wê bilindkirina tekoîna civatî re kirina zêdetirkirina dîplomasîya navnetewî li ser rewşenbîr û akadamisyenan  û hwd re, wê bandûra wê zêdetir bike û ancamên wê mayînda bike.

Ev pêvajoya nû ku bi denezene rewşenbîran re derket li holê, di şibihê, pêvajoya emerika a li Wîetnamê û yê Firansa li Cezayîrê. Her wusa, di vê çerçoveyê de hinek şibandinên ku mirov dikarê wan weke hevdû şîrove bike hena. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman, bilindkirina tekoşînê li kurdistanê ji aliyê kurdistanîyan ve bi awayekî civatî, wê ancamên wê pêvajoyê bên mayîndatir kirin. Bo vê yekê, di serî de di vê pêvajoyê de li kurdistanê û bi teybetî di her qadê de divê ku tekoşîna li hemberî faşîzmê were bilind kirin.

Ji her aliyê ve em divê ku pêşveçûnên vê pêvajoyê bi serketin û pêşketina rojava ve girêdayî werênina ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de em divê ku ji vê aliyê ve jî li pêvajoyê binerin. Her wusa şoreşa rojava, li rojhilat pêvajoyek nû da destpêkirin. Ev pêvajo, wê li kurdistanê û rojhilat û bi wê re jî li giştîya cihanê jî wê hin bi hin pêşketinên nû bi xwe re werêne.

Lê ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê jî, pêvajoyek, ku mirov divê ku ji gelek aliyan ve li wê binerê ya. Di serî de kurd, ji aliyê ve di çerçoveya tifaqek netewî ve tekoşîna civatî di vê pêvajoyê de bilind bikin. Di vê çerçoveyê de bi rewşenbîr û hwd jî, çendî ku ev pêvajo were fahmkirin û

ser ziman, wê ancam û bandûrên wê zêdetir bin. Asil, di vê pêvajoyên weha de pêşengîya rewşenbîrî, dîrokî ya.

..

**Di nava wêqas şer û hêrîşên ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku li civate kurd dike, rêyek li pêşîya wan dimênê û ew jî ew a ku kurd, divê ku serî li ´Neteweyên yekbûyî´ bixin.** Tevî hemû bêdengîya saziyên navnetewî û neteweyên yekbûûyî, kurdan xwepêşandin û çalakiyên ku saziyên navnetewî bikina nava tevger û çalakiyê de li dar dixistin. Bo ku pêşîya komkujiyên nû ên mazin ku rejima tirk werêne serê civate kurd bigirê. Weke civatekê kurd, ji hemû maf û azadîya xwe hatiya girtin. Neteweyên yekbûyî, ji şerê cihanê ê duyemin ve heta roja me, di çerçoveya parastina mafê mirov, azadî û perwerdeya bi zimanê zikmakî de gelek bineterên nivîskî pêşxistina. Her wusa, bineterên neteweyên yekbûyî, weke bineterna dadî û destûr ku li ser destûrên dewletan re dihê dihên dîtin in. Gotina ´dada navnetewî´, hinekî jî bi wê temenê wê pêşketîya. Her civatên ku dijîn û maf û azadîyên wan ên ku hebûna wan tên di çerçoveya ´dada xwezayî´ de bineterên dadî û destûrî wan maf û azadiyên civatî û mafên hevbeş ên civatî misoger dikin hatina pêşxistin.

Her wusa, weke ku çawa ku di roja me de dema ku rêyên dadî li tirkiya bi dawî dibin û kurd serî ´dadgeha mafê mirovan a ewropa´ dixe, di vê çerçoveyê de weke rêyeka ku kurd êdî divê ku bo parastina hebûna xwe ya civatî divê ku kurd divê ku serî li neteweyên yekbûyî bixin. Ev mafê wan jî heya. Wek tê zanîn ku berî nûha bi demekê ´kampanya imzayan´ bo azadîya birêz Ocalan hatibû pêşxistin. Kurdan, dikarin pêvajoyek bi vî rengî jî bo serî li neteweyên yekbûyî bixin dikarin bidina destpêkirin. Bi wê re jî, dikarin li ser wan îmzayên ku bo azadîya birêz Ocalan dana berhevkirin jî, dikarin serî li neteweyên yekbûyî bixin.

Kurdan, ev 40 sale ku tekoşîna maf û azadiyê dikin. Li hemberî wê jî rejima tirk û rejimên din ên li herêmê ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî beşkirin, hertimî kirina ku pirsgirêkê weke pirsgirêka ´terorê´ û ankû ´ewlakariyê´ werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî hanîna li ser ziman. Bi vê re jî, heta roja me, bi hezaran kurd qatilkirina. BI hezaran kurd xistina zinandan. Û bi hezaran kurd qatil kirina. Her wusa, heta roja me jî, zimanê kurdî qadaxaya. Kurd, bi civatî ti maf û azadîya wan di destê wan de ne hatîya hiştin. Her wusa, heta roja me, kurdan, tevî

ku aliyê maxdûr in jî, çend projeyên çareserkirinê jî pêşxistina jî, ji aliyê rejimên herêmê ên weke rejima tirk û hwd, hatina vala derxistin. Herî dawî, pêvajoya çareserîyê, mirov dikarê bahse wê bike. Piştre jî, mirov dikarê bahse denezene xweserîyê ku DTK´ê li kurdistanê denezendî, mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, hêrîşên dawî ku ´hendek´ û ankû ´denezendina xweserîyê´ kirina ´hêncet´ û bi wan hêrîşî kurdan û civate kurd dikin, didina nîşandin ku ti çare êdî di destê kurdan de nema ya.

Kurd, weke civatekê, divê ku di vê çerçoveyê de maf û azadiya xwe de divê ku serî li neteweyên yekbûyî bixin. Her wusa, bineterên neteweyên yekbûyî ên di çerçoveya ku civak li ser pêşaroj û qadara xwe gotinê bibêje, hatîya bisogerkirin. Divê çerçoveyê de serî li neteweyên yekbûyî bixin. Wekî din jî, heta ku neteweyên yekbûyî nekeve dewrê de, divê ku ti kesek hêvî nekê ku ji herêmê wê rejimên ku hena, wê çareserîyê pêşbixin. Heta roja me, hemû çareserîyênku hatina pêşxistin jî, vala derxistina. Minaq, tirkiya, hem di pêvajoya çareserîyê de hemû çareserîyên ku aliyê kurd pêşxistina vala derxistina û bi wê re di qada navnetewî de jî li ser sûrî û rojavayê kurdistanê jî, çi çareserî hatina pêşxistin, hertimî hewldana vala derxistina wan dana nîşandin.

Bo vê yekê, divê ku mirov werêne ser ziman ku tirkiya, wê êdî hemû rêyên çareserîyê tûna kirina. Tirkiya, hemû hêzên xwe kiriya dewrê de ku wê çawa wê çawa civate kurd tûna bike. Li vir, ev jî hat dîtin ku heta ku pirsgirêka her çar beşên kurd newê çareserkirin, wê çareserîyên li beşan jî, hertimî dibin telûkeyên hêrîşkirinê de bin. Her wusa, ji ber ku pirsgirêka bakûrê kurdistanê ne hatîya çareserkirin, hêrîşên rejima tirk ên li hemberî rojava û hêrîş û politikayên wê yên li li başûr, mirov dikarê minaq bide nîşandin. Divê çerçoveyê de ev jî hat dîtin ku rejimên herêmê ên weke tirkiya, ne di wê qûdret û sîyanê de na ku karin ji pirsgirêka kurd re çareserîyekê bidina nîşandin. Rêya ku hertimî li herêmê serî lê dana, tûndûtûjî û komkujî na. Rêyên demokratik û mirovane, ti carî, ne ceribandina. Heta roja me, hatîya dîtin ku hêz û rejimên herêmê, ne wê qûdret û sîyanê de na ku çareserîyên demokratikî û mirovî pêşbixin. Her wusa, hertimî serî li rêyên komkujiyan dana. Bo ku rojhilat bigiştî jî di wê de aramî pêşbikeve, di serî de çareserî ji pirsgirêka kurd re were pêşxistin.

Li herêmê, bi teybetî, divê ku kurd, bi civatî serî li neteweyên yekbûyî bixin û doza mafên xwe yên hevbeş ên civatî bikin. Kurd, di çerçove ya maf û azadîyên xwe yên hevbeş de divê ku wê serîlêdanê li neteweyên

yekbûyî bixin. Di vê çerçoveyê de divê ku serî makanizmayên navnetewî bixin. Sazî û dadgehên navnetewî, di vê çerçoveyê de bo çareserkirina pirsgirêka kurd û sûcên li dijî mirovatiyê ku li dijî civate kurd hatina kirin, li ser wan divê ku serî li wan sazîyan bixin.

Î ro rejima tirk, hemû nirxên dîrokî ên civate kurd û kurdistanê, tûna dike. Her wusa, tevî ku di listeya mîreteya mirovatiyê de jî ya hêrîşên wê li ser Sûra Amedê, divê ku mirov li vir bibîr bike. Sûra Amedê, mîreteyeka dîrokî a kurdistanê û çanda kurdistanê û civate kurd a. Her wusa, ev mîrete, di dema hûrîyan de hatîya çêkirin. Lê î ro, di bin hêrîşên hovane ên artişa rejima tirk ên bi tank û topan ên bi hovane de ya.

**Keleha Sûrê û ankû ´sûra Amedê´, ji aliyê hûrîyan ve hatîya çêkirin.** Sûra amedê, weke herêmek dîrokî ku divê ku mirov wê werêne ser ziman, divê ku mirov hinekî li ser dîroka wê bisekinê. Piştî ku hikimeta Tirk, qadaxaya derketina li sûkê danî ser sûrê, piştre, hanîn ser ziman ku piştî ku "çendî xûrîxandin bibê, wê ji nû ve were çêkirin." Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku weke ku çawa ku rejima tirk dixwezê ku Heskîfê di bin avê de bihêle û wê dîroka şariştanîyan a bi hezaran tûna bike, bi heman rengî, dixwezê ku sûrê jî tûna bike. Ji ber ku sûr û bi teybetî hêtên sûrê, weke bineterna dîrokî na. Bi teybetî, hêtên sûra amedê, weke bineterna dîroka gelê kurd û kurdistanê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov dîroka wê werêne ser ziman.

Dema ku mirov dîroka hûrîyan dixwêne, bo hûrîyan dihê gotin ku "xalkê ku welatê xwe di nava sûrê de avakirîya" jî bahse wan dihê kirin. **Sûra Amedê**, **weke keleheka Hûrîyan a dîrokî** ku parastina wan kiriya. Di dema Hûrîyan de gelek hêrîşên ku hatina serê hûrîyan û piştre Mîtannîyan di wan sûran de hatina şikandin. Ew sûr, bûna weke aliyna parastina jîyane hûrîyan. Hertimî jî, Hûrîyan giringî dana sûrên amedê û parastina. Li gorî bineter(´dokument´)ên dîrokî, navê amedê ê roja me, weke ku di serdemên hûrîyan bi navê "**amîda**" dihê ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya sûrê werêne ser ziman.

Rastîya sûrê, rastîya kurdistanê ya. Bi teybetî Sûr, **Birca belek û medreseya sor** ên ku li Cizira bota na, Heskîf û hwd, sê cihên dîrokî ên dîroka xalkên kurdistanê na. Ev hersê cihên giring jî, î ro dibin hêrîşên rejima tirk de na. Bi hênceta şerê xwe yê li hemberî rêvberîyên xweser ên kurdistanê, ev herêm weke herêmên qadaxa denezendina û wan bi tank û

topan tûna dike. Ti farqe tûnakirina çeteyên DAÎŞê a keleha Palmîra û ya rejima tirk a Sûrê tûna ya. Divê ku mirov weke hevdû şîrove bike. Sûr, di vê sale 2015´an de piştî lêkolînên giring û demdirêj, weke ´mîreteya çandî a cihanê û mirovatiyê ketîya lîsteya ´UNESCO´ de jî. Her wusa li vir divê ku mirov vê yekê, bi teybetî vê rastîyê werêne ser ziman.

Sûrên Amedê, dema ku em li ser dîroka wê bihizirin, emê herina dema Hûrîyan. Her wusa, heta ku bineterên nivîskî ku di ancama kolanê de hatina dîtin, di wan de dihê gotin ku "di dema hûrîyan de sûra amedê hatîya çêkirin." **Hûrîyan, bi hezaran salan, jîyanek di nava wan sûrên amedê de pêşxist.** Di aslê xwe de amede rast sûra amedê bixwe ya. Piştre, amed, bi hildana goçberîyan û hwd, mazin bûya û ji sûran derketîya dervî sûran jî. Lê di aslê xwe de sûr, weke navendekê bûn. Weke ku Hûrîyan jî bawer dikir û mitanniyan jî bawer dikir ku "ew dinivîsê dûnyê na", her wusa di vê çerçoveyê de li Sûrê nerîna. Deriyên ku ji sûrê di vebin ku ji başûr û rojava deriyê mêrdînê, rojava deriyê rehayê, ji bakûr deriyê çîyê û ji rojhilat jî derîyê nû ê sûrê hatina çêkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de ji her çar aliyên wê ve bi sêhatî ketina nava bajêr û jîyane di nava sûrê de derî ji wê re hatina vekirin.

Ji aliyê temen ve divê ku mirov werêne ser ziman ku Sûr, ji aliyê wê yê çemê diclê ve diket ber çem de. Heta ku dema ku mirov hinekî lêkolînên kolanî dike, mirov dibînê ku hêtên bajêr ên bilind ku dikevina aliyê çem de dihatina sînorê çem. Di vê çerçoveyê de bajar, weke bajarekî li ber çem bû. Bi wê re jî, jîyane di nava wê de hertimî geş bû. Av, bi çokên ku li nava bajêr dihatina vekirin re, bi tememî digiihişt avê. Yanî weke ku kurd heta roja me jî dibêjin, ´herêmek avî bû.´

Sûra Amedê, piştî Hûrîyan re wê malavaniyê ji mitanniyan re bike. Di dema Mîtannîyan de jî, wê jîyanek navend ava bike. Piştre jî, wê bi heman rengî sûra amedê, weke herêmek navend bimêne. Her wusa, Ev herêma navend, wê piştre di dema Medîya û desthilatdarîya mediya de jî, wusa bimêne. Weke herêmek navend bimêne. Keyên Medî, wê werina wir û li ber çemê Diclê û gûlîstanên wê ku î ro jî di nava kurdan de weke ´gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´ dihên bi navkirin de, wê jîyanek xweş derbas bikin. Di dema Medîya de jî û her wusa di dema Asûrîyan de jî, ev rewş wûsa bûya. Keyên Asûrî jî, ên weke Asûrbanîbale duyem û **kûre** wî û piştre keyên din jî, wê bixwezin ku werina wir û li wir, di wê xweşîya wê de bijîn. Piştî Medîya, wê Axamanîşî û Sasanî jî bi heman rengî nêzîkî wê bibin. Weke navendekê wê bi navê "amîde" wê herê bikin. Navê wê yê dîrokî amîde ya. Di vê çerçoveyê de î ro navê

amedê, weke navekê ji wê ya ku dihê bikarhanîn a.

Piştî Medîya û desthilatdarîyên wan re wê Amedî û sûrên wê weke navend ji desthilatdarîya kurd a Merwanîyan re jî, navenditiyê bike. Heta ku wê Amîde, ji merwanîyan re weke "paytaxt" jî bê. Her wusa di vê çerçoveyê de dîrokeka wan sûra Amedê ya kevn heya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werêne ser ziman ku Di dema Merwanî û şedadîyan de jî wê Sûra amedê, weke navend bê. Di wan deman de çendî ku hêrîşî bûna li Amedê, li ber wan sûrên amedê têkçûna. Her wusa, di dema hatina îslamê de wê artişên Abasîyan werina ber sûrên amedê û bi roj û heyvan bikevina şer de bi kurdan re lê wê têkneçin. Her çend ku hêrîşên mazin dikin jî, nikarin bi serkevin.

Ev vegotineka bi çîrokî ku bo sûra amedê bo vê demê tê gotin ku dema ku artişên Abasîyan tên ber sûrên amedê nikarin derbas biibin. Bi heyvan şer dikin. Wê xalkê di nava sûrê de bi heyvan li berxwe bide. Artişên Abasîyan ti rêyan nabînin ku bikevina huundur de. Tê vegotin ku rojekê dêlik(´kuçikê mê´ û ankû ´sayê mê´)ek wê di qûleka ku di wê re dikeve hundur de wê bikeve berçav de û werê ditin. Piştre Artişên Abasî, wê wî dêlikê bişopênin û di cihê ku ew dikeve bajêr de di wir ve bikevina bajêr de û şer bikin bi xalkê bajêr re. Tevî ku weke ku tê gotin ku gelek xûrîxandin û zîyanek mazin didin jî, bi sernakevin. Çend ku ev hêrîşên Abasîyan, weke "fetihkirina Amedê" dihê binavkirin jî, jî di aslê xwe de, wê rewş û dîrok vajî vê gotinê xwe bide dîyarkirin.

Di dema hêrîşên artişên îslamê de wê sûrên amedê zîyanek mazin bibînê. Her wusa, hemû nivîs û nqaşên kevn ên li ser hêtên sûrên amedê wê di dema wan de werina jêbirin. Sûrên Amedê, di vê çerçoveyê de weke ku ji nû ve werina awakirin li wan tê. Lê wê karibin xwe li ser lingan bigrin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku sûrên amedê, ev dîroka wê ya heta î ro ku tê ne bin pênc(5) hezar salan re ya. Dibêt ku hê jî kevntir bê û herê. Her wusa, di vê demê de ev sûrên amedê ên ku pirr kevn in di bin hêrîşên rejima tirk û artişa wê de na. Rayadarên tirk, dibêjin ku "sûr ku were xirakirin, wê ji nû ve were avakirin." Lê ev xirakirina wê, ti farqê wê, ji wê hewldana wan ya di bin avê de hiştina heskîfê tûna ya. Dema ku sûr, were tûnakirin, wê hingî, ew dîroka şariştanî a dîroka kurd û kurdistanê were tûnakirin. Ji xwe, rejima tirk û rayadarên wê, bo vê yekê, dixwezin ku wê bi hênceta ku di nava şer de xûrîhaya, wê bixûrîhênin û wê dîroka wê tûna bikin.

Heta roja me, hemû nirxên ku hebûna civate kurd û ya kurdistanê li ser lingan digrin, hatina armanc girtin. Li vir, divê ku mirov vê yekê di

dewama vê gotinê de werêne ser ziman ku di bin avê de hiştina heskîfê û tûnakirina sûra amedê, divê ku mirov bi wê qadaxaya li ser zimanê kurdî ku rejima tirk danîya re wê hilde li dest û werêne ser ziman.

Sûr, mirov dikarê wê weke amede pêşî jî werêne ser ziman. Her wusa, ev herêm ku î ro weke bi giştîya wê re weke ´amedê´ jî dihê binavkirin, dema ku mirov li dîroka wê ya li herêmê dinerê, mirov dibînê û kifş dike ku hertimî weke herêmek navend a. Rêyên bazirganiyê, weke rêyên hevrîşîmê û hwd, li vir ve diçin. Her wusa, herêm, weke herêmek navend a. Bajarê ku Hûrîyan dinava hêtên sûrê de avakirîya, her wusa wê weke bajarekî herêmî ê giring bê. Ev herêm, weke herêmek beravî û dewlemend, wê hertimî, rastî hêrîşên talankirinê jî werê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di dîrokê de gelek sefer û hêrîş li sûrê bibin. Lê her sefer û hêrîşên talanê ku li sûrê bûna, wê ew hêtên sûrê ku heta roja me li ser lingan mana, wê pêşîya wan bigrê.

Sûr, di vê çerçoveyê de ew hêtên wê, dîroka avakirina wan, heta dema hûrîyan û dibêt ku berî wê jî diçêt. Lêkolînên ku li herêmê bi kolanî hatina kirin, didina nîşandin ku jîyan li van herêman dîroka wê heta salên serdemên hûrîyan diçin Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman Hûrîyan, li herêmê, weke keleh û ankû kirman, herêm pêşxistina. Herêmên weke **"keleha Fisê",** divê ku mirov li vir bibîr bixe. **kirmana Fîsê**, wê ew jî, kirmanaka di dema hûrîyan hêtên wê hatina çêkirina û gelek malavanî ji destpêkna re kirîya di dema mîtannîyan de. Her wusa, li vir, mirov fahm dike ku bi tememî bajar hatina xistin nava kirmanê de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku çendî ku mirov nikarê bêî baxçeyên hewserê sûrên amedê fahm bike, bi heman rengî jî, mirov dikarê bêî sûrê amedê û baxçeyên hewserê li heskîfê jî bihizirê. Di vê çerçoveyê de ew herêm, wê bi hevdû re di çerçoveyê de li herêmê temenê jîyanê biafirênin. Her wusa, sûrê amedê di demên hûrîyan de demekê weke kirmana hûrîyan jî hatîya binavkirin. Nîşanaka vê jî, ku heta roja me jî, ji deriyê Reha re ku ´**derîyê hûrî**´ jî dihê gotin a. Her wusa, bi wê re ji ´**derîyê çîyê**´ re ´**derîyê xarpûtê**´ jî hatîya gotin. Ev bi navkirin, wê têgînna bidina di vê çerçoveyê de. Her wusa, xarpût, î ro, navê çem û herêmekê jî ya li kurdistanê. Her derîyek ji aliyekî ve divebê û wateya xwe ji hatin û pêşveçûnên ji vî derîyî ve dibin ve dihêne ser ziman. Minaq, teybetîya derîyê hûrî, ew a ku li rojava divebê û li rojava herêmên weke Reha û hwd hena û ev weke herêmna navend in. Bi wê re jî, rojavaya ku di keve vê aliyê de wê weke herêmek

navendî bê ji hûrîyan re. Ev nav jî, ji dema hûrîyan ve li herêmê hatina bikarhanîn.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku herêmên li dora amedê ên weke ´erxanî´ û farqînê jî, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman. Î ro, li van herdû herêmên wê, bineterên ku di ancama lêkolînên kolanê de derketina li holê di **´şikefta hîlêrê´ a li erxanî** û li **´şikefteya hasûnî´ a ku li farqînê** ya, di wan de lêkolînên ku hatina kirin, daya nîşandin ku jîyana bicihbûyî û her wusa, karê çandîniyê, cotkariyê û her wusa xwedîkirina sawalgeriyê li van herêman pirr zêde zû pêşketîya. Nîşanakên ku derdiketina li holê ji van herdû şikefteyan, dana nîşandin ku jîyanê bicihbûyî li van herêmên pirr zêde zû pêşketîya. Jîyane bicihbûyî ya bi vî rengî ku çandînîyê û cotkariyê dike û sawalan xwedî dike, temenê wê heta dema nêzî 10 hezar salan diçêt. Herêmên ku weke nêzîkî ber çemê diclê ên weke Erxanî û farqînê, weke herêmna ku li wan temenê jîyanê û pêşketina wê zûtir pêşketîya ya.

Em î ro dizanîn ku herêmên weke Heskîfê, herêmna ku li wan pirr zû jîyane şariştanî pêşketîya. Ev herêm, weke herêmek li ber çem û avê, wê temenê jîyanê xwe li wê biafirêne.

Weke ku çawa li ber diclê li sûrê pêşxist, her wusa, bi heman rengî li cizira bota jî li ber çemê diclê ku wêli Cizira bota, bi awayekî navendî jîyane şariştanî pirr zû temenê wê pêş bikeve. Em divê ku werênina ser ziman ku temenê jîyane bicihbûyî û ankû ya şariştanî li Cizira bota, ne bin 10 hezar salî re ya. Ku ne ser re bê, wê ne bin re bê. Ev rewş, wê bo sûrê jî wusa bê. Sûr, weke herêmek navend a. Her çar deriyên wê yên ku ji wê divebin, di aslê xwe de di vê çerçoveyê de mirov dikarê weke dager(´sembol´)a wê navendîtîya wê jî, werêne ser ziman. Hûrîyan, Sûr, weke navendek giring pêşxistin. Hêtên wê yên ku bajêr dorpêç dikirin weke kirmanekê, di dema wan de çêkirina wan hatîya kirin. Piştre jî, lê zêdetirin û nûkirin li wê hatîya kirin.

Ew hêtên Sûrê, li ser wan bi awayekî nivîskî û kîtabî, wê gelek nivîs werina nivîsandin. Her wusa, sûret û wêneyên şêr û eyloyan li ser hêtên wê, nîşanayaka giring a wê ya ku ev di dema hûrîyan de hatina çêkirin. Li deverna naqşeyên şêr, mar û eyloyan hena. Ev her sê ajal jî, wê di nava çanda hûrîyan de xwediyê wateyna ku li wan hatina kirin bin. Piştre bi çanda Mîtra re wê ev her sê sawal, bi watetir bibin. Di aslê xwe de ev hersê sawal, nîşanakên çand û bawerîya ´yazdanîyê´ na. Mîtra jî, di wê çerçoveyê de dihêt.

Bi demê re, wê gelek nivîs û kîtabeyên ku li ser hêtên Sûrê hena, wê werina jêbirin. Gelek ji wan, wê di dema hatina artişên îslamê de hatina jêbirin. Gelek beşên sûrên amedê di dema hatina artişn îslamê de hatina xûrîxandin. Yên ku ne hatina ji wê birin jî, li şûna wan nivîs û kîtabeyên nivîskî ên berê, nivîs û kîtabeyên nû hatina nivîsandin. Her wusa, ji ber vê yekê ya ku nivîsên ji dema hûrî û mîtannîyan, wê pirr zêde li ser hêtên sûrê nemênin heta ku dem tê dem û roja me.

Di dema Eyûbîyan de wê ´rastorasyonek´ li ser hêtên sûrê werina kirin. Her wusa, di vê demê de jî, wê nivîsên berê wê demê gelek ji wan werina ji wê birin. Lê wê hêt, li hemberî hêrîşên ku di wê demê de li wir dibin, were zaxmtir kirin. Di wê demê de farqîn ku di hinek nivîsên berê de weke "mayafarqîn" jî dihê bi navkirin, li wê jyanek navendê û pêşketî heya. Merwanî, wê bi girseyî, xwe li dora wê bigrin û wêdêrê bi sûrê re weke navendekê pêşbixin. Ji ber ku li hewirdora wê, ardên bo çandinîyê û cotkirinê hena. Her wusa, herêmna avî na jî.

Jîyane di nava sûrê de, wê piştre pirr zêde pêşbikeve. Her wusa, cudahiyên di nava wê de jî pêş bikevin. Hatina Asûrîyan jî li wê, wê piştre bike ku rengê jîyane wan jî li wir pêşbikeve. Dêrên ku heta roja me li amedê hena ên kevn, hinekî jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Sûr û ankû amed, wê piştî hûrîyan û mîtannîyan, bi med û desthilatdarîya medîya re hebûna xwe bide domandin. Her wusa, piştre jî, wêji jîyane xalkê herêmê re bê temenekî pêşketî. Heta ku artişn îslamê tê û hêrîşî wan dike, wê ev rewşa wê xwe bide domandin. Di dema Îslamê de wê ji şadadî û merwanîyan re malavaniyê bike. Bi teybetî, wê ji merwanîyan re malavaniyê bike. Piştî Merwanîyan re, wê di bin desthilatdarîya eyûbîyan de hebûna xwe bide domandin. Eyûbîyan, ev dever weke navendek çûn û hatinê û ya şariştanî pêşxistina. Her wusa, Ji sûrê heta Heskîfê, wê di wê demê de di bin desthilatdarîya eyûbîyan û mîrgehên kurdan de bê. Ev rewş, heta dema derketina Osmanîyan wusa bê. Osmanî, wê piştî ku xwe digirin, wê seferna li herêmê bikin kontrola xwe li herêmê çê bikin. Lê wê bi wan seferên xwe zêde ne serkevtî bin. Piştî ku dibînin ku bi seferên leşkerî bi sernakevin, wê têkiliyê bi mîrên kurdan re dênin û li ser wan têkilîyan re bahse hebûna xwe bikin. Li hemberî mîrên Amedê, seferên Yavûz selim ên li hemberî amedê û dora wê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Lê çendî ku omanî, seferan li herêmê dikin jî, li ser herêmî mûwafaq nabin.

Ji Sûr û amedê û dordorên wê, di bin mirgehên kurdan de na. Her wusa, Weke ku çawa ku ev rewş li sûr û amedê heya. li Herêma botanê û ya Rehayê jî wusa ya. Mîrgehên kurdan, wê serdestîya xwe ya civatî heta sedsala 18´min jî li herêmê bidina domandin. Ji vê demê û pê de, êdî dem ji wan dixwezê ku yekîtîyekê li ser esasê civatîtîya kurdistanî çê bikin. Ya ku ew di wê de kêm dimênin ev a. Piştre jî, wê hin bi hin aşîr bi aşîr û ankû mîrgeh û bi mîrgeh şer û pevçûnên mazin ên ku dikevinê de wê di wan de derbeyên mazin bixwûn û têk herin. Ev jî, wê bi xwe re bê temenê wê ku derbeyek mazin li xate pêşketin civatî a kurdistanî bikeve.

Ev rewş, wê bo sûr û amedê jî wusa bê. Lê Sûr, weke ´amede kevn´, wê hertimî hebûna xwe karibê bi demê re bide domandin. Li herêmê, hêrîşên aşîrên tirkmenan, Selçûqîyan, û hwd bûna. Her çend ku van hêrîşên wan bûna sedemên xûrîxandinên mazin ên dîrokî jî, lê wan nekarîya ku li herêmê xwe serdest bikin. Tenê, bi hêrîşên xwe ve mana. Piştre jî, di dewama van hêrîşên hov de, wê hêrîşên osmaniyan li herêmê bidomin. Lê osmanî jî, wê bi tememî nikaribin, xwe li herêmê serdest bikin. Ji xwe, hemû hêrîş û seferêmn wan ên li kurdistanê ku hertimî herêmên kurdan weke herêmên şer di demê de dihêlin jî, wê sedema wê ev rastî bê. Her çend ku di pirtûkên dibistanan de bahse serdestîya, Selçûqîyan, Akkuyun û karakuyun û hwd bê kirin jî, dîrok vajî van gotinan li herêmê rastiyê şanî me didêt. Ti serdestîyên ku bi van navan re ku dihên ser ziman, li herêmê pêşneketina. Lê pirr zêde li herêmê û jîyane herêmê, pirr zêde hêrîş pêşketina. Î ro jî, li amedê, gelek mizgeft û cihên kirmanî ên dîrokî ku navê van aşîrên tirkmen dinivîsênin jî, di aslê xwe de ev deverên weke mizgeft û kirman û hwd, cih û deverên ku eyûbîyan ku pêşxistina na. Her wusa, bi wê re jî, gelek mirgehên kurd ên xort ên ku li herêmê serdestî meşandina û ku î ro bahse navê wan nayê kirin jî, divê ku mirov bahse wan bike.

Sûr û amedê, her wusa deverek ji van deveran a ku hertimî, weke herêmek kurdistanî ku ew naqşatîya xwe ya dîrokî a civatî hertimî karîya ku biparêzê. Di berfanbara 2015´an û piştre di destpêka salê 2016´an de hêrîşên artişa tirk ên li Sûrê, hinekî jî, mirov dikarê, weke hêrîşên Selçûqîyan û hinek aşîrên din ên tirkmen ên li herêmê jî werêne ser ziman. Bi teybetî, artişa tirk, di hêrîşên xwe yên di vê demê de hêtên sûrê ku xwediyê dîrokek pirr kevn in bi wan ji xwe re dikir armanc ku wan tûna bike. Ji ber ku ew hêtên sûrê, ji dema hûrîyan ve hatibûbûna çêkirin û beşek giring ji dîroka xalkên herêmê ên weke kurd û kurdistanîyan bû. Di dema ku hêrîşî sûrê dikirin, digotin ku **"emê sûrê ji nû ve ava**

**bikin."** Lê di aslê xwe de bi xirakirina sûrê re, pêşî dixwestin ku wê dîroka wê ya civatî û kevn ji holê ra bikin. Tiştek ku xwemalîya wê hat tûnakirin, wê ti carî weke rastîya xwe berê nebê. Dixwestin ku wê xwemaliya wê ya dîrokî tûna bikin, weke ku çawa dixwestin ku heskîfê di bin avê de bihêlin û beşek giring a dîroka herêmê bi wê re ku di bin avê de bihêlin û tûna bikin. Zihniyeta ku dixwest ku heskîfê di bin avê de bihêlê û tûna bike, li amedê hêrîşî sûrê dike, li cizîra bota hêrîşî ´birca belek´ û ´medreseya sor´ dike û herêmên din ên bi vî rengî ku dîrokî û kevn in, ji xwe re dike armanc bo ku tûna bike. Ji ber ku dîroka kevn a xalkên herêmê di van cih û warên kevnera de vêşarî ya.

...

**Li Sûrê komkujî.**

Ji destpêka hevya dawî a sale 2015´an ve li Sûrê, dorpêçkirinek leşkerî û hwd rejima tirk danîya li ser Sûrê. Bi wê re jî, hêrîşan bi polîs û leşkerên xwe bi tank, top û balafirên şer li wir dike. KOmkujiyên ku polîs û leşkerên tirk li Cizîra, Silopî û Nisêbînê kirin, di vê demê de bi wan re Hezex û Sûr derketîya li pêş. Di roja dawî a sibate 2016´an de dorpêçkirin û hêrîşên li ser Sûrê digihişt sê-heyvan. Bênavber di nava van hersê heyvan de hêrîş û topbaranên li ser Sûrê didom in. Bi teybetî jî, hêrîşên ku li Sûrê dihêne kirin, hêrîşên rûxandinê na. Kirmanên herêmê ên kevn ku ji dema hûrî û mîtannîyan ma, di armanca hêrîşên polîs û leşkerên tirk de na. Ev kirmanên ku weke "sûra Amedê" jî dihê bi navkirin, weke xêveka dîrokî ya. Bi wan hêrîşên li hebûna wê ´kirmana Sûrê´ re dihê xwestin ku ew xêv û bîr werê tûna kirin. Ji bîrhanîna mirovan were derxistin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werêne ser ziman ku Sûr, weke herêmek dîrokî ya. Di nava wan hêtên wê yên bilind ku ji dema hûrîyan ve hatina çêkirin û heta roja me hebûna wan hatîya, jîyanek civatî a kurdistanî bi jîyane cihêrengîya xalkên herêmê re afirîya. Di aslê xwe de hêrîşên ku li Sûrê dihêne kirin, hinekî jî li wê jîyane jî dihê kirin.

Sûr, ji her aliyê ve hatîya Dorpêçkirin. Nahêlin ku mirov herinê de û ji wê derkevin. Ji her aliyê ve hêrîşên polîs û leşkerên li ser Sûrê hena. Di vê demê de jî ew hêrîş Zêdetir bûna. Her wusa, weke ku çawa ku li Cizîra bota bû, gelek kurdistanîyan xwe sipartibû jêrzemînên binmalan û di wan de dikirin ku parastina xwe bikin. Weke ku çawa li Cizîra bota dibû, di wan jêrzamînên di binmalan de ew dikirin ku ew mirovên sivîl werina qatilkirin. Herî Dawî, nûçeya ku di 27´, sibate 2016´an de ji Sûrê dihat ew bû ku bi sedan mirovên sivîl xwe jêrzemînên binmalan û di wan

jêrzemînan de ew ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve dihên bombardiman kirin Hêrîş li wan û jîyane wan dihê kirin. Di wan sivîlan de jî pitikên çar û ankû pênc heyvî hena. Zarokên piçûk hena. Jin û mêrên pîr û kal hena.

Li Amedê û deverên din ên bajarên kurdistanê, her xwepêşandinên ku dibin jî, bo parastina jîyane wan mirovan û şermazarkirina wan hêrîşên li ser bajarên kurdan, rastî hêrîşên polîs û leşkerên tirk tê. Her wusa, di hemû bajarên kurdan de di vê çerçoveyê de rewşek awarta hatîya pêşxistin. Li Amedê jî, heta roja me, gelek caran kurdistanî li hevdû civîyana ku xwepêşandinên sivîlane li darbixin. Lê ew jî, bia wayekî hovane rastî hêrîşên polîs û leşkerên tirk hatina.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêvajoya komkujiyan ku li Nisêbînê û Cizîra bota hatibû pêşxistin û di wê de bidestê leşker û polîsên tirk bi sedan kurdistanîyên sivîl hatibûbûna qatilkirin, heman pêvajo li Sûrê û piştre li Hezexê jî, hatîya pêşxistin piştî Cizîra bota, Silopî û nisêbînê. Ev pêvajoya hêrîşên li bajarê kurdistanê ku rejima tirk pêşdixe, teybetîya wan ya sereka ew a ku bi armanca rûxandina jîyane mirovên sivîl dihê kirin. Her wusa, deverên ku weke navendên dîrokî na, di wê de armanc dihên girtin. Sûr jî, teybetîya wê ya sereka di vê çerçoveyê de dihê dîtin. Hêrîşên li navçeya Sûrê ku dihên kirin, bi wan hêrîşan ew demograîya wê ya civatî û hebûna wê ya dîrokî, bi teybetî di wan hêrîşan de armanc dihê girtin. Di pêvajoya hêrîşên li Silopî, Cizîra bota û Nisêbînê de jî heman rewş hebû. Di van bajarên kurdistanê de jî cih û warên dîrokî hatibûbûna armanc girtin.

Rejima tirk, dixwezê ku wan hêrîşan bidomêne û bo vê yekê, hertimî di çerçoveya çêkirina temenê domandina wan hêrîşan de sîyesetê dike û gavê diavêjê. Her wusa, di 27´ê sibate 2016´an de ku weke roja destpêka ´agir bestê´ a li Sûrî jî bû, bo ku wê pêvajoya agir bestê ku di destpêkê de vala derxe, bi alikarîya tirkiya çeteyên Cebetil-nasr û DAÎŞê hêrîşê dibina ser girê-sipî. Pêşî gelek hêrîşên kriminalize kirinê li ser çapameniyê û artişê re li rojava kirin. Bi wê re hemû pêvajoyên ku pêş dikevin ên sîyesî, rojava û hêzên wê dervî wan bihêlê, weke ku çawa di pêvajoya agir-bestê´ de ku raaydarên tirk dîplomasî dikirin ku YPGê dervî wê bihêlin. Armanc ji vê, ev bû ku hêrîşên xwe li rojava bidina domandin.

Hê jî, hinek dordor, an bi zanebûnî bê û ankû ne bizanebûnî bê, dibêjin û dipirsin ku "ka çima tirkiya hêrîşî rojava dike." Lê sedema hemû hêrîşên rejima tirk ku di bin nav û gotina "sazûmana civakî" de ku li bakûrê kurdistanê dike û di bin nav û gotina "parastina sînoran" de ku li

rojava dike, hêrîşên li dijî statûya civate kurd in. Ev gotin, weke gotinên´sernûxûmandinê´ dihên bikarhanîn ji vê şerê jenosîdkirina civate kurd re. Weke van gotinan, gelek gotinên din jî ên ku dihên bikarhanîn hena. Di aslê xwe de ji aliyekî ve gotina ´şerê desthilatdarîyê´ jî, ji vê şerê jenosîdkirina civate kurd re dibê weke maske û sernûxûmandinekê. Li vir, bi oparasyonên têgihê ku li ser çapameniyê re bi vî rengî dihênina ser ziman, di vê çerçoveyê de li ser wê(´van gotinên bi vî rengî re ku temenê şerê rejimê ê li ser serê civate kurd diafirênê´) re pêvajoyên şer ên bi civate kurd meşandina heta roja me.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî binxat bike û werêne ser ziman ku çawa dibê ku rêveberîyek, beşek hebûna civatekê bi ardnîgarîya wê ya ku ew li ser dijî re ku bike nava sînorê desthilatdarîya xwe de û li ser wê re şerê desthilatdarîya bi van gotinên bi vî rengî bi wê civatê re bimeşênê? Bi têgîna desthilatdarîyê re hanîna vê rewşê ser ziman re, di aslê xwe de wê gotina ´desthilatdarîyê´ jî bi awayekî xirab ku dihê îstîsmarkirin wê ji wê re bike weke maske ku sernûxûmandinekê ji wê şerê yê bi armanca jenosîdê û hwd re bike. Bi demê û dîrokê re û her wusa di roja me de hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê ku li civate kurd bûna, ji van aliyan ve jî divê ku mirov bi teybetî bike bi lêpirsîn û lêkolînê de.

Di roja me de hêrîşên ku li Sûrê û hwd dibin, di vê çerçoveyê de weke hêrîşna ku bi armanca jenosîdkirina civatê ku mirov dikarê werêne ser ziman in. Lê di vê çerçoveyê de di nava rûpelên çapameniyê de bi awayekî ku bi gotinan û wate û têgîna gotinan re ku li ser wê binûxûmênin, rewşek xwe bi awayekî vekirî li ser desthilatdarîyê û hwd re dide dîyarkirin. Pêvajoya hêrîşên rejima tirk ên li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Geverê, Farqînê, Hezex û Sûrê û hwd, di vê çerçoveyê de weke pêvajoyek şerê bi armanca jenosîdê ku di bin maskeya desthilatdarîyê û ankû şerê desthilatdarîyê de dihê vêşartin a. Rastîya desthilatdarîyê û zihniyeta wê, bi van pêvajoyên hêrîşê ên rejima tirk û hwd, ên li bakûrê kurdistanê û hwd re xwe biawayekî vekirî birastîya xwe re dide dîyarkirin.

Ev pêvajoya şerê rejima tirk ê li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Geverê, Farqînê, Hezex û Sûrê û hwd, ji herîşên wê yên li ser rojava û başûrê kurdistanê û qadaxaya ku wê bi destûrî danîya li ser zimanê kurdî dûr şîrove bike û werêne ser ziman. Dema ku mirov wan bi hevdû re dihilde li dest, hingî rastî baştir biawayekî vekirî xwe dide dîyarkirin.

Pêvajoya şerê rejima tirk ê li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Geverê, Farqînê, Hezex û Sûrê û hwd, ku di dema dawî di sale 2016´an de li bajarên kurdistanê dike, mirov dikarê bişibihêne pêvajoya pêvajoya hêrîşên rejima tirk a ji dema komkujiya zilanê(´1926´) û heta dema komkujiya dersimê(1937´). Ji sale 1926´an û heta sale 1937an, wê li bakûrê kurdistanê, bi dehan komkuji werina kirin. Wê bajarên kurdistanê û civate kurd bi komkujiyan werina bêmirovkirin û bêdeng kirin. BI gotinaka din, wê bi awayekî di nava wê bêdengiyê de civatê bitafisênin. Hêrîşên li farqînê, Sûrê û hwd, kî dikarê ji rewşa pêvajoya komkujiya dersimê cûda şîrove bike. Her wusa, hêrîşên li li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, hezexê û hwd, kî dikarê ji pêvajoya komkujiyên dema zilanê û botanê ku di destpêka komarê de bûna, ji wan cuda werêne ser ziman? Pêvajoya komkujiyan a ji sale 1926´an û heta sale 1937an a komkujiya dersimê, di vê demê de ji nû ve hatîya birêxistin kirin û li gorî demê hatîya formule kirin û li gorî komkuji li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Geverê, Farqînê, Hezex û Sûrê û hwd, dihê kirin. Ev jî, bi awayekî vekirî, ji destpêka komara tirk û heta roja me, domandina pêvajoya jenosîdkirina civate kurd a ku heta roja me li berçavê hemû cihanê dihê domandin a.

...

## DENEZANDINA XWESERÎYA LI KURDISTANÊ

Li kurdistanê, di roja **14 tirmiha 2011ê** de xweserîya demokratik hate denezandin ji aliyê kurdan ve. Di aslê xwe de kurd, bi dîroka xwe ya dem dirêj re hêjayî ji wê bêhtirin. Dîrokaka wan ya ne bin deh hazar salî re heya. Di pêşketina hemû nirxên mirovatiyê de weyn û roleka wan ya dîrokî heya. Lê mixabin, î ro, di rewşeka hê xirab de na. Pêvajoya ku ji sale sale 2011´an de bi hêrîşan li hemberî civate kurd destpêkir, piştre wê heta sale 2016´an, wê bi awayekî şitt xwe bide domandin. Kurdan, ew denezendina xweserîyê li bakûrê kurdistanê, di 28´ê berfanbara 2015´an de dûbara kir û di civîna DTK´ê de li amedê bi weşandina denezenekê re ew carek din hanîn ser ziman. Gelek mirov, tenê bi gotina ´xweserîyê´ re li ser wê dihizirin û wê şîrove dikin. Lê di aslê xwe de, divê ku mirov bi hebûna civate kurd, pêwîstîyên wê yên bi xwe rêvebirina cewherî û hwd re divê ku mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman. Weke civateke ku

ne bin 50 milyonî re na kurd, bêgûman, têgîna ku bi gotina xweserîyê re bê û ankû bi gotina ´rêveberîya xwe ya cewherî re bê ku dihênina ser ziman, di çerçoveya bersivdayîna pêwîstînîyekên civatekê û xwe ji hemû aliyan ve ku serdest bike û birêve bibe ya. Di vê çerçoveyê de li şûna ku weke xweserîyeka ´qatalan´ a di nava îspaniya de ku mirov li wê bihizirê, divê ku mirov di çerçoveya weke projeya ewropa de li giştîya li rojhilat ku weke ku ingilistan, almanya, firansa û hwd hena, mirov dikarê şîrove bike û werêne ser ziman. Rengekî şîroveyê ê bi rengî, wê baştir rastiyê werêne ser ziman. Ji ber ku kurd, bi dîroka xwe re û bi hebûna xwe ya civatî û pêşketina xwe re ne civatek in ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman in. Di aslê xwe de dema ku mirov di vê çerçoveyê de li çareserîya pirsgirêka kurd bihizirê, wê bi awayekî di rojhilat de projeyeka weke ya ´ewropa´ ku navê rojhilat a, wê li rojhilata navîn bi xwe re bide pêşxistin. Ev jî, wê rojhilat, di rengekî weke ewropa bi projeyî bide pêşxistin. Li rojavayê kurdistanê pêşketina şoreşa rojava, li başûrê kurdistanê, rêveberîya kurd a federal û li bakûrê kurdistanê tekoşîna maf û azadîyê a kurdistanîyan, pêvajoyê bi awayekî bixwezayî bi vir ve dibêt. **Li kurdistanê, pirsgirêka herî mazin biqasî ya metingerên ku kurdistan û civate kurd di nava xwe de parvekirina, pirsgirêka tifaqê a di nava sîyeseta kurd de jî ya. Ev pirsgirêkên tifaqatîyê jî, ji aliyekî, li pêşîya pêşketina civate kurd, weke astengîya herî mazin a**.

Di deme ku min ev nivîs li ser xweserîya demokratik û denezandina wê bidest nivîsandinê kir de, nûçeya ku kete ajansan de ew bû ku Îranê, li herêmên başûrê kurdistanê li herêmên Zerdeş û pîranşarê bidest oparasyonekê kiribû. Bi wê re jî, divêt ku mirov bi bîr bixe ku li aliyê kurdistanê li bakûrê kurdistanê li aliyê ku xweserîya demokratik lê hatîya denezandin jî, oparasyonên dewlete tirk bê navber berdewam dikin. Di wan oparasyonan de rojek jî namêne ku xaberên kuştîyan newin. Lê di nav waqas gengeşî û tevlîhevîyê de kurdan xweserîya xwe ya li bakûrê kurdistanê denezand. Bi vê re jî, mirov divêt ku bi bîr bixe ku rayadarên dewlete tirk yên ku digotin me "pêvajoya çareserkirinê" ya pirsgirêka kurd daya dest pê kirin jî, bi hemû sazîyên xwe ve bidest hêrîşê li ser kurdan kirin. Nivîskarên wan yên weke Cengiz Çandar û Ahmed Altan jî, ku hin kurd wan weke "dostên kurdan" di denezênin jî, bidest hêrîşê kirin. Ya wan jî, netewperestiya wan bi carekê re wan girt. Çengiz Çandar, di nivîsa xwe ya pêşî a piştî denezendina xweserîyê de dibêje bo denezene xweserî "salataya gotinan." Bi wê re jî, di dewama wî de, wê hêrîşkirina li kurdan bibe. Di seatên ku kurdan xweserî didenezend de

lijneya bilind a ewlakariyê a tirk `MGK´ê jî di civînê de bû. Piştî ku bi denizen bû û pê de, piştre, bi awayekî bi gûman, 12 leşkerên xwe dana kuştin û li ser wan re li giştîya welêt ´şîn denezendin.´ Armanca bi kuştina leşkeran û piştre li ser wan re denezendina ´sine´ ew bû ku pêşîya pîrozbahiyên bo bo denezendina xweserîyê bigrin. Ji xwe, piştre waliyê demê ê Amedê, ev yek hanî ser ziman û piştrast jî kir.

Di wê pêvajoyê de divêt ku mirov di serî de bibêje ku kurd hatina û ketina pêvajoyaka pirr girîng de. Di wê pêvajoyê de ku hizir û ramana wan çi bê û bi çi awayê bê, divêt ku di vê demê de bi hev re li ber vê pêvajoyê bisekin in. Ev yek, ji bo gelê kurd dîrokî ya. Di wê demê de ku kurd yekbûna xwe çênekin, gelo wê kengî çê bikin? Divêt ku mirov vê yekê jî bi bîr bixe. Pêvajoya xweserîya demokretik, pêvajoyaka ku mirov di vê demê de pirr mazin li ser bisekinê ya. Ev pêvajo, wê temenê hemû pêvajoyên piştre wê biafirêne. Kurd, bi vê pêvajoyê re, divêt ku mafê xweyê bingihîn yên ku ji hebûna wan tên yên weke yên ziman û sazîbûnê divêt ku bidest bixin û bidest sazîkirina wan bikin. Sazûmanaka xwe ya ku bi vê yekê ava bikin, di vê demê de divêt ku ava bikin. Ev yek, her weha girîng e. Bi vê re wê kar bidawî bibe? Na. wê bi dawî nebe. Karê asil yê ku bê kirin, di aslê xwe de di vê demê de ji vê demê û pêde êdî dest pê dike. Ya ku mirov di vir de di serî de bi bîr bixe jî ev yek bixwe ya. Xweserîya demokratik, ku mirov ji kîjan aliyê lê binerê, mirov divêt ku bibêje ku pergalaka xwe bi rêvebirinê ya. Divêt ku mirov vê yekê di serî de bi bîr bixe.

Ev pêvajo, wê li ser sûrî jî û li ser Îranê jî bandûra wê hebe.oparasyonên Îranê yên ku li rojhilatê kurdistanê ku dest pê kirin, divêt ku mirov tenê bi gotina wê ya ku ew dibêje ku "li dijî PAJK ya", ji wê zêdetir û wirdetir bi vê pêvajoya denezandina xweserîya demokratik ve girêdayî revabike û fahm bike. Di temenê wê de nêzîkatîyên Îranê yên ku mirov wan bixwêne jî, bi vê ve girêdayîna. Li Sûrî, di vê demê de tevlîhevîyek heya. Gelên li sûrî hemû jî, î ro li ser lingan in. Hemû jî, bi dengekî li ser lingan in. Kurdên başûr rojavayê kurdistanê jî bi hev re li ser lingan a û doza azadîya xwe dikin. Dixwezin ku êdî mafê wan were radest kirin li wan. Di vê pêvajoyê de jî, hem tirkîya û hem jî Îran, ji bo kurdan dervî wê pêvajoya ji nû ve avakirina sûrî bihêlin di tevgerê de na. Ji ku kurd, mafê xwe bidest nexin, di tevgerîyê de na. Bi vê yekê re, deme ku bi gotina "muxalif" re hêzên dijberî rejime sûrî ku têde tên ser ziman, bi hewldanaka pir bi xesas hewldan tê dayin ku kurd bi navê xwe re têde û di nav de nebin.

Kurd, î ro, hê li welatê wan şer heya. Hê jîyane wan bi şerê ku li welatê wan tê dayin re tê tarûmar kiriin. Jîyane wan, bi awayê wê yê ku heya re ji holê tê rakirin. Ji her awayê re kurd, di bin hêrîşekê de na. Pêşî temenê jîyane wan ji holê te rakirin. Bi wê re mirov karê bêje ku bi wî şerê ku li kurdistanê tê dayin, armanc ne tenê şîkandina vîna kurdan a. Armanca wê ya duyemin jî, awa û temenê jîyane kurdan ji holê rakirin a. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêje ku şerekê ku ji pirr aliyan ve tê dayin a. Di nav wî şerê ku li kurdistanê ev 30 salin ku tê dayin de, kurdan awayê jîyane wan weke ku ji holê hate rakirin. Lê di nav wî şerî de bi nifşên ku mazin bûn re carek din ku ne bi tememî jî bê, awayê jîyane xwe ji nû ve derxista li holê û da ava kirin. Xweserîya demokratik, di vir de, weke heyîna wê awayê jîyanê yê ku kurd bi wê êdî awayê ji jîyane xwe ji nû ve derdixina li holê û ava dikin a. Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku nirxên kurdan, hemû jî, hatina telan kirin. Bi wê telan kirinê re kurd, êdî ji nû ve nirxên xwe jî diafirênin. Di deme nû de di nav şer de afirandina wê, wilqasî ne hesanî ya. Lê kurdan, ev yek, pêk hanî. Ev yek kir. Bi vê yekê re carek din pîrozkirinê de bi maf dikin.

Pêvajoya nû ya ku kurdan têde xweserîya xwe ya demokratik denezand, divêt ku mirov ji pirr aliyan ve nêzîkî wê bibe. Di vê pêvajoyê de, di zihnîyetê de û di kirinê de yekbûna kurdan bûna wê, wê di nav wê ji nû ve adilandin û avakirina rojhilat de wê cihê wan jî bide çêkirin. Di vir de, divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Rojhilat, ji her aliyê xwe ve ji nû ve tê rastkirin. Wê ew statûqûya wê ya ku heya, wê bi buhurê. Êdî rêveberîyên herêmê jî, wê nikaribin, li ber wê bisekin in. Pêvajoyek bi vî rengî dest pê kiriîya. Ev pêvajo, bidestê gelên herêmê yên kurd, fars, arab re hatîya dest pê kirin. Lê di nav wê pêvajoyê de pirr hêz hene ku dikin û dixwezin ku li gor xwe rewşekê di nav wê rewşê derxina li holê. Li herêmê, tevgerîyaka mazin ya gelî û civatî di nav xalkên wê de heya. Lê hêzên ku pêşavanîyaka rast û pak ji wê tevgerîyê re bikin û ji wê tevgerîyê pêşaroja herêmê jê derxin kêm in. Yên ku hebûn jî hatina tesfîye kirin. Bi vê yekê re, hêzên herêmê, bi ku artarnatifên xwe ji holê rakirina di nav wê tevgerîyê de dikin ku li gor xwe ancamakê jê derxin. Lê tevî vêqasê jî, vê ev yek weke ku wilo wê ne hesanî bê. Çendî ku rastkirinekê bikin jî, êdî ne biderfet a, ku dervî vîna gelên herêmê ew rastkirin were kirin. Deme ku nikaribin li pêşîya wê bisekin in, êdî kirina bin kontrola xwe de. Rastkirineka ku di bin kontrolê de, êdî dixwezin. Bi vê yekê re, êdî tevgerîyekê dest pê kirîya.

Li herêmê, weke pêvajoya 1923´an ku çawa ku di konfaranse Lozanê de bû, ku careka din dixwezin ku kurdan dervî pêvajoya destûrî bê hiştin. Tevgerîyeka bi vî rengî heya. Ya ku mirov ji deme û pêvajoya rojhilat û hewldanên ku tên kirin ku dixwêne, tenê ev a. Di vê pêvajoyê de, weke pêvajoya 1923´an, wê karibin kurdan dervî pêvajoyê bên hiştin û an jî na? Bersiva vê pirsê wê dem bide me. Lê divêt ku miirov vê yekê di serî de bêje ku hewldanaka bi vî rengî û ku pir bihêzî heya. Di pêvajoya ji nû ve avakirina sûrî de, hewldan tafandina dengê kurdan û ne hiştina hatina li holê ya navê wan, di ancama wê yekê de dibin. Ji ber çi di konfaranse ku tê gotin ku wê pêşaroja Sûrîye têde were nîqaşkirin ya li stembûlê ku wezirê karê derve yê Emerîka jî têde amede bû(14´ê temûza 2011), ne hat hiştin ku kurd navê wan têde hebe? Hêzên herêmê, bi vî rengî di xwezin ku li gor statûqûya ku heya, bi rê ve herê. Di çerçoveya statûqûya ku heya de, tê xwestin ku hemû tişt were kirin. Di wê statûqûyê de jî, kurd nîn in. Navê wan jî, nîn a. Hemû şer û pevçûnên ku bûn û yên ku î ro jî bi kurdan re dibin, ji bo vê yekê na. Oparasyonên ku tirkîye li bakûrê kurdistanê dide meşandin, ne tenê armanca wan ya şerkirina li ber tevgera kurd a. Armanca wê ya şerkirinê jî, ya şerî û sereke di vir de heya. Îran jî, bi wê re di ahangekê de tevdigerihê. Oparasyonên ku Îranê yên ku ew li rojhilatê kurdistanê dide meşandin, bi hevkarîya tirkî herême başûrê kurdistanê jî kirina nav de. Tirkî jî, başûrê kurdistanê ev ser du salan re ya ku bi firokên şer bombabaran dike. Îran jî, bi wê re topbaran dike. Tirkîye dibêje ku "armanca wê tevgere kurd ye ku li ber wê şer dike PKK ya". Îran dibêje ku dîsa "armanca wê tevgera kurd ya ku li ber wê şer dike PJAK a". Lê ev herdû gotin jî, di aslê xwe de derew in. Armanc, bi vê pêvajoyê ve girêdayî ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha di serî de tesbît bike û kifş bike. Ne Îran û ne jî tirkiye, di vê pêvajoyê de naxwezin ku kurd bibina xwediyê ti statûyê û gotinê.

Bi Îran û Tirkiyê re welatên ku kurdistan di konfaranse Lozanê de di nav wan de hat beşkirin, li wan ji wê demê hate î ro, zimanê kurdî qadaxa ya. Kurd, nikarin bi zimanê xwe yê zikmakî xwe û zaroyên perwerde bikin û bixwênin û binivîsênin. Li Îranê û Li tirkî jî û li Sûrî, ku di roja me de weke amûrna pêşketinê tên bikarhanîn, televîzyon, bi zimanê kurdî qadaxa na. Tirkî bi navê "trt-şêş" yek vekir. Lê ew jî, armanca wê, ew e ku wê qadaxa li ser zimanê kurdî bide veşartin û berdewam kirin û televizyonên kurdî yên ku bên vekirin, wê bidina nîşandin û herîna bi ser wan de û pêşîya wan bigirin û wan bidina girtin. Di deme ku tirkî li ber

denîmarka ji bo ku televîzyona kurd bigirê li ber gerîya, hertimî ev tv´ya xwe ya ku wê vekiribû hanî rojevê. ..

Di wê pêvajoyê de, hêzên weke Emerîka yên ku polîtîkayên wan li herêmê hene, hemû bazarîyên wan yên bi emerîka û hwd re li ser meseleye kurdan a. Di hemû danûstandinên xwe de kurd mijara wan in. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku kurd, di vê pêvajoyê de, weke ku bitenê na. Ti hêz û kesek li cem wan nîn a. Bi vê yekê re karê wan pirr zor a. Lê ew jî, ku bi wê ne afirandina yekbûnaka di nava xwe de hê bêhtir karê xwe yên li pêşîya xwe ji xwe re zortir dikin. Divêt ku wê yekbûna xwe çê bikin. Li ser temenê wê denezandina denezandina xweserîya demokratik karin yekbûnekê di nava xwe de çê bikin û wê hê bêhtir bi pêşde bibin. Ku yekbûnek di nava xwe de çêkirin, wê karin wê bi pêşde bibin. Ya rastî, êdî mirov fihêt dike ku bahse yekbûnê bike ji bo kurdan. Di vê sadsalê de, ku ev êdî weke pirsgirêk jî nayê dîtin, hê kurdan ev di nava xwe de çêkirina. Bila li denezandina serbixwebûna xwe ya başûrê Sûdan´ê binerin û êdî ji xwe fihêt bikin.

Hate î ro, divêt ku hezar carî hatîya gotin ku "çî hatîya serê kurdan ji wê nebûna tifaqa di nava wan de hatîya serê wê wan". Ev gotin, pirr rast û di cih de ya. Yekbûn, wê her pêşketinê bi xwe re bêne. Di serî de, di hilbijartinê di 12 hezirenê de ku li bakûrê kurdistanê û li tirkiye bûn, ku mirov tenê li wê binerê, mirov wê bibîne ku yekbûn û tifaq, karê bi çi zorîyan ve were. Bi vê yekê re, yekbûn, divêt ku sazîyên wê jî, êdî werina afirandin. Yekbûn, vê yekê ji mirov dixwezê. Kurd, mafê wan yê dewletbûnê jî heya. Mafê wan yê serbixwebûnê jî heya. Lê kurdên bakûrê kurdistanê di vê rewşê de xweserî denezandin. Du sedemên wê yên bi demê re hene. Yek, qat(perçe)bûna kurdistanê ya di nava çar welatan de ya. Bi vê yekê re di aslê xwe de, têgihiştina xweserîya demokratik ku baş were têgihiştin û fahm kirin, karê pêşketina weke ku ewropa piştî şerê cihanê yê duyemin jîya karê li rojhilat bide jînkirin. Ev derfet jî heya. Lê kar kîjan hêzên herêmê karin ji wê yekê pêşavaniyê bikin? Deme ku mirov vê gotinê dike, mirov xwe nagirê ku vê pirsê jî ne pirsê. Di wê rewşê de, wê kurd jî, û hemû gel û xalkên herêmê wê qizinc bikin.

Di aslê xwe de, li herêmê bigiîştî jî temenê wê pêşketina bi vî rengî heya. Têgihiştina Îslamê ya gelemper, derfetê ji vê pêşketinê re li herêmê diafirêne. Di wê çerçovê de karê pergalaka giştî ku xalkên herêmê hemû xwe têde bênina ser ziman were ava kirin. Pêşketina sadsalên piştî derketina Îslamê ya ku jîn kir, hinekî jî li ser vê yekê û temenê û esasê

bû. Salahadînê Eyûbî, li ser wê temenê nêzkatî lê kir. Salahadîn, ew pergala kurdan ya ku bi hezar salan ava afirîbû, wî ew fahm kiribû. Bi wê û kevneşopîya wê re nêzîk bû û bi serket û li herêmê pergalaka giştî ava kir. Bi vê yekê re, herêmê kira hêzêk. Herêm, bi vî rengî ku î ro îran, tirkî, Sûrîya Û hemû welatên din yên rojhilat dikin re wê ti carî nebe hêzeke ku karibê pêşketinê xwe jî bi rê ve bibe. Wê her timî bi vê yekê rengî serwerî û serdestîyek li ser serwerî û serdestîya wê re wê hebe. Di deme Medîya de, kurdan bi persan re împaratoriyek ava kir. Di deme sasanîyan de persan bi kurdan re împaratoriyek ava kir. Di vê demê de jî karin bi hev re tevbigerihin heman bi pêşketin bi dîrokên xwe re bidina jîn kirin li herêmê. Lê bi vê yekê re, çendî ku yekbûna nava kurdan hem ji bo wan û hem jî ji bo herêmê girîng e, ku mirov li dîroka kurdan û ya herêmê binerê, mirov wê êdî wê bibîne.

Li rojhilat, pergalên wê yên ku î ro lê hene, weke ku ketibina sûkeka ku derîyê derketinê li dawiyê wê nebe de. Ku mirov li wê dinerê, mirov wê dibîne. Ya rastî, di vir de ji wê sûka ku weke ku bê derîya ji wê biderî derketin, tenê wê bi çareserkirina pirsgirêkên xwe bi nêzîkatîyên dîyalogê na. Divêt ku êdî rêveberîyên herêmê dev ji şerên li ber gelên herêmê berdin. Divêt ku êdî rêzê bidina gelên xwe. Gelên xwe, êdî weke bindestîyên xwe nebin in. Wilo nêzîkî wan nebin. Mafê wan yên ji heyîn û hebûna wan tê radestî wan bikin. Di nav xwe de, divêt ku bi têgihiştineka ku di têgihiştinîn pergalê xwe de dana rûnandin, divêt ku rêz û hûrmetê ji mirovên herêmê û dîroka wê re bigirin. Gelên herêmê hemû jî, ku mirov li mazinat û biçûkatîya wan ne nerê, hemû hêjayî nêzîkatîyaka rast in.

Gelê kurd, li herêmê xwediyê dîroka herî kevn a. Xalkek ji wan xalkê ku li herêmê dîroka wê ya herî kevn a. Di pêşketina herêmê de di her demê wê de weyn leyistîya. Di vê demê de, wê veyne xwe bileyizê. Bi wê re, wê ne mafê xwe bidest bixe, wê her weha dîroka herêmê jî bi pêşketina xwe re û bi bidestxistina mafê xwe re wê li ser lingên wê bide rûnandin. Dîroka herêmê, di rewşa nahaka de weke ku ne lingekî wê heya û ne jî li ser lingên xwe ya. Weke mirovekî ku bi lingên xwe ve hatibê dalqandin li berçav a. Wê ev were rastkirin. Bi wê re û bi wê rastkirinê re, wê herêmê bikeve riya xwe ya pêşketinê de. Herêm, di nêzîkatîyaka rast de ku nêzîkatî lê were kirin, wê ti tiştek û ti kesek nikaribê li pêşîya pêşketina wê û pêşveçûna wê bibe bend û wê astang bike. Ne tenê tirkiye, Divêt ku Îran jî û Sûrî jî û hemû welatên din yên rojhilat jî, wê pêşketina kurdan ya ku wan bi xwe re di xwe de çêkirina

baş û qanc bixwênin. Ev yek, wê ne tenê ji bo wan baş û qanc bibe, her weha ji bo herêmê jî, wê baş û qanc bibe.

Pirsgirêka kurd, ya ku î ro, bi sûrî re cihana arab muhatebekî wê ya û bi wê re Îran û tirk û hê jî Îraq mihatebên wê na, bende herî mazin ya li pêşîya pêşketina rojhilat a. Îran, dîrokaka wê ya bi hezar salan bi kurdan re heya. Lê mixabin, ez weke mirovekê kurd, ku li wan kirinên wê yên ku li dijî kurdan ku ew dike ku ez dibînim, dilê min pirr dihêşîhe. Ez di serî de di dilê xwe dibêjin heyf. Ya ku piştî wê dîroka bi hezar salan ku bi hev re jînbûnê ku bûbana ne ev bana. Divîyabû, ku nêzîkatîyaka herî rast ya bi rûmet bana. Ez nêzîkatîya Îranê ya ku ew di vê demê de li ber kurdan dike di ti ahlaqê û olê de cihê wê nîn a. Îran, dibêje ku ew girêdayî kevneşopîya Hasan û Huseyin a. Ev herdû nirxna pîroz in. Lê ku î ro herdû jî şax ban, wê di serî de ew kirinên ku î ro ew li dijî kurdan dike, wê wan ew şermazar bikira. Î ran, bixwe jî, vê yekê dizanê. Divêt ku ji wan xelatiyên ku ew nirxên ahlîbeydî ku bibinîn wê wan şermazar bikin, dûr bikeve. Ez deme vê kirina îranê ye di demê de dibînim, ku ez tenê li ser wê dihizirim, ez dibênim ku weke Îran li ber Hasan û Huseyin di şer de bê, ez dibênim. Wilo tê berçavên min. Hasan û Huseyin, ji mafîya mirov têkoşîyan. Wan hertimî rastî û mafê mirov li dinyê parast. Li wê dinya din jî, wê ew wê biparezên. Kevneşopîya wan ev a. Hasan û Huseyin, Rêz û hûrmet ji gel û xalkên di din re girt. Wan rêz û hûrmet da miletên din. Li cem wan hemû milet yekbûn. Lê li cem Îranê yek in. Weke yekî kurd, ez karin bêjim ku yek in. ..

Di vê temenê de, divîyabû ku Îran, di serî de, ya ku li mafê kurdan bi kurdan lê xwedî derketiba, ew ba, ku weke ku ew dibêje ku li ser riya rast dimeşê ku ew rast ba. Lê demek kî ne rast a. Îran, ne li ser riya mafîyê dimeşê. Ne li ser riya Hasan û Huseyin dimeşê. weke ku tirkiya ne li ser riya Îslamê dimeşê û hwd. Ku Îran, li ser rîya madîya re meşî ba, wê kurd li rojhilatê kurdistanê ne di wê rewşa xirab de ba û wê şer li ber wan nedaba dest pê kirin. Ku weke ku tirkî dibêje ku Îslamîyetî pêre heba, wê î ro li wir kurd, en di wê rewşa xirab de ban. Gelek ji wan gelê ku ew avakirîya gelê kurd a. Di destpêka wê olê de cîh girtîya. Li ser têgihiştina bimafîtiyê û rastîyê re ku mirov bimeşê, divêt ku mirov vê gotinê bêje ku kurd, î ro, gelê ku li ber wî bi zordarî zilmaka mazin ya ku cihê wê di ti olê de nîn a hatîya kirin. Li herêmên ku kurd, ne xweserîtîyê denezênin, ku serbixwebûnê denezênin, dîsa divîyabû ku li ber wê bi hûrmet nêzîkatî lê hatiba kirin. Di nêzîkatîyaka rast de ku mirov lê bihizirê, ku kurd, serbixwebûna xwe jî denezênin, wê dîsa li heman herêmê bin û wê

bi hev re bin. Bêgûman mafê kurdan ê denezendina serxwebûna kurdistanê jî heya. Wê tenê ew denezandin, bi gihiştina mafê xwe re wê bi sînor maba. Î ro jî, ku ew bibe, wê wilo bê. Lê ku li herêmê bi nêzîkatîyaka rast nêzîkatî were kirin, wê hingî bê dîtin ku weke xalk û gelne ku li heman herêmê li rojhilat dijîn kurd, fars, tirk û arab, wê dîsa bi hev re ban. ..

Ku rêveberîyaka herêmê jî, têgihiştinaka rast ya ji bo pêşketina herêmê bi wan re hebe, ku kurdan ne xwestiba jî, wan wê xwestiba ku kurd serbixwebûna xwe denezênin û piştre dîsa li ser wê re bi hev re bijîn. Di vîr de, di vê demê ya ku bê kirin jî ev yek bixwe ya. Di temenê têgihiştineka netewperestî de nêzîkatî kirin û nerîn, wê ti carî mirov li herêmê ne gihêne dîtinaka rast û pak ku ji nîjadperestiyê dûr a. Xalk û gelên li herêmê yên ku wê bi hev re bijîn, divêt ku biqasî ku ji bo xwe dihizirin wilqasî jî ji bo xalk û gelên din yên herêmê jî bihizirin û di nêzîkatîyaka rast de bin. Bi nêzîkatî, têgihiştin û nerîna serwerî, serdestî û desthilatdarîyê tenê nerîn, wê ne gihêne wê nerîna baş û qanc. Hate nahaka herêmê jî, ya ku bûya sedeme windakirinê wê jî, ev bûya. Herême rojhilat, pêncsalên dawiyê yên dîroka xwe yên ku li şûn xwe hişt bi windahî buhurand û li şûn xwe hişt. Ji vir pêde, divêt ku ew nebe. Ew afrîqabûna ku bahse wê dihate kirin, êdî hin bi hin li rojhilat pêş dikeve. Divêt ku ya ku pêşî were dîtin, eva. Rojhilat, pergale wê ya ku bigiştî were afirandin, wê ti carî ne bi yekrengî bê. Têgihiştin, "yek milet, yek ziman, yek dewlet" hwd, têgihiştin ku pêşarojê ji dest didina ravandin û didina windakirin in. Têgihştinên, ku çand û gelan bi hev re ji dîrokê dibin in. Di aslê xwe de xweserîya demokratik di vir de weke pergala ku bi hev re û di nav hev re ya jîyînê ya. Lê herkesek bi rengê ku dijî. Pergala, ku mirov sibehê rabê û li gûlîstane xwe binerê, ji dêla rengekî wê çend rengan bi hev re bibînê ya. Ku Welatek jî, were denezandin, ku li wê herêmê pirr milet û gel hebin, wê bi wê welatitîya wan re, wê bi têgihiştinaka xweserî ya ku ew bi hev re wê bi wê, ku wê bijîn, wê awayê jîyane wan wê li herêmê wê hebe, weke ku î ro li Ewropa dibe. ..

....

**Di 28´ê berfanbera 2015´an de piştî ku kurdan cardin xweserîya xwe ya herêmî li kurdistanê denezendin, rejima tirk, pêvajoyek şer ya giştî li hemberî civate kurd da destpêkirin.** Piştre, weke ku serokwezirê demê ê tirk Dawutoglu jî hanî ser ziman, ´ «amedekarîya wê pêvajoya hêrîşê di sale 2013´an li hemberî kurdan hatibû kirin.» Ev jî, dida nîşandin ku dema ku gotina ´pêvajoyê´ bikardihanîn jî ne ji dil bûn.

Lê di dawîya sale di 2015´an de hat dayîn destpêkirin. Kurdan jî, li bajarên xwe, bo ku xwe ji wan hêrîşên rejima tirk biparêzên, ´hendek´ kolan. Kolandina hendekan di çanda rojhilat de pirr kevn a. Di dema ku destpêka îslamê de jî, **şerê destpêkê ê îslamê ku weke «şerê hendekê»** tê bi navkirin. Ev bi navkirin, di dema ku hêrîş li misilmanan bûn, hingî, misilmanan bo ku xwe biparêzên, hendek kola bûn. Di sale 627´an de di nava misilman û mekkeyîyan de şerekî dawî rûdide. Ji ber ku hijmara mekkeyîyan zêdetir bû, bo ku xwe biparêzên û weke stretejiyekê misilmanan ´hendek´ kola bû. Bo vê yekê, weke «şerê hendekê jî, ev şer misilmanan tê bi navkirin.

Li kurdistanê jî, piştî hêrîşên artişa tirk bi tank û topan li kurdistanê, êdî kurdistanîyan tax bi tax hendek kolan bo xwe parastinê. Şerê bi hendekan ê li kurdistanê ku kurdistaniyan di dawîya sale 2015´an pêşxist û di sale 2016´an de jî domîya weke şerê parastina rêveberîyên xweserî ên kurd, mirov dikarê weke şerê hendekan ê parastinê jî werêne ser ziman. Rejima tirk, bi hemû teknika xwe ya şer, hêrîşî kurdan dike. Lê kurd, di destê wan de ti teknikek mazin ya bi çekan bê û ankû bi awûrên parastinê bê, di destê wan de tûna ya. Êdî ew jî, hendekan pêş dixin. Mirov dikarê weke şerê hendekan ê li kurdistanê jî binav bike û werêne ser ziman.

**Kurd**, weke civatekê ku xwediyê dîroka xwe ya xweser û teybet, ziman û çanda xwe ya cuda na, mafê wê heya ku werêne rojavê ku ji tirkiya cuda bibe. Bêgûman, di vê rewşê de divê ku werêne rojevê jî. Her wusa, hêzên ku hebûna kurdan herê nakin, di înkara kurdan de israr dikin, di vê çerçoveyê de ti rêyên din ji kurdan re nahêlin. Dema ku hebûna xweserîyên kurdan li herêmên wan bi ziman, çand û xwe rêveberîya wan newê nasîn, wê çaxê kurd divê ku cudabûnê bikina rojeve xwe de. Ji xwe, ya rast jî, di vê rewşê de wê ev bê. Dema ku rejima tirk, hebûna civate kurd, nasnekê û li hemberî hebûna wê politikayên înkarê dimeşêne û dîroka wê, dîroka komkujiyên ku wê hanîna serê kurdan a, wê çaxê, kurd, bi awayekî xweza û rast ji xwe dipirsin ku wê çawa bi vî rengî bi tirkiya re bijîn. Ji 5´ê Nîşana 2015´an ve tecrîdeke giran hatîya danîn li ser Birêz Ocalan. Tecrîd bixwe jî, mirov dikarê weke êşkenceyê werêne ser ziman.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku rastîya hêrîşên rejima tirk û rayadarên wê ku bi hemû rê û rêbazan li kurdistanîyan dikin ji 7´ê hezîrene 2015´an û heta roja me ku em di wê de dijîn, mirov dikarê weke sedema cudabûna kurdan jî, werêne ser

ziman. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku maf û azadîya kurdan nebê ku li ser vîn û pêşaroja xwe gotinê bibêje û kifşkirinê bike, wê çaxê bi rengê mirov dikarê bahse wekehevdû bi hevû re jiyînê bike? Bêgûman, mirov nikarê bahse wê bike. Civate kurd, civateke a û xwediyê rest(norm)ên xwe yên civatî ya ku bi wan bijî. Di serî de hebûna civate kurd dihê înkarkirin.

Ji xwe, divê ku mirov werêne ser ziman ku hemû şerê rejima tirk ê bi kurdan re ku dike jî, bo ku bêstatûtiyê ku bi kurdan bide herêkirin a. Di vê çerçoveyê de hêrîşî kurdan dike.

Dema ku kurdan û tevgera kurd bahse ´ bi hevdû re jîyankirinê´ kir, di çerçoveyek ku wekhevdû xwediyê heman maf û azadiyê na, di vê çerçoveyê de hanî ser ziman. Dema ku bahse bi hevdû re jîyankirinê kir, ne got ku emê dibin kolederiya faşîzma rêveberîya tirk de bijîn. Her wusa, bi wê re ku bi demê de şerê tûnakirina hemû rastî û restên civatî ên civate kurd ku tuna bike. Ku kurd, nikaribin refarandûmekê li ser pêşaroja xwe û bi vîna xwe bikin, wê çaxê mirov nikarê bahse wekehevdûbûnê û her wusa maf û azadiyê bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rejimeke tirk ku dîroka wê hemû dîroka komkujiyan a ku hanîna serê civate kurd, bi ti awayê û ahlaqê temenê bi hevdû re jîyankirinê a civate kurd bi wan re tûna ya. Di serî de ku heka ku rejima tirk û ankû xalkê bixwezê ku bi kurdan re bijî, divê ku ji wê dîroka xwe ya bixwûn, lêborîna xwe ji kurdan bixwezê. Di aslê xwe de ya bi ahlaq, mirovî û rast, ew a kurd cuda bibin jî û cuda nebin jî, divîyabû ku rejima tirk û gelê tirk, ji ber wê dîroka xwe ya bixwûn ji gelê kurd lêborîna xwe bixwezê. Ya ku wê wan jî di vê çerçoveyê de bi mirovatiya wan re jî rû bi rû werênê wê ev bê.

Kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di aslê xwe de temenê bi rejima tirk re jîyankirinê tûna ya û nema ya. Her wusa, ku î ro, hemû hêrîşên rejima tirk ên bi artişa wê re li bajarên kurdistanê ên weke Cizra bota, Sûr, Nisêbîn, Silopî û hwd bisekinê jî, dîsa temenê bi hevdû re jîyankirinê tûna ya û nema ya. Rejimeke ku hêrîşên bi vî re ên xadarî ku li xweserîya kurdan bixwe jî dike, wê çaxê, bi çi ahlaqê mirov dikarê bahse bi wê re jîyankirinê bike? Li vir, divê ku mirov hinekî ji aliyê ahlaqî ve jî li mijarê binerê. Ji aliyê ahlaqî ve dema ku mirov li mijarê binerê, wê çaxê, wê ev rengê nerîna li mijarê me bi rest(´norm´)ên civatî ên civate kurd re bike ku hevnasîyê bike. Her wusa, li vir, divê ku mirov li vir, di vê çerçoveyê de û bi teybetî, di çerçoveya rastîya civate kurd û hebûna rastîya civate kurd de li mijarê binerê.

Î ro, li kurdistanê, gelek dordor, dibêjin ku hêrîşên rejima tirk û artişa wê li bajarên kurdistanê, weke bi hênceta ´hendek´an dihênina ser ziman. Lê di aslê xwe de, ev ne rast a. Mirov nikarê bi wê re werêne ser ziman. Ya ku divê ku mirov werêne ser ziman ew a ku divê ku mirov bi naskirin û ankû ne naskirina hebûna civate kurd re werênina ser ziman. Di temenê hemû hêrîşên rejima tirk ên li civate kurd de, zihniyeta wê ya ku hebûna civate kurd înkar dike heya. Di temenê hemû hêrîşên wê yên ku li başûr jî, li rojava jî û li bakûrê kurdistanê jî li civate kurd kirina, zihniyeta wê ya înkarker heya.

Divê ku ti kesek rastiyê berevajî nekê, dema ku birêz Ocalan bahse bi hevdû re jîyankirinê kir, di çerçoveyeke weke hevdû de ku xwediyê heman maf û azadiyê bikin kir. Her wusa, di çerçoveyek ku rêz û hûrmet ji hebûna hevdû ya civatî re were dayîn nîşandin, di wê çerçoveyê de hanî ser ziman. Î ro, ew projeya ku bi hevdû re jîyankirinê a ku rêberê gelê kurd birêz Ocalan hanî ser ziman, ji aliyê rejima tirk ve hatîya vala derxistin. Di pêvajoya çerçoveyê ku birêz Ocalan da destpêkirin de jî, er gavavêtinên ku hatina avêtin, ji aliyê rayadarên tirk ve hat vala derxistin û li ser wê vala derxistinê re pêvajoyên şerkirina bi civate kurd re hat pêşxistin. Gav bi gav, bi vî rengî temenê konsepta şer a ku rejima tirk li hemberî civate kurd da destpêkirin hat pêşxistin.

Î ro, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di kîjan demê de bê bila bibe, di herdemê de mafê gelê kurd heya ku li ser pêşaroja xwe gotinê bibêje. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de projeyeka bi hevdû re jîyankirinê ku were pêşxistin û heta ku bi destûrkirin jî, heta ku bi rengekî weke çûyina refarandûmê û hwd ku di wê de ji gelê kurd newê pirsîn, dîsa mirov nikarê bibêje ku ew projeyeka bi hevdû re jîyankirinê ya. Di vê çerçoveyê de ya ku wê biryarê bide, wê gelê kurd bê. Gelê kurd jî, î ro, di wê astê de ya ku nexwezê ku bi rejima tirk re bijî.

Di kîjan rewşê de gelê kurd dikarê bi rejima tirk re di çerçoveya naskirina hebûna hevdû de bijî? Di çerçoveyeka ku rejima tirk ji wê dîroka xwe ya bixwûn ku wê di wê de bi sedan komkujî hanîna serê civate kurd û wê înkar bike û li ser wê re rûpelekî nû were vekirin, bi wê rengê hingî mirov dikarê bahse bi hevdû re jîyankirinê bike. Lê nûha, di vê çerçoveyê de mirov nikarê bahse wê bike. Yên ku mijarê dişibêhênina rewşa Îspanya û ankû **Îrlandayê** û hwd, divê ku mirov werêne ser ziman ku temenê pêvajoya çareserîyê ya van welatan pêşî li ser temenê ku ew rejimên weke îspanya û ingilistan ku wê rastîya xwe ya dijber red bikin û rûpelekî nû vekin a.. Î ro, bi ti awayê temenê bi hevdû re jîyankirinê ê

civate kurd bi rejima tirk re tûna ya. Temenê bi hevdû re ya jîyankirina civate kurd û rejima tirk, ne ji aliyê zihniyeta wê ve heya û ne jî ji aliyê rastîya dîrokî ve heya. Kurd, wê çawa bi dîrokeka hertimî di wê de komkuji hanîna serê wan, wê bi wê re bijîn. Tenê ku mirov dîroka komare tirk hilde li dest, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman, ji destpêka avabûna wê komarê û heta roja, bi komkujiyên ku hanîna serê kurdan û civate kurd ew dîrok hatîya nivîsandin. Zagonên ´şerq û îslahatê´ û hwd, di vê çerçoveyê de li hemberî civate kurd hatina derxistin. Komkujiyên ku weke komkujiya zilanê û ankû komkujiya dersimê di nava vê dîrokê de hatîya hanîn li serê civate kurd. Heta roja me jî, ew komkuji, hatina hanîn li serê civate kurd bi armanca ji dîrokê birina wê.

Heta roja me, rejima tirk, ew dîroka komare xwe bixwe jî, weke dîroka komkujiyên ku hatina serê kurdan nivîsandîya. Her wusa, heta roja me, zimanê kurdî qadaxakirîya. Dema ku kurdan dibistanên bi zimanê kurdî vekirin ku çawa ku rayadarên tirk diçûn û mohr li devê deriyên wan dixistin, hê di bîra me de ya. Komkujiyên ku hanîna serê kurdan û ev dîroka komkujiyan ku hanîna serê kurdan, bo kurdan û civate kurd sedema cudabûnê ya ji tirkiya. Hêrîşên li rêveberîyên xweser ên kurdan, sedema cudabûnê ya ji tirkiya. Di aslê xwe de hêrîşên rejima tirk û artişa wê li rêveberîyên xweser ên kurdan, êdî bi awayekî vekirî û xwezayî ji kurdan dixwezê ku cudabûnê bihizirin ji tirkiya yê. Ev 40 sale ku rejima tirk, hemû rêbaz bikarhanîya û bi kurdan re şer meşandîya. Berê wê jî heya. Ev rewş hemû, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Bi teybetî, hêrîşên li rêveberîyên xweser ên kurdan, dide nîşandin ku ji hizirkirina cudabûnê ji tirkiya û pê de, êdî ti rê nemaya. Dema ku rêveberîyek xweser jî, bi vî rengî sedema hêrîşkirinê bê bo rejima tirk û artişa wê ku herê bi ser kurdan de, êdî ji cudabûnê û pê de, ti rê nemaya bo kurdan.

Herkesekî û bi teybetî jî, kurdan pirr ked da û hêvî kir ku pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane were çareser kirin. Xwestin ku ne xwûna kurdan û ne jî ya ti kesekî din bi rijihê. Bo vê yekê, di pêvajoyên aşîtîyê û hwd dana destpêkirin. Lê bi serneketin. Kurd, piştî ku li rêveberîyên wan ên xweser ku denezendina ku hêrîş bûn û pê de, êdî rêya li pêşîya wan maya ya nîqaşkirin û hizirkirina cudabûnê ya. Hêrîşên ku di vê demê de li civate kurd dibin, êdî vê rastiyê piştrast dikin. Kurdan, tekoşîneka mirovatiyê dan. Xwestin ku bi gelan re bi awayekî hevbeş pirsgirêkan

çareser bikin. Lê ya ku derfet ji wê re nedîtin jî, ev a. Hertimî, pêvajoyên hêrîşê û komkujiyê li ser serê wan hatina bi rêxistin. Î ro, qadaxaya derketina li sûkan a li bajarên kurdan, bi armanca tafisandina rêveberîyên wan ên xweser, her wusa dide nîşandin ku kurd, hemû rêyên bi hevdû re jîyankirinê ceribandina lê ancam bidest nexistina. Her wusa, çareya dawî jî, rêveberîyên xweser ên li bajarên kurdistanê û hêrîşên li bajarên kurdan ku rejima tirk bi artiş, tank û topan dike jî, vê rastiyê radixe li berçavan.

Heta roja me, dibêjin ku "ev hezar salin ku em bi hevdû re dijin." Lê ev derew a. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku dîroka osmaniyan, bo kurdan, weke dîrokek komkujiyan a. Di her demên wê de komkuji hatina hanîn li serê civate kurd. Her wusa, heman tiştî bo dîroka komare tirk jî mirov dikarê bibêjê. Dîroka **komare** tirk, ji aliyê kurdan ve, weke dîroka komkujiyên ku hatina hanîn li serê wan a. Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, mirov nikarê bahse bi hevdû re jîyanbûnekê bi hazad û bi rûmet bike. Di aslê xwe de komare tirk ku nivîsandina dîroka xwe weke dîroka komkujiyên ku hatina serê kurdan, hingî jî, ev bi serê xwe bo kurdan û civate kurd, sedema ji hevdû cudabûnê ya. Di nava têkiliyên kurd û rejima tirk de, wekhevdû û ankû têkiliyek bi rûmet tûna ya. Têkilî, têkiliyek metinger a. Heman tiştî bo têkiliyên di dema osmaniyan de jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Dema ku rewş, ev bê, wê çaxê, mirov nikarê bahse temenê bi hevdû re jîyankirinê bike. Her wusa, ´di çerçoveya hemwelatîyek wekehevdû de´ nîqaşên ku dihên kirin de jî, ji ti aliyê ve temenê wan tûna ya. Î ro, ne bi zihniyetî, ne bii destûrî û ne jî ji aliyê rastîyên din ên sîyesî, aborî û hwd, mirov dikarê bahse wê bike. Bo bê yekê, î ro, divê ku mirov werêne ser ziman ku kurdan, hertimî, bi mirovî û di çerçoveyek rast de, hemû rêyên mirovî û bi mirovatî ceribandin. Pêvajoya çareserîyê, di aslê xwe de rêyek ji van rêyên bi mirovî û mirovatî ê civate kurd bû ku ceriband. Lê ew jî biserneket. Her wusa, piştî wê re jî, çi bû? Ya ku bû, ew bû ku rejima tirk, dîsa konseptek şer, bi rêxistin bike û şerekî giştî li hemberî civate kurd bide destpêkirin. Î ro, şerê wê yê li hemberî civate kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Di aslê xwe de, ti carî, dîrokeka ku em karibin, di çerçoveya têgîneka mirovatî ya bi hevdû re jîyankirinê, mirov nikarê ji dîroka rejima tirk bixwêne. Di dema osmanîyan de jî, dîroka wê bi kurdan re bû weke dîroka şer. Piştî osmanîyan re ku li ser bermeniya wê avabûya komare tirk jî, kurdan alikarî dayê de ku were avakirin. Di her deverên tirkiya û

kurdistanê de xwûna kurdan heya. Lê mixabin, hertimî, wê çawa civate kurd dbin pêvajoyên hêrîşan de bê. Berê bi zihniyeta Mahmut Esad bozkurt nêzîk dibûn. Mahmut Esad bozkurt digot ku "yên ku ne tirk bin, tenê mafekê wan heya û ew jî, ew a ku ´îteatê ji tirkan re bikin" bê. Î ro jî, bi heman zihniyetê dibêjin ku " ku tu tirk bê şênaz ba, lê ku tu ne tirk bê îteatê bike." Ev ne tenê gotineka ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe û hêzên xwe yên teybet li ser hêtên li bajarên kurdistanê didina nîşandin a. Ji wê zêdetirî, weke gotinaka ku rastîya zihniyeta wan ya înkarker a.

Kurd, di vê çerçoveyê de ku mirov ji kîjan aliyê ve li rewşa wan binerê, divê ku mirov werêne ser ziman ku temenê jîyankirina wan ya bi rejima tirk re tûna ya. Her wusa, ji destpêka komarê û heta roja me, dîrokeka ku bi wê hertimî komkuji hanîna serê civate kurd, hat nivîsandin. Ev jî, î ro, dîroka komare tirk a. Kurd, ji kîjan aliyê ve ku li rejima tirk û dîroka wê dinerin, ew komkujiyên ku wê hanîna serê civate kurd dihêne bîra wan(´kurdan´) û berçavên wan(´kurdan´). Di vê çerçoveyê de ji aliyê derûnî, civaknasî û her wusa rastiyên din ên civatî ve, temenê bi hevdû re jîyankirinê tûna ya û ne hatîya pêşxistin.

Kurd, civatek in. Bêgûman, rengê pêşketina vê civate ê teybet heya. Çanda wê ya teybet heya. Zimanê wê yê cuda heya. Bo vê yekê kurdan bixwe, weke çareserîyeka ku bi wê hebûna civate xwe biparêzên, ´xweserîya demokratik´ hanîna rojevê. Her wusa, bi wê re ku karibin hebûna civate xwe biparêzên. Di vê çerçoveyê de wê li bajarên xwe bixwe rêvebiriban, wê bi zimanê xwe perwerdeya dîtîban. Û wê bi rengê civate xwe û çanda xwe re bi dîroka xwe re pêşketina xwe jîyankiriban û bi ber pêşarojê de biçûyan. Lê ji ber ku ermancek rejima tirk ê ji dîrokê birina civate kurd heya, êdî wê xweserîya civate kurd jî ji wê re zêde dibînê û hêrîşî wê dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke birêz Karayilan jî hanî ser ziman ku ´Xweserîyê nasnekin, emê cudabûnê bihizirin." Lê di aslê xwe de, ev cudabûn, ji xwe bûya. Î ro, ji ti aliyê ve bendên deronî, civaknasî û ên aliyên din ên civatî, têkiliyên kurd û tirkan û rejima tirk bi hevdû re nema ya. Têkiliya ku rayadarên tirk, bi wê re dibêjin ku ´em bi hevdû re dijîn jî, rengekî têkiliyê ku em divê ku bi têgîna metingerîyê werênina ser ziman a. Rengekî têkiliyê ê kole û efendî ya. Bo vê yekê ev rewşa bi hevdû re ya kurd û tirkan, mirov nikarê biawayekî bi rêz û hûrmet werêne ser ziman. Rengê hevdû re bûna kurd û tirkan, rengekî ku li ser navê mirovatiyê ku mirov divê ku wê şermazar bike ya.

Bêgûman, di vê rewşa ku rejima tirk bi hemû hêz û artişa xwe hêrîşî rêveberîyên xwe ên bajarên kurdistanê dike, li ser wan hêrîşan re hanîna rojevê a cuda kurdan ji tirkiya, wê rast û di cih de bê. Ya rast jî, wê ew bê. Ji xwe, bi awayekî din jî, ti reng û rêyên hanîna li ser ziman tûna ya. Yan kurd, wê, metingerîya rejima tirk herê bikin û qabûl bikin ku bi demê re di nava civake tirkiya bi halihin û ji dîrokê herin û yan jî, wê nîqaşkirina cudabûna ji tirkiya bikina rojeve xwe de. Her wusa, xweserîya ku kurdan li bajarên xwe denezendina, rengê hêrîşkarîya rejima tirk bi artişê li wan, divê ku weke sedema vê nîqaşkirinê jî mirov werêne ser ziman. Dema ku ew xweserîya li bajarên kurdan jî ku kurdan denezendîya wilqasî zêde rastî hêrîşkarîya rayadarên tirk û artişa wê were, wê çaxê, êdî mirov nikarê bahse ti rengên din ên bi hevdû re jîyankirinê bikin. Bin wê re jî, herêkirina tûnebûnê û ji dîrokê çûyinê ya.

Ji xwe piştî hêrîşên rejima tirk bi artişa wê re li rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan re, êdî ti rê û rêbazên namênin ji cudabûna kurdan ji tirkiya û pê de. Ya ku êdî piştî wan hêrîşên rejima tirk ên li rêveberîyên xweser ku divê ku bibe, ew têgîna cudabûna kurdan ji tirkiya ya. Ji xwe, ji wê û pê de, ti rêyên din namênin. Êdî divê ku kurd rêya xwe ji ya tirkiya cuda bikin û bibêjin herkesek bi rêya xwe ve.

Ji xwe, piştî hêrîşên rejima tirk û artişa wê li rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan û pê de, temenekî nîqaşek din jî namêne li holê. Dema ku xweserîya te ya ku ji hebûna te jî nasnekê, wê çaxê, tê bi çi ahlaqê û rêz û hûrmetê bi wê re bijî? Bi wê re jî, ya ku mirov karê bibêje jî, ew a ku ´yên ku hebûna min ya civatî nasnekê, bi çi ahlaqê û mirovatiyê ezê bi wan re bijîm.´? Î ro, her kurd jî, ê pirsê ji xwe dikin. Piştî hêrîşên rejima tirk bi artişa wê re li rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan li Cizira bota, Nisêbîn, Silopî, Sûr û hwd, ev nîqaş di mejiyê kurdîstaniyan de zêdetir bûn. Her wusa, kurd, êdî nexwezin ku wê bi dîroka metingerî û ya lanetî a bi rejima tirk re ku hata roja me jîyane, êdî bijîn. Dîroka ku heta roja me, hatîya jîyankirin, weke dîrokek lenetî ya. Divê ku were lenet kirin jî. Dîrokek metingerîyê ya. Kurd, wê dîrokê şermazar dikin. Naxwezin ku ew êdî bi wê dîroka lenetî re bijîn. Ew dîroka ku bi wê re komkujiyên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê hanîna serê civate kurd û heta roja me bi sedan komkuji hanîna serê civate kurd, kurd dixwezin ku dawiyê li vê dîroka lenetî werênin.

Piştî hêrîşên rejima tirk bi artişa wê re li rêveberîyên xweser, êdî kurdan zêdetirî bidest nîqaşkirina cudabûna ji tirkiya kirin di mejiyê xwe de. Rejimeka ku xweserîyê jî ji civateke weke civate kurd re zêde dibînê,

bi çi ahlaqê wê bi wê re were jîyîn? Hêrîşên rejima tirk ên li ser rêveberîyên xweser, êdî da nîşandin ku temenê bi hevdû re jîyankirinê nemaya. Ji xwe, bi hêrşên rejima tirk ên li ser rêveberîyên xweser re êdî kurdan ji xwe pirsî ku rejima tirk bi artişa xwe re hêrîşî xweserîyeka kurdan a li bajarên wan jî bike, êdî temenê bi hevdû re jîyankirinê nema ya. Piştî van hêrîşên li xweserîya kurdan a li bajarên wan, nîqaşkirina cudabûna kurdan ji tirkiya, rast û di cih de ya. Ya ku ji xwe, divê ku bibe û were nîqaşkirin jî ev a. Ji ber ku ji wê û pê de, ti tiştek din êdî nema ya. ….

**Di çerçoveya parastina hebûna civate kurd de ew xweserîya ku DTK´ê û gelek saziyên din ên kurdistanîyan denezend, rastî hêrîşên rejima tirk tê ji her aliyê ve. Vê yekê jî, divê ku mirov di dewama vê mijarê de em divê ku şîrove bikin û werênina ser ziman.**

Piştî ku DTK li hevdû dicivî û di **28´ê berfanbera 2015**´an de denezene xweserîya rêveberî a kurdistanê denezend, ji her aliyê ve hêrîşên rayadarên tirk û rejima tirk li wan destpkir. Her wusa, gotinên ku dihênina ser ziman, gotinên hêrîşkirinê na. Gelek nivîskarên tirk ku dem bi dem weke "dostên kurdan" jî bi nav dikin, dema ku mijar dibê mijara maf û azadîya civate kurd, nîjadperestîya wan, wan digirê û bidest hêrîşî kurdan dikin. Dostanî, nivîskarî, û heta ku mirovatîya wan jî bi ´nivîskarî´ya wan re heta sînorê kurdan a. Ji wê nabûhûrê. Di aslê xwe de, ew gotina "xate sor" ku car bi car bahse wê dihê kirin, di mejiyê van dordoran de jî, bi mirovatîya wan re heta sînorê kurdan a.

Yên ku bahse pêvajoya çareserîyê dikin û dibêjin ku divê ku bidomê jî, wê çawa hebûna civate kurd di çerçoveya tirkiyatiyê de bidina halandin û hebûna civate kurd bêstatû bidina hiştin di serê wan de heya. Her wusa, Gotinên Nivîskara tirk ezgî başaran ku dema ku xwesteka kurdan a xweserîyê şîrove dike û dibêje "nexweşîya xweserîyê", di sale 2011´an de ku kurdan xweserî denezendibû, hingî, pêşî Cengîz Çandar li hemberî wê derketibû û ew xweserîya ku di wê demê de kurdan bo xwe denezendibû, weke "şalataya gotinan" bi navkiribû hanî bîra min. Wusa dihê ditin ku ev nexweşîya ku Ezgî başaran weke ´neşxweşîya xweserîyê´ dihêne ser ziman weke gelek nivîskarên din ên tirk, di aslê xwe de nexweşîyeka mejiyê niviskarên tirk ku mirov divê ku li ser nîjadperestîtîya wan ya bi tirkitiyê û her wusa dîjminatîya wan ya li gelê kurd re werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku yên gotinên weke ´nexweşîya xweserîyê´ û ankû ´xîyanetê´ bi lêv dikin, di aslê xwe

de ew li hemberî nirxên mirovatiyê û pêşketina wê, xwediyê mejiyekî nexweş û di xîyanetê de na. Civate kurd, civateke ku dîroka wê heta serdemên şariştaniyê ên dema sûmerîyan diçêt. Lê çawa dibê ku dema ku kurdek di çerçoveya nirxên xwe de gotinekê bibêje û ankû bo parastîya civate kurd, hewldanekê bike, dibê xîyanet? Li vir, di serî de, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Yên ku vê helwesta kurd bi gotina ´xîyanetê´ dihênina ser ziman, di serî de di mejiyê xwe de hebûna civate kurd bi dîroka wê re înkar dikin û herkesekî weke "tirk" dihasibênin û li ser wê re vê gotinê dibêjin. Lê dema ku mirov rastîya vê gotinê bikolê, mirov fahm bike ku di temenê vê gotinê de zîhniyeta înkarker ya li hemberî civate kurd di temenê wê de heya.

Car bi car, rayadarên tirk jî, gotina "pêvajoyê" û ankû "çareserkirina pirsgirêka kurd" hanîna ser ziman. Li vir, divê ku mirov hinekî di çerçoveya vang gotinên ku di çerçoveya nîqaşên li ser ´denezene xweserîyê a DTK´ê re ku dihênina ser ziman re di rohnîya wan gotina de wan gotinên weke "pêvajoyê" û ankû "çareserkirina pirsgirêka kurd" û hwd hildina li dest. Yên ku di mejiyê xwe de û ankû di zihniyeta xwe de xweserîyekê jî ji hebûna civate kurd re pirr dibînin û wê weke ´nexweşîyekê´ û ankû ´xîyanetê´ dibînin, wê çawa pirsgirêka kurd çareser bikin? Di aslê xwe de, di vê çerçoveyê de denezene DTP´ê rastîya van gotinan a di serê rayadarên tirk de jî raxist li berçav. Da nîşandin ku ew nexwezin ku di çerçoveya radestkirina maf û azadîya civate kurd de pirsgirêkê çareser bikin.

Dema ku gotina "tirkiyatiyê" jî dihênina ser ziman, ne di çerçoveya di nava sînorê tirkiya de ku her xalk bi nirx û azadiya xwe re bijîn, wê dihênina ser ziman. Di çerçoveya zihniyeteka ku berê jî bi gotinêna weke "entegresyonê" de hanîbûna ser ziman, di çerçoveya ´asîmlekirina civate kurd û ji nirx, ziman, çand û dîroka wê dûrkirinê de vê gotinê dihênina ser ziman. T. Ardogan, dibêjê ku "van berê digot ku ´ ew dibêjin ku di çerçoveya tirkiyatiyê de wê sîyesetê bikin. Lê meyizênin ku tişta ku van kir, xweserîyê di denezênin." Yanî, gotina ´tirkiyatiyê´, bi zihniyeta ku wê çawa herkesekî bikina tirk û asîmle bikin, gotina ´tirkiyatiyê´ rayadarên tirk wê dihanîna ser ziman.

Wê çawa civate kurd tûna bikin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikin. Zimanê civate kurd qadaxakirina û nahêlin ku ti kesek bi zimanê kurdî xwe perwerde ûû binivîsêne. Her wusa di jîyane xwe ya asayî de bo kurdekê bi karhanîna zimanê kurdî, bo rayadarên tirk, ´xîyanet´ a. Bo rayadarên tirk, û nivîskarên wê ên weke Ezgî başaran ên bi zihniyeta

nîjadperest û faşîşt, xwestina xweserîya civate kurd û parastîya wê, weke ´nexweşîyekê´ ya. Ev mirov, bi wî mejiyê xwe yê nexweş, vê gotinê ji kurdan re dihênina ser ziman. Ev mirovên bi vî rengî, ti carî nikarin, bibêjin ku rêz û hûrmeta wan ji mirovatiyê û nirxên mirovatiyê re heya. Di çerçoveya zihniyetek kujar a rejimê a înkarker de hêrîşî kurdan dikin. Li gorî mejiyê van mirovên weke ku Ezgî başaran, kurd jî kî na ku doza maf û azadiyê dikin. Divê ku weke ku çawa ku rayadarên tirk gotina bijîn û îteatê bikin. Ev zihniyeta Ezgî başaran, zihniyeta DAÎŞ´ê jî ya. Ti farqê, vê zihniyeta Ezgî başaran û ya DAÎŞê ku bi wê hêrîş civate kurd kir û li şengalê bi hezaran şengalî qatilkir û li rojava û kobanê bi hezaran kurd qatilkir, ji hev tûna ya û ji wê ti farq tûna ya. Her wusa, zihniyet, heman zihniyet a.

Î ro, yên ku weke sedema şerê rejima tirk ê li kurdistanê li hemberî civate kurd, ´hendek´an dihênina ser ziman, divê ku mirov ji wan re werêne ser ziman ku ev rejima ku î ro wî şerî bi kurdan re dike, di destpêka komare tirk de jî li Zilanê û dersimê û bi sedan deverên din ên kurdistanê komkuji hanî li serê kurdan. Î ro, alikariyê dide DAÎŞê û wê dide hêrîşkirin li ser rojava. Her wusa, di roja me de rayadarên tirk li ser komên çete re hêrşî rojava dikin. Lê siba ku artişa tirk, weke ku çawa ku li bakûrê kurdistanê hêrîşî kurdistanîyan dike ku pêvajoyek şer li hemberî civate kurd da destpêkirin, wê temenê wê dîsa binivîsên mirovên weke Ezgî başaran û hwd wê were afirandin. Ji xwe, ji nûha de pêvajoyek hêrîş kirinê di fiîliyetê de li hemberî rojava dana destpêkirin.

Zihniyeta ku di mejiyê xwe de ti carî civate kurd weke civat nabînê û hertimî, dixwezê ku di nava tirkiyatiyê de bihalêne û herkesekî bi demê re bike tirk, î ro hêrîşî xweserîya ku saziyên kurdan li kurdistanê kirîya dikin. Ev hêrîşên ku di piretikê de bi artişê rejima tirk û hikimeta wê li Cizîra bota, Silopî, Nisêbîn, Kerboranê, Dêrka çîyayê mazî, Sûrê û hwd li kurdistanîyan dike, binivîsandinê jî mirovên weke Ezgî başaran û hwd, li denezendina xweserîya civate kurd dikin. Zihniyeta Ezgî başaran, ew zihniyeta ku li Farqîn, Sûr, Nisêbîn, Silopî û Cizira bota û hwd, hêrîşî kurdan dike û kurdan qatil dike ya. Di vê çerçoveyê de nivîsên xwe dinivîsênin. Nivîsênin ku denezendina xweserîyê weke ´nexweşîyê´ û ankû ´xîyanetê´ şîrove dikin, divê ku mirov ji wan re bibêje ku win ji civake tirk in û ew xweserîya ku ji wê re hatî denezendin, ne ji civate tirk re ya ji civate kurd re ya. Dema ku tu andamê civatekê bê û civatekî din ku ji ya cuda ku di çerçoveya hebûna xwe de xweserîyê denezêne û ankû ku serxwebûnê´ jî denezêne, çawa ji wê civate din re dibê ´nexweşî´ û

´xîyanet´. ..

Yên ku hebûna civate kurd înkar dikin û dikin ku wê ji dîrokê bibin, yên ku bi nirxên mirovatiyê re di nava xîyanetê de na, ew in. Yên ku pirsgirêka wan bi hebûna civakeka ji civake ku ew bixwe andamê wê na ku ji wê cuda ya, ew nexweş in. Yên ku li hemberî hebûna civateka din dijberî dikin û li dijî bidestxistina maf û azadîya wê na, ew hemû dîrok û nirxên mirovatiyê re di xîyanetê de na û nexweş in. Di aslê xwe de, dema ku mirov ji vê aliyê ve li mijarê binerê, ew mejiyê ku ji civate tirk bê û ku hebûna civate kurd ji xwe re weke "pirsgirêk" dibînê û pêşketinên nava civate kurd ji xwe re weke telûke dibînê û xweserîya civate kurd ya ku ji hebûna wê tê jî weke ´nexweşîyê´ û ankû ´xîyanetê´ dibînê, ew mejî mejiyekî nexweş û dij-mirov a. Ev meji, mejiyekî ku nesibê xwe ji nirx û wijdanê mirovatiyê negirtîya ya. Ev mejî, nikarê bahse wijdan û ahlaqê bike.

Î ro, di aslê xwe de dozên ku serdozggerên tirk ku ji sîyesetmederên kurd ên weke Salahadin Demirtaş re vekirîya ji ber denezendina xweserîya civate kurd, di aslê xwe de rastîya zihniyeta **tirk** a di çerçoveya gotina ´pêvajoyê´ de jî radixe li berçav. Ev rewş, dide nîşandin ku hertimî, li ser wê hizirîna ku wê çawa pêvajoya çareserîyê, di çerçoveyeka ku wê çawa bi wê civate kurd bêstatû bihêlin de li wê hizirî na. Her wusa, ev dozên ku li ser denezendina xweseriyê re ku ji sîyesetmederên kurd re hatina vekirin, rastîya zihhniyeta rejima tirk a înkarker jî radixe li berçav. Bo ku rayadarên tirk gotina ´pêvajoyê´ bikarbênin, divê ku ppêşî hebûna civate kurd weke civatekê nas bikin û rêz û hûrmetê ji wê re bigrin. Dema ku hebûna civate kurd nasnekin û bi ser wê de gotina ´pêvajoyê´ bikarbênin, ew êdî tenê dibê xapandinek û manipûlasyonek.

Ji xwe, ji ber ku rejima tirk û hikimeta wê pêvajoya çareserîyê dawî li wê hanî. Nivîskarên weke Ezgî başaran, li şûna wê, vê rastiyê fahm bikin û werênina ser ziman, dikin ku li ser rastiyên bi vî rengî binûxûmênin û her wusa aliyê kurd û civate kurd, heta roja me, dibin hêrîşên rejima tirk de ya dikin ku gûnabar bikin. Gelek Nivîskarên tirk, weke Ezgî başaran, weke ku çawa ku li ser çapameniyê re û bi nivîsandinê re dûrûst tevnegerîyan û rastîyên konsepta şer a rejima tirk ne nivîsandin û tenê xwestin ku hênceteke ji hêrîşên rejima tirk ên li kurdan re çê bikin û piştre bidest hanîna li ser ziman weke hêncetê "hendek" hanîn ser ziman, dikin ku nûha hebûna denezendina xweserîya civatî a kurdistanê jî, weke sedemek hêrîşan bidina ravakirin û werina ser ziman.

Her wusa, ew manipûlasyona ku li ser ´hendekan´ re kirin, vêca nûha dikin û dixwezin ku li ser denezendina xweserîyê re bikin. Dîsa zihniyet, heman zihniyet a.

Her wusa, dîsa gelek nivîskarên dikin, di vê çerçoveyê de hebûna civate kurd ji xwe re weke ´pirsgirêk´ dibînin. Heta roja me, ku ev şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd domîya bê, divê ku mirov werêne ser ziman ku ji ber ku van "nivîskarên tirk" temenê wê çêkiriya. Yanî, wan jî, bi rengê nivîsandina xwe, wê çawa asîmlesyona li ser serê civate kurd "meşrû" bidina nîşandin û her wusa şerê rejimê ê bi kurdan re çawa temenê wê çê bikin, li ser wê re gotin hanîna ser ziman. Gelekan ji wan, ev gotin, dibin maskeya ´demokrasiyê´ de hanîya ser ziman. Gelekan ji wan jî, weke rayadarên tirk, di bin maskeyên weke gotina "sazûmana civakî" de hanîna ser ziman. Yên ku bi vî rengî hanîna ser ziman, di bin maskeya ´rewşenbîrîyê´ de hanîna ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de temenê hêrîşan li civate kurd hertimî çêkirina û parastina. Win rojekê, rastî tenê nivîskarekî tirk jî nayên ku ew şerê rejima tirk ê ku li hemberî civate kurd meşşandîya ku şermazar kirîya. Tevî ku rewş ev bê, ev dordor jî, hertimî bi wê re meşkul bûna ku wê çawa gotinê bigihênina kurdan. Wê çawa li ser gotina re gotinê bibêjin. Hemû jî, di karin her roj navê ´kurd´ bikarhabênin. Lê dema ku bahse ´maf û azadîya civate kurd hat kirin, wê ti gotinê nebêjin. Her wusa, ji xwe, gotina ´hebûna civate kurd´, ji wan re weke gotinaka ku temenê hêrîşkirinê ya. Vê yekê ku bi awayekî vekirî neyênina ser ziman jî, bi derûnîyeka ku di vê çerçoveyê de hertimî nivîsên xwe dinivîsênin. Di vê demê de jî, piştî denezendina xweserîya civate kurd li bakûrê kurdistanê ku di civîna DTK`ê de di 28´ê berfanbara 2015´an de hat kirin, êdî di vê çerçoveyê de bi zihniyetekê û derûnîyekê bidest hêrîşê kirin.

Hêrîşên ku piştî denezendina xweserîyê ku nivîskarên tirk ên nîjadperest li kurdan û tekoşîna wan ya maf û azadiyê dikin, aliyekî wê yê din jî heya. Ev hêrîşên ku ew dikin, bo ku temenê hêrîşên din li kurdan ku bi rêya artişê bê û ankû bi rêya dozger û pergale dadê bê ku li kurdan bên kirin, ku temenê wan çê bikin in. Ji xwe, piştî van hêrîşên nivîskarên tirk ên di çerçoveya dijberî û dimijnatîya mejiyê wan ê li civate kurd, êdî bidest vekirina dozan li sîyesetmederên kurd kirin. Di vê çerçoveyê de ev nîqaşên ku di çerçoveya ´dijberîya li xweserîyê´ de ku nivîskarên tirk ên nîjadperest û bi zihniyetek faşîzane li ser gotina ´xweserîyê´ re dikin, di vê çerçoveyê de bo ku temenê dozên ku wê li hemberî siyesetmederên kurd li ser pergale dadê re vekin jî ya.

Têgîna xweserîya civate kurd, ne şaş û xelat a. Rast a. Hebûna civatekê bi wê dihê parastin. Civate kurd, weke civatekê xwediyê nirxên xwe yên teybet a. Civate kurd, xwediyê dîrok, çand, ziman û hemû nirxên xwe yên civatî ku ji yên civate tirk cuda ya. Her wusa, Nivîskare tirk Ezgî başaran, weke nivîskarek tirk, rast dibînê ku zimanê kurdî qadaxa bê û ew weke ku çawa ji civate tirk re dinivîsêne, bi wî rengî civate kurd jî, ji ziman û çand û nirxên dûrkevin weke yekî tirk bijîn û bi zimanê wê bixwênin û bibina tirk. Tirsa, di mejiyên bi vî rengî a vêşarî ew a ku civatek, weke civate kurd, wê xwe bi nirxên xwe û zimanê xwe pêşbixe û werêne ser ziman. Bo vê yekê, hertimî, rast dibînin ku civate kurd, bi zimanê tirkî û weke civate tirk ji nirx, ziman û çanda xwe dûrketî bijî. BO vê yekê, ti rêxistinî û ankû sazîyên ku hebûna civate kurd diparêzên ku ev xweserî jî bê, bo van mirovên bi vî rengî, hertimî weke ´nexweşîyekê´ û heta ku ´xîyanetekê´ ya. Ji wê pîstir, ahmaqtir û bêrûmettir ti tişt tûnaya ku mirovekî tirk û andamê civake tirk ku xweserîya civate kurd û pêşketina civate kurd bi mejiyê xwe re weke ´nexweşîyekê´ û ´xîyanetekê´ dibînê ya. Di aslê xwe de ya ´nexweşî´ û ´xîyanet´ ev a. Ya ku mirov dikarê weke nexweşîyekê û xîyanetekê werêne ser ziman ev a.

Yên ku î ro, hêrîşî denezendina xweserîya civate kurd dikin, ku werênina ser ziman jî û newênina ser ziman jî, bi mejiyê xwe re kuştina ku tê gûhê wan, ji wê xweşîyekê hîs dikin. Ev nivîskar û dordor, li ser hêrîşên ku rejima tirk û rayadarên wê bi artişa tirk û gelek hêzên teybet li Cizira bota, Silopî, Nisêbîn, Sûrê û hwd, ti gotinê nayênina ser ziman û nanivîsênin. Ji xwe, bi awayekî ku wê bi mejiyê xwe re "rast" û "meşrû" dibînin bêdeng dimênin. Zarokên kurd ên 3 heyvî tên qatilkirin. Jinên kurd ên ciwan û pîr, tên qatilkirin. Ciwanên kurd, ji ber ku kurd in tên qatilkirin. Wan qatilkirinan jî, weke ku heta roja me kirina, di bin "tekoşîna li dijî terorê" de kirina. Hebûna civatekê di vê çerçoveyê de tûna dikin li ber wê bêdeng in. Lê ku kurd, xweserîya didenezênin, weke gûrê har bidest hêrîşî wê dikin. Vêca ev mirov, wê siba bi navê xwe re bahse mirovatiyê bikin!

Xweserîya civate kurd, pîroz a. Ya ku dikeve ser her milê kurdî de ew a ku pêşbixin, gav bi gav wê pêş ve bibin. Divê ku ti hêvîyê ji rejima tirk nekin. Ku li tirkiya mijar dibê mijara kurd û civate kurd, demokrasî jî, dad jî, mirovatiyî û ahlaq û her tiştê bi navê mirovatiyê dawî lê tê. Li tirkiya her tişt, rewşenbîrî jî di nav de, sînorê wê heta kurdan a. Weke ku çawa ku mirovatî jî, sînorê wê heta kurdan bê.

Bêgûman, dibê ku ser vê denezene xweseriyê re raaydarên tirk bi polîs û leşkerên xwe û hemû hêza xwe re hêrîşên mazin li kurdan bikin. Dibêt ku hê gelek kurdên din jî bikujin. Dibê ku demek piştî vê dema ku du roj mana ku em bikina sale 2016´an de, ku hêrîşên hê maztir li rojava jî bikin. Dibêt ku artişa tirk bixwe, bidest hêrîşên mazin ên nû li rojava jî jî bike. JI gotinên nivîskarên tirk ên weke Ezgî Başaran, hinekî jî ev jî tê fahmkirin. Divê ku kurd, xwe ji van rewşan re jî amede bikin. Weke ku çawa ku li rojava pêvajoya hêrîşên DAÎŞê bi alikarîya tirkiya li civate kurd bû, li bakûrê kurdistanê jî î ro heman rewş heya.

Bêgûman, piştî şoreşa rojava, herêm ket pêvajoyek nû de. Her wusa, piştî wê re, çendî ku hêrîş bûn, bo ku wê pêşketina civate kurd a li rojavayê kurdistanê ji holê rakin kirin. Lê biserneketin. Her wusa, li bakûrê kurdistanê jî. piştî denezendina xweserîya civate kurd û pêşxistina parastina cewherî bi yekîneyên weke **"yekîneyên parastina sivilan**" jî, pêvajoyek nû destpêkiriya. Gelek dordorên ku weke Ezgî başaran ku gotina ´dostaniyê´ ji xwe re dikina maske û nêzî kurdan dibûn, maskeya wan jî dikeve. Ev pêvajo, pêvajoyek wusa ku rûyê herkesekî ê rast dide nîşandin a.

Xweserî, di çerçoveya ku civate kurd, saziyên xwe bixwe birêvebibe, ku bi zimanê xwe yê civatî ê kurdî perwerdeya xwe bibînê û her wusa parastina hebûna xwe bike hatîya pêşxistin. Di vê çerçoveyê de weke rêyeka parastina civate kurd û hebûna wê, xweserî hatîya pêşxistin. Li kurdistanê, xalkên din ên dîrokî, ên weke asûrî û hwd jî, ku bi wê karibin hebûna xwe biparêzên. Têgîna xweserîyê, di wê çerçoveyê de ya ku bi hevdû re ku rêz û hûrmet ji hebûna hevdû re bigrin a. Kurd, wilqasî bi erdem in ku çendî ku ewqas komkuji ji destê wê rejima tirk dîtina, dîsa bi wê re bahse jîyane hevbeş dikin. Lê andamên wê rejima tirk jî, li hemberî wê, wilqasî bêerdem in ku çendî ku serdest in, dixwezin ku hebûna civate kurd tûna bikin û wê tûnakirinê meşrû bidina nîşandin.

Li kurdistanê, her dordor, divê ku li hemberî hêrîşên rejima tirk ku bi tank û topan li kurdistanîyan dike bibina yek. Yekîtî, wê ji wan re pêşaroja wan werêne. Her wusa, wê kurdistana wan Azad bike ku di wê de bi azadî û di nava aşîtîyê de bijîn. Serkevtin, ya kurdistanê û gelê kurdistanê ya. ....

…

**Li ser ´plana jenosîdê´ a ku rejima tirk li ser serê civate kurd çêkirîya.**

**Li vir, dewama mijarê de divê ku mirov li ser ´plana jenosîdê´ a ku rayadarên tirk û reveberîya wê li hemberî kurdan çêkiriya û binetera wê di çapameniyê de hat weşandin jî, divê ku em li ser wê rawastihin. Gelek dordoran, ev plana jenosîdê, weke ´modela Sîrî-lanka´ bi navkir û hanî ser ziman. Li gorî, vê planê, wê di asta pêşî de, bajarên kurdan ên u rêveberîya xweser denezendina wê bi hêrîşên li wan bihetana kirin, wê bihetan valakirin. Di dewama wê de li gorî vê planê di asta pêşî de wê ser 10 hezarî re kurd bihetan qatilkirin. Û piştre jî, nêzî milyonekê kurd ji herêmên wan bihetan daban goçberkirin ji herêmên wan, bo ku hebûna civate kurd biheta kontrolkirin.**

Plana jenosîdê´ li ser serê civate kurd ku hatîya pêşxistin, hat eşkera kirin. Dema ku mirov li wê plana jenosîda ku li ser serê civate kurd were pêşxistin ku mirov li hûrgilên wê dinerê, pêvajoya jenosîdê a ku di dema komkujiyên zilanê de li ser serê civate kurd hatîya meşandin û di dema komkujiya dersimê de li ser serê civate kurd hatîya meşandin, dihêne berbîra me. Gelek hûrgilên wê, bi teybetî, di şibihê ya dema komkujiya zilanê. Di dema komkujiya zilanê de herêmên kurdan ji aliyê artşîa tirk ve dihatina dorpêçkirin û piştre dihatina tûnakirin û ji naqşeyê birin. Di planê de dihê gotin ku wê ser 7 û ankû 8 hezar kurd werina girtin. Ser 10 hezaran re kurd werina qatil kirin. Her wusa, wê nêzî 200 hezar kurd ji herêmên wan werina goçberkirin. Her wusa, ev jî, li demê hatîya belav kirin. Gotinên weke barkirina şrinaxê li cizîrê û ankû ên barkirina çolemergê li geverê jî, di dewama wê de divê ku mirov werêne ser ziman. Ev rewş hemû, bi du armancan tên kirin. Yek; bi ermanca şikandin û tafisandina civate kurd û vîna wê ya. Ya din jî, ew a ku bi leyistina bi demografiya civate kurd re ku dixwezin ku ancamê li gorî xwe û zihniyeta xwe li ser civate kurd re bidest bixin. Leyistikên bi leyistina demografîya civate kurd re, li ser zagonên weke ´zagona şerq û îslahatê´ û hwd re heta destpêka komara tirk diçin. Aliyekî gotinên weke ”ji nû ve avakirina Sûrê”, ”ji nûve avakirina Cizîrê” û ankû ”kirina cizirê di statûya bajarên mazin de”, ”kirina çolemerg û gever yek”, û hwd, bi hemû goçberkirinên din ên ku di vê demê de ji kurdistanê ji nava civate kurd didina kirin re ku dibin, leyistikên ku li ser demografîya civate kurd tên kirin in. Hasabên şikandina vîna civate kurd, ku bi leyistina demografiya wê hatina plan kirin in. Ji xwe, ji salên 1985´an û pê de, herêmên dervî bajaran ên weke gundan û hwd ên kurdan hatina vala kirin û gelek herêmên weke herêmên bersînoran hwd, hatina mayînkirin û heta

roja me jî, ew mayinkirin didomê. Ew mayînkirina qadên ku jîyane sivîl a gûndiyên kurd li wan hebû, bi armanca dana goçberkirinê bû. Ev goçberkirin jî, ji aliyekî ve weke planaka rejima tirk a ku bi wê dixwest ku demografîya civate kurd bide gûharandin di temenê wê de hebû. Piştî salên 1985´an û pê de, wê ji salên 1990´î û heta salên 1994´an û hwd, wê ser çar(4) hezar gundên kurdan re werina valakirin û vêrankirin ji aliyê hêzên rejima tirk ve. Lê bi wê goçberkirinê, valakirina gundên kurdan û vêrankirina wan re, ew ancama ku dixwest ku bidest bixe bidest nexist. Berxwedana civate kurd ne şikand. Piştre jî, di sale 2015´an, pêvajoya hêrîşên li bajarên kurdan ên weke li Cizîrabota, nisêbînê, silopî, farqînê, Geverê, Sûrê û hwd da destpêkirin û bi wê re xwest ku bajarên kurdan bide goçberkirin û li ser wê re demografîya civate kurd, ji nû ve li gorî xwe ku di bin kontrola wê de bê bi reng û awa bike. Bi teybetî, bajarên kurdan ên ku hê temenê çand, wêja û dîroka kurdî di wan de dijî, di vê çerçoveyê de rejima tirk ji xwe re kiribûbûna armanc ku wan tûna û vêran bike. Bi armanca xirakirin û vêrankirinê re û piştre ku digotin ku ´wê ji nû ve bi TOKÎ´yan ava bikin jî, dixwestin ku wê dîroka civate tûna bikin. TOKÎ, weke projeka rejima tirk ku bi wê li kurdistanê dixwezê ku dem bi dem mudahaleyê li demografîya civate kurd bike ya. Di vê çerçoveyê de ev sazî hatîya bi rêxistin kirin a. Çendî ku weke sazî û ´şerketên´ avakirina xanî û malan dihê dîtin jî, lê di çerçoveya demografîya civatî de weyn û rola ku ev dileyizê, ew a ku wê çawa gûharandinê di nava civatê de çê bike û temenê herêmê ê dîrokî tûna bike û li ser wê re ji nû ve avakirinê li gorî rejimê bike ku karibê kontrola xwe li ser civatê ji nû ve saz bike, di wê çerçoveyê de erkek wê heya.

Di aslê xwe de rastîya TOKÎ û wateya wê, ji aliyê kurdan ve jî bi tememî û bi başî ne hatîya dîtin û fahm bikin. Ev sazî, wê çawa civatê ji dîrok û kokên wê qût bike, di çerçoveya plansazîyeka bi vî rengî de kar û xabatê dike. Mirov, dikarê TOKÎ´yê weke lingekî şerê rejima tirk ê ku li ser artişê, pergela perwerde û ya dadê re dimeşênê re jî werêne ser ziman. Lê herî zêde TOKÎ, bi sazîyên sîyesetê ve girêdayî kar û xabatê dike û di çerçoveya gotina wan de kar û xabate xwe dimeşênê. Rayadarên hikimetê û rejimê ên payabilind, bi wan re rayadarên TOKÎ di têkiliyê de na û bi hevdû re di ahengekê de kar û xabatê dikin. **Hebûna TOKÎ´yê jî,** divê ku mirov di çerçoveya pêvajoyên jenosîdkirina civate kurd de ku rejima tirk heta roja me dimeşênê de weke lingê ku ji dîrok û kokê qûtkirinê jî wê werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de di bin gelek navan de saziyên bi vî

rengî ên ku hatina avakirin û hê jî tên avakirin, mirov dikarê bahse wan bike.

Li bajarên kurdan ên ku li wan hinekî kurdîtî heya, rayadarên TOKÎ´yê li wan hatina bierk kirin. Bi malbatên kurd re dikevina têkiliyê de û ji wan dixwezin ku di cih de malên xwe bifiroşina wan û ji herêmê goçbikin. Dibêjina wan, wê li şûna malên wan, avahiyên mazin û bilind werina danîn û çêkirin. Bi vî rengî, ji aliyekî din ve jî, kurdên ku naxwezin ku malên xwe bifiroşin jî, wê rastî zor û tûndûtûjîya rayadarên rejimê werê. Wê ji wan re bê gotin ku ´win li dijî sazûmana civakî serî ra dikin.´ Di vê çerçoveyê de wê herina bi ser wan de. Piştî ku rayadarên tirk ên weke Dawutoglu û T. Ardogan hanîn ser ziman ku wê li Sûna Sûrê, Cizîrê, geverê û hwd bajarên nû werina avakirin û pê de, rayadarên TOKÎ´yê jî bi avokatan re kom bi kom li malan digerîyan û zor didana malbatan ku malên bi firoşin û ji herêmê bar bikin û herin. Bi gotinaka din, wê çawa wan, ji koka wan qût bikin, sîyeseta wê li ser serê kurdan dimeşandin.

Bi teybetî, malbatên kurd, ku malên wan di ancama topbarana artişa tirk de hatî rûxandin, wê herina bi ser wan de û wê bi darêzorê bikin ku malên wan ji wan bistênin. Li bajarên kurdan, di vê çerçoveyê de hêrîşên artişê û hewldanên rayadarên TOKÎ´yê, di vê çerçoveyê de bi hevdû re di ahengekê de li herêmên ku li wan kurdan li berxwe dida didoma.

TOKÎ, ji sale 2005´an û pê de, bi awayekî vekirî zêdetirî hat xistin bajarên kurdistanê de. Bi teybetî, herêmên dîrokî, dihên kifşkirin û li wan TOKÎ, dixwest avahîyan çê bike. Berî hêrîşên li ser Cizîra bota, Sûr, Nisêbîn, Şirnax, Silopî, Gever û hwd ku bi wan re TOKÎ jî ket rojevê de TOKÎ´yê, xwestibû ku ´gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´ bi heman rengî tûna bike. Heta ku, daristanên gelek ji vê herêmê hatibûbûna birrîn jî. Xwestibû ku hemû daristana wê qût bike û li şûna wê avahîyan dênê. Her wusa, piştre ev hewldana xirakirin û ankû tûnakirina ´gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´ û hwd, wê bê mijara bertekên mazin jî ji nava civate kurd. Her wusa, divê ku mirov giringîya ´gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´, bi dîrokê re weke ya ´heskîfê´ û sûra amedê û birca belek a cizira bota kevn û giring werêne ser ziman. ´Gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´, xwediyê dîrokek kevn û demdirêj in. ´Gûlîstanên hewserê´ û ankû ´baxçeyên hewserê´, bûya mijar û ketîya nava rûpelên hemû pirtûk û têgînên pîroz ên dîrokî de jî.

TOKÎ´yê, di çerçoveyeka ku herêmên dîrokî ên ku koka wê bi pêvajoyên wê ên pêşketinê re dide nîşandin, ji xwe re dike ku armanc ku li ser wan avahîyan çê bike. Bi  vê rengê, bi çêkirina xanî û avahîyan, rayadarên tirk, hizirkirina ku wê dîroka herêmê ya civatî û kevn jî, di bin wê de bihêlê. Ji xwe, hemû hasab li ser vê rastiyê dihê kirin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku pirsgirêka rejimê û zihniyeta wê a bi kok û dîroka civat û xalkên herêmê re, di vê çerçoveyê de li ser TOKÎ û avahîyên wê yên ku li ser xirakirina herêmên dîrokî û kevn re ku dihê çêkirin re dihê xwestin ku were çareser kirin. TOKÎ, weke projeyeka ku di çerçoveya bi armanca jenosîdkirina civate û ku ji kok û dîroka wê qûtkirinê re ku hatîya pêşxistin a. Rastîya TOKÎ´yê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi mejiyê rejimê ê ku bi wê dixwezê ku hebûna civate di nava tirkiyatiyê de bi halênê û piştre herkesekî bike tirk re fahm bike û werêne ser ziman. Di çerçoveya pêvajoya demî a roja me ya jenosîdkirina civatê de divê ku miirov li TOKÎ´yê **bihizirê**. ..

Herî zêde TOKÎ´, bi ardhêja Wanê re derket li pêş. Di wê demê de jî TOKÎ, qaşo wê ji maxdûrên ardhêjê re avahîyan çê bike. Her wusa, di wê demê de jî malên bi hezaran kurdan ji destê wan standin û ew ji herêmê dana goçberkirin. Avahîyên TOKÎ ku çêkirin jî, maxdûrên ku piştre ji wan avahîyên ku çêkirina, ew jî li ser deynkirinê re dana girêdan. Di vê çerçoveyê de TOKÎ, wê ji kok û dîrokê qûtkirinê, di vê çerçoveyê de weke ”tiştekî baş” dikê ku bifiroşê mirovên herêmê.

Ji xwe, heta roja me, bi politikayên teybet ên rejimê, aborîya herêmê hatîya tûna kirin. Ne hatîya hiştin ku li herêmê pêşketinek aborî bi ti awayê were çêkirin. Projeyên ku weke ”projeyên pêşketina herêmê” ku dana nîşandin, projeyên weke di bin avê de hiştina herêmên weke heskîfê û hwd a. Her wusa, ji aliyê TOKÎ ve jî, herêmên herêmê ên dîrokî ku hatina kifşkirin ku wan di bin wan avahiyên ku çê bikin re de bihêlin, politika hatina meşandin. Li herêma Dersimê jî, zîyeretgeh û cih û warên pîroz ên civate kurd, di bin çêkirina bendavên ku çêkirina de hatina hiştin.Her wusa, bi dehan bendvanên ku li herêmên kurdan hatina çêkirin, cihên ku li wan bendav hatina çêkirin, cihên ji aliyê çand, dîrok û wêjeya herêmê ve ku giring in. Politikayên weke ên li ser TOKÎ re ku rejima tirk pêşxistina, di çerçoveya politikayên di bin avê de hiştina herêmên dîrokî ên weke heskîfê û hwd re di ahengekê de dihê meşandin. Hinek herêmên dîrokî, ên weke cihên pîroz ên civate kurd li herêmên dersimê, heskîf, sûr, birca belek û gelek herêmên din ên weke van giring, hatina armanc girtin. Tunakirina herêmên weke heskîfê, rejima tirk ji aliyê civatîya

herêmê ve li wê dinerê û pêwîst dibînê ku were tûna kirin. Ji ber ku ev herêmên çandî, wêjeyî û dîrokî, bîrhanînaka dîrokî û çandaka civatî û hwd bi xwe re dihawênin û diparêzên. Heta ku ev bijîn jî, wê weke ku temenê civatî a herêmê bijî. Bo ku ew temenê civatî nejî û were tûnakirin, di vê çerçoveyê de li ser politikayên şer re plan û stretejiyên tûnakirinê hatina pêşxistin. Dibêjin ku wê bajarên din li dora şirnax û cizîra bota ava bikin. Divêjin ku wê Sûrê ji nû ve ava bikin. Sûr, xwediyê dîrokeka kevn a ser 4 hezaran ve ya. Di dema hûrîyan de hatîya avakirin. Ketîya lîsteya UNESCO de jî weke ´mîreteya mriovatiyê´. Her wusa, çend ji wan herêmên giring ên weke Cizîra bota, Nisêbîn, Hezex, herêmên çolemerg û geverê, Sûr, farqîn û hwd in. Bi teybetî jî, ev herêmên teybet, bo tûnakirinê bi politikayên şer armanc girtina bo ku tuna bikin. Nûha, herêmên weke Cizîra bota, sûr, Nisêbîn, Gever û hwd, rayadarên tirk, dikin ku wan vala bikin. Bi tank û topan hêrîşî van herêman dikin. Piştre li ser çapameniyê re dibêjin ku emê ji nû ve ava bikin. Di vê çerçoveyê de bi vê politikaya şer ku bi topbaranên ku tankan dixûrîxênin û kavil dikin û piştre dibêjin ku ”emê ava bikin´”, divê ku mirov weke hêrîşek çandî a li dîroka civatê jî j vê aliyê xirakirin û ji nû ve avakirinê ve jî werêne ser ziman. Divê çerçoveyê de hêrîşa çandî û li nirxên dîrokî de divê ku mirov di bin avê de hiştina ´zaogma´, hewldana di bin avê de hiştina heskîfê, hewldana tûnakirina baxçeyên hewserê û hwd jî werêne ser ziman. Yanî, ev şerê ku di van rojên dawî de li hemberî civate kurd dimeşênê, ji aliyê wê kuştinê zêdetirî, aliyekî wê yê di çerçoveya hêrîşa çandî û li nirxên civatî de di vê çerçoveyê de werênê ser ziman. Politikayên li ser TOKÎ´yê re, ji vê aliyê ve di çerçoveya hêrîşa li nirxên civatî û çandî de divê ku mirov werêne ser ziman.

Berê, ku weke heskîfê dîrokî û giirng bû herêma ”**zaogma**” ku di bin avê de hat hiştin, bi gotina ku ”emê peykel û hêkelên herêmê emê barî muzexanê bikin re mirovên ku bertek didana nîşandin bêdeng kirin. Herkesek jî dizanî ku ew ”barkirina çend hêkel û naqşên zaogma li muzexanê, bi armanca pêşîya bertekan girtinê û şikandina wan bû. Heman politika bi heman gotina re li ser heskîfê re jî, hanîn ser ziman. Lê dema ku dîtin ku wê nikaribin, heman ancamê bidest bixin, êdî dev ji hanîna ser ziman a wan gotina berdan. Lê rejima tirk, ti carî dev ji armanca xwe ya di bin avê de hiştina heskîfê ne berda ya. Ji ber ku ew herêm dîrokek herêmê û civate wê, bi dîroka şariştanîyên ku li wê herêmê pêşketina re di xwe de dihawêne. Ya ku dihê xwest ku were ji holê rakirin jî, wê ev bê.

Dema ku mirov li herêmên ku dihên naqandin û ku TOKÎ li wan avahîyan çê bike ku mirov dinerê, miirov dibînê ku weke herêmên dîrokî na. Ankû, herêmên ku li wan di demên berê de ku şariştanî pêşketina na. TOKÎ, weke projeyeka ku bi wê ku rayadarên rejimê dixwezin ku rewşa jîyanî a civatî ku li herêmê heya ku wê tûna bikin û li şûna wê, rengê rewşa ku ew dixwezin ku wê demezrenênin a. Mirov, nikarê hebûna TOKÎ a li herêm û bajarên kurdan, tenê weke sazî û şirketeka ku avahîyan çê dike û hwd, bi wê re bi sînor werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, divê ku mirov weke sazîyek ku diçerçoveya politikayên rejimê de ku kar û xabetê di nava civatê de dike ya. Armanca TOKÎ a sereka, ew a ku civaknasîya civatî a herêmê a kurdî armanc digirê ku wê tûna bike ya. Ji xwe, di vê çerçoveyê de artişa tirk hêrîşî bajarên kurd dike û wan dixûrixêne û kavil dike û piştî wê re rayadarên tirk, derdikevin berçapameniyê dibêjin ku ”emê bi TOKÎ´yê bajarên nû li şûna yên ku hatina xûrîxandin ava bikin.”

Bi gotinaka din, mirov dikarê vê jî werêne ser ziman ku rayadarên tirk bi hêrîşên bi artişê re ku ew bajarên kurd bi hemû hebûna wan re armanc girtin û dikin bixûrêxênin û piştre, dikin ku TOKÎ´yê bixina wan bajaran de ku di dewama wê hêrîşa rejima tirk a bi artişê de ku rastîya wê herêmê ya dîrokî û civatî tûna bike û li şûna wê êdî li ser wê tûnakirinê re xwe ji nû ve weke ”rastîya herêmê” bidina avakirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov xûrîxandina artişa tirk a bi tank û topan, bi avakirina avahiyên TOKÎ re di çerçoveya zihniyeta rejimê de bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman. Her wusa, çendî ku em divê ku xûrîxandina artişa tirk û ji nû ve avakirina TOKÎ´yê di çerçoveyekê de bihevdû re hilde li dest, bi heman rengî, divê ku mirov xûrîxandina artişa tirk û ji nû ve avakirina TOKÎ´yê jî, bi heman çerçoveyê re bi qadaxaya ku rejima tirk û raaydarên wê danîna li ser zimanê kurdî re hilde li dest û werêne ser ziman. Bi wê re jî, di dewama wê de divê ku mirov xûrîxandina artişa tirk û ji nû ve avakirina TOKÎ´yê û qadaxaya li ser zimanê kurdî jî, bi hevdû re di çerçoveya şerê rejima tirk ê bi civate kurd re ê di çerçoveya bêstatû hiştina wê de hilde li dest. Di vê çerçoveyê de di ahengekê de wê ev rewş hemû bi hevdû re di çerçoveyekê werina dîtin û ser ziman.

Mirovekî ku ji dûr ve û ji derve li rewşa TOKÎ´yê binerê, wê bibêje ku ”mirovên ku bêmal û pêwîstîya wan bi xanî heya, ji wan re xanî û ankû mal çê dike. Ev rengê hizirkirinê, di aslê xwe de dibê maske ji van rastiyên politikayên rejimê ên bi rêya TOKÎ re ku dike bike meriyetê û bibê sêrî de. Dema ku em şerê rejimê ê jenosîdkirina civate kurd di biin

maskeya gotina ´terorê´ de dihê meşandin bi qadaxaya li ser zimanê kurdî re fahm nekê, wê rastîya TOKÎ, di çerçoveyek masûmane de xwe werêne li berçav. Ev jî, wê bê sedema ne fahmkirina rastiyê. TOKÎ, tenê rastîya politikeyek ji wan politikayên rejimê a ku bi wê dike ku mudaheleyî civate kurd, civaknasîya wê û hwd bike ya. Di vê çerçoveyê de bo ku li gorî rastîya xwe ya dîrokî civate kurd, bi civaknasîya xwe ya civatî a dîrokî re pêşnekevê, di vê çerçoveyê de di çerçoveyek ku ji kok û dîroka wê qûtkirinê re li ser TOKÎ´yê û hwd re mudahaleyê li hebûna civatê dikin. Armanca sereka li vir, wê ew bê ku bi mudahaleyên li demografiya civate kurd re ku civaknasîya wê re jî gûharînê li gorî xwe bidina çêkirin. Temenê vê rengê politikayê jî, li ser gotinên weke ku rengê pirsgirêkê ku di salên 1990´î de bi ne pêşketinê re dihanî ser ziman a. Zihniyeta ku sedema pirsgirêka civate kurd, weke sedema ne pêşketinê dihanî ser ziman, di vê çerçoveyê de xwe dide dîyarkirin. Yanî, li şûna naskirina hebûna civatê û statûya, li gorî mantiqê xwe ku weke ku bi wê dihizirê ku bixwezê hinekî pêşketinê li gorî xwe bide çêkirin û bi wê re pirsgirêkê ji holê ra bike. Zihniyeta ku ji aliyekî ve pirsgirêka kurd, weke pirsgirêka ”ewlakariyê” li wê dinerê, ji aliyê din ve jî li pirsgirêkê weke pirsgirêka ´li şûn mayînê´ û ankû ´pêşneketinê´ ku li wê dinerê, di vê çerçoveyê de li ser projeyên bi vî rengî re dike ku bi ji dîrok û koka wê qûtkirinê re dike ku li ser pirsgirêka kurd re ancamê bidest bixe.

Berê di destpêka salên 1985´an û wan de Turgut Ozal, digot ku ”pirsgirêk, pirsgirêka pêşketinê ya.” Bi wê re digotin ku ”pirsgirêk, pirsgirêka li şûn mayînê ya.” Bi gotina ”´pirsgirêka pêşketinê´ û ankû ´pirsgirêka li şûn mayînê´ re, qasta pêşneketinê dihat kirin. Bi gotinaka din, weke ku cardin wan dihanî ser ziman, dihat gotin ku ”rojhilat cahil maya, pirsgirêk ji wê derdiketîya û ankû derdikeve. Lê bi zanebûnî bê û ankû ne bi zanebûnî jî bê, ev gotin di çerçoveyeka ku li ser rasthatina ser ziman a pirsgirêka kurd jî digirt. Bi vê gotinê, pêşîya gotina ku kurd statûya xwe dixwezin jî digirtin û her wusa ya maf û azadîyê jî digirtin. Ne dihiştin ku bahse maf û azadiya civate kurd were kirin. Yên ku bahse maf û azadiyê dikirin jî, digotin ku ev ´**beşker**(´bölücü’) in.´ Gotina ´beşkerîyê´, bi wê pêşîya hemû nîqaşên ku di wan de navê kurd dihat ser ziman, bi wê pêşîya wan digirt. Bi wê re jî gotina ´terorê´ jî, weke maskeya ji hemû şerê rejimê ê li hemberî hebûna civate kurd, dihat bikarhanîn. Beremberî wê jî, di vê çerçoveyê de hikimetên dema Ozal, projeyên weke yên ”GAP”ê dihanîn rojevê. Di vê çerçoveyê de projeyên çêkirina bendevên bi navê ”ilisu” û hwd, dana destpêkirn. Projeyên di bin

avê de hiştina heskîfê hanîn rojevê û dan destpêkirin. Lê bi demê re dema ku rengê pirsgirêka kurd xwe da dîyarkirin, êdî yên ku ev pirsgirêk pêşxistin di serê xwe de bi xwe re ketin gûmanê de ku wê ancamek baş li gorî xwe bidest bixin. Di aslê xwe de TOKÎ, rengekî din ê van politikayên dema Ozal in ku di roja me de hatina rojanekirin û guncewkirin a. Li ser wê re, bi heman zihniyetê dikin ku ancamê bidest bixin.

Li vir, divê ku miriov vê yekê jî werêne ser ziman ku Ozal, dema ku dît ku wê bi van politikayan ancamê bidest nexê, xwest ku pirsgirêkê bi civatî çareser bike. Bo vê yekê, têkilî bi tevgera kurd û aliyê kurd re danî. Lê di nava rejima tirk de mirovên ku hê hêvî ji tafisandina tevgera kurd dikirin û bawer dikirin ku dema ku tevgera kurd tafisandin, wê êdî pirsgirêk jî were çareserkirin li gorî ku ew divin, êdî Ozal jî kuştin û pêvajoyek nû ya şer piştre li dijî civate kurd dana destpêkirin. Ji wê demê û heta roja me, rayadarên rejimê ku Dawutoglu û T. Ardogan jî di nava wan de ya, ev pêvajoya şer li hemberî civate kurd heta roja me hanîna. Bi wê re jî, li ser wê re dikin ku ancamê bidest bixin. Li gorî mantiqê van rayadarên tirk ên ku pêvajoya şer piştî ozal re li dijî civate kurd dana destpêkirin jî, ku tevgera kurd bişikênin, wê karibin bi pêvajoyên bişavtinê û ankû ´asimîlasyonê´ ancamê bidest bixin.

Heta demekê li ser cemaetê re bi malên ku bi wê di bin maskeya olê de dana vekirin, xwestin ku ancamê bidest bixin. Pêvajoyên şer, heta demekê li ser wê re dana destpêkirin. Piştre jî, li rex wê jî, hikimetên AKP`ê, projeyên bişavtin û ankû asîmilekirina kurdan pêşxistin. Bo ku ev projeyên bişavtinê û ankû asîmilekirinê herina sêrî, divîyabû ku civaknasiya civatê jî bi mudahaleyên ku li ser sazîyên weke TOKÎ û hwd re ku li wê dikin re gûharandinê bidina çêkirin. Di vê çerçoveyê de di serî de di aslê xwe de divê ku mirov TOKÎ´yê, weke beşek ji projeya rejima tirk a ji dîrokê birin û jenosîdkirina civate kurd jî bihasîbêne û werêne ser ziman.

Piştî sale 2013´an û pê de, dema ku rayadarên ”modela Sirî-lanka” dihanîn rojevê, li ser vê rewşê re di mejiyê xwe de xwediyê aqilekî bûn. Pêvajoya çareserîyê, dema ku hatibû dayîn destpêkirin, di destpêka wê de di cih de rejima tirk bidest birêxistinkirina vê plan û modela şer kir ku bi wê hêrîşî kurdan bike. Li bakûrê kurdistanê, li her deverê ji nû ve qarakol çêkirin. Weke ku ji nû ve kurdistanê dagir bikin, pêvajoyek leşkerîyê dan destpêkirin. Ji aliyê din ve jî, li ser DAÎŞê û hwd ve pêvajoyna şer jî li rojava, başûr û hwd jî bi rêxistin kirin. Di vê çerçoveyê de hizirkiribûn ku

wê ancamê bidest bixin. Hêrîşên rayadarên tirk, piştî pêvajoya hêrîşên li kobanê û rojava ku li bakûrê kurdistanê dabûbû destpêkirin, di vê çerçoveyê de plan û stretejiyên şer hatibûbûna çêkirin. Lê li dervî sînoran li başûr û rojavayê kurdistanê, tevî gelek zirar û komkujiyên mazin ên weke komkujiya şengalê û kobanê jî bi serneketin. Lê dîsa, li bakûrê kurdistanê, ew plana şer ku çêkirin, kirina fermiyetê ya û bidest hêrîşên li bajarên bakûrê kurdistanê bi tank û topan kirin. Pêvajoya hêrîşê li bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizîra bota,, Silopî, Nisêbînê, Farqînê, Sûrê û hwd, destpêkir. Bi wê re li bajarên din ên bakûrê kurdistanê jî, heman pêvajoyên hêrîşê **dan destpêkirin**.

Pêvajoya jenosîdkirina civate kurd, di vê çerçoveyê de di salên 2014´an de û hinekî berî wê, bi gotinên weke ên ´modela Siri-lanka´re hatibûbû ser ziman.`Modela siri-lanka´ çi bû? Ew jî, ew bû ku wê hêrîşî bajaran bikiran, bajara bi artişê bihatan dorpêçkirin, wê tevkujiyên bikomî ku di wan de bi hezaran kurd, bihatinan qatilkirin wê bihata kirin,wê çapamenî bi heta bêdeng kirin û hwd. Bi wê re jî, wê çapameniya dewletê wê ti komkujiyên ku dihatina serê civate kurd, wê ne hildaba rojeve xwe. Bi wê re jî, wê di her aliyê de hêrîşêk li civate kurd bikiran. Wê dîmanikên civatî ên civate kurd, hemû bihatan armanc girtin û tûna kirin. Di vê çerçoveyê de planaka jenosîdkirina civate kurd, tê gotin ku di êlûna 2014´an de hatîya amede kirin. Piştre bi dorpêçkirina bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, şirnax, nisêbîn, silopî, farqîn, sûr, gever û hwd, ku hemû bajarên din jî di nav de wê bêt pêşxistin. Bo ku întîbayekê cuda jî bide rayagiştî û cihane derve jî, wê bi gerên li kurdistanê ên ku navê ”hevdîtina biratiyê´ li wan dikin re, wê manipûlasyonê bikin û hewl bidin ku pêşîya dîtina rastiyê bigrin. **Gera dawutoglu a di destpêka sibate 2016´an de ku ew li kurdistanê dike û diçê mêrdinê û piştre artuklu´yê û bi axiftina xwe ya li zanîngeha li artuklu´yê ku dike re, wê di vê çerçoveyê de li ser wê re manipûlasyonê bikin û dîmenekî derewînî bikin li berçavê cihanê bidina nîşandin. Lê bi wê re jî, wê şerê we yê şikandina vîna civate kurd jî, wê bi wê re bidina domandin. Axiftina ku dawutoglu di vê gera xwe de li zanîngeha artuklu´yê kir, dida nîşandin ku planaka pirr-alî a ku bi wê dixwestin ku vîna kurdan bişikênin, hikimeta tirk amede kirîya.** Her wusa, ev dema ku bahse wê dihê kirin jî, rastî wê dema ku di wê demê de berxwedana kobanê hebû bû. Bi wê re jî, ku bakûrê kurdistanê li ser pîyan bû û serhildan dikir.

Di rojên weke 7 û ankû 8 êlûna 2014´an de hemû kurd û kurdistanî li

ser lingan bûn. Her wusa, piştî ku bi awayekî vekirî di çerçoveya berxwedana li kobanê de hemû kurdistanî li her deverê rabûna serpîyan, gotinên weke ´parastina sazûmana civakî´ ji devê serokwezirê tirk Dawutoglu dihatina ser ziman. Di wê demê de sazîya sazûmana civakî´, biqasî ku tê gotin ku di vê demê de raporekê amede dike. Ev rapor, di çerçoveya planaka jenosîdkirina civate kurd de dihê amede kirin. Piştre ev rapor tê civîna hikimetê a wê demê û di wê de dihê herêkirin û piştre di dewama wê de wê artişê jî li gorî wê amede bikin û pêvajoyê bidina destpêkirin. Her wusa, dorpêçkirina bajarên kurd, êdî bi wê re dihê pêşxistin. Hêrîş, bajar bi bajar li kurdistanîyan dibin. Li Cizîra bota, Silopî, Sûr, Nisêbîn, Gever, Farqîn û hemû bajarên din ên bakûrê kurdistanê, hêrîş li wan dihên kirin. LI hemberî van hêrîşan ew hendekên ku kurdan bo xwe parastinê çêkirina, li ser wan re, bi awayekî plankirî nîqaşê didina kirin û weke ku sedem tenê ew hendek bin, nîqaşê dikin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku plana jenosîda civate kurd ku rejima tirk û hikimeta wê ya vê demê amede kiriya, divê ku mirov di çerçoveya wê de werêne ser ziman ku hemû hêrîşên ku li kurdan dibin, hatin pêşxistin. Her wusa, weke ku çawa berê, gundên kurdan dihatina şawitandin û valakirin, î ro, reng gûharandîya. Î ro, bajar dihên vêran kirin û valakirin. Her wusa, goçberkirina kurdan ji bajarên kurdan, mirov dikarê di çerçoveya zihniyeteka ku kurdan di wergehna de werin girtin, mirov werêne ser ziman.. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman, bo ku kurdan bike bin kontrolê de hertimî ji herêmên kurdan ew li herêmên rojava ên tirkiya dana goçberkirin. Di vê çerçoveyê de hêrîş dihên kirin. Hêrîşên DAÎŞê bi armanca goçberkirina kurdan ji rojava û valakirina rojava, di vê çerçoveyê de bi zihniyeta rejima tirk, mirov dikarê werêne ser ziman.

Li vir, wusa dihê dîtin ku lingekî din ê vê plana jenosîdkirina civate kurd heya. Di serî de hemû ´muhatabên ku dikarin li ser navê civate kurd gotinê bibêjin û muzaakareyan di çerçoveya çareserkirina pirsgirêka kurd bikin, wê wan tûna bikin. LI şûna wan jî, çend ´kurd´ên ku qaşo li aligirên wê na, wê derxin û wê bibêjin, ev muhatabên me na. Yanî, pêşî xalkê bitafisîne û bi wê re tekoşîna civate kurd a maf û azadiyê ku karibê derbe lê bixe û bişikêne û bi wê re êdî van ´kurdên´ xwe yên ku weke ´muhatab´ derxina pîyasê. Li ser wan re gotinê bibêjin. Ji ber ku rejima tirk, ti carî naxwezê ku di çerçoveya naskirina statûya civate kurd de maf û azadîya wê nas bike. Ev kurdên ku dxwezin ku wan derdixina li pîyasê, wê kurdna ku di çerçoveya bêstatûya civate kurd de sîyesetê bikin û doza

maf û azadîyê nekin bin. Her wusa, divê ku mirov van aliyên tûnakirina muhatabê rast ên civate kurd û tafisandina civate kurd û li ser wê re û li ser bêstatûya civate kurd re kurdên ku wê sîyesetê bikin, wê bikin derxina li pîyasê. Ev rastî hemû jî, di çerçoveya plana jenosîdkirina civate kurd de ev hatîya plankirin. Yanî, her kurdên ku dengên xwe derxistina hatina tafisandin.

Hêrîşên ku li civate kurd dihên kirin, gelek rêbazên hovana di wê de hatina bikarhanîn. DI destpêka hêrîşên ku li civate kurd dibûn de, hêrîşên ku leşker û polîsên tirk ku li gorîstanên kurdan dikirin jî, divê ku mirov di çerçoveya vê plana wê de werêne ser ziman. JI ber ku hebûna civate kurd hatîya armanc girtin, di vê çerçoveyê de hemû nirxên civate kurd bi awayekî hovane hatina armanc girtin. Bi wê re jî, di pêvajoya hêrîşln leşker û polîsên bajarên kurd ên weke silopî, cizira bota, Nisêbîn û sûrê û hwd, di wê de jî, weke ku çawa ku hêrîşî goristanên kurdan dikirin, hêrîşî kurdan dikin. Her wusa, bi dehan ciwanên kurd, hatina qatilkirin û cenezeyên wan, derfet ne hatîya dayîn ku werina defnkirin. Kurdan, cenezeyên ciwanên xwe di deverên cemidî de dihiştin bo ku xira nebin. Her wusa di pêvajoyek bi vî rengî di bûhûrtin. Weke ku çawa ku li Silopî, dayikek kurd ku dayika 6 zarokan a, dikujin û nahêlin ku 8 rojan ji devê deriyê wê were hildina. Li ser serê wê ´sekvanekî´ bicih dikin, yên ku diçin ku cenezeyê wê dayika kurd hildin, gûleyan li wan dibarênin û wan dikujin.

Her wusa, ev rengên hêrîşên ku mirov nikarê bi ti nirxên mirovatiyê re werêne ser ziman, wê weke hêrîşna ku bi armanca şikandina moralê civate kurd bin. Her wusa, hemû nirxên civatî ên ku civate kurd ji wan moralê digirê, dikina bin hêrîşan de. Di vê çerçoveyê de planaka giştî ku bi wê jenosîdê li ser serê civate kurd bikin amede kirina. Her wusa, di vê demê de bineter û dokumentên ku derdikevina li holê, bi awayekî vekirî û bi fermî didina ravakirin ku rejima tirk jenosîda civate kurd ji xwe re kirîya armanc.

Di destpêka pêvajoya çareserîyê de çendî ku tevgera kurd ´agirbest´ denezend û pê de, rayadarên tirk bi dest çêkirina karakolên mazin li herêmên kurdan kirin. Her wusa, bi wê re jî, nîqaşên ´çekberdanê´ dabûbûna destpêkirin. Piştre jî, pêvajoyên weke ´pêvajoyên bi rêxistin kirina DAÎŞê hatina birêxistin kirin. Pêvajoya çareserîyê, bo ku rêxistin û ankû pêvajoyên weke DAÎŞ´ê birêxistin bikin û biajona biser kurdan. Piştre jî, pêvajoya hêrîşên DAÎŞê li rojavayê kudistanê û başûrê kurdistanê li hemberî civate kurd hatina pêşxistin. LI şengalê û kobanê,

komkujiyên ku di wan de bi hezaran kurd hatina qatilkirin kirin. Bi wê re jî, bi milyonan kurd ji herêmên wan dana goçberkirin. Ev hêrîş û komkuji û goçberkirin, di çerçoveya planakê de hatibûbûna pêşxistin. Di aslê xwe de, ew plana jenosîdê ku tê gotin ku rejima tirk li hemberî civate kurd pêşxistîya û di êlûna 2014´ê de hatîya çêkirin û belgeya wê derket li holê, di wê belgeyê de jî, çerçoveya hêrîşên DAÎŞê ên li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê hatîya çêkirin. Di wê belgeyê de ne tenê kurdên bakûrê kurdistanê û hêrîşên li wan di wê de dihên plankirin. Her wusa, hêrîşên ku li ser DAÎŞê re li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li başûrê kurdistanê hatina pêşxistin jî, di wê de çerçoveya wan hatîya pêşxistin.

Dema ku mirov tenê vê plana rejima tirk a bi armanca jenosîdkirina civate kurd, tenê di çerçoveya hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê û bi teybetî li 7 û ankû 7 bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Silopî, Sûrê, Farqîn û hwd re werêne ser ziman, wê pirr tang bê û kêm bimêne. Her wusa, hêrîşên ku di vê demê de li van bajarên kurdistanê de dibin, tenê aliyekî vê plana jenosîdkirina civate kurd diafirêne. Tenê lingekî wê dihêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bi wê re jî, werêne ser ziman ku hemû beşên civate kurd û hemû herêmên kurdistanê ku bakûrê kurdistanê jî, rojavayê kurdistanê jî û başûrê kurdistanê jî di nav de hatina xistin çerçoveya hêrîşên vê plana jenosîdkirina civate kurd de. Bi teybetî, ji ber çi gîranîya hêrîşan li van hersşê beşên kurdistanê ên weke rojava, başûr û bakûrê kurdistanê bû? Ji ber ku li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê rêveberîyên kurdistanî ku hatina avakirin hena. Di serî de ev herdû herêmên kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurdistanî hatina avakirin, kirina armanc. Bo vê yekê ya ku DAÎŞê bi teybetî, ev herêm kiribûbûna armanca hêrîşên xwe. PIştre jî, asta pêşketina civate kurd li bakûrê kurdistanê û pêşxistina temenê statûya civate kurd û rêveberîya xweser a kurdistanî ku pêşketîya bi van hêrîşan ku ji holê rabikin. Ji ber vê yekê ya ku bi teybetî ev hersê herêmên kurdistanê kirina bin hêrîşan de.

Bi vê re divê ku mirov vê yekê jî, bin xat bike û werêne ser ziman ku hemû hêrîşên ku li civate kurd dibin ku li bakûrê kurdistanê bê, ku li rojavayê kurdistanê bê û li başûrê kurdistanê bê, di civîna lijneya bilind a tirk a bi navê `MGK´ê de dihên nîqaşkirin û plana wan dihên derxistin. Li ser wan hêrîşan û ancamên wan ên ku dixwezin ku bidest bixin jî, hertimî nîqaşê pêşdixin. Ev jî, dide nîşan dikin ku ti hêrîş û rengên hêrîşî ku li civate kurd dibin, mirov nikarê bêplan werêne ser ziman. Hemûyan, divê ku mirov biplanekê û di çerçoveya planakê de werêne ser ziman.

Rejima tirk û rayadarênn tirk, çend ku dibêjin ku "em bi hevdû re weke bira na", "ev hezar sale ku em bi hevdû re na," "wê ti kes, nikaribê yekîtîya me xira bike û me ji hevdû cuda bike" jî, weke gotinên ku bi wan li ser van pêvajoyên jenosîdkirina civate kurd dinûxûmênin. Divê ku mirov van gotinan, di vê çerçoveyê de weke gotinên ku bi armanca ku ser ppêvajoyên jenosîdkirina civate kurd binûxûmênin, werênina ser ziman. Wekî din, ti wateya van gotinan di rastiyê de û di jîyanê de tûna ya. Ji xwe rejima tirk, ti carî, kurdan bi zihniyeta xwe, di wê çerçoveyê de nabînê. Her wusa, gotinên weke "biratiyê" di vê çerçoveyê de jî bûna weke gotinên xapandinê. Dema ku li bakûrê kurdistanê rejima tirk, ji ber ku hebûna civate kurd tûna bike û ji dîrokê bike hêrîşên pirr mazin bike û rojavayê tirkiya û çapameniya wê li hemberî wê bêdeng bê, ti kesek nikarê bahse biratiyê bike. Yên ku bahse wê bikin ku kurd jî bin û tirk jî bin, bi armanca xapandinê bikardihênin. Di çerçoveya gotina "biratiyê" de ne di demên osmaniyan de û ne jî di demên komare tirk de, mirov nikarê ti piretikê û ankû kirinê bike. Civateka ku hebûna wê bo tûnakirinê ku were armancgirtin ku li ser wê re gotinên weke "biratiyê" û "em bi hevdû ra hezar sale dijîn" ku werênina hanîn li ser ziman ji aliyê wê rejima tirk ku wan hêrîşan dike ve, tenê bi armanca xapanndinê mirov dikarê wan werêne ser ziman.

Li vir, di serî de divê ku kurd vê gotina "biratiyê" baş fahm bikin û derxistina têgihiştinê. Ji ber ku heta roja me li ser vê gotinê re hertimî mirovatiya wan û hêstên wan ên mirovî hatina îstismarkirin û bi wê ew hatina xapandin. Di serî de dema ku bahse gotinên biratiyê dihê kirin, divê ku li kirinê binerin. Ku di kirinê de zimanê civate kurd hatibê qadaxakirin, rejima tirk li hemberî statûya wê şer dabê destpêkirin û hêrîşan li hebûna wê bike bê, wê çaxê, ew ne biratîya. Ew gotinên biratiyê, weke gotinna maske na. Weke ku çawa ku di sale 2000´an de oparasyon li nava zindana kirin û di wê de ser 200 mirovî qatilkirin û piştre navê wê oparasyona ku bi wê komkuji kirin kirina "oparasyona wergera li jîyanê", divê ku mirov gotinên wê yên bi navê ´biratiyê´ û hwd jî, di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, li ser gotinan re çawa ku oparasyonên têgihê dihên kirin, mirov dikarê ji ve gotina "oparasyona wergera li jîyanê" û her wusa gotina "biratiyê" a ku rayadarên tirk li hemberî kurdan bikardihêne, bi wan re fahm bike. Ev di serî de oparasyonên têgihêna ku bi wan nirxên mirovatiyê, dihên îstismar kirin in. Gelo sedsalê piştre, hinek dema ku vê gotina "wergera li jîyanê bibihîzîn wê, wê bibêjin ku rejima tirk bi rastî li gorî wateya vê gotinê

xwestîya ku jîyane wan mirovan biparêzê ew oparasyonên komkujiyê kirîya? Bêgûman, ji xwe, bo ku di demên piştre ev were gotin, ev nav li wê hatîya kirin. Lê li mejiyê wan mirovên sedsalê piştre jî, wê ev gotin, wê weke gotinaka ku oparasyona têgihê li mejiyan dike û ku bi wê rastiyê beravajî dike û sernûxûmêne wê bibe. Du mirov û ankû civat, ku bi rastî hêsta biratiyê hebe, ti carî, wê yek li hemberî ya din planên jenosîdê pêşnexê. Wê ti carî, dîroka xwe nekê dîroka komkujiyên ku hanîna serê wê civatê. Ku ev kiribê, ev gotin, tenê bo xapandinê na.

Her wusa, di destpêka şerê vê demê ê rejima tirk ê bi kurdan re de jî, gotinên weke "parastina sazûmana civakî" hatibûbûna ser ziman. Î ro, em dibînin ku di vê wateya van gotinan de, ev planên ku biarmanca jenosîdkirina civate kurd ku î ro belge û dokumentên wê derdikevina li holê hatîya hanîn li ser ziman. Yanî, li vir, di serî de divê ku mirov rastîya mejiyê ku bo jenosîdê planan çê dike, baş fahm bike. Plana rejima tirk a ku tê gotin ku di êlûna 2014´an de hatîya çêkirin a bi armanca jenosîdkirina civate kurd, her wusa, di vê çerçoveyê de jî, gotinên weke ´biratîyê´ dihêna hanîn li ser ziman. Lê ev gotin, hemû jî, bo ku rastîyan beravajî bikin û bi wê re jenosîdkirinê bidina domandin, dihên kirin. Her wusa, ev gotin, bo ku rastiyê, beravajî bikin jî dihên gotin.

…

**Komkujîyên weke omkujiya Roboskî hanîna serê civate kurd li kurdistanê, di çerçoveya têgîna rejimê a kirina jenosîda kurd de hatîna kirin.**

Komkujiya roboskî di 20´ê berfanbara 2011´an de bi kombardimana balafirên şer ên artişa tirk hatibû kirin. Ev komkuji, komkujiya di ancama bomabardimana balafirên şer ên artişa tirk de hat kirin, heta roja me jî, êşên wê zindî na. Di seatên ku komkuji hatibû kirin de civîna lijneya bilind a tirk ya bi navê "MGK" dihat li darxistin. Piştre jî, derket li holê ku ev komkuji, biryara wê di vê civînê de hatibû girtin. Komkujiya roboskî, di rojên ku bû de rayadarên tirk, pirr zêde bo ku wê şîlo bikin di çapameniyê de gotin hatina gotin. Heta ku qatilên kurdan ên weke T. Ardogan ku di wê demê de serokwzir bûn û î ro serokkomarê tirk in, bixwe jî derketina berçapameniyê û di wan rojên ku nîqaşên ´jibergirtin(´kurtaj´)a zarokan" di rojevê de bû, şibendinek bi wê re kiribû û gotibû, her ´ji bergirtinek,, roboskîyek a."

Ji wê demê û heta roja me, gelek gotin li ser komkujiya roboskî hatina gotin. Her wusa, em î ro di sale 2015´an de dijîn û sê roj mana ku emê

bikevina sale 2016´an de. Lê hê jî, êşên vê komkujiyê zindî na. Bi ser ve jî, ji wê demê û heta roja me, komkujiyên din, rejima tirk bi polîs û leşkerên xwe hanîna serê civate kurd. Piştî komkujiya roboskî û bûyîna û heta roja me, hema bêja deverek kurdistanê nemaya ku komkuji li wê ne hatina kirin.

Di wan rojên û heyvên ku di wê de komkujiya roboskî bûbû û êşa komkujiya roboskî zindî ya, pirr li ser wê axiftin û xwepêşandin bo wê bûn. Rayadarên tirk jî, bo ku pêşîya xwepêşandinan bigrin, hanîna rojevê ku "li meclisê komisyona lêkolîna roboskî hatîya avakirin û wê raporekî amede bike." Ti kurdî hêvî ji wê komisyonê ne kirin. Her ku kurdan xwepêşandin li derxistin û bertek li ser vê komkujiya hovane didana nîşandin, rayadarên tirk, digotin ku "li bendê rapora komisyonê bin." T. Ardogan bixwe jî, ev gotin dihanî ser ziman. Bi wê komisyonê re saziyên sivîl, zor dan ku li dadgehê jî "doza roboskî" were vekirin. Çend ku ti kesek ne li bendê û hêvîyê jî bû ku wê biryarek bidadî were dayîn jî, xalk li bendê ma. Lê piştre derket li holê ku ev doza ku hatibû vekirin jî, bi armanca tafisandina bertekên civatê ên li hemberî hikimeta tirk bû.

Dem bi ser ve çû û komisyona ku li meclisê hatibû avakirin, rapora xwe amedekir û ji rayagiştî re hanî ser ziman. Lê tevî ku dewletê û hêzên dewletê ew komkuji kiribû, wê çawa dewletê paqij derxin, di wê raporê de gotin hatibûbûna ser ziman. Yanî, weke ku ji nava gel, mirovan digot, "rapor, rapora sernûxûmandinê bû." Wusa jî bû. Rejimeka ku heta wê demê komkuji hanîna serê civate kurd û dihizirê ku piştî wê komkujiyê jî komkujiyên nû were serê civate kurd, wê çawa rastîya kirina komkujiya roboskî werêne ser ziman. Di nava rûpelên rojnemeyan de nîqaş dana destpêkirin. Wê çawa ser binûxûmênin û wê çawa mejiyê mirovan bikina gûmanê de, di wê çerçoveyê de nivîs di rojnemeyan de dinivîsandin. Nivîsna, wusa dnivîsandin ku mirovên ku ew dixwandin, ji xwe re bi mejiyê xwe re diket gûmanê ku bibêje ku dewletê ew komkuji kirina. Çapameni, di her demê de di çerçoveya sernûxûmandinê û beravajîkirina rastîyan de pirr zêde bikardihanîn. Di komkujiya roboskî de jî bikarhanîn.

Rêbazên ku rayadarên tirk bikardihênin, hertimî, komkujiyan bike, û li ser wê komkujiyê re hinekan din gûnahbar bike û her wusa li ser wê re înkar bike ku dewletê ew komkuji kirîya. Înkarkirin, weke rêbazeka ku hertimî rejima tirk di komkujiyên ku li ser serê civate kurd kirina de bikarhanîya ya. Minaq, komkujiya kortekî a li gundê herêma ranya a başûrê kurdistanê de, dîsa balafirên şer ên tirk kiribûn. Lê tevî ku ew kiribûn jî, ji navenda artişê bixwe, ragihandibûn ku "wan, komkuji

nekirîya." Her wusa, ev rêbaz, ji ber çi bi vî rengî, bkarhanîn? Bo ku di demên pêşarojê de ku mirovan li ser wan komkujiyan axiftin kir û ankû gotin hanî ser ziman, dewlet di wê de rêbaze xwe ya înkarê bicih bike bû. Dikir jî. Yanî, înkarkirinên di roja me de li ser komkujiyên ku dikirin re dimeşandin, weke gotinna ku bo pêşarojê digotin bûn.

Minaq, di sale 2000´an de komkujiyên ku di zindanan de kirin, piştre navê "wergera li jîyanê" li wê kirin. Mirovekî ku piştre li vê gotinê nerîba, wê bigota ku ´raaydarên dewletê bo ku jîyanê xilas bikin ew oparasyon kirina." Lê ev ne rast bû. Ji ber ku ya ku wê tenê di pêşarojê de maba, wê ew gotin ba. Vêca wê çawa di wê gotinê de xwe baş bikina nîşandin û ankû wê rastî beravajî kiriban, di wê çerçoveyê de ev gotin bi vî rengî dihatina hanîn li ser ziman. Di roja me de kurdan, navê rêbaze bikarhanîna çapameniyê kiribû "şerê teybet" û ankû "şerê derûnî". Lê rastî ji wê zêdetir bû bi vê gotinê re.

Minaq, yekî ku di salên li pêş de ku li ser komkujiya roboskî binerin, wê li wê rapora komisyona meclisê binerin û wê bibêjin ku bi vî rengî bûya. Wê bi wê raporê di çerçoveya gotinên ku dewletê ´paqij´ derdixin wê biaxifin. Ya ku vê ji aliyekî din ve temem dike jî, ´doza roboskî´ a ku di dadgeha rejima tirk de di sale bûhûrî de bi "biryara neşopandinê" biancam bûbû. Mirov dikarê vê dozê, bi şibandina dozeka din re jî werêne ser ziman. Her wusa, ew a ku doza ku di wê de Cemal Temizoz ku destê wî di qatilkirina bi sedan kurdan de heya, çend roj berî qatilkirina Tahir Elçî ku bi "biryara baraatê" hatibû bi ancam kirin. Di ti demên dîrokê de dad û dadgeh wilqadî pîs û lewitî û qirêj ne hatibû bikarhanîn.

Tenê ku mirov di çerçoveya dema dîroka komare tirk de jî bihizirê, rejima komare tirk, bi sedan komkuji hanîna serê civate kurd. Zimanê kurdî qadaxa kiriya bo bi tememî mirovên kurd asîmle bike û civate kurd ji hevdû belav bike. Komkujiya roboskî, tenê komkujiyek ji wan bisedan komkujiyên ku rejima tirk hanîya serê civate kurd a.

Komkujiya roboskî, bi rapora komisyona meclisê a ku bi şêwayekî paqij derxistina rayadarên dewletê û sernûxûmandinê û biryara doza roboskî a ku di çerçoveyê de hatî dayîn re komkujiya roboskî ji rojevê hat derxistin. Her wusa, di rojên ku rayadarên pirr zêde dixwestin ku komkujiya roboskî ji rojevê derxin de, kê bahse ´komkujiya roboskî´ dikir de, wê rayadarên tirk û gelek mirovên ku xwe weke ´nivîskar´ bi nav dikirin, digotin ku "çima tenê win bahse komkujiya roboskî dikin." Bi vê gotinê, ji kurdan dixwestin ku êdî ti kesek li ser komkuji

neaxifê û komkuji weke kaderê were dîtin û êdî wê herê bike. Yên ku di her salwegera komiujiya dersimê de jî, bahse komiujiya dersimê dikirin, ji wan re digotin ku êdî "wê li şûn xwe bihêlin, rûpelekî nû li pêşîya xwe vekin." Rêbazên sernûxûmandinê bi van re ne bi sînor bû. Zêdetir jî hebûn...

Minaq, dema ku bahse komkujiya ermeniyan dihat kirin, dihat gotin ku "dîrokê ji dîrokzanen re bihêlin, bila sîyesetmeder wê ne kina rojava xwe û parlament li ser wê neaxivin." Bi vê hizrê, digotin ku "emê arşîva osmaniyan vekirin". Yanî bi gotinaka din, dixwestin ku bibêjin ku êdî wê li şûn xwe bihêlin. Lê her ku wusa dihat gotin ku mirovna ku zêde li ser wan komkujiyan ku rejima tirk dikir ne diaxiftin û ew ne dihildana rojava xwe, êdî rayadarên tirk jî, komkujiyên nû jî dikirin. Piştî, komkujiya roboskî, î ro li Cizîra bota, Nisêbînê, Silopîyê, Sûrê, farqînê û hwd, bi wan li gelek deverên din ên kurdistanê û bajarên kurdistanê komkujiyên mazin dihênina serê civate kurd. **Dibêt ku çend sal piştre, dîsa derkevina berçapameniyê, û bibêjin ku "van komkujiyên ku li Cizîra bota, Nisêbînê, Silopî, Sûrê û hwd, li ser wan neaxivin, wan li şûn xwe bihêlin, em rûpelek din ê sipî vekin." Weke ku çawa ku di çerçoveya nîqaşên li ser komkujiya dersimê de dibêjin**.

Ji xwe, her komkujiya ku hatîya kirin û piştre bi vî rengî ser wê hatîya nûxûmandin, temenê komkujiyên ku wê piştre werina serê civate kurd jî afirandîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku li ser hemû komkujiyên ku rejima tirk hanîna serê civate kurd, yan weke ku di pêvajoya komkujiya roboskî de kirina li ser pergale dadê re di derbarê wê de ´biryara ne şopandinê´ dana, yani weke ku çawa ku dozên qatilên dewletê ên weke cemal Temizoz ku bi sedan komkuji kirina, ´bi biryarên baraatê" ser wan hatîya nûxûmandin. Weke weke ku çawa ku di kirina komkujiya li kortekê de ku balafirên şer ên rejima tirk kirin de wê bibêjin ´me nekirîya´ bi vî rengî rêbaze înkarê bijêrên û ser wan binûxûmênin. Ev jî, bûna temenê komkujiyên ku heta roja me rejima tirk dihênê serê civate kurd.

Komkujiya roboskî, weke komkujiyeka ku em divê ku wê di çerçoveya pêvajoya kirina jenosîda kurd de ku werênina ser ziman a. Her wusa ev komkuji, weke sedan komkujiyên din rejima tirk hanîya serê civate kurd, armanca wê, şikandin û ji hevdû belavkirina civate kurd. Ku komujiya roboskî jî di nav de, hemû komkujiyên ku hatina hanîn serê civate kurd, divê ku em bi qadaxaya ku rejima tirk danîya ser zimanê kurdî re wan hildina li dest. Di vê çerçoveyê de qadaxaya li ser

zimanê kurdî, çendî ku aliyê jenosîda kurd ê çandî, zimanî û zêhnî ya, her wusa komkujiyên fîzîkî ên weke komkujiya roboskî û hwd jî, komkujiyên ku rejima tirk ji aliyê fizîkî ve ku hanîna serê civate kurd. Yanî, komkujiyên weke komkujiya zilanê, komujiya dersimê, komkuji roboskî hemû komkujiyên din ku rejima tirk hanîna serê civate kurd, komkujiyên ku divê ku mirov weke aliyê jenosîda kurd ê fizîkî ku werênina ser ziman in. Aliyê bi qadaxaya ser ziman û çanda kurd jî, li ser rêbazên weke asîmlasyonê û hwd re, aliyê jenosîda kurd ê sipî ê gîyanî û hwd in.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov komkujiya roboskî, di dewama hemû komkujiyên din ên ku rejima tirk hanîna serê civate kurd de wê hilde li dest.. Weke ku çawa ku di derbarê ti komkujiyên ku rayadarên tirk berê kirina de ne hiştîna ti biryarên dadî werina dayîn. Her wusa, di vê çerçoveyê de nêzîkî komkujiya roboskî jî bûna. Di nava pergale dada tirk de, ji destpêka komarê û heta roja me, mirov rastî ti belge, dûkument û ankû biryarên dadî ên ku di derbarê tenê komkujiyeka kurdan de jî dana. Her wusa, pergale dadê di vê çerçoveyê de weke rêya sernûxûmandina komkujiyên kurdan bikarhanîna. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku weke ku çawa ku di demên bûhûrî de ti biryarên dadî di derbarê ti komkujiyên rayadarên tirk û artişa wê hanîya serê kurdan de nedaya, wê di roj û demên pêş de jî, ev biryar newina dayîn. Wê di rojên pêş de jî, dad weke rêya sernûxûmandinê a komkujiyên ku hanîna serê civate kurd wê bikarbênin. Paşeroja pergale dadê, wê pêşaroja wê jî û rengê pêşketina wê ya di demên pêş de jî bide dîyarkirin.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku pergale dade tirk, bûya weke marşa ku hemû pîsîtîya rejiima tirk û komkujiyên ku rejima tirk hanîna serê civate kurd ku di bin xwe de diveşêrê ya. Pergale dada tirk, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bişibihêne marşaka ku binê wê tişî pîsîtî û qirêjî ya.Herwusa komujiya roboskî jî, **malistina li binê wê marşê** û ser wê hatîya nûxûmandin.

.

**Bi komkujiyên ku di dema hikimetên AKP´ê de dihêna hanîn li serê civate kurd de rejima tirk, pêvajoya sêyemin a ´zagona şerq û lslahatê´ formule kirîya û li hemberî civate kurd bi şerê ku li hemberî rêveberîyên xweser ên kurdistanîyan dimeşênê re dikê merîyetê de.**

Di destpêka salên 1925´an û wan de ev ´zagona şerq û îslahatê´ hatibû derxistin. Armanca wê jî, ew bû ku wê çawa demografiya civate kurd li herêmên wan bide gûharandin, di vê çerçoveyê de ev zagon xwediyê wateyekê bû. Di wê demê de komare tirk a ku nû avabûyî, wê li agirî, zilanê, Erzûrûm û erzinganê, komkujiyên mazin werêne serê civate kurd. Gelek herêmên kurdan ên weke gund û navçe, wê di ancama komkujiyên ku rejima tirk dihêne serê civate kurd de wê bên bêmirov kirin. Yanî, wê herêm, ji naqşeyê werina birin. Ev herêmên ku bi komkujiyan ji mirovan hatina valakirin, wê li şûna wan aşîrên tirkmen û azerî werênina hanîn û li şûna wan bicih bikin. Azerîyên li Îdîrê, Dadaşên li erzûrûm û erzinganê û li herêmên din ên serhadê malbatên din ên tirk û tirkmen ku hene, di vê demê de ên ku hatina hanîn li kurdistanê na. Piştî denezendina rêveberîyên cewherî ên li kurdistanê jî, di çerçoveya têgînek ´têcîrkirina´ kurdan ji herêmên wan, rayadarên tirk, hanîn ser ziman ku wê bajarên nû ava bikin. Ev gotina ´emê bajarên nû ava bikin´ jî, ji aliyekî ve weke gotinaka şerê teybet bû ku bi wê dihat xwestin ku ser hêrîşên polîs û leşkerên tirk ên bi tank û topan ên li bajarên kurdan binûxûmênê bû. Ji aliyê din ê dûyemin ve jî, di serî de ew navendên bajarî ên kurdistanê ku dîrokî na, dihat xwestin ku wan ji holê ra bikin. Bo vê yekê û di vê çerçoveyê de dihat gotin ku emê çolemerg û geverê bikina yek´. Bi wê re jî, bi heman tişt bo şirnax û cizîra bota jî dihat gotin. Li amedê jî, heman tişt bo Sûra amedê a dîrokî jî dihat gotin. Pêşî, bi hêrîşan li van bajarên kurdan, ew di rûxandin û kavil dikirin. Piştre jî, li ser wê re digotin ku emê bi TOKÎ`yê wan ji nû ve ava bikin. Di vê demê de wê gelek aşîrên kurd, bi girseyî ji herêmên wan werina dayîn goçberkirin. Li şûna wan jî, wê bi heman rengî, aşîrên tirkmen wrênina hanîn li herêmê û bicihkirin. Armanca bi vê gûharandina demografiya civate kurd li herêmên wan, ew a ku wê çawa karibin, wan bikina bin kontrolê de bê.

Ev zagona şerq û îslahatê, wê di salên 1960 û 1970´î de, ji nû ve werê nûkirin. Wê rayadarên rejimê, bidest kirina zordestiyê li mirovan bikin ku ji herêmên goç bikin. Di ancama wê de, wê ji salên 1960´î û 1970´î û pê de, pêleka goçberkirinê ji herêmên kurdan li rojavayê tirkiya û li welatên ewropî wê were dayîn destpê kirin. Her wusa, piştî salên 198î û pê de, ev goçberkirina ji kurdistanê, were zêdetir kirin. Tenê di salên 1990 û heta sale 1993´an, wê nêzî 4 hezar gûndên kurdan werina şawitandin û vêrankirin. Di ancama wê de wê ser 6 milyonan re kurd, ji herêmên kurdan werina dayîn goçberkirin li herêmên rojava ên tirkiya. Armanc, ew a ku demografiya civate kurd were gûharandin. Li van

pêvajoyên nûkirina vê zagona şerq û îslahatê, wê pêlên goçberkirinê ên nû werina zêdetir kirin. Vêcarê, ji rojava û başûrê kurdistanê jî di nav de, wê kom bi kom kurdan ji herêmên wan bidina goçberkirin li welatên ewropî. Ew kesên ku tê gotin ku ”tacîrîya mirovan dikin” jî, di vê çerçoveyê de bi plan ji aliyê saloxgeriyên herêmê ên weke yên rejima tirk û hwd ve dihên pêşxistin. Karê wan, tenê girseya kurd a li kurdistanê ya. Her wusa, weke pêla dawî a goçberkirina kurdan ji herêmên wan, di dawîya sale 2015´an de hikimeta tirk a Dawutoglu plan dike û li gorî wê plankirina wê jî, ew ku wê gelek herêmên kurdan di ancama hêrîşên artşê û hêzên dewleta tirk de wê werina tûna kirin û xirakirin. Di ancama wê de ser sêsad(300) hezarî kurd, wê ji herêmên wan werina goçberkirin. Bi wê re jî di ahengekê de wê jinên kurdan teşvîik bikin ji zaroyekî û ankû du zaroyan zêdetir çênekin. Lê wê bi wê re jî, zorê bikina civake tirk ku zêdetir zarokan çê bikin. **Ev jî, weke planakê di sale 1996´an de di civîna lijneya bilind a tirk bi navê ´MGK` de hatibû plankirin bû.**

Lê di sale 2015´an de rejima tirk, pêvajoyek şer a giştî li hemberî civate kurd da destpêkirin. Di ancama wê de jî, bi sed hezaran kurd ji herêmên wan hatina dayîn goçber kirin. Cih û warên kurdên ku ji herêmê dana goçberkirin, weke ku çawa ku rayadarên komare tirk di sale 1925´an de kiribûn ku li şûna kurdên ku dabûbûna goçberkirin, aşîrên tirkmen azerî dihanîn ku bicih dikirin, di vê demê de rejima tirk û rayadarên wê dikevina nava hewldanakê de. Di vê demê de hin aşîrên tirkmen ku bi navê «ahiska» ji herêmên kafkasyan berhev dikin û wan dihênina herêmên kurdna û li şûna kurdên ku goçberkirina bicih dikin. Di despêka sale 2016´an de, li avahiyê «TOKI»´yê ên li erzinganê û Axlatê ku hatina çêkirin, di vê demê de wê bi hezaran tirkmenên bi navê **«Ahiska»** wê ji herêmên kafkasya û ukrayna werina hanîn li herêmê û li van herêman bicih bikin. Armanca vê bicihkirina aşîrên tirkmen li herêmên kurdan, ew a ku wê çawa pêşîya zêdebûna kurdan li herêmên wan bigrin a. Bi vê armancê, ew hatina hanîn li herêmê.

Em divê ku vê ppêvajoya bi şerê rejima tirk ê bi kurdan re û bi wê re dayîna goçberkirin a kurdan ji herêmên wan û li şûna wan hewldana bicihkirina hin aşîrên din ên tirkmen, divê ku miirov weke pêvajoya dawî a vê ´**zagona şerq û îslahatê**´ jî werêne **hanîn li ser ziman**. …

.. Di dema ku ev ´zagona şerq û îslahatê´ hatibû derxistin di salên 1925´an de, weke ku î ro rejima tirk li herêmên botanê ên weke Cizira bota, Nisêbîn, Silopî, Kerboranê Dêrka çîyayê mazî, Sûra Amedê û hwd komkujiyan dike, di wê dema ku ev zagon derxist de jî li agirî, zilanê û

piştre li dersimê komkiyên mazin hanîn serê civate **kurd**. Di dema AKP´ê de pêvajoya sêyemin a ´zagona şerq û lslahatê´ hatîya formule kirin. Hemû hêrîşên leşkerî, sîyesî û hwd, di vê çerçoveyê de li civate kurd dihên kirin. Gelek dordorên ku ji nezaniya xwe dibêjin ku ´ne ji hendekan ba, wê şer bi vî rengî nebûba´ jî, tenê weke gotinên ku bi zanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê, gotinên ku rastiyê berevajî dikin û şîlo dikin in. Ya ku şer daya destpêkirin ne hendek in. Ya ku hendek dana çêkirin, şerê rejima tirk ê li hemberî civate kurd a. Heta roja me, şerê tûnakirina civate kurd bi kurdan re dike. Rejimeka ku nasnemeya civate kurd nasnekê û naxwezê ku nas bike û di nasnekirinê de israr dike, bêgûman, wê pêvajo û konseptên şer li hemberî civate kurd bi rêxistin bike û pêşbixe. Vê pêvajoya şerê rejima tirk, mirov dikarê bişibêhene, pêvajoya berê ya destpêka komarê ku rejime tirk di wê de komkujiya zilanê kiribû bû. Gelek nîşanakên ku mirov dikarê wan bişibihêne hevdû jî hena. Zihniyeta ku bi wê dixwezin ku nasnemeya civate kurd tûna bikin û civate kurd di jenosîdê de derbas bikin a ´zagona şerq û îslahat´, di vê demê de weke ku ji nû ve hatîya formule kirin. Di wê demê de jî, weke ku rojnemeya komarê a demê ´cûmhûrîyet´ê sernav diavêt nivîsê(13´ê temûze 1930) û digot ku "yên di nawala zilanê de hemû hatina tûnakirin, di vê demê de mirov di rojnemeyên weke `yeni-şafak´ê de dibînê di van rojan de. Her wusa, hemû rojnemeyên din jî, di vê çerçoveyê de hêrîş dikin û temenê şerê bi kurdan re diafirênin.

Zagona şerq û îslahatê, di vê demê de dihê ji nû ve formule kirin di çerçoveya armanca rejimê a tûna kirina temenê civatîya kurd û nasnemeya wê de. Di vê çerçoveyê de pêvajek dana destpêkirin. Her wusa, pêvajoya şerê rejimê a di vê demê de ku bi kurdan re daya destpêkirin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Hêrîşên li ser civate kurd, qadaxaya li ser zimanê kurdî, bi zorê dana mirovan goçberkirin ji herêmên wan û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Zagona şerq û îslahatê, armanca wê ew bû ku ´nasnemeya kurd´ tûna bike û ji holê ra bike. Her wusa, mantiqê çareserîkirina pirsgirêka kurd a di serê rayadarên tirk de bi wê re xwe hanî ser ziman. Zagona şerq îslahatê, piştî komkujiyên ku li agirî û zilanê hatibû kirin, hatibû derxistin. Armanca wê di wê demê de ew bû ku demografiya civate kurd bigûharê. Bi wê re jî, saziyên ku civate kurd bi rêvebirin, rayadarên ku li ser navê dewletê li wir in, mamosteyên ku li wirin û hwd, wê li ser navê dewletê civate li gorî mantiqê rejima tirk perwerde kiriban. Her wusa, di

vê çerçoveyê de jî, girseya kurd ku xwediyê potansiyala berxwedanê ya, wê çawa ji hevdû wre belavkirin, zagona şerq û îslahatê, wê armanc digirê. Bo vê yekê bû ku piştî komkujiyên zilanê û hwd, gelek aşîrên kurd, ji herêmên kurdan li rojava bi girseyî hatibûbûna goçberkirin. Bi wê re jî, wê ew aşîr û malbatên ku hatibûbûna goçberkirin li rojavayê tirkiya, wê hatibûbûna asîmle kirin. Kurdên li herêmên xwe mabûn, wê ew jî bi bernemayên asîmilasyonê wê hatiban asîmlekirin.

Bi wê re jî, kurdên ku ji herêmê hatina goçberkirin, wê li şûna wan aşîrên tirk, azarî û tirkmen, wê hanîban li herêmê ku bi wan karîban civate kurd û demografiya wê ji holê rakiriban. Ya ku di dema derxistina ´zagona şerq û îslahatê´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de werre kirin. Ji xwe, di wê de kurdên ku ji herêmê hatina goberkirin, wê li şûna wan, weke ku li îdîr û agirî dibê, wê aşîrên azarî werênin. JI Erzûrûmê aşîrên kurd ên ku ji herêmê hatina goçberkirin, wê li şûna wan hin aşîrên dadaş bicihkiriban. Her wusa, li herêmên din jî, wê heman politikayê werina meşandin. Kurdên kuserî hildana jî, wê di ´dadgehên îstiklalê´ de bihatan derizandin û piştre bihatan derizandin. Di wan dadgehan de, her kurdê ku weke pêşeng ku navê wî derketîya li pêş, wê werina darizandin bi armanca tafisandinê.

Dadgehên weke ´dadgehên îstiklalê´, wê di çerçoveya têgîn û gîyane zagonên weke zagona şerq û îslahatê´ de wê kar bikin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov mantiqê van dadgehan û vê zagona şerq û îslahatê´ bi hwvdû re hilde li dest. Wê piştre jî, ev rewş hebûna xwe bidina domandin. Piştî salên 1950´î û pê de, wê zagona şerq û îslahatê´, weke ku ji nû ve were sererastkirin û hin xal li wê werina zêdekirin. Di salên weke 1960´î û hwd de, pêşengên kurd weke serokên aşîran, mirovên pêşeng û hwd, wê werina berhevkirin û bên şandin li ´sûrgûnê´. Ev sûrgûnkirinên li di vê demê de wê li gorî gîyane vê zagona şerq û îslahatê werina kirin. Bi wê re jî, wê pêvajoyên nû ên goçberkirinê ji kurdistanê bidina destpêkirin. Ji salên 1970´î û pê de, biawayekî bi plankirî, wê malbat bi malbat, werina dayîn goçberkirin. Ev pêvajo, wê di salên 1980´î de wê were zêdetir kirin.

Kurd, piştî salên 1980î, wê destpêkirina tekoşîna azadîyê jî, ji hinek aliyan ve wê were kirin weke hêncet û wê mirovan ji herêmê bidina goçberkirin. Wê ser 4 û ankû 5 hezaran re gûndên kurdan werina vêrankirin û kavilkirin. Mirovên ku di wan de dijîn jî, wê werina dayîn goçberkirin, li rojavayê tirkiya. Di vê çerçoveyê de wê ser 8 milyonan re kurd ji herêmên wan werina dayîn goçberkirin. Her wusa, di vê

çerçoveyê de wê gelek malbatên ku hatina dayîn goçberkirin li rojavayê tirkiya jî, wê ji wan deran jî, bên dayîn goçberkirin li welatên ewropa. Di vê çerçoveyê de wê dîyasporaya kurd, wê were pêşxistin.

Ji wê demê û heta roja me, ev rewşa goçberkirina kurdan ji herêmê, wê di çerçoveya planekê de were kirin. Bi wê re jî li ser pergale perwerdeyê re wê kurdan bikin ku asîmle bikin. Di vê çerçoveyê de ku em weke jenosîda sipî werina ser ziman asîmlasyon, wê her wusa di vê çerçoveyê de giranî were dayîn li ser wê. Lê bi wê re jî, pergale sîyesî û dadî, wê bi wê re di ahengekê de were bikarhanîn. Wê çawa tafisandinê pêşbixin, pergale rêvebirinê û ya dadî, dihê bikarhanîn.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di roja me de, ev rewş li ser zêdetirî êdî hatîya bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de weke ku bi zagona şerq û îslahatê´ de, armanca wê ew bû ku ´demografiya civate kurd were gûharandin û bi wê re temenê ´nasnemaya civate kurd´ ku were tûna kirin. Her wusa di vê çerçoveyê de armanca zagona şerq û îslahatê, di serî de tûnakirina nasnemeya civate kurd bû. Di roja me de, hêrîşên ku bi AKP´ê re li kurdistanê dihên kirin, divê ku mirov aliyekî wan di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Di aslê we de AKP´ê di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wan dihizirê, di çerçoveya tûnakirina hebûna temenê civate kurd de ya. Wê çawa nasnemeya civate kurd werê tûnakirin, di vê çerçoveyê de hertimî hêrîşî civate kurd dikê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku heta roja me, nêzîkatîya rejima tirk a li hemberî civate kurd mirov li wê dihizirê, ya ku mirov dibînê ku bi awayekî bi plan di çerçoveya gîyane vê zagona şerq û îslahatê de nêzîk bûya. Piştî ´dadgehên îstiklalê´, wê ´dadgehên awarta´ werina pêşxistin. Piştre, li şûna wan ´DGM` û ankû ´dadgehên parastinê ên dewletê´ wê werina pêşxistin. Hertimî, di dewame hevdû de ev hatîya pêşxistin. Weke ku mirov li ser dadgeh û pergale dadê re dibînê, tenê nav hatina gûharîn. Piştî ´dadgehên parastinê ên dewletê´ wê dadgehên cezayê giran´ werina pêşxistin. Hemû jî, li gorî rewşên awarta na. Wê çawa civate bikina bin kontrolê de, di vê çerçoveyê de hatina pêşxistin. Ankû, wê çawa civate kurd, nasnemaya wê tûna bihasibênin û bi wê re û ankû bi demê re nasnemaya civate kurd tûna bikin, li ser wê re dihizirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di har rewşê de armanc tûnakirina hebûna civate kurd û nasnemaya civate kurd. Bi wê re jî, di vê demê de şerê ku rejima tirk û bi teybetî hikimeta AKP`ê ku bi kurdan re daya destpêkirin, li ser wê re dixwezê ku ancamê bidest bixe û weke ku rejima tirk di pêvajoya komkujiya zilanê û piştre di dema piştî

komkujiya dersimê kir û hwd, dixwezê ku pêvajoyeka bi vî rengî li ser serê kurdan bide destpêkirin. Yanî, hata ku rayadarên dewletê ên ku kurd in, wan ji herêmê dûr bike. Çend kurdên ku aligirên wê na, li ser wan re li herêmê rejima xwe ji nû ve di çerçoveya înkare kurd û tûnakirina nasnemeya civate kurd de bikarbêne. Bi vê re jî, hertimî, li ser artişê re rejima tirk li kurdistanê pêvajoyên xwe yên şer û sîyesî û heta ku dadî jî dana meşandin û biancam kirina. Di vê demê de jî, em rastî heman pêvajoyê de tên. Di aslê xwe de, di vê çerçoveyê de piştî sale 1925´an ku di wê de zagona şerq û îslahatê hat derxistin, di sale 1960´î bi çerçoveyek nû ev zagona şerq û îslahatê hatibû pêşxistin li gorî demê û li gorî wê ew serokên aşîrên kurd, pêşeng û hwd, hatibûbûna sûrgûn kirin. ...

Di aslê xwe de di vê demê de AKP´ê û hikimeta AKP´ê dixwezê ku pêvajoya wê zagona şerq û îslahatê a sêyemin jî, di vê çerçoveyê de bi şerê ku bi kurdan re daya destpêkirin û bi teybetî jî li ser kurdên ku ji herêmê dana goçberkirin û hwd re dixwezê ku ancamê bidest bixe. Bi wê re jî, ji rojavayê tirkiyê di bin navê mamostetiyê û ankû melletiyê û hwd de, bi vî rengî rayadarên xwe yên ku bişêne herêmê li ser wan re pêvajoya sêyemin a zagona şerq û îslahatê ku dike ku pêşbixe bibe sêrî. Bi wê re jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku heta roja me, ne tenê rayadarên rêvebirinê, bi wê re mamoste, rayadarên ku weke dozger, serdozger û ankû ku di pergale dadê dixabitiin û hwd, wê wan jê di vê çerçoveyê de bierk bike. Di vê demê de li kurdistanê, ´dadgehên cezayê giran, rol û weyna dadgehên salên 1925´an ên bi navê ´dadgehên îstiklalê´ û hwd re dibînin. Weke hevdû na. Zihniyet û mantiqê wan yek a. Karê ku dikin jî, mirov dikarê ji hevdû cûda werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de pergale sîyesî û rêvebirinê jî, dixwezê ku di çerçoveya tûnakirina nasnemeya civate kurd de ji nû ve li ser serê civate kurd birêxistin bike.

Di vê demê de hinek mirovên ku piçûk dihizirin, dibêjin ku ´ sedema şer hendek in´. Lê di aslê xwe de ev ne rast a. ´Hendek, tenê, di vê demê de weke hencet hatina bikarhanîn. Ku Hendek, neban jî, wê ew şerê rejimê bi konsepta wê ya şer re a li hemberî civate kurd bida destpêkirin. Li vir, mijara hendekan û ankû gotinên din ên bi vî rengî tenê weke gotinna ku weke hêncet dihêna ser ziman in. Rejima tirk û rayadarên wê, tenê di çerçoveya ´tûna kirina nasnemeya civate kurd´ de dihizirin. Ya ku di serê wan de ya ev a. Ya ku mejiyê wan tenê li wê hatîya girêdan, tenê û tenê ev a. Şerê xwe di vê çerçoveyê de bi kurdan re dike. Şerê rejimê di vê çerçoveyê de bi kurdan re di vê demê de bi kurdan re dihê meşandin.

Di aslê xwe de em di vê demê de, divê ku werênina ser ziman, hikimeta AKP´ê, dixwezê ku bi serê ku ji her aliyê ve bi civate kurd re daya destpêkirin, bi wê ancamekê bidest bixe û bi wê re ji nû ve vê zagona şerq û îslahatê, bi rêxistin bike. Ya ku heta nûha, dike û ankû kirîya jî ev a. Ji herêmên kurdan, bi sed hezaran kurd, bi teybetî naqandina û dana goçberkirin li welatên rojava ên ewropa. Divê ku mirov, van goçberkirinan, bi zihniyeta zagona şerq û îslahatê a rejima tirk ku li gorî demê ji nûve hatî formule kirin fahm bike û werêne ser ziman. Di dema ku zagona şerq û îslahatê hatibû derxistin a sale 1925´an de ku çi ancam di wê demê de bi wê bidest xistibûn, di vê çerçoveyê de di vê demê de jî dixwezin ku ancamê li gorî demê bidest bixin. Li ser sazî, rayadar û rêveberîyên herêmî ên weke walitîyan û ankû dozgerîyên herêmê re jî, vê pêvajoyê di nava jîyane civatî de bide domandin. Bi wê re jî, li ser wê re jî, bi leşkerîyê û hêzên din ên di bin navê ewlakariyê û hwd de ku li kurdistanê bicihkirina, kontrolkirinê jî çê bikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku rayadarên tirk, hêzên xwe yên ku heta roja me li başûrê kurdistanê hiştina, dixwezin ku pêvajoyna şer ji wir ve jî li hemberî kurdan bidina destpêkirin. Bo vê yekê, ji aliyê herêmên botanê çolemergê û hwd ve, bi oparasyonên leşkerî dike ku ancamê bidest bixe. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev konsepta şer a ku rejima tirk li hemberî civate kurd daya destpêkirin, divê ku mirov werêne ser ziman ku jenosîda ser serê civate kurd bibe sêrî. Hemû şerê wê yê ku li hemberî civate kurd dimeşênê di vê çerçoveyê de ya.

Heta roja me, bi zagonên weke ên ´zagona şerq û îslahatê´ û hwd re hemû leyistik li ser demografiya civate kurd kirin. Her wusa, lê tevî wê jî, ancam bidest nexistin. Her wusa, di vê demê de jî, bi hikimetên AKP´ê re zagona şerq û îslahatê ji nû ve hatîya şîrovekirin û li gorî demê hatîuya formulekirin û dihê xistin li merîyetê de li ser serê civate kurd. Di aslê xwe de şerê rejima tirk, ê ji 15´ê berfanbera 2015´an ve ku li hemberî civate kurd da destpêkirin, aliyekî wê yê mazin di vê çerçoveyê de heya ku divê ku mirov li ser wê bisekinê û wê fahm bike. Zagona şerq û îslahatê, bi mantiqê ku wê çawa nasnema civate kurd tûna bike û bi wê re navê kurd û pirsgirêka kurd ji rojevê derxe di çerçoveya ji dîrokê birinê de. Di vê çerçoveyê de zagona şerq û îslahatê, gîyane wê, heta roja me jî dijî. Di rewşa mamosteyên ku ji rojavayê tirkiyê dihên şandin li nava kurdan de dijî. Di rewşa ku hemû polîs û hwd, ku ji rojava werina şandin de dijî. Di rewşa ´dadgehên cezayê giran´ ku li şûna ´dadgehe parastinê a

dewletê´ û ankû ´DGM´ ku hatîya avakirin de dijî. Di rewşa kadroyên melletiyê ên dîyenetê ku dihên birêxistinkirin û şandin li kurdistanê de dijî. Di rewşa goçberkirina rewşa kurdan de dijî. Heta roja me, bi çêkirina gelek hêncetan ji wê re ku ne hiştina ti pêşketinên bi aborî û jîyanî ku li herêmê bibin û ku malbat bo ku dabara malbate xwe bikin ku diçina rojavayê tirkiya bo ku kar bikin û dabara malbate xwe bikin de dijî. Ev rewş û hemû rewşên bi vî rengî, rewşên ku mirov dikarê di çerçoveya zagona şerq û îslahatê de werêninê ser ziman in jî.

..

**Destpêka berxwedana li bakûrê kurdistanê û gotinên weke «ku hendek neban, wê hêrîş ne bûban" ..**

Di destpêka hêrîşên rejima tirk ên li bakûrê kurdistanê de gelek kurdên ku rastîya van hêrîşên rejima tirk fahm ne dikirin, digotin ku «dema ku hendek neban, wê hêrîş jî ne bûban.» Yanî, sedema wan hêrîrşên rejima tirk, ew hendekên ku li Cizira bota, Silopî, Nisêbînê, Sûrê û hwd, ku hatibûbûna çêkirin, weke hencet, didan nîşandin. Di aslê xwe de ev rastîya van gotinan, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku yên van gotinan dihanî ser ziman, ji ne zanîya rastîya dewletê bêxaber diaxiftin. Her wusa, piştre dema ku serokwezirê tirk Dawutoglu derket berçapameniyê û got ku «me amedekarîya van hêrîşan di sale 2013´an de kir.», êdî deng ji van mirovan derneket. Çendî ku ji nava kurdan û hin dordorên kurd gotin hatina gotin û hat gotin ku «sedema van hêrîşan ne hendek in´ jî, lê van dordoran bawer nekir. Lê piştî ku Dawutoglu got, êdî deng ji van dordoran derneket. Î ro jî, deng ji wan dernekeve. ..

Bi teybetî, kurdên ku ji têgîn û hizrên netewî ên kurdistanê û civate kurd dûrketina, van gotinan dihanîn ser ziman. Pirranîyan van dordoran zimanê kurdî nizanin. Dîroka kurdî nizanin. Dibêt ku hinek ji wan di nava malbata wan de hê hinek dapîr û ankû bapîrên wan ên ku bi kurdî dijîn hebûn jî. Pişta gotina xwe didana van mirovan û digotin ku ´em jî kurd in.´ Lê ji vê û pê de, ti têkilîya wan bi kurdewerîyê re tûnabû. Ji tekoşîna azadîyê dûrbûn. Bo wan dozkirina mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê ne giring bû. Li gorî wan hebûna jî dibû û nebûna jî dibû. Ew kurdên ku êdî tenê navê kurdî li xwe dikirin bûn. Lê wekî din ti têkiliya wan bi kurdî û civate kurd û nirxên wê re nema bû.

Her wusa, ev dordor, hertimî bo rejima tirk, bûna weke balgih. Rejima tirk, hertimî pişta xwe daya wan û li hemberî civate kurd û li dijî

statûya civate kurd gotin hanîya ser ziman. Ev dordor, temenê domandina asîmlasyonê û ankû bişavtina li ser serê civate kurd jî bûn. Rejima tirk, rayadarên wê, dema ku bahse parastina jîyanê ”hemwelatîyên wê yên kurd” dikir, di serî de di serê wê de ev dordorên ku li gorî wê û zihniyeta wê û bi zimanê dijîn hebûn.

Hêrîşên rejima tirk, wê piştre li ser dordorên ku hinekî jî bê, ku li gorî nirxên xwe yên civatî dijîn wê bidomîya. Wê ev kurdên ku bi zimanê tirkî jîyane xwe dijîyan û li gorî dewletê, dijîyan, wê ji aliyekî ve temenê hêrîşên wê yên li ser kurdên din ku ne li gorî wê jî bûn. Ev dordorên kurd, di dema ku hêrîşên rejima tirk, piştî 7´ê hezîrene 2015´an û pê de ku li civate kurd zêdebûn jî, derketina li pîyasê. Dengê wan derket. Gelek ji wan digotin ku ”sedema hêrîşan hendek in.” Ev gotin, ”sedema hêrîşan, hendek in”, di aslê xwe de argûmanaka rejima tirk a li hemberî kurdan ku dema hêrîş dikir ku bikardihanî bû. Hêrîşên ku kurdistanê dikirin, di vê çerçoveyê de wê çawa hêncetê ji wan re çê bikin, bi wê li ser gotinên bi vî rengî dikirin ku çêbikin. Lê di rastiyê de jî rastî vajî wê bû. Sedema hêrîşan ne hendek bûn. Hendek, bo ku kurd xwe ji hêrîşên artişa tirk ku karibin xwe biparêzên hatibûbûn danîn. Sedema hêrîşan a sereka, ew bû ku wê çawa pêşîya pêşketina civate kurd bigrin, temenê pêşketina statûya wê bigrin û vîna wê ya civatî bi hêrîş û ji hevdû felişandinê ku çawa bişikênin, di vê çerçoveyê de û bi vê armancê ew hêrîş dihatina kirin. Yanî armanca hêrîşan, di bin bikarhanîna van gotinan de di aslê xwe de dihat vêşartin. Hemû hêrîşên ku li civate kurd dibûn ku bi leşkerîbûna û bi sîyesîbûna, divê ku mirov bi qadaxaya rejimê a ku danîya ser zimanê kurdî re hilde li dest û fahm bike. Pêşî, rayadarên tirk, li ser hin nivîskarên tirk ku xwe nêzî kurdan dikin di bin navê gotina ´dostaniyê´ de da gotin ku ”dema ku hendek hatina çêkirin, hingî bi wê re temenê sîyeseta kurd hat lawaz kirin.” Heta ku piştre, di dewama wê de gotin ku ”şideta PKKê, dengên HDP´ê dan kêm kirin.” Di aslê xwe de ev gotin hemû jî, manipûlasyonên ku bi zanebûnî bê û ankû ne bi zanebûnî bê ku dihatina kirin bûn. Yên ku ew gotin dihanîn ser ziman, Nivîskarên tirk ên weke Ezgî başaran û hwd bûn ku ew jî, bi zihniyeta rejimê dinivîsênin û di temenê xwe de hertimê hizrên dewletê ên li dijê statûya kurd, dihênina ser ziman in.

Li vir, aliyekî vî şerê rejima tirk ê bi kurdan re jî, çêkirina manipûlasyonan li ser têgihan re ya. Wê çawa mejiyê mirovan tevlîhevikin û ankû wê çawa sedemên wan ên bo tekoşîna wan ya azadîya civatî pûç bikin, di wê çerçoveyê de gotinan dibêjin. Erka ku

rayarên tirk û ankû rejima tirk danîna ser pişta van nivîskarên tirk ku di bin navê ´dostaniyê´ de ku nêzîkî kurdan dikin, ew a ku wê çawa hêncet û sedemên kurdan ên bo tekoşîma maf û azadîya civatî pûç bikin a. Di vê çerçoveyê de ev dordor, gotina xwe dibêjin. Di çerçoveya tirkiyatiyê de ev gotina xwe dibêjin. Her wusa bi wê re li ser esasê asîmlekirinê re gotinê dibêjin. Gotinên ”biratîya kurd û tirk” jî, gotinna di wê çerçoveyê de na ku wê çawa bi zimanê tirkî û li gorî tirkiyatiyê civate kurd, ji rest, rêzik û kevneşopîyên wê yên civatî dûr bikin û di nava têgîna tirkiyatiyê de ku herkesekî pêşî bikina weke tirk û piştre êdî di vê çerçoveyê de wê herkesek, weke ´hemwelatê tirk´ wê weke tirkekî bijîn.” Dîsa ev dordor bûn, dema ku kurdan doza maf û azadiyê dikirin, digotin ku ”kurd, nîjadperestitiyê dikin.” Civateke ku zimanê wê qadaxa kirî, hemû maf û azadîya wê ji dest hatî girtin û ji aliyê civatîya wê ve jî hemû mafên wê yê hevbeş ku bêpar hatî hiştin û hemû mafên wê ji destê wê hatina girtin, çawa dibê ku ew dibê nîjadpperest? Yên ku vê gotinê bikardihênin, yan ji nezanîya xwe vê gotinê ji tekoşîna civate kurd re bikardihênin û yan jî bi zanebûnî û bi nîyetek xirab û bi awayekî ku dijberîyê ji civate kurd re dike vê gotinê bikardihênin. Yên ku vê gotinê dibêjin ku ji netew û ankû nîjadaka serdest bin, ew bixwe bi wê gotina xwe re dibina nîjadperest. Andamê civatekê weke civate kurd, ku î ro zimanê wan yê civatî zimanê kurdî qadaxa bê û zimanê tirkî bikarbênin û dema ku bi zimanê tirkî jî bahse çand û zimanê civate ku ew bi koka xwe ji wê na ku bikin, ew bo yên ku andamê wê civatê na nabê nîjadperestî. Lê bo yên andamên civake serdest ku wê gotinê ´nîjadperestîtîyî´ bo wan bikardihêne, dibê nîjadperestî û ji wê zêdetirî jî dibê **faşîzm jî**. Ti kesekî serî li ser vê rastîyê serî ne wastand û ankû ne xwest ku biwastêne. Bi wê re jî, kurdên ku gotina xwe digotin, wê di bin bandûra gotinên van dordorên ku di bin navê ´dostaniya kurd´ de ku nêzîkî kurdan diman, wê bi tirk û gûman nêzîkî nirxên xwe yên civatî biibin, û weke yekî tirk ku bi zimanê tirkî dijîn û xwe dihênina ser ziman, wê bo wan weke ku baştir bibe. Wê di serî de ev têgîh bi wan ji aliyê derûnî ve were dayîn herê kirin.

Derûnîya kurdan, di vê çerçoveyê de weke ku hatibû binpêç kirin. Li ser wê re jî, pêngav bi pêngav, mirovên ku bi nivîskarîyê bê û ankû bi rayadarî bê, ku sîyeset dikir, wê hebin. Li hemû mirovên ku din navê dostaniyê de jî bin ku nêzî kurdan dibûn, ji kurdan re digotin ku di bin banê tirkiya tirkiyê de em weke hevdû dijîn, û divê ku em wê biparêzên. Ev jî, wê weke têgiheka derûnîkî wê were pêşxistin. Li ser vê derûnîyê re jî, wê gotin bên dayîn gotin.

Hêrîşên ku piştî 7´ê hezirena 2015´an û pê de ku li kurdan bûn, armanca wan pirr kûr bû. Planaka nû, weke ya sale 1925´an hatibû amede kirin. Di vê çerçoveyê de wê dîsa kurd bihatan tafisandin û bêdengkirin û li ser wê re weke ku dihat gotin wê destûra tirkiyê jî hatiba nûkirin û wê di wê çerçoveyê de pirsgirêk li gorî xwe ji nû ve çareser bikiran. Her wusa, partîyên dewletê ên weke CHP´ê ku di jîyane partîyên iktidarê ên weke AKP´ê û hwd re di ahengekê de sîyeset dikirin, di rastîya maf û azadîya civate kurd de weke hevdûû di hizirin û gotin dihanîna ser ziman. Ji xwe piştî ku kurdan li bakûrê kurdistanê rêveberîyên xwe yên xweser denezendin, êdî bi hevdû re weke ku di yekdengiyê de bin, bidest hêrîşî li hemberî kurdan kirin.

Kurdên di vê demê de rastîya demê û hêrîşên dewletê fahm nekiribûn, digotin ku ”sedema hêrîşan hendek in.” Lê rastî, ne wusa bû. Yên ev gotin digotin, rastîya dîroka civate kurd ne dizanîn. Her wusa, rastîya komare tirk jî fahm nekiribû bûn. Di dîroka vê komarê de komkujiyên weke komkujiya koçgiriyê, komkujiya agiriyê, komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd, weke komkujiyên ku di wan de bi hezaran kurd, hatina qatilkirin, rayadarên vê komarê hanîna serê civate kurd. Ji xwe, mejiyê van kurdan, ne di wê derûnîyê de jî bû ku li ser van rastîya bihizirê jî. Dema ku hinekî li ser van rastîya hizirîyaban, wê hinekî jî ba, wê rastî hinekî fahm kiriban. Lê weke ku mejiyê wan di tirsîyan ku wan rastîya kifş bikin. Mejiyê mirovê ku li gorî metingerê xwe dihizirê û ankû di saziyên wê kar dike, wê hertimî mejiyê wê rejima metinger bê. Wê li gorî wê bê. Î ro, pirranîya kurdên ku di vê çerçoveyê de xwe bi rejimê ve girêdana, wê jenosîda ku li ser civate wan tê meşandin jî nabînin, divê ku mirov i vê çerçoveyê de bahse rastîya wan xamgîn û hazîn bike.

Mejiyê ku rastîya meşandina jenosîdê li ser serê civate kurd ne didît ku tenê sedema hêrîşan çend hendekên bi armanca xwe parastinê didîtin, her wusa ew mejiyê ku li gorî rastîya tirk û sîyeseta wê dihizirî bû. Ev mejî, ne mejiyekî ku li rastîya civate kurd bihizirê bê, ku ew mejî xwediyê wê kurdek jî bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku pêvajoya hêrîşên rejima tirk ku li hemberî civate kurd dihat meşandin, bi zanebûnî bê û ankû ne bi zanebûnî bê, ev mejî li ser gotin û sedem û hencetên ku wan hêrîşan dike re li wê dinerê. Her wusa, wusa li berxwedana gelê kurd jî dinerê. Bi gotinaka din, gelê kurd ji aliyê rejima tirk ve dihê qatilkirin û di jenosîdê ve dihê bûhûrandin, ev mejî, ji wê re di çerçoveya gotinên

rayadarên rejimê de bi awayekî ku gotinê ji rayadarên rejimê re nebêje û yên ku rstî komkujiyan tên gûnahbar dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de mejiyê ku li gorî metingerê xwe dijî, ev a. Rewşa van kurdan, weke rewşa kurdên ku di dema komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd de ku komkuji dihatkirin û bêdeng diman in. Yanî, ku li rex dewletê, bi awayekî vekirî û ankû sergirtî cih digirtin in. Î ro jî, di vê pêvajoya ku hêrîşên rejima tirk û rayadarên wê bi polîs û tankên wê li kurdan dibin de, li hemberî wan hêrîşan bêdeng in. Deng ji wan dernekeve. Yan, wê gotinên rayadarên tirk ên weke ´sedema hêrîşan hendek in´ wê werênina ser ziman û yan jî wê tirsê ji xwe re bikina hêncet û wê bêdeng bin. Her wusa, ev rengê tirsê, mirov divê ku bi bêrûmetîyê re werêne ser ziman. Hinekî jî, bi dûrketina ji nirxên civatî re jî werêne ser ziman.

Pêvajoya hêrîşên ku rejima tirk ji dawîya sale 2015´an û heta sale 2016´an ku li hemberî civate kurd da destpêkirin, divê ku mirov weke hêrîşên bi armanca jenosîdkirina civatê werêne ser ziman. Ev hêrîş, divê ku mirov van hêrîşên rejima tirk ên di vê demê de weke hêrîşên dema ku di wê de komkujiyên koçgirî dihat kirin werêne ser ziman. Divê ku mirov weke hêrîşên dema ku di wê de komkujiyên zilanê dihat kirin, werêne ser ziman. Divê ku mirov weke hêrîşên dema ku di wê de komkujiyên dersimê dihat kirin, werêne ser ziman.

.......

**Tevgera jinê û kirina wê ya weke ´armanc´ û berxwedana gelê kurd a li bakûrê kurdistanê.**

Di hêrîşên rejima tirk ên bi artişê ku li bajarên kurdistanê li kurdan dibin de jin, bi teybetî weke armanc dihên bijartin. Her wusa, heta nûha li gelek bajarên kurdan jin hatina qatilkirin. Herî zêde di mejiyê hemû kurdan re cih girt, jina kurd a bi navê ´Teybet Inan´bû ku piştî ku ji aliyê hêzên rejima tirk ve hat qatilkirin, hefteyekê cenezeyê wê li devê derîyê malê wê li berçavên heft zaroyên wê mabû. Zilamê wê çûbû ku wê hilde, ew jî rastî gûlabaran polîs û leşkerên tirk hatibû ew jî, ketibû ardê. Her wusa, biheman rengî, hatibû serê gelek kurdan. Di hêrîşên leşker û polîsên tirk de, bi teybetî qatilkirina jin û zarokan, kî dikarê weke rasthatinekê werêne ser ziman? Ne ti kesek. Ji ber ku ev ne rasthatinak a. Bi teybetî, jinên kurd dihên armanc girtin û qatilkirin. Ji ber ku jin, dema ku di nava tekoşîneka civatî de hebin, ew tekoşîn weke tekoşîneka civatî rengê xwe dide dîyarkirin. Bo vê yekê ya ku leşker û polîsên tirk, bi teybetî jinên kurd ji xwe re kirina armanc, Her wusa, heta roja me, bi hezaran jinên kurd, bi awayên cûr bi cûr ji aliyê hêzên dewleta tirk ve

hatina qatil kirin. Ev jinên kurd, hemû jî, jinên ku di nava jîyane de bi pirsgirêkên jîyan û civate ve eleqeder dibûn bûn. Herî dawî, di hêrîşên polîs û leşkerên tirk ên li Silopî de sê jinên kurd ên din jî hatina qatil kirin. **Ew jî, Andamê meclisa DBP Sêvê Demir, Hevserokê meclisa xalkê ê silopî Silopi Pakize Nayir û andamê tevgera jinê a KJA Fatma Uyar** jî, divê çerçoveyê de bi awayekî hovane armanc hatina girtin û qatil kirin.

Her wusa, dema salwegera komkujiya kurdan a li Parîsê ku di wê de sê jinên kurd hatina qatilkirin de, bi heman rengî sê jinên kurd di 5´ rêbendana 2016 de hatina qatil kirin.

Ev her sê jinên kurd ên ku dawî hatina qatilkirin, ji ber ku derdiketina çapameniyê, dihatina nasîn. Her wusa, di vê çerçoveyê de dihatina nasin. Ew jî, bo vê yekê, hatina qatil kirin.

Hêrîşên ku li kurdistanê dibin, her wusa, weke herîşên ku bi tememî temenê bi hevdû re jîyanê ku ji holê dirakin in. Rejima tirk, ji kurdan re dibêje ku ´yan, winê weke kole di bin metingerîya min de bijîn û yan jî mafê jîyanê bi ti awayê din ji we re tûna ya.´ Zihniyeta ku bi wê nêzîkî kurdan dibê jî ev a. Her wusa, bo vê yekê, li ser navê civate kurd çi hebe, ji xwe re dike armanc û hêrîşî wê dike. Ti carî, rayadarên rejima tirk, bi awayekî mirovî nêzîkî kurdan nebûna. Ti minaqên wê nîn in. Ne di nava jîyane xalkê de û ne jî di nava jîyane kurdan a berê de. Ti minaqên vê tûna na. Wê çawa kurdan bikina weke tirk û wê çawa ji çand û zimanê wan dûr bikin, di wê çerçoveyê de hêrîşî kurdan dikirin. Di salên 1890´î de kurdên ku bi zimanê kurdî diaxiftin, rastî êşkeceyên pirr mazin dihatin. Piştre jî, ev rewş biheman rengî domî ya. Kurdên ku bahse ´kurdan´ dikirin û ankû navê´ kurdistanê´ di hildan, rastî hêrîşî dihatin. Heta ku dihatina girtin û rastî cezayên pirr xadar jî dihatin. Di zindanan de kurdên ku bi kurdî diaxiftin, bi teybetî êşkenceyên mazin li wan dikirin.

Piştî ku tekoşîna azadîyê a kurd pêşket û pê de, wê ev hêrîşîên ku li ser çand û zimanê kurdî, ji hebûna xwe ti tiştî winda nekin. Her wusa, ji ber ku di malan de zimanê kurdî bi jin û dayikên kurd re hebûna xwe didomand, wê êdî ev beşên civate kurd, bên armanc girtin. Hêrîşên ku li jinên kurd, dibin, weke hêrîşna bi plan ên ku bi têgîna ku li hebûna civate kurd dihatina kirin, divê ku mirov werêne ser ziman. Dema ku di nava civatekê de jinê dest bi tekoşînê kir, êdî ew tekoşîn weke tekoşîna civatê mirov dikarê wê werêne ser ziman. Bo vê yekê ya, ku hertimî, li hemberî jina kurd, ol bikarhanîn. Li gorî olê, ti maf û azadîya jinê tûna ya. Divê

ku jin li malê bê û dernekeve derve. Divê ku di gotina mêrê xwe de bê. Divê ku di her aliyê de xwe ji tekoşîna derve a di jîyanê de ku heya ji wê dûr bigrê. Ya ku hatibû derxistin, ev bû. Ya ku jîna kurd red kir û herê nekir jî ev bû. Têgîna dîrokî a maf û azadîyê ku bi jina kurd re çêbû, ew malê derxist sûk û qadan û kir nava tekoşînê de. Hinekî jî, hêrîşên li jinê, ew in ku wê çawa jinê ji wan sûk û qadan dûr bikin û bikina wan malên ku ew ji wê derketina. Her wusa, rejimê, şer û tekoşîna vê bi gelek rê û rêbazan bi jina kurd re da. Lê bi serneket.

Li vir, divê ku mirov, vê yekê jî, werêne ser ziman ku li kurdistanê, ji sadî sad hemû destavêtin û bûyarên hovane ên tecewûzê ku dibin, têkilîya wan bi rayadarên rejimê ve heya. Ev yek, di pirranîya dozên tecewûzê ên ku hatina vekirin de jî hatîya ditin. Destavêtin, weke rêbazekê ku li hemberî tekoşîna jinê dihat bikarhanîn bû. Lê rejîmê bi vê rêbaza xwe jî, bi jinê gav bi şûn ve neda avêtin. Piştre, êdî bi awayekî vekirî bi dest qatilkirinê kir. Her wusa, qatilkirina andamê meclisa DBP **Sêvê Demir**, Hevserokê meclisa xalkê ê silopî Silopi **Pakize Nayir** û andamê tevgera jinê a KJA **Fatma Uyar** û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de jî hilde li dest. Zihniyeta ku keça kurd Kewser Eltûrk ku navê wê yê di nava kurdan de ku ew bi wê dihat nasîn **EKÎN WAN** bû, sax girt û bi êşkeceyan bi awayekî hovane ew qatil kir û piştre piştî ku ew qatilkir û pê de, ew laşê wê rût kir û wêneyê wê kişand û di çapameniya civakî de parvekir, hinekî jî heman zihniyet a. Li vir, ew hêrîşên li hemberî beden û laşê jinê, bi zihniyeta ku ew hêrîş li hebûna civate kurd in, dihên kirin. Bi vê mantiqê ew hêrîş dihên kirin.

Li kurdistanê, hêrîşên ku dibin di vê demê de li civate kurd, di wê de dîsa jin û ciwanên kurd li pêş in. Zaroyên kurd li pêş in. Ji ber ku ev tekoşîn, tekoşîneke civakî ya. Nivîskarên tirk ên weke Ezgî başaran, li şûna ku weke jinekê wê van qatilkirinê bibînin, wê çawa tekoşîna maf û azadîya civate kurd reş bikin, vajî bidin nîşandin û her wusa bi awayekî wê kriminalize bikin, di wê çerçoveyê de gotinê dibêjin. Jinên ku bi zihniyeta mêr a faşîzane diaxifin jî, mirov dikarê van kesan hebûna wan werêne ser ziman. Hêrîşên ku di vê demê de li civate kurd dibin û ankû ku hêzên dewletê li kurdan dikin, wê çawa ji wê re hêncetekê bibînin, di wê çerçoveyê de gotinê dibêjin. Di vê çerçoveya bi mantiqê çêkirina ´hêncetan´ de wê, carna ´hendekan´ weke hêncet werênina ser ziman. Wê çar denezendina rêveberîya xweser a kurdistanê, weke hêncet werênina ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, ji her aliyê mejiyê xwe li ser çêkirina hêncetan di wastênin. Ev jî, bo çi tê kirin? Ji ber ku rejima dixwezê ku

ew hêrîş li civate kurd bidomin û ew jî, di wê çerçoveyê de bi gotinên ku dibêjin temenê wan hêrîşan çê dikin. Di aslê xwe de di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku her mirin dibê û qatilkirina ku bi destê polîs û leşkerê rejima tirk dibê, divê ku mirov ji wan mirin û qatilkirinan, van nivîskarên tirk jî berpirsîyar bibînê û heta ku gavekê pêşdetir herê û wan weke qatilê ku ev komkuji dana kirin jî werêne ser ziman.

Di qatilkirina her zaroyekî kurd, jinek kurd, ciwanekî kurd û ankû mirovekî kurd de berpirsîyar û destê nivîskarên tirk heya. Bo van nivîskarên tirk hebûna civate kurd, weke civat nayê dîtin. Bo vê yekê, ti makanizmayên xwe parastinê û ankû xwe rêvebirinê, bi navê wê nabê ku were pêşxistin. Nivîskarên tirk, her tişt û rewşê, di çerçoveya nexweşîyek nîjadperestî de bi tirkitiyê û tirkiyatiyê re li wê dihizirin û wusa dibînin. Dervî wê, na hizirin û naxwezin ku bihizirin. Bo wan, divê ku her tişt û herkes, weke tirk bijî û bi zimanê tirkî bijî. Divê ku bi zimanê tirkî, perwerdeya xwe bibînê. Dervî wê, bo wan û li gorî wî mejiyê wan, ne rast a. Rastîya Cengiz Çandar ku di sale 2011´an de ku dema ku kurdan ´xweserîya demokratîk´ denezend ku wî ew weke ´gotina salatayê´(´laf salatasî´) ku dihanî ser ziman û ya Ezgî başaran ku dema ku kurdan li bajarên kurdan di dawîya sale di 2015´an de ku rêveberîyên xwe yên cewherî didenezend û wê ew denezendina rêveberîyên kurdan ên cewherî weke ´nexweşîyekê´ û hwd, divê ku mirov weke ancama heman zihniyet û nexweşîya mejiyê nivîskarên tirk jî werêne ser ziman. Ji xwe, dema ku em rewşa domandina pêvajoyên jenosîdê ên li ser serê civate kurd werinina ser ziman ku ka çawa heta roja me hatîya, divê ku em pay û keda vê rengê hizirkirina nivîskarên tirk jî, di temenê de û bi wê re werênina ser ziman. Mejiyê rejimê ku civate kurd weke civat nabînê û ku dixwezê ku di nava tirkitiyê de bihalêne, her wusa rastîya vê rengê hizirkirina mejiyê nivîskarên tirk jî dihêne ser ziman. Yanî, di vê çerçoveyê de ji aliyekê ve jî nivîskarên tirk, hevkarên rejimê na ku wê heta roja me pêvajoyên jenosîdê li ser serê civate kurd meşandîya. Ew gotina kurd, ku ew car bi car bikardihênin jî, ji mejî û têgîna rastîya civate kurd dûr a. Di çerçoveya ku çawa li civate tirk dihizirin de li wê dihizirin. Weke yekî tirk dibînin. Mejî û ankû aqilê ku di nava wê de weke kirdeyekê gotina ’asîmlasyonê´ vêşarî heya, bi wê re li hemberî kurdan diaxifin ji kurdan re. Di vê çerçoveyê de jî ti hêrîşên ku li kurdan dibin, nakevê rojeve wan dordoran de.

Hêrîşên ku î ro li Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûrê û deverên din ên

kurdistanê ku li civate kurd dibin, di vê çerçoveyê de weke hêrîşna ku di wan de bi sadan kurd hatina qatilkirin in. Di nava wan mirovên kurd ên ku hatin qatilkirin de jî pirranîya wan, jin û ciwanên kurd in. Her wusa, bo ku jinên kurd ji nava tekoşînê bidina dorkirin, bi teybetî jinên kurd hatina armanc girtin. Ev hersê jinên kurd ên li silopî jî hatina qatilkirin, weke pirranîya jinên kurd ên din ku li Cizira bota, Silopî, Nisêbîn, Sûrê û hemû deverên din ên kurdistanê ku hatina qatilkirin, di çerçoveya armanc girtina jinên kurd de hatina qatil kirina na.

Rejima tirk, hêrîşên kolekirina civate kurd û tûna kirina wê li hemberî civate kurd pêş dixe. Civate kurd jî, li hemberî wan hêrîşan, tekoşîna parastina hebûna xwe dide. Î ro, tekoşîna civate kurd a li Silopî, Cizira bota, Nisêbînê, Sûrê û li bajarên din ên kurdistanê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de ku em tekoşîna kurdan, weke tekoşîna parastina hebûna civate kurd jî werênina ser ziman, wê rast bê. Rejima tirk, bi hêrîşên xwe yên li hemberî civate kurd, hebûna civate kurd armanc digirê. Hêrîşên ku li van bajarên kurdan li kurdistanîyan dibin, bi teybetî hêrîşên jenosîdkirina civate kurd in. Bi van hêrîşan, ne tenê kesên kurd tên armanc girtin, bi wê re jî nirx, çand, ziman û dîroka civate kurd jî tê armanc girtin. Hêrîşên ku piştî 7´ê hezîrene 2015´an û pê de ku li deverên pîroz ên civate kurd dibûn, divê ku mirov di vê çerçoveyê de weke hêrîşna hovane ên ku li nirxên civate kurd dibînin werênina ser ziman. Î ro jî, ew hêrîş bi heman awayê didom in. Her wusa, hêrîşên li ser sûra amedê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Sûra amedê û ankû ´kirmana amedê´ weke kirmanaka ku dîrokî ku di dema hûrîyan de hatîya çêkirin a. Dîroka xalkê herêmê bi wê re tê ser ziman. Ew jî, tê armanc girtin bo tûnakirinê.

Î ro, hebûna civate kurd dibin hêrîşan de ya. Jîyane her kurdî dibin hêrîşê de ya. Jîyane civatî a kurdan, tê armanc girtin. Di salên 1990´î de gundên kurdan dihatina armanc girtin û tûna kirin. Di hêrîşkirina li kurdan re ti sînorê mirovî û mirovatîyê nayê naskirin. Wê çawa civate kurd, ji hevdû belav bikin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikin. Her wusa, ´zagona şerq û îslahatê´ ji nû ve hatîya şîrovekirin û li gorî gîyane wê, hêrîşî qadên jîyanê ên civate kurd dikin. Wê çawa civate kurd ji hevdû bifelişênin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikin.

Civate kurd, weke civatekê mafê wê heya ku rêveberîya xwe denezenê. Mafê heya ku ´serxwebûna´ xwe jî denezêne. **Civatek, dema ku di nava xwe de makanizmayên xwe yên xwe rêvebirinê û pêşxistinê pêşnexe û çêneke, wê ew civat nikaribê xwe barî pêşarojê**

**jî bike**. Bi qadaxaya li ser zimanê civate re ne hiştina xwe afirandina biçandî û pêşxistina makanizmanyên xwe yên xwe rêvebirinê re dihê xwestin ku ew nikaribê xwe barî pêşarojê bike.Bi gotinaka din, ev jî tê wateya ji dîrokê birina civatê jî. Her wusa, ya ku wê civatê barî pêşarojê bike jî, wê ev bê. Di vê çerçoveyê de di çerçoveya parastina hebûna xwe de civate kurd, dixwezê ku saziyên xwe yên xwe rêvebirinê û parastinê pêşbixe. Denezendina rêveberîya xwe ya civatî a cewherî, hinekî jî, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Yên ku li hemberî xwe rêvebirina civate kurd in, ew di mejiyê xwe de xwediyê wê têgînê na ku civate kurd were ji dîrokê birin. Di vê çerçoveyê de dixwezin ku ew civat werê tûnakirin. Di vê çerçoveyê de î ro li bakûrê kurdistanê berxwedana rêveberîya cewherî a kurdistanê tê dayîn.

Berxwedana li bakûrê kurdistanê, bo parastina hebûna civate kurd a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Civate kurd, di her qadê de rastî hêrîşan tê. Heta roja me, cûreyekî hêrşê nemaya ku rejima tirk bi wê hêrîşî civate kurd nekirîya. Î ro li bajarên kurdistanê, hêrîşên pirr mazin ên mazin li civate kurd dibin. Ji başûrê kurdistanê û şengalê û heta rojavayê kurdistanê û kobanê, bi deh hezaran kurd ji ber ku kurd bûn hatina qatil kirin. Î ro jî, li bakûrê kurdistanê li cizira bota, Silopî, Nisêbînê, sûrê û hemû bajarên din ên bakûrê kurdistanê heman rewş heya. Komkujiyên mazin li bajarên bakûrê kurdistanê, di vê demê de tên kirin. Kurd, li bakûrê kurdistanê di her qadê de li berxwe didin. Ya ku di vê demê de dikeve ser milê kurdan de ew a ku hemû dengê xwe bikina yek û dengê xwe derdixina. Li hemberî komkujiyên rejima tirk, dengê xwe bilind bilind bikin. Ber ku rejima tirk, jenosîdkirina civate kurd ji xwe re kirîya armanc. Bo vê yekê, vanqas komkujiyan dihênina serê kurdan.

….

**Li ser qatilkirina kurdan û rengê ´meşrû´ dayîn nîşandina wê ji aliyê rayadarên tirk ve..**

Heta roja me, bi hezaran kurd, di bin çavan de hatina windakirin. Her wusa, li nava sûkê ´înfaz´kirinên weke yên ´ceylan onkul hatina kirin. Di salên 1990´î de dema ku kurd di qarakolên tirkan de dihatina qatilkirin, ew mirovên ku hatina qatilkirin, wê bina deverekê û dênina bin latekî û bibêjin ´heya me ji wê tûna ya.´ Ev weke rêbazekî kuştinê bû. Lê bi demê re wê gelek rêbazên kuştinê werina lê zêde kirin. Di pêvajoya hêrîşên rayadarên tirk ên li rêveberîyên xweser ên kurdan de hat dîtin ku rayadarên tirk, çend mirovên sivîl dikujin, wê bi propagandanyan li ser

çapameniyê re bidina nivîsandin yan "di pevçûnê de hatîya kuştinû ´û yan jî wê bibêjin ´ewê ku hatî kuştin ne sivil a.´ Ev gotin, wê weke gotinna ´meşrû´ dayîna nîşandin a wan kuştin bin û weke gotinên ku bêdengîyê li hemberî van kuştinan bidina çêkirin bin.

Dema ku zaroka 12 salî a kurd ceylan onkul ji aliyê polîsên tirk ve hatibû qatilkirin, ji aliyê polîsan ve çekek hatibû dayîn li rex wê û bavê wê ku di wêneyê wê de were dayîn nîşandin. Li ser wê çeka ku danîna li rex wan re êdî ku bibêjin ku "di pevçûnê´ de ew hatina kuştin.´ Di pêvajoya hêrîşên leşker û polîsên tirk ên li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, farqînê, Sûrê û hwd, de, gotina ku bi îsrarî rayadarên tirk, bikardihênin ew a ku dibêjin ku "heta yekî bi çek hebe, wê ev oparasyon bidomê." Ev gotinên bi vî rengî, weke gotinên ku bi wan ser kuştina sivîlên ku bi destê polîs û leşkerên tirk ên dewletê ku tên kuştin ku binûxûmêne, bikardihêne. Di vê çerçoveyê de dadgehan jî bikardihênin. Ji xwe, dadgeh û ankû dozger, wê çawa leşker û polîsan bimaf derxin, rastkirinan di dadgehê û gotinên wê de dikin. Gotinên ku di wan dozan de dihênina ser ziman, bi serê xwe gotinên ku çawa wê kriminalize bikin in. Bi gotinaka din, pergale dadê, çawa di kriminalize kirinê de bikardihênin, di vê çerçoveyê de bikardihênin.

Dozên ku li ser kuştinên sivîl ên ku bi destê polîs û leşkerên dewletê bûna de jî, wê li demê belav bikin. Yan jî, weke rêbazeka sernûxûmandinê, cihê dozê vegûhezênina li devereka din ji herêmê. Lê wê, ti carî jî, biryaraka mahkûmkirinê wê li ser komkujiyên ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re dihênina serê civate kurd û kurdên sivîl jî, nedin. Weke doza roboskî, wê yan ´biryara ne şopandinê´ bidin û yan jî, wê weke doza qatilên kurdan ên weke Cemal temizoz de jî wê "biryarên baraatê" bidin. Yan jî, wê weke ku di doza qatilkirina Tahir Elçî û hwd de jî, wê belgeyên ne rast amede bikin û li ser wan re dozê bikin ku li gorî ku dixwezin biancam bikim.

Rêbazekî ku rayadarên tirk, pirr zêde bikarhanîya heya. Ew jî, li ser walîtîyan re ya. Walîtî, wê çawa, her kuştina ku sivîl bê û ne sivîl bê, wê çawa weke ´kuştina ku di nava şer de bûya û ankû weke kuştina ku di nava pevçûnê de bûya wê bidê nîşandin, di vê çerçoveyê de di nava hewldan xabataka mazin de ya. Bi wê re jî, di gelek kuştinên sivîl de jî, rêyek din jî, rayadarên tirk bikarhanîna. Ew jî, ew a ku bikujin û li ser çapameniyê re bidina nîqaş kirin ku ´kê kuşt´ û ankû "di nava gûla barandina herdû aliyan de hat kuştin, bo vê yekê, ne kifşa ku bi gûlan kîjan aliyê hatîya kuştin.´ Bi wê re jî, di vê çerçoveyê de wê

propagandayaka mazin li ser çapameniyê re bikin. Wê oparasyonên têgihê li ser çapameniyê re li mejiyê mirovan bikin. Di vê çerçoveyê de bi çapameniyê û nîqaşênn di nava rûpelên rojnemayên tirk de, pêşî dikin ku bidina nîşandin ku ne dewletê kuştîya. Piştre jî, wê li gorî wê pergale dozê bi biryarên ku bigrê re wê bikina dewrê de. Di vê çerçoveyê de di çerçoveya propagandaya li ser çapameniyê re bikarhanîna pergale dadê, wê di vê çerçoveyê de pirr zêde bibê.

Rewşeka din jî, heya, ew jî, ew a ku weke ku çawa ku me di 10´ê rêbandana 2016´an de dît. Pêşî di çapameniyê de hanîn ser ziman ku li Wanê, di ancama şer de 12 kesî jîyane xwe ji dest dana. Li ser çapameniyê de ev 12 kes, weke kesna ku bi hêzên dewletê re ketina şer de bi çekan, hanîn ser ziman. Lê piştre hin bi hin derdiket li holê ku hemû mirovên ku li wir dihat gotin ku li wir hatina qatil kirin, ne li wir hatina qatilkirin. Pirranîya, wan mirovan jî, weke ku piştre di çapameniyê de jî hat ser ziman ku zarok û ciwanên sivîl bûn. Pêşî polîsan ew kirina binçavan de û ew di bin çavan de hatina kuştin û ankû înfaz kirin. Piştre jî, rayadarên tirk, xwestina ku wan bibina Wanê û li wir, bikina malekê de û li wir bidina nîşandin ku di ancama şerekî bi çekdarî ê bi hêzên dewletê re de ew hatina kuştin. Lê ew mirov, weke ku piştre derdikeve li holê jî, mirovên ku hatibûbûna binçavkirin û piştre hatibûbûna ´înfaz´kirin bûn. Walîtîya Wanê, radigihêne ku "şer derketîya û ew di ancama wê de hatina kuştin." Lê mirovên li herêmê weke ´şahîdê bûyarê´ dibêjin ku "ti şer derneketîya." Ji xwe rewşa kuştina van 12 mirovan jî, balkêş bû. Pirranîya wan jî, bi gûleyeka ku ji anîya xwe ve xwarina hatina kuştin. Bi wê re jî, dema ku cenezeyên wan dihildina ´morgê´, yên ku wan dihildina morgê, dibêjin ku "ew mirov, dibêt ku çend roj berê hatibibina qatilkirin. Ji ber ku bêhneka pirr diwar bi cenezeyên wan ketibû. Mirovekî ku di wê kêlîkê de hatî kuştin, wê di cih de bêhn bi cenezeyê wî nekeve. Her wusa, cihê ku weke mal ku bo bûyarê hatibû bijartin jî, nêzîkî bînaya emniyetê ya û hinek saziyên din ên leşkerî ên dewletê ya. Yanî, ew herêmek ku dihê şopandin a.

Bi vî rengî mirovên ku din çav de hatina ´înfaz´kirin, dikin weke kuştîyên di ancama şer de bûna na. Bi vî rengî li ser înfazên di qarakolên polîsan de bigrin. Berê jî, minaqên bi vî rengî bûbûn. gelek mirovên sivîl qatil kiribûn û cilên şervanên tevgera kurd ên leşkerî li wan kiribûn û li cihekî çekek jî danîbûn berserê wan û bi vî rengî weke kuştinên di şer de di çapameniyê de hanîbûbûna ser ziman. Ev rewşa qatilkirina sivîlan û piştre weke kuştinên di ancama şer de bûna ku bidinan nîşandin, di dema

hêrîşên polîs û leşkerên tirk ên bi tank û topan li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Farqînê, sûrê û hwd de pirr zêde kirin. Li van bajarên kurdan bi dehan kurdên sivîl ên weke zarok pêçekê, ciwanên bin 18 salîyê re, pîr û kalên 70 salî û hwd, qatilkirin û piştre di çapameniyê de digotin ku "me terorîst kuştin." Li ser vê gotinê re jî propagandayên di nava rûpelên rojnemeyên tirk de dihatina kirin, bi wan dixwestin ku bidina nîşandin ku ew kuştin di ancama şer de bûna. Lê ev ne rast bûn. Di vê pêvajoya hêrîşên rayadarên ên bi polîs û leşkerên wê re li van bajarên kurdan bi tank û topan de, gelek mirov hatina binçav kirin û ew hemû mirovên ku hatina binçavkirin, di bin çavan de li qarakolên polîsan pêşî hatina êşkence kirin û piştre hatina înfazkirin. Her wusa, ev 12 kurdên sivîl ku li Wanê di 10´ê rêbendanê 2016´an de ku hatina qatilkirin û piştre walîtîyê di cih de ragihand ku di ancama şer de hatina kuştiin jî, gelek ji wan mirovên ku hatibûbûna xistin ên binçavan û piştre ku di bin çavan de hatibûbûna ´înfaz´kirin bûn.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rayadarên tirk bi polîs û leşkerên xwe re heta roja me, bi vî rengî bi sedan kurdên sivîl û bêgûneh qatilkirina û piştre, li deverekê ew bicih kirina û polîsan her yekê li ber serê van çekek bicih kiriya û piştre waalîtîyê bi denezenê ragihandîya û gotîya ku ew di ancama şer de hatina kuştin û bi vî rengî ser wan kuştinên sivîl hatîya nûxûmandin. Rewşa şer, di vê çerçoveyê de raaydarên tirk, li ser çapameniyê û ragihandinên li ser walîtîyan re pirr zêde îstîsmarkiriya. Piştre jî, wê çend rayadarên tirk û ankû sîyesetmederên wan ên weke T. Ardogan û ankû Dawutoglu derkevina berçapameniyê û li ser van kuştinan re bibêjin ku "tekoşîna me ya bi terorê re bi serkevtî bi rêve diçê" û êdî wê bi vî rengî li ser înfazkirinên sivîl binûxûmênin. Bi vî rengî gelek kurd, hatina qatilkirin, li ser wan re rewşa bûyîna şer dana nîşandin û piştre jî, ew kurd, wusa mana. Ev jî, bo çi kirina? Bo ku ser wan kuştinên sivîl binûxûmênin, kirina. Di rewşa kuştina Tahîr Elçî de jî, xwestibûn ku kuştina Tahîr Elçî, weke kuştinaka ku di dema ku di nava dû alîyan de şer derket û nizanin ku ji kîjan aliyê ve gûla lê hat barandin, bidina nîşandin. Her wusa, di vê çerçoveyê de li ser rewşê re jî, bi nivîsandinên ku di rojnemeyan de dinivîsênin jî, dikin ku bidina nîşandin ku ne hêzên dewletê kirîya bidina nîşandin.

Heta roja me, gelek înfazên weke kuştina sivîlan ku polîs û ankû leşkerên tirk kirina, pêşî walîtîyê bi vî rengî li ser wan re ragihandîya ku ew di ancama pevçûna çekdarî a bi hêzên dewletê re de hatina kuştin û piştre jî, wê rayadar û sîyesetmederên tirk derkevina berçapameniyê û

bibêjin ku tekoşîna me ya bi terorê re serkevti dimeşê, û wê bi vî rengî ser van înfazên sivîl ên bi destê polîs û leşkerên dewletê binûxûmêne. Ev rengê ragihandinê ê li ser çapameniyê re wê weke rengekî ragihhandinê pirr zêde ku rayadarên dewletê bi wê ku ser înfazkirina sivîlên bidestê polîs û leşkerên dewletê ku bi wê dinûxûmênin a. Gelek sivîl qatil kirina û weke şervanên bi çekdar dana nîşandin û bi vî rengî ser wan hatîya nûxûmandin. Bi vî rengî, êdî kirina ku bidina nîşandin ku wan sivîl înfaz nekirina. Heta roja me, di vê çerçoveyê de bi sedan kuştinên sivîl bûna û ew kuştin, weke kuştinên di nava şer û ankû pevçûnên bi çekdarî de bûna hanîna ser ziman. Di şerê rejima tirk ê bi civate kurd re de ev rêbaza înfazkirina kurdên sivîl, heta roja me, rayadarên tirk bi polîs, leşker û hêzên xwe yên teybet re bikarhanîna. Weke ku çawa ku dema ku hêrîşî Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Farqînê, Sûrê û hwd dikin, kurdên sivîl dikujin û radigihênin û dibêjin ku "me terorîst kuştina." Di vê çerçoveyê de rewşa şerê rejimê ê li kurdistanê li hemberî civate kurd ku di bin navê ´terorê´ de dimeşênê, pirranîya kuştinên sivîl jî, di wê çerçoveyê de wan de nîşandin.

Rayadarên tirk, ev rêbaza înfazkirina sivîlan û piştre weke ´terorîst´ dana nîşandinê, weke rêbazekî tafisandin û bêdengkirina nava civatê bikarhanîya. Heta ku bi wê re jî, gelek înfazên sivîl kirina, û ew înfazkirin, avêtina sûkra hinek rêxistinên din ên weke tevgera azadîya kurd û hwd. Carna jî, tenê bo ku li ser çapameniyê re bo reşkirinê bike, sivîl dikuştin û diavêt sûkra tevgera kurd. Di vê çerçoveyê de jî li ser çapameniyê re nîqaş dana destpêkirin.

Di çerçoveya bikarhanîna çapameniyê de jî, mirov dikarê vê jî bibêje ku çendî ku artişa tirk bi tank û topan hêrîşî bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Silopî, Şirnaxê, Nisêbinê, farqînê, Sûrê û hwd dike û bajaran bi hêrîşên bi tank û topan xira dike, û li ser wê re rayadarên tirk dikarê bibêje ku ´ez parastina sivîlan dikim." Lê ev hemû derew û manipûlasyon in. Hemû kuştinên sivîl ku dikin, dikarin, weke "terorîst"an bidina nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de jî ji hemû nirx û ahlaqê mirovatiyê dûr dikarin, propaganda jî bikin. Minaq, rejima tirk, tevî zimanê civate kurd qadaxa kirîya û bi serê ku bi wê re dike, dixwezê ku wê ji dîrokê re bibe, lê bi awayekî bêahlaqî wê derkeve û bibêje "birayê minê kurd." Ev gotin hemû jî, weke gotinên propagandativ ên bi armanca ser komkujiyên ku dikin bigrin bikarbênin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li ser çapameniyê re oparasyonên têgihê çawa li hemberî mejiyan bi vî rengî dimeşênin, mirov dibînê.

Çapameniyê û rêyên ragihandinê, çawa weke rêyên sernûxûmandinê û vajî nîşandinê bikardihênin, mirov bi awayekî vekirî dibînê. Di pêvajoya hêrîşên rejima tirk ên bi artiş, polîs û leşkerên wê re ku bi tank û topan li civate kurd dikir de, wê çawa nehêle ku mirov rastiyê bibînê, mirov şahidiya wê dike. Ji her heyvên dawiya sale 2015´an û heta heyva pêşî a sale 2016´an, rayadarên tirk bi polîs û leşker û tankên giran hêrîşî bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, farqînê, sûrê û hwd kir, bajar xira kir û kirin kavil. Bi sedan kurd qatilkirin û bi deh hezaran kurd, ji cih û warên wan hatina goçberkirin. Lê di çapameniyya tirk de, win rastî tenê gotinekê jî di derbarê wê de nayên. Vêca, wê dîsa di demên piştre bêî ku fihet bikin û şerm bikin, wê derkevin û gotinên weke "biratîya kurd û tirk" werênina ser ziman. ... ..

**Şibîna pêvajoya hikimetên AKPê ji sale 2001ê û heta sale 2016an li dema destpêka komarê ya navbera salên 1923´an û heta salên 1937an.**

Heta roja me, gelek ciwanên kurd hatina qatilkirin ji aliyê hêzên rejima tirk ve. Em dikarin ji destpêka komarê, dem bi dem kronolojîya komkujiyên kurdan ên ku rayadarên tirk li ser serê kurdan û civate kurd kirina werênina ser ziman. Di nava kurdan de dema ku bahse "komkujîya zilanê" dihê kirin, dihê gotin ku "çem ava wan sor diharikî. Bêhna laşan ne dihişt ku mirov bêhnê hilde." ..

Bi heman rengî jî, dema ku bahse "komkujîya dersimê" dihê kirin, gotinaka ku bi navê wê re bûya yek jî, ew a ku tê gotin ku "leşkerên tirk, bi singên tifingan zikê jinên kurd diqalaştin û zaroka wê ya ku di zikê de derxistin û bi serê singa tifingê ve dikirin. Bi heman rengî dîsa bi komkujiya dersimê dihê ser ziman ku bi hezaran jinên kurd, dihatina serê latên bilind û bo ku bi saxî nekevine destê leşkerên tirk de ku dest biavêjina namusa wan, xwe ji latan diavêtin û dawî li jîyane xwe dihanîn. ..

D wê dema komkujiya dersimê de leşkerên tirk, dersimî tişî şikeftan dikirin û gass diavêtina wan. Weke ku rayadarên tirk bi nav dikir, digotin ku "weke haşaratan, bigassê ew tûna dikirin.

Ji wê demê û heta roja me, ti tişt ne gûharî. Kiryarên rejima tirk ên li hemberî civate kurd, ku di wê dema komkujiya zilanê û komkujiya dersimê de li hemberî kurdistanîyan çawa bû, di vê demê de jî wûsa bûya. Jin û dayikên kurd, di wê demê de jî rastîya leşkerên tirk û zihniyeta wan ya bênamus nas dikirin û dizanin. Bo vê yekê, li şûna ku sax bikevina destê wan, xwe di latan de diavêtina xwarê û dawî li jîyane xwe dihanîn.

Rayadarên tirk, di şerê xwe yê bi armanca jenosîdkirina civate kurd, serî li her rê û rêbazê daya. Kuştin û qatilkirin, destavêtin û tecewûz, girtin û êşkence kirin û hwd jî di nav de wê gelek rê û rêbazan li hemberî civate kurd bikarbênin. Di her hêrîşên xwe de wê çawa rûmeta civate kurd bişikênin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikirin. Bo vê yekê, bi çi rengê û şêwayê rûmeta civate kurd wê biheta şikandin, wê bi rengê û şêwayê rengê hêrîşên xwe pêş bixin. Destavêtinên weke tecewûzê ku li hemberê keçên kurd pêşketina bi destê leşker û polîsên tirk li bajarêmn kurdan ên weke Elihî, Sêrtê, Dersimê, Şirnax û Cizira bota û pirranîya bajarên din, mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê bahse bi sedan bûyarên destavêtinê ên bi destê leşker û polîsên tirk bike. Hemû jî, di vê çerçoveyê de bi plan û di çerçoveya konseptekê de li hemberî civate kurd hatina pêşxistin.

Piştre, di dema tekoşîna azadîya civate kurd de jî, wê rayadarên tirk, di çerçoveya konseptekê de gelek rewş û bûyarên bi vî rengî pêşbikexin. Armanc, ew a ku ji aliyê deronî ve di rewşek şikeştî de bihêlin. Bo vê yekê, weke ´hêrîşên rûmet şikandinê´ û ankû weke ´hêrîşên ku rûmetê armanc digirin´, van pêş dixin.

Êşkenceya li cenezeyên ciwanên kurd ên ku ji aliyê leşker û polîsên dewletê ve hatina qatilkirin, wê bê kirin. Her wusa, rewşa **EKÎN WAN** weke tenê rewşek ji wan rewşên ku berê wê rayadarên tirk hanîna serê civate kurd a. Her wusa, bi heman rengî, rewşa qatilkirina dayika kurd Teybet Înan û ne hiştina hildana cenezeyê wê ji deve derîyê wê hefteyekê, wê rewşeka ku bi şêwayeke din ku bi wê hatîya xwestin ku derûnîya civate kurd bikişênin a.

Di aslê xwe de, di vê dema de ku hêrîşên polîs û leşkerên tirk li bajarên kurdan bi armanca şikandina vîna civate kurd û tafisandina wê ku

zêde bûya de wê ciwanên kurd qatil bikin û nehêlin ku cenezeyên wan werina hildan ji cihê ku li wê hatîya qatil kirin. Her wusa, bi rojan, cenezeyên ciwanên kurd, li cihê ku li wê hatina qatil kirin mana li ardê. Di şerê jenosîda kurd de, ev rewş, ne rewşek nû bû ku di sale 2015´an de pêşketibû bû. Berî wê, di dema komkujiya agirî, komkujiya Zilanê û komkujiya dersimê de jî rewşên bi vî rengî di dema kirina komkujiyan de rayaderên tirk bi polîs û leşkerên xwe hanîna serê civate kurd.

Vê dema desthilatdarîya hikimetên AKP´ê ji sale 2001´ê û heta sale 2016´an jî, mirov dikarê bişibihêne pêvajoya di nava sale 1923´an û heta sale 1937´an de a. Her wusa, ev pêvajo, di vê çerçoveyê de ji gelek aliyan ve di şibihina hevdû. Di destpêka komarê de ji sale 1923´an û pê de, rayadarên tirk, bo ku xwe serdest bikin, wê hemû neteweyên din ên weke kurdan û hwd, wê bitafisênin. Wê komkujiyan werênina serê wan. Ji xwe, heta ku dem tê sale 1923´an, komkujiyên Ermeniyan biribûbûna sêrî. Di wê navberê de jî komkujiyên weke komkujiya koçgirî hanîbûbûna serê civate kurd. Piştre jî, di dewama wê de, li agirî, botanê, dersimê û herêmên din ên kurdistanê, wê komkujiyên din ên bi armanca tafisandinê wê werênina serê civate kurd.

Di destpêka komara tirk de ji sale 1923´an û heta sale 1937´an, rayadarên tirk, çi polîtika pêşxistin û hanîna serê civate kurd û çendî komkujî bi armanca tafisandina civate kurd hanîna serê civate kurd, di vê demê de ji sale 2001´ê û heta sale 2016´an, wê hikimetên AKP`ê wê werêne serê civate kurd. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov, pêvajoya destpêka komarê a ji sale 1923´an û heta sale 1937´an, bi ya hikimetên AKP´ê ku ji sale 2001´ê û heta sale 2016´an re bişibihêne hevdû.
Piştî dilgirtina birêz Ocalan, AKP´ê, weke partîya destpêka komarê ya ku ji sale 1923´an û heta sale 1937an desthilatdar bû, hat bi erkkirin û wesifkirin. Karê ku di wê demê de wê partîya komarê ya destpêkê kevneşopîya CHP´ê ku kiribû, wê di vê demê de AKP´ê û kevneşopîya wê ya ku li ser olê re dihat şîrovekirin, wê bi wê bikiran. Plan, streteji û zihniyeta komare tirk ya wê demê ya ku î ro AKPê bi wê hat pêşxistin ku wê kurd bitafisandina. Lê kurd, ne kurdên wê demê bûn. Di wê demê de li ser qatbûna bi aşîran re ancam bidest xistibûn. Di vê demê de jî dixwestin ku bi olê û aşîrên herêmê ku ji nû ve bi wê zihniyetê zindî bikin û li ser wê re ancamê bidest bixin. Mirov dikarê bibêje ku politikayên destpêka komarê ên ku rayadarên tirk li hemberî kurdan ku ji

sale 1923´an û heta sale 1937´an pêşxistibûn, di vê demê de li ser AKP´ê re weke ku ji nû ve hatibûbûna şîrovekirin û bi wan stretejiyên tafisandina kurdan hatibûbûna pêşxistin.

Ji aliyekî ve dema ku mirov bixwezê rastî û politikayên AKP´ê ên ji sale 2001´ê û heta 2016´an fahm bike, wê çaxê divê ku mirov politikayên destpêka komarê ên bi armanca tafisandina kurdan ku ji salê 1923´an û heta sale 1937´an ku hatina pêşxistina, hilde li dest, fahm bike û di berçav de derbas bike.

Di destpêka hanîna AKP´ê li ser desthilatdarîyê, bi planaka nû ya bi vî rengî hanîbûbûna ser desthilatdarîyê. Piştî girtina birêz Ocalan, misyona ku rejimê danîbûû ser milê AKP´ê ew ku bû ku wê derbeyek mazin li tevgera kurd a azadîyê bixista û wê civate kurd, weke pêvajoya salên 1923 û heta sale 1937´an wê bitafianda. Komkujiya dersimê, di aslê xwe de weke komkujiya dawî a vê pêvajoya destpêka komarê bû ku hanîbû serê civate kurd. Li ser vê komkujiyê re rayadarên tirk, digotin ku wê êdî kurd, ti carî newin dernekevina dika dîrokê." Ji salên 1937´an û heta salên 1960´an wê li kurdistanê bêdengîyek serdest bê. Di vê demê û pêvajoyê de ên ku navê ´kurd´ û ´Kurdistanê´ bikardihanîn jî, rastî cezayên giran dihatin. Heta ku di hatina êşkencekirin û kuştin jî.

Di vê çerçoveyê de pêvajoya dawî a ku rejima tirk li ser AKP´ê re pêşxistibû û gihandibû stretejiyeka tafisandina civate kurd, weke pêvajoyeka ji gelek aliyan ve hatibû birêxistin kirin bû. Heta ku ne tenê bakûrê kurdistanê, başûrê û rojavayê kurdistanê jî di nav de, wê derbeyek li kurdan bixista. Gotina Dawutoglu a ku weke serokweizirê hikimeta AKPê ku digot ku ´me ev konsepta şer a dawî di sale 2013´an de çêkiribû", rast bû. Di vê demê de di vê çerçoveyê de û di çerçoveya plan û konseptek bi vî rengî de li bakûrê kurdistanê hizirîbûn. Lê pêvajoya hêrîşên DAÎŞê ên li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê jî, weke lingekî vê plan û konsepta şer a li bakûrê kurdistanê bû. Rayadarên tirk, hizir kiribûn ku wê DAÎŞ, li başûr û rojavayê Kurdistanê derbeyek mazin li kurdan bixista û piştre wê jî, wê li ser wê derbeyê re pêvajoya ku weke konsepta şer a li bakûrê kurdistanê ku birêxistin kiribûn û plan kiribûn, wê êdî kiriban dewrê de û wê ancam bidest xistiban. Lê dema ku DAÎŞê, nikarî ku derbeyê li kurdan bixe, êdî weke ku plana wê ya ku di

çerçoveya şikandina kurdan û tafisandina wan de jî, weke ku şikeştin xwaribû.

Di destpêka pêvajoyên hêrîşên DAÎŞê ên li rojava de T. Ardogan bixwe diçû, ber sînorê rojava li dîlokê û digot ku "kobanê jî ket, dikevê." Ev gotin û gotinên bi vî rengî, di vê çerçoveyê de di çerçoveya plan û konsept û stretejiya ku bi şer şikandina kurdan ve girêdayî bû.

Di salê 2014´an de, planaka giştî li hemberî civate kurd hatibû pêşxistin.Hemû goçberkirinên ji rojavayê kurdistanê û kobanê û ji başûrê kurdistanê û şengalê jî, di vê çerçoveyê de di çerçoveya vê konsepta şer de hatibû hizirkirin ku were pêşxistin û hat pêşxistin jî. Di vê çerçoveyê de bi wê re êdî li bakûrê kurdistanê wê şer pêşxistiban. Şerê ku hikimeta AKP`ê î ro li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd pêşxistîya, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman. Dema ku mirov, şerê rejima tirk ê li bakûrê kurdistanê tenê bi bakûrê kurdistanê ve bi sînor bi hêncet bike û werêne ser ziman, wê rastîya wê newê fahm kirin. Konsepta şer a ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê, ji piştî 7ê hezîrene 2015´an û pê de kir merîyetê de li hemberî kurdan ku weke plan û stretejîya ´tafisandin´, ´ perçiqandin´ û ´şikandinê´ dihê bi navkirin, bi pêvajoya şer a ku ji ´êlûna 2014´an a ku bi şerê DAÎŞê ê li hemberê kobanê û rojava ku pêşketibû ve girêdayî divê ku mirov hilde li dest. Şerê rejima tirk ê bi kurdan re ku wê di dema komarê de ji sale 1923´an û heta sale 1937´an ku hatibû pêşxistin li hemberî civate kurd, çi ancam bi xwe re hanîbû, di vê dema hikimetên AKP´ê de ku ji sale 2001´ê û hete sale 2016´an, di xwestin ku heman ancamê bidest bixin. Bo ku rastîya wê baştir were fahmkirin, divê ku mirov, bi pêvajoya hêrêşên DAÎŞê ên li başûrê kurdistanê û şengalê û rojavayê kurdistajê û kobanê ve girêdayî di çerçoveyekê de hilde li dest û werêne ser ziman. Ji ber ku ev stretejiyeka giştî ku giştîya kurdistanê kiribû nava xwe de hatibû pêşxistin û di wê çerçoveyê de plana şerê bi civate kurd re hat pêşxistin. Berî hêrîşên DAÎŞê li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê, ew gera T. Ardogan a li Îranê ku di qasra sadabadê de li hevdû civîyan, di wê de ev steretejî û plana şikandina kurdan jî, di wê de hatibû rojevê. Îran jî, bi wê civînê, weke ku tevlî vê stretejî û plana şerê li hemberî civate kurd hatibû xistin.

Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji sale 1923´an û heta sale 1937an, pêvajoyek şer a giştî li hemberî civate kurd hatibû

pêşxistin. Piştî ku bi wê pêvajoya şer, ku civate kurd hat şikandin û pê de, li ser wê re li qasra sadabadê di sale 1937´an de hatibû li darxistin. Di sale 2015´an de xwstina dûbarakirina wê li ser serê civate kurd, bi wê gerê re xwe dabûbû li darxistin. Plan û stretejiyeka di vê çerçoveya di giştî hatibû amede kirin ku bi wê derbeyê li kurdan bixin. Hemû hêrîşên di pêvajoya hêrîşên DAÎŞê li başûr û rojavayê kurdistanê û piştre hêrîşên polîs û leşkerên tirk ên li bakûrê kurdistanê ku di dewama wê de dihên kirin, di çerçoveya vê stretejî û plana şikandina kurdan de dibûn.

..

**Bêdengîya rayadarên ewropî û saziyên wê li hemberî komkujiyên rejima tirk li ser serê civate kurd**.

Li vir, di dewama mijarê de divê ku mirov vê yekê jî werênina ser ziman ku di vê pêvajoya ku rayadarên tirk bi konseptek şer hêrîşî kurdan dikin, bêdeng dimênin. Çend ku hinek dengên ferdî û hinek saziyên ku deng derdixin jî ku hebin jî, wê ev deng derxistin, wê bêdengîya esasî a rayadarên ewropî û saziyên wê yên sîyesî ji holê ranekê.

Temenê pêvajoya bêdengîya rayadarên ewropî, di destpêka pêvajoya şer a ku rejima tirk li hemberî civate kurd da da destpêkirin de wê, li ser peymanên ku li ser rewşa goçber û peymanên ku çê dikin re wê biafirênin. Her wusa, rojnemeyên ewropî ên weke «the economist» ku dem bi dem weke ku di 5´ê sibatê û hwd de dike ku bi nivîs û gotarên ku li ser rewşa rejima tirk û kurdan binivîsêne jî, lê ev nivîsandin wê di çerçoveyekê de bimênê.

Lê bi wê re jî, rayadarên tirk, ew plana ku weke li gorî rojevê û demê nûkirina ´zagona şerq û îslahatê´ jî dihê di nav kirin a şer ku rejima tirk bi armanca şikandina kurdan pêşxistîya, bi pêlên hêrîş û şerê ku rejima tirk li ser serê civate kurd daya destpêkirin re wê bidine domandin. Ev plana ku weke ´şikandin´ û ´ xistinê´ û hwd ku dihê bi nav kirin, wê bê domandin. Pêvajoyên şer wê li kurdistanê, ji aliyekî ve weke ku rejima tirk bi hemû hêzên xwe yên bi çel û leşkerî û hwd, wê hêrîşî civate kurd bike. Lê bo ku ser wê şerê jî binûxûmêne li berçavên cihanê, wê rayadarên tirk ên weke ´dawutoglu´ û hwd, li kurdistanê ´gerên bi navê ´hevdîtinên bîratiyê´ li darbixê. Di wan hevdîtinên ku qaşo dikin de jî,

gotinên di çerçoveya konsepta şer de dihênina ser ziman. Her wusa, wê çawa bi gotinên ji devê rayaderan tirsandinê di nava xalkê de û di dilê mirovan de bidina çêkirin, di wê çerçoveyê de gotinan dihênina ser ziman.

Gera dawutoglu a li mêrdînê û axiftina wî ya li zanîngeha ´artuklu´yê ku di çarê sibatê de ku kir jî, mirov dikarê weke minaq û birhana vê rastiyê werênina ser ziman.Di aslê xwe de ew new hevdîtinên biratiyê na. Ew gera dawutoglu û gerên din ên ku rayadarên tirk di asta bilind de li herêmê dikin jî,wê di çerçoveyeka ku wê çawa rewşa sîyesî a civate kurd ji holê ra bikin, tirsê ku di nava civate kurd de bidina çêkirin û li ser wê re kontrola xwe li ser nava civatê çê bikin, gerên ku di vê çerçoveyê de ên ku hatina plan kirin in. **Ancama zihniyet û gotinên Dawutoglu ên ku di zanîngeha Artuklu´yê kir, di 8´ê sibate 2016´an, nûçeya ku ji Cizira bota dihat, di wê de dihat gotin ku «bi dehan kurd, bi carekê ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve hatina qatil kirin» bû.** Lê aliyekî din jî vê komkujiya ku di wê de bi dehan kurd hatibûbûna qatilkirin hebû. Di her rojên giring ên weke birhanîn û cejnan de hêzên tirk, komkujiyek hanîna serê civate kurd. Rasthatina 15´ê sibate ku kurd weke ´roja reş´ bi nav dikin a dilgirtina birêz ocalan û radestkirina wî li tirkiyê ku nêz dibê de kirina vê komkujiyê, wê bi armanca pêşîlêgertina zêde hatina li berçav a xwepêşandinên şermazarkirina dil girtina birêz ocalan jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Di roja newroza 2015´an de bi alikariya tirkiya li Hesekê komkujiyek bi heman rengî hanîbûbûna serê civate kurd. Her wusa, newroza sale 2016an jî nêz dibû û gûmana kurdan jî zêde dibû ku wê dîsa rayadarên tirk serî li komkujiyên bi heman rengî bidin. Ji van gerên ku rayadarên tirk jiv ê demê û pê de kirin, ji wan dihê fahmkirin ku hizirkirina ku wê pêşî bi pêlên hêrîşan ên bi hêzên çekdarî û leşkerî derbeyê mazin li civate kurd bixin û piştre li ser wê re êdî wê van geran bikin û bi wan geran êdî «serkevtina» xwe qaşo denezênin ku civate kurd êdî kirina bin kontrola xwe de.

Çendî ku em nikarin oparasyonên ku **17 kanûna 2001**´ê ku hikimeta tirk ku di wê demê de ´hikmet samî turk´ wezirê dadê bû ku li zindanan kirin û ku weke «oparasyonên wergera li jîyanê» bi navkirin û çendî ku em nikarin bi vî navî bi nav bikin, her wusa, bi heman rengî jî, hevdîtinên ku rayadarên tirk li kurdistanê ku di bin navê gotina «hevdîtina biratiyê» de dikin jî, em nikarin bi vê gotinê bi nav bikin. Ev bi navkirin, tenê

mirov dikarê weke oparasyona têgihê a li mejiyan werênê ser ziman. Ti farqe **gotina ´hikmet Samî turk» a bo oparasyonên ku li zindana kirin û di wê de bi dehan kes qatilkirin ya «oparasyonên wergera jîyanê» û gotina ku gera dawutoglu a li merdînê bi wê hat bi navkirina a bi navê «hevdîtina biratiyê» ji hevdû tûna ya.**

Hikmet Samî turk, ew oparasyona ku li zindana da kirin û di wê de bi dehan kesên bi gûneh hatina qatilkirin, navê «oparasyona wergera li jîyanê» li wê kiribû. Ev jî, bi armanca ku di demên piştre de ku dema ku miirov li wê oparasyona li zindana hizirîn ku di mejiyê de hizrek çê bibe û bibêjin ku «bo ku jîyane mirova xilas bikin, ew oparasyon kirin.» Yanî bi vî rengî, weke gotinaka ku rayadarên tirk bi wê di çerçoveya mejiyê mirovên pêşarojê de bi wê hizirî bûbûn. Wê çawa ser wê zihniyeta ku bi wê ewqas miirov di wê oparasyonê de qatilkirin ku wê ser wê binûxûmênin, di wê çerçoveyê de ev gotin hatibû gotin. Bi heman rengî, di çerçoveya oparasyonên têgihê de aliyekî vê gotina ´hevdîtina biratiyê´ jî, bi vê zihniyetê mirov dikarê werêne ser ziman.Di seatên ku dawutoglu li zanîngeha ´artuklu´yê axiftin dikir de wê, polîs û leşkerên tirk li cizîrê awahîyeka ku bi dehan kurdên sivîl xwe sipartina wê de wê bi tankan topbaran bikin û ser 10 mirovan re kurdên sivîl qatil bikin. Di aslê xwe de ev komkujiya ku di heman seatê de li cizîrê polîs û leşkerên kiribûn, rastîya zihniyeta rejima tirk a di bin gotina ´hevdîtina biratiyê´ de jî radixist li berçav.

Di aslê xwe de ew ger, armanca wan weke dihat hanî ser ziman, ne ´pêşxistina têgihiştina biratiyekê bû li herêmê. Armanca wê wê gerê, li ser gotin û nivîsên ku bi wê di rojnemeyan re binivîsênin re ew bû ku dîmenekî bidina dervî tirkiya û ankû rayadarên ewropî û cihanê ku ew li herêmê serdest in û her wusa hêrîşî xalkê sivîl nakin. Yanî, gerên bi vî rengî, di çerçoveya ´maske´ kirin û sernûxûmandina komkujiyên sivîl ên li herêmê ku polîs û leşkerên tirk dikin bigrê ya. Di vê çerçoveyê de weke gereka manipûlakirina rastîyan jî mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî wê rojnemeyên tirk, ne li ser komkujiyên ku polîs û leşkerên tirk ku li herêmê dikin re wê gotinê bibêjin. Wê tenê, li ser gerên bi vî rengî û gotinên dihênin ser ziman weke bi navkirinê re wê gotinê bibêjin û wê aqilek û têgihekê di mejiyê mirovan de di çerçoveya ser komkujiyên sivîl ên li herêmê binûxûmênê de wê gotinê bibêje û dîmenekê bi afirînê.Yanî, ew gerên bi vî rengî, wê i çerçoveya

oparasyonên têgihê de bin.Ji xwe, rayadarên ewropî jî bêdeng in li hemberî komkujiyên ku rayadarên tirk, ku li herêmên kurdan kirina bêdeng in. Di çerçoveya dorpêçkirina hêz û artişa tirk a li ser cizîra bota, Sûrê û hwd de serî li «dadgeha mafê mirov a ewropa» hatibû xistin. Lê dadgehê, biryarên ku dan, weke ku temenê komkujiyên rejima tirk li kurdistanê dike ji nedîtî ve were biryarê didê. Ji wan biryarên dadgeha mafê mirov a ewropa, rayadarên wêrebûnê digrin û hêrîşên ku dihênina serê civate kurd didomênin. Li bajarên kurdan ên weke Cizîra bota, sûr, farqînê, geverê, nisêbînê, silopî, û hwd, li gelek bajarên din ên kurdan ên bakûrê kurdistanê, dîmenên xûrîxandinê ku DAÎŞê li kobanê bi hêrîş û topbaranan dabû bû çêkirin, li van bajaran dihat dîtin. Malên xalkê, bi tememî, bi serê wan de dihat rûxandin. Lê tevî wê jî, cihan bêdeng dimênê.

Bi fermana T. Ardogan û dawutoglu, wê polîs û leşkerên tirk, bi tank û topan û heta ku cih bi cih wê bi balafirên şer, wê hêrîşî bajarên kurd û nava bajarên kurd bikin. Li bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizîra bota, nisêbînê, silopî, şirnaxê, geverî, farqînê, sûrê û hwd, wê tax bi tax nava bajaran were xûrixandin. Dema ku artişên nazîyan di dema şrê cihanê ê duyemin de ku hêrîşî moskova kir û dimenên xûrixandinê ku hatibûbûna afirandin, me bi hêrîşên artişa tirk ên li bajarên bakûrê kurdistanê ên weke Cizîra bota, nisêbînê, silopî, şirnaxê, geverî, farqînê, sûrê û hwd, me didîtin. Artişên nazîyan, bi topbaran û bombabaranên balafirên şer, bajarê moskova kiribûbûna kavil û harabê. Heman dîmen, me li van bajarên kurdan dûbare didît. Ya ku rayadarên tirk, dixwestin ku di bin maskeya gotina «hevdîtinên biratiyê» de ku wê binûxûmênin, ev dîmen û rengê hêrîşên wan ên weke ya artişên nazîyan bû.

….

**Civîna Cenev a 3 û hewldanên astengkirina tevlîbûna kurdan li wê, şerê rejima tirk ê li bakûr kurdistanê û weke stretejîyeka jenosîdkirinê; bikuja û înkar bike ku te kuştin kirîya ..**

Weke ku civîna duyem a cenevê di 25´ê rêbendana 2015´an de destpêkiribû û bêancam bi dawîbû bû, civîna cenevê a sêyem jî di sale 2016´an de di 25´ê rêbendanê de destpê dike. Weke ku çawa ku di dema

civîna duyem a cenevê de tirkiya bi T. Ardogan re dîplomasî li hemberî kurdan li ewropa kir û ne hişt ku kurd tevlî wê bibin, bi heman rengî di dema civîna sêyem a cenevê de jê Dawutoglu ji tirkiya tê ewropa û dîplomasiyê li hemberî kurdan dike ku nehêlin ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyem werina kirin. Li herêmê, ev sê salên dawî ku herêm hatkirin weke gola xwûnê, hê jî sîyeseta wê tê kirin. Li Sûrî, şerê ku hat dayîn destpêkirin, hat xistin weke şerê jenosîdkirina civatkên li herêmê. BI milyonan mirov ji cih û warên xwe bûn. Bi teybetî jî li pişt hemû komkuji û goçberkirina, rejima tirk û hinek rejimên din ên ku di wê çerçoveyê de sîyesetê dikin in. Li Sûrî, ev sê salên li ser hevdû civîn tên li dar xistin u wê çawa çareserîyekê bibînin. Lê di hemû civînên ku tên li darxistin de jî, ji ber politikayên rejimên herêmên ên weke rejima tirk, hemû civîn jî vala dimênin û bêçareserî dimênin.

Rejima tirk, li dijî statûya kurdan a. Heta roja me jî, şerê ku li sûrî û bi teybetî li herêmên kurdan hatîya meşandin, ku bi destê çeteyên DAÎŞ û hwd jî bin, tirkiya li pişt wan a. Ev rewş, hê jî dimênê. Her wusa, li vir, divê ku miirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ji başûrê kurdistanê bi teybetî ji şengalê û ji rojavayê kurdistanê û bi teybetî ji kobanê, bi sed hezaran kurdên ku ew ji herêmê hatina dayîn goçberkirin, dîsa tirkiya li pişt a. Ji ber çi tirkiya li pişt a? Ji ber ku dixwezê ku herêm ji kurdan vala bibê bo ku statûyekê bi navê xwe bidest nexin. Her wusa, di vê çerçoveyê de statûya meşandîya.

Hemû goçberîyên ku di destpêka şerê DAÎŞê de bi zorê hatina dayîn goçberkirin li tirkiyê, di vê çerçoveyê de bo ku bikina temenê politikayên ´şantajê´ bû. Bo vê yekê, ew mirov ji herêmên wan hatibûbûna dayîn goçberkirin. Ev rewşa, va goçberên li tirkiya ku li ser wan re bo ku wan li tirkiya bidina girtin ku peyman bi ewropa re li ser wan re çêkirin, ev jî, weke şantajeka vê pêvajoyê ya rejima tirk ku bikardihêne ya. Bi gotinaka din, ev rewş, ne rewşên ku ji ber xwe bûna. Rewşên ku di çerçoveya hinek politikayan de hatina afirandin in. Rewşa trejedîya goçberan jî mirov dikarê di wê de bahse wê bike ku ew jî hatîya pêşxistin.

Di vê demê de tê rojevê ku di civîna sêyem Cenevê were li darxistin. Tirkiya jî, li welatên ewropî dîplomasiyê dike ku kurdên rojava dervî wê civînê bihêlê. Di vê çerçoveyê de diplomasîyekê dimeşênê li welatên ewropî. Ji xwe, dicvîneka bi vî rengî ku kurd, di nav de nebin, wê ne serkevtî bê. Ji xwe ya ku tirkiya jî, dixwezê ku ev bicivîn çareserîyekê nebînê û bisernekevê. Bo vê yekê, tirkiya dihizirê, û ji xwe re dibêje "madem kû, ez nikarim pêşîya li darxistina wê bigrin. wê çaxê,

wê çawa ev civîn bisernekevê, di wê çerçoveyê de ezê sîyesetê li ser wê re bikin. Di vê çerçoveyê de jî, bi teybetî, weke rêyeka ne serkevtinê jî, hewldana astengkirina kurdan ku tevlî civînê bibin, li ser wê re sîyesetê dike. Herkesek û dûnya alem jî dizanê ku dema ku kurd, tevlî vê civînê nebin, wê ev dicvîn ne serkevtî bê.

Î ro, li Sûrî û bi teybetî li rojavayê kurdistanê, hêza herî çalak a li hemberî çeteyên DAÎŞê û hwd tekoşînê dike, hêza kurd YPG ya. Ev yek, gelek caran ji aliyê saziyên navnetewî jî bi raportên ku nivîsandina jî hatîya piştrast kirin.

Di herdû civînên berê ên bûhûrî ên Cenevê de kurd, dervî wan hatina hiştin. JI ber vê yekê jî, biserkevtî derbas nebûn. Di vê demê de jî tirkiya, dixwezê ku kurdan dervî wê bihêle. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku dema ku kurd, dervî civînê jî werina hiştin, wê çaxê, tenê çareserek li pêşîya kurdan dimênê ku ew êdî rêya xwe ji hêzên din ên Sûrîyê Cuda bikin. Êdî kurd, li çareya serê xwe binerin. Bêgûman, dema ku kurd, tevlî wê civînê nebin ku çi biryarê bigrin jî, wê ew biryarên wan kurdan girê nedin û ti kesek jî wê nikaribê ji kurdan bixwezê ku wan biryaran esas bigrin. Wê ew biryarên wê civînê, wê çaxê bo kurdan di hikmê tûnabûnê de bin.

Lê li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ji ber ku tirkiya jî naxwezê ku ti careserî ji Sûrîyê re werina dîtin êdî di vê çerçoveyê de bo sernekevtina wê çi ji destê wê tê dike. Civîneka ku vîna gelên Sûrî esas negirê, wê nebê çareserî ji Sûrî re. Her wusa, li vir, di serî de divê ku ev rastî were dîtin û fahmkirin.

Hewldanên tirkiya ên bi rengê ku dixwezê ku kurd dervî civînê bimênin, hinekî jî, bi pirsgirêka kurd a ku ew bixwe jî mihatabê wê ve girêdayî ya. Rejima tirk, di nava sînorê xwe de 20 milyon kurdî çawa bêstatû bihêle, î ro li Cizîra bota, Silopî, Nisêbînê, Şirnaxê, Geverî, Farqînê, Sûrê û hwd, bi wan li hemû bajarên din ên kurdan, şerê wê bi civate kurd re dike. Divê çerçoveyê de divê ku mirov li hewldanên tirkiya ên bi armanca dervî civînê hiştina kurdan binerê. Bêgûman, çareserîyeka ku ji vê demê û pê de, ku vîna gelên herêmê, esas negirê ku were pêşxistin jî, wê nebê çareserîyek ku pirsgirêkan çareser bike û bibe pêşaroja xalkên herêmê. Her wusa,, çareserîyek, di çerçoveya politikayên tirkiya de ku were pêşxistin, wê tenê şer, pevçûn û komkujiyên ku î ro li herêmê tên jîyankirin wê barî pêşarojê bike. Ji vê û pê de, xizmetî ti tiştî nakê. Ya ku di serî de divê ku mirov wê fahm bike û werêne ser ziman jî ev a.

Her wusa, divê ku mirov di dewama wê de werêne ser ziman ku sîyeseta ku tê meşandin ji aliyê rejimên weke rejima tirk ve, tenê xîzmetê barkirina şer, pevçûn û komkujiyan li herêmê li pêşarojê dike. Dixwezin ku pêşarojek bixwûn bo gelên herêmê biafirênin. Di meşîyê wan de û bi zihniyeta wan re mirovatî, parastina mafên mirovan û pêşxistina pergalek demokratik tûna ya. LI herêmê, ji xwe, heta roja, şer û pevçûnên ku bi kurdan re hatina kirin û komkujiyên ku hatina hanîn li serê kurdan, di ancama vê zihniyetê û politikayên wê de na.

Li Sûrî, heta roja me, çendî çareserîyên mirovane hatina dîtin, rejima tirk, weke ku çawa ku di nava sînorê xwe de hemû çareserîyên ku civate kurd pêşxistin bo çareserkirina pirsgirêka û ku vala derxistin, bi heman rengî hemû çareserîyên li Sûrî jî vala derxistina. Î ro jî, sîyeseta wê dihê kirin. Sîyeseta komkujiyê, ev a û li herêmê dihê meşandin. Ji xwe, bi serneketina civîna Cenevê a yek û civîna cenevê a duyem jî, di ancama vê sîyeseta komkujiyê bû. Her wusa, di vê demê de jî, dîplomasiyên tirkiya ên ku di vê demê de Dawutoglu li welatên ewropa dike, di çerçoveya dervî civînê hiştina kurdan de vala derxistina civînê ya. Di dema civîna cenevê a duyemin de ku di destpêka sale bûhûrî de hat li darxistin de T. Ardogan bixwe, heman rola xêrnexwez hildabû sermilê xwe û di gera xwe ya li ewropa de di çerçoveya dervî cvîna cenevê a duyem a hiştina kurdan de sîyeset û dîplomasî kir. Î ro jî, i di dewama wê de Dawutoglu salekê piştî wî re bi heman rolê û zihniyetê gerê li welatên ewropa ên weke ingilistan û almanya dike.

Di serî de civîna cenevê a sêyem jî, ku kurd dervî wê werina hiştin, wê di serî de sernekevtî bê û wê bi xwe re pêvajoya komkujiyên li sûrî bide domandin. Ji xwe, welatek ji wan welatên ku pêvajoya komkujiyên li Sûrî bi rêve dibe Tirkiya ya. Tevî ku ev dihê zanîn jî ku dîsa di rewşa vê sîyesetê de were israrkirin û kurd dervî wê werina hiştin, wê bi xwe re pêvajoya komkujiyan li herêmê bide domandin. Rejima tirk, ji xwe bo sernekevtinên çareserîyan li sûrî, van komkujiyan û pêvajoyên wê bi rêve dibe û dide kirin.

Li Sûrî, weke hêzek kifşkar kurd hena. Heta î ro, di tekoşîna li hemberî DAÎŞê de kurd bûna xwediyê weyn û rolekê. Bi wê re jî, weke hêza giring a sîyesî li Sûrî û bi teybetî li rojava kurd in. Tirkiya, hember hey û hêrîşên xwe li herêmên kurdann dana çêkirin. Her wusa, rewşa ezaz û cerablusê jî, nîşanak û birhana vê rastiyê ya.

Heta roja me, hemû rêyên çareserîyên ji aliyê tirkiya ve hatina xitimandin û vala derxistin. Sedema wê jî, ew a ku wê çawa kurdan

bêbandûr bike. Wê çawa bike ku nehêlê ku kurd statûyê bidest nexin. Tenê, ya ku tirkiya li ser wê dihizirê jî ev a. Pêvajoya şerê di nava Sûrî de, hertimî tirkiya, weke aliyekî ku şer gûrr dike maya û di rewşek xirab de cih girtîya.

Li vir, di aslê xwe de pêvajoya ku weke pêvajoya cenevê a sêyemin dihê bi nav kirin, wê bide nîşandiin ku hêzên ku vê civînê li dar dixin, çendî fêr û ders ji pêvajoya cenevê derxistina û çendî ji dil in ku çareserîyekê bibînin. Di dewame wê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hewldanaka weke ya di pêvajoya cenevê de ku bi wê bixwezin ku kurdan dervî civînê bihêlin ku bidina nîşandin, wê hem wê gotina xwe yên bi rengê ku dibêjin ku wê çareserîyê ji pêvajoya sûrî bibînin jî wê vala derxin. Dibêjin ku wê pêvajoya 18 heyvî ya bûhûrîner bi civînê re bikin ku bidina destpêkirin. Ku pêvajoyek çawa bidina destpêkirin jî, bêî kurdan wê ew pêvajo, ne serkevtî bê. kurdan, pergale xwe ya rêveberîya cewherî bi kantonan avakirîya. Her wusa, vê weke çareserîyekê ji giştîya sûrî re jî hanîna li ser ziman. Weke ku çawa ku pêvajoya cenevê a yekem û pêvajoya cenevê a duyem bi serneket, wê ev jî bêî kurdan sernekeve.

Vajî wê, ku kurd, tevlî vê pêvajoya cenevê a sêyemin newê kirin, wê pêvajoyên din ên hêrîşê li hemberî kurdan birêxistin bikin. ÇAwa ku piştî pêvajoya cenevê a duyemin, pêvajoya hêrîşên DAÎŞê li hemberî kurdan bi rêxistin kirin, ku di vê civîna cenevê a sêyem de jî kurd dervî wê werênina hiştin, wê rejima tirk û hwd, pêvajoyek din ya hêrîşên weke ya pêvajoya hêrîşan ku piştî ya civîna cenevê a duyem dabûbûn destpêkirin wê dîsa bidina destpêkirin.

Di aslê xwe de em divê ku ji pêvajoya hêrîşên DAÎŞê ên li başûrê kurdistanê û şengalê û li rojavayê kurdistanê û kobanê, van hêzên ku ne hiştibûn ku kurd tevlî civîna cenevê a duyemin bibin, berpirsîyar bigrin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ev pêvajoya sêyem a cenevê ku di hê gotin ku wê bernemeyekê jî çê bikin ku di hundurê 18 heyvan de pêvajoya asayîbûnê were pêşxistin, ku kurd dervî wê werina hiştin, wê ev bê destpêka pêvajoyek nû ya hêrîşên mazin jî li hemberî civate kurd hem li bakûrê kurdistanê û hem jî li rojavayê kurdistanê. Bi wê re jî, divê ku mirov başûrê kurdistanê jî bixe nav de.

**Bi tevlîbûna kurdan a li civîna cenevê a sêyem, wê pêşîya pêvajoyek nû ya şer û komkujiyan ku li ser serê wan bên pêşxistin jî wê bê girtin. Lê dema ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyem nebin, weke ku çawa ku piştî civîna cenevê a duyem pêvajoya hêrîşên**

**DAÎŞê li hemberî wan zêdebû û pêşket, piştî civîna cenevê a sêyem jî, wê pêvajoyek bi heman rengî li hemberî kurdan were dayîn destpêkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku yên ku dikin ku kurdan ji van civînên sîyesî dûr bikin û nehêlin ku tevlî biibin, weke ku çawa ku ji pêvajoya hêrîşên DAÎŞê ên piştî civîna duyem a civînê ku li kurdan bûn ji wan berpirsîyar in, wê ji pêvajoya hêrîşên nû ên ku piştî civîna cenevê a sêyem ku li kurdan destpê bibin jî, wê berpirsîyar bin.**

**Li vir, di dewama vê de jî, divê ku mirov li ser rewşa ku weke stretejîyeka jenosîd kirinê; ´bikuja û înkar bike ku te kuştin kirîya´jî divê ku mirov bisekinê.**

Heta roja me, rejima tirk li bakûrê kurdistanê bihezaran kurd qatilkirina. Tenê ji 1´ê mijdara 2015´an û heta heyva dawî a sale 2016´an, nêzî du hezar kurdên sîvil ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve hatina qatil kirin. Ev qatilkirina sivîlan, bi armanca tirsandinê hatîya kirin. Her roj, nûçeyên kuştina sivîlan ku bi destê polîs û leşkerên tirk hatina kirin, tên guhê me. Lê rayadarên tirk, hertimî, rêya înkarê di komkujiyên ku kirina de bijartina. Di dema ku di ancama bombabarandina balafirên şer ên tirk de ku komkujiya li kortekê bûbû, hingî jî, înkarkiribûn. Piştre di dema ku komkujiya li gundê Zergelê ê başûrê kurdistanê ku dîsa di ancama bombardimana balafirên şer ên tirk de ku komkujiyek pêkhatibû, dîsa rêya înkarê bijartibûbûn. Ev rêbaze **´bikuja û înkar bike ku ew te kuştin kirîya´** ku di komkujiyên ku berê polîs û leşkerên kirina ku hatîya bikarhanîn, wê di dema komkujiyên ku polîs û leşkerên tirk ku li Cizîra bota, Silopî, şirnaxê farqînê, wanê, geverê, sûrê û hwd, ku kirina, wê di van komkujiyan de jî wê vê rêbazê hilbijêrên.

Piştî ku qadaxaya derketina li sûkê ku hatî danî li ser van bajarên kurdan û bajarên din ên kurdan û pê de, komkujiyên mazin bi destê polîs û leşkerên tirk hatina kirin. Di van komkujiyên ku polîs û leşkerên tirk kirina de zarok, jinên ciwan û pîr, û heta ku bebekên 6 heyvî û yeksalî jî hatina qatilkirin. ...

Her wusa, komkujiyên mazin di vê çerçoveyê de ku wan de tenê sivîl hatina qatilkirn tên kirin. Lê rayadarên tirk, weke rêbaza manipûlakirinê a li ser çapameniyê re wê sê rêbazan bikarbênê. Yek; cihnedana van komkujiyan a. Rêbaza duyem in, dema ku nikarî ser wan binûxûmênê û piştre cih da wan jî di çapameniyê de wê bibêjin ku ev komkuji ne ji aliyê hêzên dewletê ve hatina kirin. Rêbaza sêyemin jî, ew a ku weke ku

pirraniya rayadarên tirk û sîyesetmederên wan diaxifin û dibêjin ku "em bi terorîsmê re şer dikin" û piştre dema ku bahse wan kuştinên sivîl bikin jî li ser wê re dibêjin ku "ew terorîst in ku hatina kuştin." Divê çerçoveyê de di çerçoveya rêbaza înkarê de wê li ser van hersê rêbazên komkujiyan re di çeçroveya têgîna ´**bikuja û înkar bike ku ew te kuştin kirîya**´ de jî wê her roj li hundurê welêt û dervî welêt werênina ser ziman ku ´em bo parastina mal û canê sivîlan çê bikin û aramiyê werênin, em van oparasyonan li hemberî terorîsmê dikin.´ Di vê çerçoveyê de jî gotina ku hertimî binxat bikin û werênina ser ziman, wê ew bê ku "em sivîlan di parêzên" a. Di dewama wê de weke ku Dawutoglu li dervî welêt dihêne ser ziman ku "ti sivîl ne hatina kuştin."

Di vê çerçoveyê de propagandayaka pirr reş di çerçoveya oparasyonên têgihê de dihê kirin. Nivîsên ku tên nivîsandin ku bi zimanê tirkî bê û ankû zimanên din ên ewropî û cihanî bê, wê di wan de di vê çerçoveyê de çawa li ser komkujiyên ku dihênina serê civate kurd bigrin û wê çawa di bin navê gotina ´terorê´ de werênina ser ziman, di vê çerçoveyê de dikevina nava tahb û xabatekê de. Di vê çerçoveyê de hem li ser çapameniyê re û hem jî di hemû têkiliyên xwe yên dîplomatikî de wê bênina ser ziman ku em pirr giringîyê didin ku di ´oparasyonên xwe yên li dijî terorê de ku zirar negihijê jîyane sivîlan.´ Lê ev gotin hemû bi dîplomasîya ku biwan re dihê kirin re bi armanca li ser komkujiyên ku bi destê polîs û leşkerên tirk ku dihênina serê civate kurd binûxûmênin a. Bi wê re jî, bi vê re jî, wê hertimî wê bikujê û înkar bike ku wê kuştin kirîya Ev rewş, weke rêbazekê dii her qadê de rayadarên tirk bikarhanîya. Ev rêbaz, bûya temenê domandina komkujiyan jî li ser serê kurdan û xalkên din li herêmê ku rejima tirk kirina.

Her wusa, li vir, divê ku mirov binxat bike û bibêje ku ji ber vê yekê ya ku çendî polîs û leşkerên wê komkujî kirina, wê weke ku di doza cemal Temmizoz de kir, wê wan li ser pergale dadê re jî ´paqij´ derxê. Wê polîtîkaya bêceza hiştinê bimeşênê. Bi wê re jî, wê ne hêlin ku ti polîs, leşker û rayadarên tirk ji ber komkujiyên ku rejima tirk bi wan hatîyan serê civate kurd ku ceza bigrin. Ev jî, di vê çerçoveyê de weke politikayê dihê meşandin.

Heta roja me, bi destê polîs û leşkerên tirk, bi de hezaran kurd hatina qatilkirin, lê win rastî tenê dozakê jî nayên ku di derbarê wan komkujiyên ku wan kirina de ku pergale dada tirk vekirîya û bi ancam kiriya. Vajî wê, pergale dadê, bûya pergaleka ku wê çawa bi wê li ser komkujiyên kurdan binûxûmênin. Wê çawa kurdan bêdeng bikin. Mînaqe wê jî,

biryara di derbarê komkujiya roboskî ya dadgehê a di rengê "´biryara ne şopandinê" de ya. Her wusa bi heman rengî, wê çawa sivîlan bikujin û bi vî rengî ser wan bigrin, politikaya wê heta roja me hatîya meşandin.

Li kurdistanê, ev pêvajoya şer ku rejima tirk li hemberî civate kurd ku di dawîya sale 2015´an de da destpêkirin û piştre domand, gelek aliyên wê dişibihina pêvajoya şerê rejima tirk ê bi kurdan re ku di nava salên 1923´an û heta 1937an de. Di hundurê vê pêvajoyê de jî, li kurdistanê di destpêka komarê de komkujiyên weke komkujiy agirî, komkujiya zilanê, komkujiyên li botanê, komkujiya dersimê û hwd, bi gelek komkujiyên din re hatibû hanîn li serê civate kurd. Di vê pêvajoya komkujiyên rejima tirk de jî li Cizîra bota, Silopî, şirnaxê, nisêbînê, farqînê, sûrê û hwd, bi wê re li gelek deverên din, biheman rengî komkuji hanîna serê civate kurd. Hê jî ev komkuji didom in.

Heta roja me, ji komkujiyên ku kirina re wê çawa hênceteke bibînin li ser gotinên weke ´terorê´ û hwd re rayadarên tirk mejiyê xwe hertimî li ser wê wastandina. Rejim û hikimetên tirk, hertimî şer li hemberî hebûna civate kurd meşandina. Dema ku kurdan doza perwerdeya bi zimanê dayikê kirina, bi lezdayîna asîmlasyonê û kriminalize kirina xwestekên bi vî rengî pêvajoyên hêrîşê bi rêxistin kirina. Dema ku kurdan doza xwe rêvebirinê kirina, bi konseptên şer û hwd, re pêvajoyên şer li hemberî wan dana birêxistinkirin û destpêkirin. Î ro jî, li kurdistanê di vê çerçoveyê de pêvajoyek bivî rengî heya. Her wusa, wê çawa pêvajoya pêşketina civate kurd û statûya wê bigrin, hêrîşên xwe dikin û diçina bi ser kurdan de.

Her wusa, dîpplomasîya rayadarên tirk a li welatên ewropî ku di vê demê de dikin ku bo ku kurd newina dewetkirin li civîna cenevê a sêyemin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi politikayên wê yên bi armanca ji dîrokê birina civate kurd re hilde li dest, fahm bike û werêne ser ziman. Piştî civîna cenevê a duyemin, pêvajoya şerê DAÎŞê li hemberî kurdên başûr û rojavayê kurdistanê birêxistin kirin. Di vê pêvajoyê de jî mirov ji dîpplomasîya rayadarên tirk fahm dike ku dixwezê ku dîsa pêşîya tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin bigrê û piştre pêvajoya nû a şer li hemberî civate kurd hem li rojavayê Kurdistanê û hem jî li bakûrê kurdistanê, bide pêşxistin û domandin. Nûçeyên ku ji herêmê tên jî, di vê çerçoveyê de na ku rayadarên tirk li pey birêxistinkirina pêvajoyek nû a şer li hemberî civate kurd a.

Hêrîşên rayaderên tirk ên bi polîs û leşkerên wê li bakûrê kurdistanê û dîsa ji aliyê rayadarên tirk ve birêxistina pêvajoyên hêrîşê li hemberî

rojavayê kurdistanê, rojava û bakûrê kurdistanê gihand hevdû. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî rayadarên tirk jî, pêvajoya şerê ku li bakûrê kurdistanê dimeşênin û li rojavayê kurdistanê birêxistin dikin, kirina yek. Di vê çerçoveyê de jî bo ku wê pêvajoya şer li ser serê civate kurd bidina domandin, naxwezin ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyemin bibê. Hinekî jî, di vê çerçoveyê de dîplomasîya rayadarên tirk a li dijî tevlîbûna kurdan li civîna cenevê, hinekî jî di vê çerçoveyê de bi pêvajoya şerê wê yê ku li dijî civate kurd pêşxistîya ve girêdayî ya. Li vir, dîsa weke gotina dawî, divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku newê hiştin ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyem jî bibê, wê çaxê, weke ku çawa ku piştî civîna duyem a cenevê pêvajoya hêrîşên DAÎŞê hat pêşxistin li hemberî kurdan, divê ku mirov li bende pêvajoyek din ya hêrîşê a piştî civîna sêyem a cenevê jî bê.

**Tirkiya** bo ku kurdên rojava newina dewet kirin li civîna cenevê a sêyemin, pirr xabitî û dîplomasî kir. Ev jî, di çerçoveya politikayên xwe ku li ser esasê înkare kurd de avakirina, biwan dikir. Bi wê re jî, tirkiya, dixwest ku weke ku piştî Sikes.picot û konfaranse Lozanê ku li ser esasê bêstatû hiştina kurdan ku pêvajoyek dabûbûn destpêkirin, êdî dixwest ku di wê çerçoveyê de ev were domandin. Divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tirkiya, tûna hasibandina kurdan, ji xwe re weke politikayekê bijartibûbû.

Di aslê xwe de dewet kirina kurdan li civîna cenevê a sêyemin, hem weke dawî lê hanîna xelatîya ku di civînên cenevê ên yekemin û duyemin hatibû hanîn û hem jî bi wê re jî li Sûrî kurd êdî weke biryarek hatibû herê kirin. Ya ku herî zêde tirkiya dihêşand jî ev bû. Bi wê re wê politikaya tirkiya a li ser esasê tûna hasibandina kurdan û ku bi wê li bakûr kurdistanê şerek li dijî kurdan dabûbû destpêkirin, wê weke derbeyekê jî bê li wê. Di aslê xwe de di vê pêvajoyekê de mirov, divê ku dewetkirina li civîna sêyemin a cenevê, mirov dikarê weke duyemin tevgera rewşenbîr û akadamisyenan ku bi navê ”em ê ne bina hevkarê vî sûcê” dabûbûn destpêkirn jî werêne ser ziman.

Rayadarên ewropî, Emerikî û Rûsî jî di nav de ragihandinên ku dikirin, dihanîn ser ziman ku divê ku ´dawî li qatilkirina kurdan were hanîn. Tevî ku ew vê dihênina ser ziman de jî di civînên weke civîna cenevê a sêyemin û hwd de, weke ku di civînên berî wê de bûna, ne hiştina ku kurd tevlî van civînên sîyesî bibin ku weke vînekê xwe bidina

dîyarkirin. Civîna cenevê a sêyemin, ji ber ku ew bi awayekî jidil ne di wê rewşê û xwestekê de na ku bihêlin ku kurd tevlî wê bibe, êdî hat taloq kirin li dawîya sibatê. Mijara kurd, bi şerê ku rejima tirk û hwd ku bi kurdan re dike re di rojava cihanê de ya. Lê navendên sîyesî ên ku dikarin pêşîya vî şerê li hemberî civate kurd bidina girtin jî, bêdeng in li hemberê şerê rejima tirk û hwd, ê li hemberê civate kurd. Berpirsîyarê berdevkê wezereta derve a rûsya hanî Marîya Zaharova di ragihandina xwe ya di 21ê rêbendana 2016´an de hanî ser ziman ku ´divê ku tirkiya dawî li qatilkirina kurdan werêne." Serokwezirê Almanya Angela Merkel dibêje ku "kurd tên qatil kirin." Bi vî rengî, di asta bilind de wê, weke care pêşî gotinê li ser rewşa kurdan werênina ser ziman. Bêgûman, wê rewşa tevlîbûna kurdan a li nava civîna sêyem a cenevê, wê bandûrek giring û mazin li pêşketinên li rojhilat bike. Dema ku mirov bahse tevlîbûna kurdan a li civîna cenevê a sêyemin bike, divê ku mirov di serî de bi rewşa kurdan re di çerçoveya statûya wan de wê hilde li dest. Her wusa, divê ku mirov bi wê re di çerçoveya pêşketina li rojhilat de jî hilde li dest.

Hemû hêrîşên ku li rojava ku bi alikariya tirkiya li kurdan dibûn, aliyekî wan ê giring a bû ku bi wan hêrîşan kurdan ku bi wan kurdan zayif bikin û ji hêz bixin ku karibin weke hêzekê tevlî civînên bi vî rengî ên sîyesî bibin. Bi hêrîşên ku rayadarên tirk bi rêya çeteyên weke yên DAÎŞ, cebetil nasr û hwd ku li rojava dikirin, bi wan hêrîşan çendî ku xûrxandinak mazin kirin û komkujiyên mazin jî hanîn serê kurdan jî, lê kurd têkneçûn û li ser lingan. Di vê çerçoveyê de ew ancama ku rayadarên tirk bi hêrîşên DAÎŞê û cebetil-nasr û ahrar el-şam û hwd ku bidest nexistin, piştre bi hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê ku li Cizîra bota, Silopî, Şirnaxê, nisêbînê, geverê, farqînê û Sûrê û hwd, ku di serî de li van bajarên bakûrê kurdistanê û hemû bajarên din ên bakûrê kurdistanê dixwest ku wê ancamê bidest bixe, Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de divê ku mirov, wan hêrîşên li bakûrê kurdistanê, di çerçoveya zihniyeta rejima tirk û rejimên herêmê ên ku kurdistan di nava wan de hatî qatkirin re di dewama hêrîşên ku bi van çeteyên DAÎŞê cebetil-nasr, ahrar el-şam û hwd de ku dikirin, divê ku mirov werêne ser ziman. Pêvajoya hêrîşên DAÎŞê û hwd, divê ku mirov weke pêvajoyek şer a li hemberî civatê kurdistanê û hwd werêne ser ziman. Carna ev pêvajoya şer bi navê DAÎŞê dikirin û di hanîn ser ziman. Carna, di bin navê cebetil-nasr de dikirin. Carna jî, di bin navê ahrar el-şam de dikirin. Di pêvajoya ku

civîna cenevê a sêyem di hat li darxistin de rayadarên tirk, li pey derxistina bi navna din, hin ”rêxistinên” kujar ên weke DAÎŞê û hwd de bûn.

Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bandûra tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin, wê li bakûrê kurdistanê û takoşîna kurdan a azadiyê jî bûba. Li wir jî, statûya kurdan, wê biheta rojevê. Ya ku herî zêde, dixwest ku li pêşîya wê bisekinê, ev bû.

Pêvajoya mudahaleyên li Sûrî, ji destpêkê û heta roja me, tirkiya li ser rêxistinên weke DAÎŞê û hwd re xwestiya ku di nava wê de politikayên xwe pêşbixe. Xwestîya ku li gorî politikayên xwe reng bidiyê de. Di aslê xwe de ku î ro li Sûrî bi sed hezaran mirov hatibibina qatilkirin û goçberkirin, divê ku mirov hinekê jî bi van politikayên rejimên herêmê ên weke rejima tirk re werênina ser ziman.

Rayadarên tirk, çendê ku dibêjin ku ew ser hezar salî re ya ku li herêmê hena jî, lê ti carî li gorî gîyane herêmê bi xalkên herêmê re ne ketina têkiliyekê de. Hertimî li ser politikayên desthilatdarîyê re nêzîkatî kirina. Di vê çerçoveyê de jî, li herêmê, dîrokek bi xwûn hem bo xwe û hem jî bo herêmê nivîsandina. Î ro jî, rewş ji wê necudatira.

Em dema ku li dîroka herêmê binerin, ku ji dema sûmerîyan û heta roja me jî, tevî ku gelek şer û pevçûn li herêmê bûna jî, lê ti rêveberîyê li herêmê, weke ya tirkan li herêmê tevnegerîya ya. Her çend ku zilma newrûd mohra xwe li dîrokê daya jî, lê mirov nikarin bi tememî wan weke nemrûd jî werêne ser ziman.

Li rojhilat, xateka dîrokê heya. Her timî gelek xalk dinava hevdû de jîyan a. Sînor ji hevdû re xîz nekirina. Bi hevdû re jîyanek bi nirx avakirina. Ev bi hevdû re jîyankirina xalkên herêmê, di nava rûpelên dîrokê de weke ´xalkên mesepotamîya´ jî bahse wê hatîya kirin. Li vir, di aslê xwe de serkevtina kurdan, wê weke serkevtina wê gîyane mesepotamiya jî bê. Hertimî, dîroka herêmê ku hatîya nivîsandin, li gorî vê gîyane mesepotamiya hatîya nivîsandin. Heta dema medîya jî, ku li gorî felsefeya Zerdest, wê bi pergale civakî a medîya re wê civakên avestayî pêş bikevin, di vê çerçoveyê de wê xwediyê gîyan, rastî û hebûnekê bê bi pêşketina li herêmê û bi hebûna xalkan re. Nêzî hezar

salî, wê civakên avestayî wê bi pêşketina xwe re bijîn. Çendî ku di demên piştre ên ku di wan de îslam pêş dikeve de jî, ku li gorî gîyane vê pêşketin dibê, wê pêşketin bibê. Lê piştre, bi rêveberîyên weke yên osmanîyan re ku ji vê xatê dûrketin bûn re, wê êdî tengezerî û ankû ´krîzên´ şariştanîyê li herêmê jî dest pê bikin. Wê şerê desthilatdarîyan li hemberî hebûna xalkan dest pê bike.

Di aslê xwe de divê ku mirov rastîya osmaniyan li herêmê baş fahm bike. Dema ku osmanî derdikevin, rojhilat li ber kirina ronasansekê ya ku di xwe de çê bike ya. Lê piştî ku osmanî serdest dibin û bi teybetî ku îstambû jî kirina destê xwe de û pê de, wê hemû zanebûna li herêmê goç rojava û ankû ´ewropa´ bike. Rewşenbîr û hewd, wê mafê xwe hanîna ser ziman êdî li herêmê ji xwe re nebînê. Hebûna osmanîyan, bo herêmê, tê wê wateyê jî ku pêşîya pêşketina ronasansê jî girtin. Herêm bigiştî di reşîyekê de dana hiştin. Dema ku mirov dîroka pêşketinê li herêmê hewl bide ku fahm bike, wê bê dîtin ku bi serdestbûna osmanîyan re wê derbeyek mazin li pêşketina herêmê a xalkan were xistin. Ev piştre jî, wê xwe bide domandin. Yanî, di roja me de dijberîya T. Ardogan a li dijî rewşenbîr û akadamisyanan, dîrokeka wê bi dîroka rejima tirk û berî ya osmanîyan re jî heya.

Rewşenbîrîyê, bi serdestîya van rêveberîyên bi vî rengî re li herêmê mafê xwe hanîna ser ziman, bi awayekî rast nedîtîya. Bo vê yekê, hertimî, li herêmê pêşketin di nava jîyanê de nebûya. Pergale civakî a pêşketinê nebûya. Hertimî, pergale serdestîya desthilatdarîyên bi vî rengî, bi hebûna xwe re pêşîya pêşketina pergale civakan û pêşketina wan girtîya. Di aslê xwe de dema ku mirov dîroka herêmê baş dahûr dike, her wusa di vê çerçoveyê de mirov dibînê ku desthilatdarîyên li herêmê, çendî ku civakên li herêmê bêî perspektifa pêşketinê hiştina. Xalkên ku li berxwedana weke kurdan û hwd, rastî komkujiyên mazin hatina. Di vê çerçoveyê de li mesepotamiya û anatolia, gelek xalk hatina birin ji dîrokê.

**Gera Joa Biden, hêrîşên rejima tirk ên li bakûrê kurdistanê û** mijara tevlîbûna **kurdên rojava li civîna cenevê, divê ku** mirov di dewama mijarê **de bi çend gotinan re bi pêşketin li herêmê ên weke şerê rejima tirk ê ku li bakûrê kurdistanê ku li hemberî kurdan daya destpêkirin û civîna cenevê a sêyemin re werêne ser ziman.** Gera Joe

Biden, wê bê weke gereka ku bi wê dixwezê ku rewş û rastîya hizrên hêzên herêmê fahm bike bê.

Di vê pêvajoya ku alikarê serokê wezerete karê derve ê Emerîka Joe Biden gerê li tirkiya dike de hêrîşên tirkiya li bakûrê kurdistanê zêdebûna. Di hinek çapameniyan de jî hat ser ziman ku şîreta wî ya li rêveberîya tirk ew bûya ku bi mijara ´xweserîyê´ li masê rûnihin bi kurdan re ya. Lê bi wê re jî, dema ku diçê û bi rayadarên tirk re dirûnihê, tevgeran kurdan bi gotina ´terorê´ tohmetbar dikê. Ev gotina Joe Biden ku di gera xwe ya li tirkiye û ku di hevdîtina xwe ya bi rayadarên tirk ên weke T. Ardogan re ku dihênê ser ziman, dibê weke nîşanaka astengkirina tevlîbûna kurdan a li civîna cenevê a sêyemin jî. Ji piştî vê re, wê êdî ji ti kesekî re nebê ´supriz´ ku wê dewetîyê ji kurdan re neşênin ku tevlî civîna cenevê a sêyemin bibin. Lê tevî wê jî, ji ber ku weke hêzên mazin dizanin ku bêî kurdan nikarin ancamaka baş bidest bixin. Ya ku wê civînê bide taloqkirin jî, wê ev **rastî bê**. Bi wê re jî, mijara tevlîbûna kurdên rojava li civîna cenevê di rojevê de ya. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ji aliyekî ve jî, mijar tevlîbûna kurdên rojava li civîna cenevê û hêrîşên rejima tirk li bakûrê Kurdistanê, di çerçoveya şerê rejima tirk ê li hemberî statûya civate kurd de bi hevdû ve girêdayî ya. Ev mijar, çendî ku weke ji hevdû cuda werina ditin jî bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na.

Bêgûman, şerê li herêmê ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk bi xalkên weke kurdan re ku dikin, şerê metingerîyê û xwe serdest kirinê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku şerên li herêmê, şerên desthilatdarîyî na. Şerê li rejimên herêmên ên weke rejima tirk û hwd ku ew li ser DAÎŞê û hwd re ku bi kurdan re dimeşênin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, şerê li dijî statûya kurdan in. Bo vê yekê ya ku bi rayadarên tirk bi awayekî vekirî dijberîya xwe li dijî kurdên rojava dihênina ser ziman ku ew tevlî civîna cenevê bibin.

Pêvajoya şerê rejima tirk ê bi kurdan re ku li bakûrê kurdistanê meşand, li vir, di aslê xwe de divê ku mirov weke pêvajoya şerê tekoşîna maf û azadiyê ku bandûra wê li hemû pêşketinên rojava ku dibin divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, kurdan xwe naskir û pêşketin bi xwe re bi têgihiştinî da çêkirin û li ser wê re doza maf û azadîya xwe dikin. Ev rewşa kurdan, î ro li herêmê, weke rewşa gûharîna naqşaya herêmê ya sîyesî, demografî û desthilatdarî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Herêmên kurdan, li rojhilat, weke herêmna stretejikî na. Bo vê yekê, şerê

xwe li wan serdestkirinê hem bi kurdan re dihê kirin û hem jî li herêmê bi wê re şerê desthilatdarîyê dihê dayîn. Şerê rejima tirk, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Li vir, di gera Joa Biden de ev mijar jî dihêna rojavê. Bêgûman, mijara statûya kurd û şerê rejima tirk ê li bakûrê kurdistanê ê bi kurdan re jî di hevdîtina Joe Biden de dihê ser ziman. Di vê çerçoveyê de gera Joa Biden, weke gereka sîyesî ya di van waran de ku li gorî ahenga li herêmê a ardnîgarî, sîyesî û damografikî û hwd ku ji nû ve pêşketinê bi xwe re werêne jî mirov dikarê werêne ser ziman. Ev ger û gerên bi vî rengî, di çerçoveya zihniyeta civîna cenevê de dihên kirin. Her wusa, li vir, di van civînên siyesî de wê rewşna çawa ên sîyesî derkevina li holê, hinekî jî li ser wê re xwediyê wateyekê na. Herdû civînên civînên cenevê ên yekemîin û duyemin ku berê bûbûn, ji ber ku derketina dervî sînorê zihniyeta desthilatdarîyê a li herêmê ku hatî rûniştandin nebû, êdî ti ancam ji wan derneket. Her wusa, di vê civîna sêyemin de wê derketina dervî wê bibe û ankû nebê, ya ku wê temenê pêşveçûnên bi ber pêşaroje ve bie dîyarkirin jî wê ev bê.

Tevlîbûna kurdên rojava weke statûyekê li civîna cenevê a sêyemin, di serî de wê piştî rewşa sale 1990´î û piştre ku bi başûrê kurdistanê re derket li holê û di ancama wê de statûya kurdên başûrê kurdistanê bi wê re reng û awa stand, wê bê pêvajoya vê rewşê a duyemin ji aliyê kurdan û herêmê ve. Tevlîbûna kurdên rojava li civîna cenevê, wê weke rewşeka pejirendina statûya kurdên rojava jî bê. Bi wê re jî, wê pêşîya pêvajoyên komkujiyên ku rejimên herêmê dihênina serê civate kurd jî, wê ne bi tememî jî bê wê bide girtin. Ya ku rejimên herêmê ên weke tirkiya aciz dike ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyemin bibin jî wê ev rastî bê. Di vê serî de divê ku mirov hinekî ji vî aliyê ve jî li wê binerê. Ji xwe, ya ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin ku naxwezin jî ev a. Lê li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku bi herêkirina kurdên rojava bi statûya wan re di civîna cenevê de wê derîyê herêkirina statûya kurdên bakûrê kurdistanê jî ku ne bi dilê wê jî bê wê li rejima tirk ve bike. Ya ku tirkiya, li dijî wê disekinê jî ev a. Li bakûrê kurdistanê şerê rejima tirk ê li Cizîra bota, silopî, nisêbînê, şirnaxê, farqînê, sûrê û hwd ku li van bajarên kurdan bi komkujiyên hovana re bi ancam dibê, ji ber vê rewş û zihniyeta rejimê a di çerçoveya dijberîya statûya kurd ya ku dihêne ser ziman a. Ji xwe ´pêvajoya çareserîyê´ jî, ji ber ku ne mantiqekê rast rejima tirk ji aliyê xwe ve hildabû li dest, êdî bi serneket.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku kurd, di vê demê de hemû mijarên ku bi wan ve girêdayî ku tên axiftin di çerçoveya statûya kurd de na. Rejima tirk, ku kurd statûyekê bidest bixin, wê bidest xistina kurdan a statûyê weke ´têkçûn´ xwe dibînê. Hebûna xwe, li ser tûna hasibandin û bi demê re tûna kurdan, ava kirîya. Di vê çerçoveyê de jî di vê demê de politika dike. Di pêvajoya çareserîyê de jî rayadarên tirk, ti carî ne xwediyê planaka çareserîyê bûn. Tevî ku kurdan, ev dizanî jî, pêvajoya çareserîyê ana destpêkirin û piştgirî danê de.

Li Sûrî, rewşa sîyesî, wê çawa reng û awa bistêne, wê bandûra wê li îranê û tirkiya bibê. Her wusa, li vir, ji ber ku rewş ev a, êdî wê sîyeseta Sûrî, çawa bê gihandin li dîzaynekê, hemû hêzên herêmê di çerçoveya wê de di pêvajoya ji nû ve avakirina rêveberîya Sûrî de dikin ku gotina xwe bibêjin û li gorî gotina xwe ancamê bidest bixin.

Her çend ku tirkiya i bakûrê kurdistanê, dawî li pêvajoya çareserîyê hanî û şer bi kurdan re da destpêkirin û bi wî şerî xwest ku ancamekê li gorî di çerçoveya tafisandina kurdan de bidest bixê jî, lê berxwedana kurdan, ew ancama ku wê xwest ku bidest bixe, pêşîya wê girt. Li bakûrê kurdistanê denezendina rêveberîyên xweser, denezena rewşenbîran û her wusa, rewşa mihtemel a tevlîbûna kurdên rojava li civîna cenevê, wê weke rewşna ku politikaya tirkiya a di çerçoveya înkare kurd de ku bi wê şerê teror û jenosîdê li ser serê civate kurd dimeşênê, vala derxê bê. Bo vê yekê, tirkia, ne dixwest ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyem bibin. Di serî de asntengiyên li pêşîya tevlîbûna kurdan li civina enevê a sêyemin, li herêmê, rejimên ku civate kurd û kurdistan ku di nava wan de hatî qatkirin û her wusa hêzên ku li herêmê politikayên serdesyîyê dimêşênin in.

Bêgûman, divê ku mirov tevlîbûna kurdên rojava li nava civîna cenevê piçûk ne nirxêne. Giring a. Lê li vir, mijar tenê bi tevlîbûna li nava wê civîna cenevê re jî ne bes a. Li vir, di serî de sîyeseta ku li ser essê tûna hasibandina kurdan û di çerçoveya bêstatû hiştina kurdan de ku li wir, were meşandin jî, wê dîsa ancamak baş dernekeve li holê. Rejima tirk û rayadarên wê, heta kêlîka dawî jî li dîplomasîyê li dijî tevlîbûna kurdên rojava li civîna cenevê dikin. Lê dema ku nikaribin ku pêşîya wê tevlîbûnê bigrin, bi gotin û projeyên ku bi wan nehêlin ku civîna cenevê bi awayekî rast serkeve, wê bikin ku werênina rojevê. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî baş fahm bike.

Li li vir, di gera birêz Joe Biden te tişta ku derket li holê ku gotina "terorê" bo tevgera kurd dihêne ser ziman, divê ku mirov vê bikarhanîna

vê gotinê jî, di vê çerçoveyê de werêne ser ziman ku ew şerê jenosîdkirina civate kurd ku hewl didin ku di bin maskeya gotina de terorê de vêşêrên a. **Her wusa, rewşa ku î ro a li Cizîra bota, Silopî, Şirnaxê, farqînê, Sûrê û hwd, ku li hemû bajarên din ên bakûrê kurdistanê heya, mirov nikarê ji rewşa ji salên 1923´an û heta salên 1937´an cuda werêne ser ziman.** Bi heman rengî û zihniyetê, rewş ku hatî pêşxistin, divê ku mirov werêne ser ziman.

Ez bixwe, dema ku li rewşa bajarên kurdan ên weke cizîra bota, silopî, şirnaxê, farqîn û sûrê û hwd, dinerim, rewşa herêma zilanê ya sale 1926´an û rewşa dersimê a 1937´an dihê berbîra min. Di wê demê de artişa tirk li zilanê û dersimê û hwd, sefer dikir. Î ro jî, ya ku li bajarên kurdan, ji vê rewşê û zihniyeta wê ne cudatira. Yên weke Joe Biden ku hê jî gotina terorê ji kurdan re bikardihênin, ku hinekî bi wijdan bin û bi van rastiyên dîrokî ên bi êş re wê rewşa rûxandina bajarên kurdan ku rejima tirk wan bi tank û topan xûrixand ên weke cizîra bota, silopî, farqînê, şirnaxê, farqînê û hwd, çawa werênina ser ziman? Gelo wê rewşa hewldana ji dîrokê birina civate kurd, çawa şîrove bikin? rewşa qadaxaya zimanê civate kurd çawa şîrove bikin?

Dema ku em politikayên rejima tirk ên li dijî kurdan şîrove bikin, divê ku em bi dîroka wê re werênina ser ziman. Bi wê re jî, bi zihniyeta wê re jî, werênina ser ziman. Heta roja me, bi gotina "mafê xwe parastinê" û ankû ´parastina desthilatdarîya xwe re´ ev gotinên di temenê bêdengîya xwe ya li hemberî komkujiyên kurdan domandina. Lê dîrok, wê van rastîyan hemûyan jî, di nava rûpelên xwe de bi awayekî binivîsêne.

Î ro li Cizîra bota, hêrîşên rejima tirk û polîs û leşkerên li kurdan dibin. Bi hezaran kurdistanî, di bin telûkeya komkujiya polîs û leşkerên tirk de na. Di 23ê rêbendan 2016´an de nûçeyên ku ji Cizîra bota dihatin, ew bûn ku bi dehan sivîl di bin bombabarana leşker û polisên tirk de ya. Her wusa nûçeyên ku di hatin, di wan de dihat gotin ku bi dehan birindar ku birîna wan girana hena. Tevî wê jî, bombabarana leşkerên tirk li wê didoma.

Rejima tirk, şerekî terorê li hemberî kurdan dimeşênê. Bi wê şerê terorê û bêahlaq, dixwezê ku derbeyê li kurdan bixe. Divê ku mirov vî şerê terorê û bêahlaq, weke şerê jenosîdê û bi armanca jenosîd kirinê jî werênina ser ziman. Li kurdistanê, rojek namênê ku mirov nûçeyên komkujiyan nebihîzê.

Dema ku hebûna civatekê wre armanc girtin bo tûnakirinê, divê ku

mirov wê weke şerê jenosîdê werêne ser ziman. Her wusa, yên ku vê komkujiyê dikin jî, kujar in. Heta roja me, dibin navê rêvebertiyê de bê û ankû di bin navê parastina ´sazûmana civakî´ û hwd de bê, ew kujarî hatîya vêşartin. Lê ev kujarîyek a. Bo ku vê kujarîya xwe ser wê binûxûmênin jî, olê weke maske bikardihênin. Heta roja me jî, ev kirina. Li ber çavê hemû cihanê rejima tirk van komkujiyan dike. Lê hemû cihan li ber wê bêdeng a. Her wusa, ji bilî hinek mirovên ku dengên xwe derdixin û pê de, bêdengîyek heya li hemberî komkujiyên ku dihên serê civate **kurd**. ....

Civiîna sêyemin de jî sîyeseta ku di dema civîna duyemin a cenevê de ku hatî meşandin, wê newê terikendin. Her wusa, di vê civînê de jî, wê çawa kurdan dervî pêvajoyên sîyesî bihêlin pêşîya pêşketina statûya wan li herêmê bigirin, di vê çerçoveyê de sîyeset li hemberî kurdan dihê meşandin. Di serî de statûya rojava û pergale wê ya ku kurdan û xalkên din ên li herêmê ku bi hevdû re pêşxistina, li hemberî nasîna wê, vînek sîyesî dihê dayîn nîşandin. Her çand ku pêvajoya tevlîbûna kurdan a li civîna cenevê a sêyemin weke ku tê astengkirin jî, wê di vê çerçoveyê de sêyesetek were meşandin. Sîyeseta dervî pêvajoyên sîyesî hiştina kurdan bi kurdan re dikin. Her wusa, şerê wê jî bi kurdan re dikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, di dewama wê de werêne ser ziman ku di destpêka civîna cenevê de nayê hiştin ku kurd tevlî pêvajoyê bibin. Her wusa, ji kurdan re dibêjin ku ´winê tevlî pêvajoyên piştre bibin.´ Ev jî, sîyeseta demhûhûrînê a bi kurdan re ya.

Li herêmê, ev ser 40 salî re ya ku rejimên herêmê ên weke tirkiya, îran, sûrî û îraq bi kurdan re şerê tûna kurdan bi kurdan re dikin. Di vê pêvajoyê de jî komkujiyên weke komkujiya helebçê, komkujiyên dawî ên piştî civîna duyem a cenevê ku li şengalê û kobanê hanîna serê kurdan, wê bên hanîn li serê kurdan. Wusa, dihê fahmkirin ku hêzên ku î ro jî li pêşîya tevlîbûna kurdan astengîya derxstin ku kurd tevlî pêvajoyên sîyesî bibin û nahêlin ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyem bibin, di dema civîn cenevê de jî, ne hiştibûn ku kurd tevlî civîna cenevê bibin û piştî civiîna duyem a cenevê jî pêvajoya hêrîşên DAÎŞê û hwd, li kurdan dabûbûn destpêkirin û hêvî kiribûn ku ancamê bidest bixin. Wusa dihê dîtin û fahmkirin ku yên ku ne hiştibûn ku kurd tevlî civîna duyem a cenevê bibin, hêvî kiribûn ku wê DAÎŞ derbeyek mazin li kurdan bixe ku di cîvîna cenevê a sêyem de nikaribin xwe li ser lingan bigrin û li ser wê xwe li ser lingan negirtinê re êdî civîna sêyem a cenevê li darxin û bi vî rengî êdî pêvajoya sîyesî jî li gorî xwe bibina sêrî.

Ya ku di vê demê de her wusa dihê dîtin û kifşkirin, ev a. Pêvajoya civîna cenevê a sêyemin û her wusa ne hiştina tevlîbûna kurdan di **destpêka** wê de jî, wê vê rastîyê raxê li berçav. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku yên ku di vê çerçoveyê de astengîyan li pêşîya kurdan derxistin ku tevlî bibin, ev 40 sale ku şerekî mazin bi kurdan re meşandin a. Di hundûrê vê 40 salê de jî nekarîna ku kurdan bişikênin. Piştî civîna cenevê a duyemin, li rojavayê kurdistanê û kobanê û başûrê kurdistanê û şengalê hêrîşî herêmên kurdan kirin û komkujiyên mazin hanîna serê kurdan. Di destpêka pêvajoya civîna cenevê a sêyemin de ku heman dema ya civîna cenevê a duyemin de dihat xwest ku were li darxistin lê ku bi çend rojan bi derengî hat li darxistin, bi heman rengî li bakûrê kurdistanê pêvajoyek hêrîşan li hemberî civate kurd hatibû li darxistin. Ji cizîra bota, silopî, nisêbîn, sûrê û hwd bigra û heta hemû bajarên din ên kurdan, wê ev pêvajoya hêrîşan bê birêxistin û domandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku pêvajoya hêrîşan li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk dayî destpêkirin, divê ku mirov di dewama hêrîşên DAÎŞê ên li şengalê û kobanê de werêne ser ziman. Li vir, ji aliyekî din ve jî, divê ku mirov têkiliyekê bi şerê rejima tirk ê li bakûrê kurdistanê û wê civîna cenevê a sêyemin re dênê. Di çerçoveya hewldana domandina vî şerî li hemberî civate kurd de dikin û dixwezin ku ev rewşa kurdan ya bi şer bidomê. Yanî, li herêmê, nakokîyan li şûna sîyesetê bi şer çareser bikin. Di serî de çareserîya pirsgirêka kurd, di vê çerçoveyê de bi sîyeseta şer bidina domandin.

Ji aliyê rejima tirk ve dawî lê hanîna pêvajoya çareserîyê, hinekî jî, di vê çerçoveyê de bi wê sîyeseta wê ya şer ve girêdayî ve girêdayî divê ku mirov li wê bihizirê. Tirkiya, di destpêka pêvajoya çareserîyê de li şûna ku wê plan û projeyên aşîtîyane ên bo çareserîyê pêşbixe, bidest pêşxistina pêvajo û plan û konseptên şer kir. Piştre jî, li ser wê dawî li pêvajoya çareserîyê hanî û pêvajoya şer da destpêkirin.

Rejima tirk, ji ber ku nexwezê ku di çerçoveya radestkirina maf û azadiya kurdan de pirsgirêka kurd çareser bike, êdî hertimî, her dayimî wê çawa muhatabên esasî ên pirsgirêka kurd ji holê rabike, dikeve nava lêgerînên wê de. **Her wusa, gotinên rayadarên tirk ên weke «emê bi HDPê re hevdîtinê êdî nekin» û hêrîşên li qada sîyeseta kurd û her wusa danîna tecrîdê li ser serê birêz ocalan û gotina «bi Leyla zana re em dikarin hevdîtinê bikin» jî, divê çerçoveyê de mirov, dikarê weke sîyeseta vala derxistina muhatabên esasî jî werêne ser ziman.** Ji ber ku rayadarên tirk, naxwezin ku di çerçoveya radestkirina maf û

azadîya civate kurd û hr wusa nasîna statûya wê de pirsgirêka kurd ku wan bi destê xwe afirandîya çareser bikin.

Rayadarên tirk, hertimî pirsgirêk, weke pirsgirêka ´terorê´ dana nîşandin. Di bin navê gotina ´terorê´ de şerê xwe yê jenosîdkirina civate kurd bi kurdan re kirina û meşandina. Raydarên tirk, her rewş û kirina bo kurdan û bi navê kurdan, bi gotina terorê´ hanîna ser ziman. Hêz û partiyên kurd li rojava jî doza statûya kurd dikin, wê jî bi gotina terorê dihênina ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di vê pêvajoya şerê rejima tirk ê bi civate kurd re de gelek hêzên dervî herêmê û her wusa ji herêmê ên ku piştgirî didana rayadarên tirk hebûn. Ev hêz û saziyên ku ew piştgirî didana rayaderên tirk di şerê wan yê bi civate kurd re de, di vê çerçoveyê de nêzîkî rewşa kurd dibin. Bo vê yekê, rewşên sîyesî ên bo civate kurd û her wusa ku wê rewşa kurdan bi wan bide nasîn, li pêşîya wê astengîyan derdixin weke ku çawa ku di pêvajo û civînên yekemin, duyemin û sêyemin ên cenevê de ku wê astengiyê derdixin. Rewşa kurdan û tekoşîna wan a bo maf û azadiyê ku pêşketîya, rewşa kurdan derxist astek bilind. Her wusa, hebûna kurdan derxist li holê. Li herêmê hebûna kurdan, bi awayekî vekirî derket li holê. Ev hebûna ku derket li holê, wê çawa bê gihandin li statûyekê, di wê çerçoveyê de di serê xwe de ne zelal û safî na. Hêzên ku heta roja me kurd û tevgerên kurdan bi gotina ´terorê´ bi navkirina ûû tohmetbarkirina, dikevina zorê de ku wê statûya kurdan herê bikin. Her wusa bi wan zor jî tê ku bi kurdan re rûnihin.

Pirsgirêka kurd, hatîya wê astê ku li herêmê êdî ti kesek nikarê bêî wê sîyesetê bike. Her wusa, rewşa civîna duyemin a cenevê ev yek bi awayekî vekirî raxist li berçav. Bi wê re didewama wê de rewşa civîna cenevê a sêyemin jî, mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Sîyesetên statûqûperêz li herêmê ku heta roja me li ser wê li herêmê sîyeset hatina kirin û meşandin, di wê de kurd û statûya kurd tûna ya. Dema ku di wê çerçoveyê de civînên bi vî rengî ên weke civîna cenevê ku dihên xwestin ku werina li darxistin jî, weke ku di pêvajoya yekemin a civîna cenevê a duyemin û ya sêyemin de jî ku bê ancam bi dawî dibê, ew civîn bi ancam dibin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku sîyeseta ku li ser wê re şerê bi kurdan re heta roja me dihê meşandin, bi sîyeset a bi zihniyeta wê tê kirin, hebûna kurdan nayê herêkirin.

…

**Aliyê şerê AKPê ê ku li** bakûrê kurdistanê **li** hemberî kurdan **dayî** destpêkirin **ê navnetewî**.

Dema ku mirov li konsepta şer a k u hikimeta tirk a AKPê li hemberî kurdan dayî destpêkirin ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa, mirov aliyekî wê yê navnetewî jî dibînê. Bi teybetî, berî destpêkirina civîna cenevê a sêyemin, weke ku amedekarîyek di vê çerçoveyê de bi wê konsepta şer a li hemberî kurdan hat kirin.Pêvajoyek şer li hemberî kurdan hat dayîn destppêkirin li bakûrê kurdistanê li hemberî civate kurd. Piştre jî, li ser wê re pêvajoyên nû ên sîyesî ên li Sûrî, weke ku li bi civîna cenevê a sêyemin û hwd re bû êdî dana destpêkirin.

Konsepta şer a hikimeta tirk a AKPê, di vê ku di çerçoveya civîna cenevê a sêyemin de jî werêne ser ziman. Her wusa, bi vê re ya ku mirov kifş dike, ji wê zêdetirî, weke ku çawa ku piştî civîna duyemin a cenevê bû û pê de, mirov kifş dike, her wusa, temenê pêvajoyek nû a şer ku piştî civîna cenevê a sêyemin ku bi kurdan re bê kirin li ser civîna cenevê a sêyemin re dihê avêtin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dewet nekirina kurdan a li civîna cenevê a sêyemin, li piştî wê hêzên herêmê ên weke Îran, rejima îraqê a baxdadê û her wusa hin hêzên din ên li herêmê hena. Lê ji wê zêdetir jî, aliyekî wê yê giring jî divê ku mirov bi hebûna ewropa û amerika re werêne ser ziman. Î ro, li hemberî şerê rejima tirk ê li bakûrê kurdistanê bêdengîya welatên ewropî û amerika, di derbarê dewet nekirina kurdan a li civîna cenevê a sêyemin de jî wê aqilekî bide me.

Li vir, divê ku mirov vê jî bibêje ku berî destpêkirina civîna cenevê a sêyemin, weke ku bi awayekî vekiriî temenê bêdengîya welatên ewropî û amerika û hwd, li ser rewşa pênaber û goçberan re bi peymanên ku di wê çerçoveyê de hatina çêkirin re hat çêkirin. Almanya, di vê çerçoveyê de di çerçoveya ewropa de weke ku xwediyê misyonekê bû. Her wusa, ji gera Angela merkel a li tirkiya ku di dawîya herdû heyvên 2015´an de ku kir, wê di vê çerçoveyê de aqilekê biafirêne. Her wusa, ancamên civînên rayadarên almanî ên bi bi rayadarên tirk re ku li ser rewşa pênaberan re dikirin, wê di vê çerçoveyê de xwe bidina dîyarkirin.

Her çendî ku rewşa pênaberan, weke ´trejedîyekê´ hat bi navkirin jî, lê ev rewş weke ku hatibû pêşxistin bo ku temenê vê politikaya demê bi wê were afirandin û hat afirandin jî.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov rewşên sîyesî û bûyarên ku li herêmê ên piştî civîna duyem a cenevê û bi teybetî li Sûrî û rojavayê kurdistanê

bûna, bi hevdû re di çerçoveyekê de hilde li dest. Di vê çerçoveyê de bi dahûrkirina van rewşên sîyesî û bûyarên ku dibin re divê ku mirov temen û rewşa sîyesî a civîna cenevê li cihekî bicih bike.

Piştî civîna duyemin a cenevê şerê ku li başûrê kurdistanê û şengalê û li rojavayê kurdistanê û kobanê bi kurdan re hat meşandin, bo ku kurd ji hêz bikin bû. Her wusa, di çerçoveya vê politikaya ku bi wê dihat xwestin ku kurdan ji hêz bikin de bi deh hezaran mirovên kurd ji herêmên wan hatina kirin weke pênaber û hatina bi dunyê xistin. Rewşa pênaberan, mirov nikarê ji rewşên hêrîşên DAÎŞê ku li şengal û kobanê hatina kirin cuda şîrove bike. Divê ku mirov bi hevdû re di çerçoveya hêz û rejimên herêmê û hêzên ku li herêmê di çerçoveya pirsgirêka kurd de ku sîyesetê dikin, divê ku mirov bi aqil û politikayên wan re werêne ser ziman. Di dewama vê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku divê ku mirov astengkirina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin û bêdegîya ewropa û amerika a li hemberî komkujiyên ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê wê demê de dihêne serê kurdan, bi hevdû re hilde li dest û şîrove bike.

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê rastîyê jî werêne ser ziman ku şerê ku di vê sedsalê de bi kurdan re dihê meşandin, divê ku mirov di çerçoveya politikaya înkare kurdan de hilde li dest. Li herêmê, hêz û rejimên herêmê, û hêz û rejimên dervî herêmê ên weke ewropa, amerika, Rûsya û hwd jî di nav de, sîyeseta ku li hemberî kurdan dimêşênin, di çerçoveya wê sîyeseta înkara statûya kurdan de ya. Ev yek, bi awayekî vekirî dihê dîtin. Di sedsale 21´ê de û ku heta dawîya çeyreka pêşî a sedsale 21´ê, şerê tûna kirina kurdan ku bi kurdan re dihê meşandin û hemû cihana ku gotinên ´mafên mirovan´, ´dad´, azadîyê´ û hwd ku bi lev dike ku li hemberî wê bêdeng a, wê têgîneka bi gotina ´jenosîd´ re ku kurd hatina dorpêçkirin wê bi me re bide çêkirin.

Î ro, ku em bahse dad û haqaniyetê bikin û li ser ´neteweyên yekbûyî´ re bahse ´dada ser netewan re bikin û ku civakeka ku weke civake kurd ku ser 50 milyonî re li herêmê û ti nimînêrên wan di civînên neteweyên yekbûyî e nebin û bi wê re şerê jenisîdkirina kurdan ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku bi kurdan re bimeşêne, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hem rastîya vê cihanê fahm bike û hwerêne ser ziman û hem jî divê ku rastîya bêstatû hiştina civakeka weke civake kurd a ser 50 milyonî re hilde li dest û fahm bike. Di vê sedsalê de bi sîyeseta ku tê kirin, gotinên weke gotinên ´mafên mirovan´, ´dad´, azadîyê´ û hwd, divê ku mirov weke maske ji wê sîyeseta demê re jî werêne ser ziman.

Ku î ro di destpêka sibata 2016´an de jî ku statûya kurdan weke civak´ were nasîn jî, wê ev cihane roja me, wê rewşa şerê bi kurdan re ê heta roja me ku hatî meşandin û li hemberî wê bêdeng mayîna li hemberî hemû komkujiyên ku hatina hanîn li serê civate kurd, wê çawa werêne ser ziman? Bêgûman, ev pirs, ji pirseka sîyesî zêdetirî, weke pirseka ahlaqî û haqaniyetî xwe dide dîyarkirin. Rewşa kurdan a k u heta roja me, ew şerê bi armanca bêstatû hiştina wê û ji dîroka birina wê ku bi wê re dihê meşandin, bi ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin re xelakek din li wê zêde bûya. Her wusa, ji aliyê ahlaqî ve ku mirov vê rewşê bike berlêpirsînê de, di vê sedsale 21´ê de di sale 2016´an de ku bahse vilqasî aqil, zanebûn û pêşketina wê dihê kirin de, îzaha mirovatiyê, wê bi bêdengîya wê li hemberî komujiyên ku di vê demê de rejima tirk dihêne serê civate kurd re weke sefelatekê bê. Yan jî, wê karibin, wilqas komkujiyên ku hanîna serê civate kurd weke maskeyekê di bin gotina ´terorê´ de **binûxûmênin**? Ew mirovatiya ku wilqasî mirov divê ku di mejiyê xwe de bi nirx mazin bike, piçûk bûya û di rewşek sefil de ya bi rewşa xwe ya «pêşketî.» ..

Li vir, di çerçoveya rewşa kurdan de êdî rewş hatîya wê astê ku mirov divê ku hebûna DAÎŞê û ya civînên weke civînên cenevê ên yekemin, duyemin û sêyemin û hwd, bi hevdû re di zihniyetekê de hilde li dest. DAÎŞê, di ancama bêstatû hiştina kurdan de hat ajotin û hêrîşkirin li ser kurdan. Êdî bi awayekî vekirî dihê dîtin û fahmkirin ku DAÎŞ, tenê navê pêvajoyek rêxistinkirî a şer a li hemberî civate kurd bû li herêmê. Li ser wê re herkesekî ji aliyê xwe ve sîyeset kir û hê jî dihê kirin. Bi gotinaka din, rewşên weke rewşên civînên cenevê ku ne hiştina ku kurd tevlî wan bibin, temenê hêrîşên çeteyên DAÎŞê û hwd diafirêne. Li vir, di dewama wê de em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku bi ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê, temenê wê şerê pêvajoya hêrîşên DAÎŞê weke ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dike, barî pêşarojê dihê kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov ji aliyê civate kurd ve civîna cenevê werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji bîr nekê ku piştî civîna duyem a cenevê ku di destpêka sibate 2015´an de bû û pê de, wê hêrîşên li herêmên kurdan pêl bi pêl werina zêdetir kirin û piştre bi hêrîşên DAÎŞê re werê dayîn domandin. Piştre jî, li ser ancamên wî şerî ên trejikî re gotin di tv-en de hatina gotin û pêvajo hatîya pênase kirin.

Li vir, divê ku mirov vê pirsê jî bike. Piştî ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin û pê de, êdî wê çi bibe? Bo ku mirov bersivê

bide vê pirsê û rastîyekê bi wê bersivê re werêne ser ziman, hewce nakê ku mirov zêde bi zanebûn bê. Tişta ku piştî pêvajoya civîna cenevê a duyemin ku bû û pê de, wê piştî wê re bi rengna din were hanîn domandin li ser serê kurdan û herêmê. Ev jî, tê çi wateyê? Ev jî, tê wê wateyê ku wê pêvajoyek nû ya şer bê li hemberî kurdan bê û hwd. Pêvajoya şer a li hemberî kurdan û sûrî a piştî civîna cenevê a duyemin, piştî wê destpêkir. Lê pêvajoya şerê civîna cenevê a sêyemin ku bi kurdan re ya, weke ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dike, berî wê destpêkir.Li vir, çendî ku mirov îsrare rejima tirk a şer ku bi kurdan re divê ku mirov bi hewldana ne nasîna statûya kurdan re werêne ser ziman, bi wê re jî ewçendî divê ku mirov dawî li pêvajoya çareserîyê hanîn û ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin jî bi hevdû re hilde li dest. Ev bûyar û mijarên ku bi rewşa kurdan û şerê li hemberî van ve girêdayî ya, ku di çerçoveya nasîna statûya wan de bê, divê ku mirov bi hevdû vve girêdayî hilde li dest.

Weke ku berpirsîyarê neteweyên yekbûyî ´De mestûra´ ku di civînên xwe yên bi heyetên kurd re dihêne ser ziman ku «hêzên mazin, nahêlin ku kurd tevlî civînê bibin» û piştre di dewama gotina xwe de dihêne ser ziman ku «mijara tevlîbûna kurdan li civîna cenevêa sêyemin neteweyên yekbûyî derbas dike» jî, wê di derbarê vê têgîna ku «pirsgirêka kurd afirandîya û li ser wê re li herêmê sîyesetê dike jî, wê têgînekê bide me.

Li vir, divê ku mirov vê rewşê jî baş fahm bike, ku pirsgirêka statûya civate kurd ku di sedsale 21´ê de û di sale 2016´an de ku hê didomê jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hilde li dest. Her wusa, rewşa dorpêçkirina civate kurd bi sîyeseta jenosîdê, wê di çerçoveya sîyeseta giştî a sedsalê de bê. Li vir, hêzên li herêmê ên li tirkiya, bi wê nezanîya xwe, dikevina rewşa domandina wê sêyesetê de.

Li vir, divê ku mirov vê rastiyê jî werêne ser ziman ku ti carî hêza tirkiya bi tenê tûna ya ku pirsgirêka kurd heta 2016´an bide domandin ku piştgirî ji wê re nebê. Ev rewşa piştgirîyê, hinekî jî, wê di derbarê wê «hêzê mazin» ku ´De mastûra´ di nava gotinê de bi awayekî vekirî û ankû sergirtî ku balê dikişêne li ser wê di çerçoveya ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin de û ku pirsgirêka kurd di çerçoveya bêstatû hiştina civate kurd de ku hanîya heta roja me jî, wê têgînekê û hizrekê bide me.

Li vir, dema ku rewş ev bê, wê çaxê, divê ku mirov sîyesetek giştî a navnetewî di çerçoveya domandina pirsgirêka kurd, konseptên şer ên li hemberî civate kurd û bêstatû hiştina civate kurd de divê ku mirov bahse

hebûna wê bike. Her wusa, dema ku li vir, rewş ev bê, wê çaxê, mirov nikarê konseptên şer ên li hemberî civate kurd, ku di nava sînorê tirkiya de ku li hemberî kurdên bakûrê kurdistanê jî bê, mirov nikarê bi tenê bi tirkiya re wê hilde li dest. Li vir, li herêmê, bo li hemberî civate kurd, konseptek şer a bi vî rengî were pêşxistin, divê ku çerçoveyek wê ya giştî a navnetewî bi wan ´hêzên mazin´ ku De mastûra´ balê dikişêne li ser re jî, li wê bihizirê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov aqilekî dimeşêne, ya ku weke ancamakê ku mirov bi aqile xwe ku digihîyê de, ew a ku konsepta şer a ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê li dijî kurdan pêşxist divê ku mirov bi şerê DAÎŞê û komên din ên weke wê ku li hemberî kurdan ku li rojavayê kurdistanê dimeşênê re hilde li dest û divê ku mirov di çerçoveya wê zihniyet û sîyeseta ku dixwezê ku civate kurd bêstatû bihêlê û bi wê re jî ku ne hiştîya ku kurd tevlî civîna cenevê a sêyemin bibin re divê ku mirov wê hilde li dest.

Ancama pêşî a ne hiştina tevlîbûna kurdan li civîna cenevê a sêyemin çi ya? Weke ancama civîna cenevê a duyemin, wê ancama civîna cenevê a sêyemin jî, wê pêvajoyek nû a şer bê bo civate kurd. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de vê jî, bi sîyeseta jenosîdkirina civate kurd re hildê li dest û werêne ser ziman.

Di aslê xwe de aliyê sîyesî ê ku weke ´hêza mazin´ ku bi îsrarî bi sîyeseta jenosîdê hebûna civate kurd dorpêçkiriya û nahêlê ku pirsgirêka kurd çareser bibe jî, wê rengê wê sîyeseta navnetewî jî bi van civînên cenevê re di çerçoveya sîyeseta bi înkara statûya civate kurd re wê xwe bi awayekî fermî bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de mirov dikarê van civînên cenevê û her wusa civînên bi vî rengî, weke belge û dokumentên sîyeseta înkarkirina statûya civate kurd jî hilde li dest. Her wusa, bi vî rengî jî, wê ev civîn bi awayekî bina malê dîrokê.

Lê herîkîna dîrokê, çendî rêveber û desthilatdarî bixwezin ku li gorî xwe bireng bikin jî, wê nebê. Her wusa taloqkirina civîna cenevê a sêyemin ku dihat plankirin ku wê di 25´ê rêbendana 2016´an de jî, wê bide dîyarkirin ku wê pêşketina xalkan karibê kifşkirinê bi dîrokê re bide kirin. Taloqkirina civîna cenevê a sêyemin, sedema wê ya pêşî ew bû ku weke civîna cenevê a duyemin ku dihat xwestin ku di çerçoveya bêstatû û înkare kurd de were kirin. Lê ev sîyeseta ku di çerçoveya zihniyeta konferanse Lozanê de dihatkirin û civîna cenevê yekemin û ya duyemin ku hatibû li darxistin û bi serneketina wan civînan re bi ancam bû, wê biheta xwestin ku di civîna sêyemin a cenevê de jî, were dûbare kirin. Ev sîyeseta ku li ser esasê înkar û bêstatû hiştina civate kurd de ku dihat

meşandin, bi rewşa desthilatdarîya kurd a başûrê kurdistanê û rewşa desthilatdarîya rojavayê kurdistanê a ku hatibû avakirin re derbeyek mazin xwaribû bû. Hewldanên li darxistina civînên cenevê ên yekemin, duyemin û sêyemin bêî kurd, hewldanaka ku bi wê dixwestin ku wê sîyeseta ku kurd di wê de bêstatû hatina hiştin, bi şêweyekî li gorî demê ku temenê wê biafirênin û bidina domandin bû. Ya ku bi serneketibû bi ´serneketin civînên cenevê´ re jî, ev rastî bû. Di civîna sêyemin a cenevê de rêveberîyên herêmê û dervî herêmê, xwestibûn ku kurdan dervî wê bihêlin. Her wusa, weke ku çawa ku di civîna duyemin a cenevê de kurd ne hatina dewet kirin, di civîna cenevê a sêyemin de jî di wê de israrkirin ku kurd newina dewet kirin. Her wusa, sedema pêşî a taloqkirina civna cenevê a sêyemin jî, wê ev bê.

Piştî ku civîna cenevê a sêyemin hat taloqkirin jî, şerê li Sûrî û û rojavayê kurdistanê geştir bû. Her wusa, hêrîşên li herêmên Halabê, hinekî jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Herêma Halabê, hêzên ku li Sûrî şer dikin, dikin û dixwezin ku rewşa xwe li wê xort bikin. Wusa hizir dikin ku Halab, weke pro-tîpa Sûrîya. Bo vê yekê, rejim jî dixwezê ku li wir û li dora wê xwe û rewşa xwe xort bike. Komên din ên şer dikin jî, bi heman rewş, mantiqê û zihniyetê şer dikin. Weke ku piştî civîna cenevê a duyemin, pêvajoya hêrîşên DAÎŞê li rojava û kobanê û hwd destpêkirin, bi heman zihniyetê, nûha jî li rojava, halabê û û hwd, hêrîşan pêş dixin. Rewşa Halabê, di vê çerçoveyê de giring a. Her wusa, hêzên ku diçina civîna cenevê a sêyemin, dikin ku hêza xwe bi xortî li halabê biparêzên bo ku li ser pêşaroja Sûrî xwedî gotin bin.

…

**Komkujîya li Cizîra bota ku hêzên rejima tirk kirin, ´jêrzemîn(´bodrûm´)ên wahşetê´ û rewşa «wahşeta jêrzemînan».**

Di dema ku çend roj mana ji salwegera 15 sibatê a ku kurd weke ´roja reş´ bi nav dikin a ku di wê de birêz Ocalan hatîya dilgirtin de ji Cizîra bota, nûçeya komkujiyek mazin tê. Hêzên dewleta tirk bi hefteyan a ku di serî de Cizîra bota jî di nav de gelek bajarên kurdan dorpêçkirina û di wan de komkujiyan dikin. Mirov dikarê vê komkujiya dawî a ku hêzên rejima tirk a li Cizîra bota kir, weke ancama gotinên Dawutoglu ên ku li zanîngeha Artuklu´yê kirîya jî werêne ser ziman. Berîya vê komkujiyê Dawutoglu, gerekê li bajarê kurdistanê ê weke mêrdînê û hwd dike. Hinek dordorên ku dixwestin ku vê gerê weke maskeyekê ji komkujiyên

ku hêzên rejima tirk li bajarên kurdan bikarbênin jî, gotina ´hevdîtina biratiyê´ li vê gerê kirin. Lê di gera xwe de dawutoglu, gotinên ku wî dihanîn ser ziman, gotinên ku wê bi wan kurdan ´tehdîd´ bikin û wê çawa tirsandinê û bêhêvîtîyê bi kurdan re çê bikin, di wê çerçoveyê de bikardihanîn.

Her wusa, piştî gera Dawutoglu û gotinên wî ên li zanîngeha artuklu´yê ku weke ancama wan gotinên wî ya, ji Cizîra bota nûçeya ku dihat, di wê de dihat ser ziman ku bi dehan kurd hatina qatilkirin. Bi wê re jî, komkujiyên xwe dihanîn ser ziman. Ya ku rayadarên tirk, ji gotina biratiyê fahm dikirin, ew bû ku herkesekî asîmle bikin û bikina tirk bû. Ev gotina ´biratiyê´ ku rayadarên tirk car bi car bi xwe bikardihênin, ew bixwe jî bi wê bawer nakin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku weke ku çawa ku heta roja me, ol û bawerî îstismar kirina û bikarhanîna, bi heman mantiqê nêzîkî gotinên weke biratiyê jî bûna. Gotina biratiyê, car bi car kirina maske ji komkujiyên ku kirina û car bi car jî wê çawa xapandinê bikin, di wê çerçoveyê de bikardihanîn.

Rastiya şerê rejima tirk ê li kurdistanê li hemberî civate kurd û komkujiyên wê yên ku heta roja me, dihêne serê civate kurd, vê rastiyê piştrast dike. Dema ku yekî ji mirovekî re got ´bira´ û gotina ´biratiyê´ bikarhanî, her wusa wê li hemberî bi rêz û hûrmet bê û rêz û hûrmetê bide nirxên wan jî weke ku rêz û hûrmetê ji nirxên xwe re dixwezê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê nêz bibe. Lê ti carî rayadarên tirk, di vê çerçoveyê de nêzîkatî li kurdan ne kirina. Di ti demên dîrokê de ti kesek nikarê bibêje ku bi biratî nêzî kurdan bûna. Nêzîkatîya bi wê î ro li Cizîra bota, Sûrê, Silopîyê, Nisêbînê geverê û hwd ku li bajarên din ên kurdistanê ku nêzî kurdan dike, bi heman rengî di demên bûhûrî de nêzî kurdan bûna. Di destpêka komare tirk de komkujiyên weke komkujiya Zilanê hanîn serê kurdan. Piştre di dewama wê de komkujiyên weke komkujiya dersimê û hwd, hanîn serê civate kurd. Piştre jî, piçûk mazin, wê komkujiyên ku hêzên rejima tirk dihênin serê kurdan wê bidom in. Ji salên 1980´î û pê de, wê hemû herêmên kurdan, weke "herêmên awarta" werina bi navkirin û piştre wê politikayên xwe yên tafisandina kurdan bi rêve bibin.

Kurdan li hemberî wan politikayên wan, berxwe dana. Serî ne danîna. Ji ber ku serî li ber wan ne danîna, wê piştre komkujiyên nû ku li demê hatina belavkirin, wê werênina hanîn li serê civate kurd. Ji salên 1985´an û pê de, wê dem bi dem û roj bi roj komkujiyan werênina serê kurdan. Piştre wê heta salên 2000´an wê ev komkuji bidom in. Piştre jî, ji sale

2000´an û heta salên 2016´an û dawî li komkujiyên ku rejima tirk û hêzên wê dihênina serê civate kurd wê dawî li wan newê. Komkujiya herî dawî a di roja 8´ê sibata 2016´an de ku polîs û leşkerên tirk li Cizira bota ku hanîna serê kurdan û ku di wê de bi dehan kurdîstanî hatibûbûna qatilkirin, wê were kirin. Ev komkuji, wê li berçavê hemû cihanê were kirin. Lê wê cihana k u bahse ´mirovatiyê´ dike, wê li ber van komkujiyên rejima tirk û ayadarên wê ku dihênina serê civate kurd bêdeng bimênin.

Lê kurd, li her qadê li ser lingan bûn. Berteka xwe li hemberî van komkujiyên ku rejima tirk dihanî serê civate kurd dihanîn ser ziman. Ev komkujiya ku polîs û leşkerên tirk, weke bi dehan komkujiyên ku berî wê polîs û leşkerên tirk hanîna serê kurdan, wê ne bê komkujiya pêşî û ne jî wê bibê komkujiya dawî jî. Ev komkuji, hemû jî, weke komkujiyên ku di ancama derxistina li holê a pirsgirêka kurd in. Heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê ev komkuji, dawî li wan newê. Rayadarên tirk, dixwezin ku vê politikaya komkujiyan li ser serê kurdan bidina domandin û bi wê re derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê ya, ku her gav û kirinên di çerçoveya çareserkirina pirsgirêka kurd de hem wan ji xwe re dike armanc û hêrîşî wan dike û hem jî bi şitt li dijî wan disekinê. Dîplomasîya rayadarên tirk a li dijî tevlîbûna kurdan li civiîna cenevê a sêyemin jî, di vê çerçoveyê de vê rastiyê piştrast dike.

Di nava tirkiya de jî pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin, dema ku sê salan li ser asta hevdîtina bi rê ve çû û ku hat wê astê ku divê ku muzakare êdî werina destpêkirin, rayadarên tirk dawî li pêvajoyê hanîn. Her wusa, bi wê re jî, wê çawa muhatabên ku bi wan re di wan hersê salan de rûniştina, wê tûna bike û vala derxin, li ser wê re politikayê dikin. Gotinên weke "hewldana derxistina muhatabên nû", gotinên T. Ardogan ên bi rengê ku hanîn ser ziman ku "bi yên wele Leyla Zane re hevdîtinê bikin" û hwd, gotinên vala derxistina muhatabên pêvajoyê na. Ev gotin, divê ku mirov di rengê gotinên berê ên bi rengê "divê ku ocalan dervî pêvajoyê were hiştin" ku rengekî din hatina ser ziman in jî, mirov dikarê li wan binerê û fahm bike. Bi gotinaka din, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji ber ti politika û çareserîyên ku di wan de statûya kurd were nasîn ku di serê wê de tûna na, êdî bi vî rengî gotinan avêjina li holê û dihênina ser ziman. Rewşa birêz Ocalan hem bi hevdîtinan û hem jî bi kampanyaya îmzayan ku bo azadîya wî hatibûbûna berhevkirin re êdî weke muhatabê ku divê ku bi wî re pirsgirêka kurd were çareserkirin re zelal bû bû. Êdî rejimeka ku ti

çareserîya naxwezê û çareserî di serê wê de tûna na, rewşek bi vî rengî, ne rewşeka ku wê herê bike û bipejirênê bê. Bo vê yekê, êdî wê sîyeseta redkirina wê pêş bixe.

Di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ew gotinên ku bi wan dihênina ser ziman ku "dixwezin ku muhatabên nû derxin li holê" jî, tenê derew in. Rejimeka ku politikayên wê ên çareserîyê nebin, wê ti carî muhataban dernexe li holê ku bi wan re maf û azadiya civate kurd radest bike û hebûna civate kurd bi statûya wê re weke civate nas bike. LI şûna wê, wê komkujiyên ku weke ku li Cizira bota dike û li Sûra amedê û hwd dike, wê pêvajoyên şer û komkujiyan bi rê ve bibe. Ji xwe ya ku dike jî jî ev a di vê demê de. Komkujiya dawî a li Cizîra bota, divê ku mirov bi xosletên wê yên bi demê re baş bixwênê. Di demeka ku di wê de salwegera 15 sibatê a dilgirtina birêz Ocalan nêzîk dibe û 7 û ankû 8 roj mana ji wê rojê re ev komkujiya li Cizîra bota dihê kirin. Di vê çerçoveyê de komkujiya li Cizîra bota a dawiyê ku di roja 8´ê sibate 2016´an de hêzên rejima tirk kirin, divê ku mirov weke komkujiya ku di roja newrozê de ku li Hesekê hatibû kirin, weke wê şîrove bike û werêne ser ziman. Di wê dema komkujiya newrozê de jî, nameya birêz Ocalan hat xwandin û di wê de bahse destpêkirina ´muzakareyan´ dihat kirin. Di vê demê de jî, bi hatina salwegera 15´ê sibatê re ku birêz Ocalan newê rojê û bi wê hatina wî ya rojevê re ku bahse muzakareyan û azadîya wî û ya civate kurd newê kirin, di Çerçoveyeka ku bi wê bê xwestin ku mudahale li rojevê were kirin, ev komkujiya li Cizîra bota dihê kirin û bi şêwayekê di vê rengê û çerçoveyê de dihê xistin rojevê de.

Cizîra bota û herêmên din ên li wan rêveberîya cewherî hatîya denezendin, berxwedana li wan, berxwedenek dîrokî ya. Her wusa, rayadarên tirk, wusa tefkîr ne dikirin, wê bi vî rengî rêveberî werina denezendin û piştre wê berxwedana bo wan were û pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de berxwedana ku pêşket, wê politikayên wê yên şikandin û tafisandina kurdan jî derbe li wan bixe. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ku em denezene rewşenbîran weke rewşa berxwedana a duyem werênina ser ziman, divê ku em di temenê wê de weke rewşa pêşî ya berxwedana li bajarên kurdan werênina ser ziman. Berxwedana Cizîra bota, rejima tirk pirr zêde hêşandi bû. Bo vê yekê, serî li ser reng û cûreyê wahşetê dida. Rewşa ku weke ´rewşa wahşeta bodrûmê´, li Cizîra bota, bo ku wê berxwedana gel li wir bişikêne pêşxistibû bû. Ev rewşa ´**wahşeta jêrzemîn(´bodrûmê**´)´, wê di çerçoveya ku mirovên ku bo ku xwe ji hêrîşan biparêzên ku xwe sipartina

´bodrûmên bin xanî û ankû malên xwe de û ku hêzên tirk, ku dema ku xwe digihênina wan bodrûman, êdî bi awayekî hovane wan mirovan bi komî qatil dikin. Li berçavê cihanê hemûyî, wê mirovên sivîl, bi vî rengî di bodrûman de werina qatil kirin. Lê bertekên li hemberî wê jî, kêm bûn. Deng ji welatên ewropî û Amerika dernediket li hemberî wê hovîtîyê. ..

Li vir, divê ku miirov di dewama vê de vê yekê jî werêne ser ziman ku heta dawiya sibate 2016´an, wê ew hêrîş li Cizîra, Sûr, Hezexê û bajarên din ên kurdistanê bidom in. Wê bi topbaranê, herêman tûna bikin. Bi wan topbaranan, bi sedan mirovên sivîl qatilkirin. Piştre bo ku wan nîşanakê topbaran û hêrîşên xwe yên ku di ancama wan komkujiyên ku rayadarên tirk ku kirina ku afirîna bo ku wan ji holê ra bikin, bidest berhevkirina ´moloz´an û bermehîyên avahiyan kirin û diavêtina ber çemê diclê. Piştî cihên ku komkuji li wan bûna, wê **´kepçe´** bikevina herêmê de ku nîşanakên komkujiyan ji holê ra bikin. Ev rewş, weke rewşeka ku li hemû bajarên kurdistanê ên ku di wan de leşker û polîsên tirk ku komkuji dikirin, di wan de dihat dîtin. ..

Piştî rewşa qatilkirina mirovan di jêrzemîn(´bodrûm´)ên malên lli Cizîra bota, wê di 17´ê sibate 2016´an de wê bi heman rengî rewş li Sûra Amedê were rojevê. Di navaroka nûçeyên weke ”nûçeyên lezgîn´ ku ji herêmê dihatina de dihat ser ziman ku di jêrzemîn(´bodrûm´)ên hinekî malên li sûra amedê de bi dehan û sadan mirovan ku xwe sipartina wan, rastî topbarana leşker û polîsên tirk tê. Bo vê yekê, weke ku çawa di dema komkujiyên li cizîra bota de ku bû, wê li her deverê kurdistanî derkevina qadan û wan hêrîşên polîs û leşkerên tirk şermazar bikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werêne ser ziman ku di heman roja ku ev rewş li Sûra amedê dûbare dihat rojevê, qadaxaya derketina li sûkê li Hezexê hatibû danîn. Piştî ku qadaxaya derketina li Sûkê li Hezexê hatibû danîn û pê de, wê polîs û leşkerên tirk bi tank û topan bidest hêrîşê li taxên Hezexê jî bikin.

Hikimeta AKP´ê bo ku kurdan jî bike hevkarê wan komkujiyên ku wê dihanî serê civate kurd, wê ji cerdewanan bixwezê ku ew jî hêrîşê li sazîyên civate kurd bikin. Bi wê re jî, ji aliyekî din ve jî, kontrayên rejima tirk êbi awayekî vêşarî di nava DAÎŞê de li rojava dabûbû şerkirin li dijî kurdan, wê gelekan ji wan jî werêne li herêmê û bide şerkirin. Ev rewş, wê di nava kurdan de ji aliyekî ve weke ”´hevkarîya DAÎŞ û hikimeta tirk” were rojevê û ji aliyê din ve jî, wê weke ”hanîna çeteyên DAÎŞê ku li herêmê li hemberî kurdan şer bikin” wê were ser ziman. Ev rewş, di dema hêrîşên li Cizîra bota, Sûr, Farqînê, Gever û Hezexê de pirr

zêde hatibû ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku piştî li kobanê û herêmên din ên rojava têkçûna DAÎŞê û pê de, wê rayadarên tirk, gelek kontrayên xwe yên ku şandibûbûna rojava ku di nava refên DAÎŞê de ku li hemberî kurdan şer dikirin, wê wan werênê herêmê û li hemberî civate kurd li bakûrê kurdistanê bide şerkirin. Ev bû, ya ku weke hanîna DAÎŞê li herêmê bû. Di aslê xwe de dema ku rastîya DAÎŞê bi heta lêkolîn kirin, wê bi heta dîtin ku pirranîya mirovên ku hatina berhevkirin û dihatina dayîn şerkirin, wê ji wan kontrayên rejima tirk bin. Di salên 1990´î de bi heman rengî û şêwayî wê li ser nîjadperest û faşîştên tirk re wê rêxistinkirinên bi vî rengî werina pêşxistin. Piştre hatina ser desthilatdarîyê a AKPê ku olê weke ´maske´ ji xwe re bikardihêne, wê li ser olê re heman rewşên ku ku di salên 1990´î de li ser nîjadperestan re dihatina pêşxistin, wê li ser olê re pêşbixin. Kontrayên ku rejima tirk di salên 1990´î de ji nava nîjadperestan derxistina li holê bo ku kurdan qatil bikin, vê carê bi reng û maskeya olî di hatina derxistin li holê. Rejima tirk, li ser têkiliyên xwe yên bi sûûdî û hinek rejimên din ên arab re jî, dikir û dixwest vê rewşa olî bi maske bike û bide domandin. Politikayên rejima tirk ên dema hikimeta AKPê de ku li ser olê re û di bin maskeya olê de dihatina pêşxistin, wê di vê çerçoveyê de bixwezê ku olê ji wan komkujiyên ku li kurdistanê dikirin re bikina maske. Li ser hevdû çûyina T. Arogan û Dawutogu li Sûûdî û hwd, hinekî jî bi vê politikaya wan ya bikarhanîna olê weke maske ve girêdayî bû. Komkujiyên ku li Cizîra bota, sûr, farqîn, Gever, Nisêbînê, Hezex û hwd, di şêwayekî di rengê komkujiyên ku DAÎŞê li rojava dikir de komkuji dihatina kirin. Komkujiyên ku weke komkujiyên li ´jêrzemîn(´bodrûm´)ê dihatina bi navkirin, hinekî di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibîr bixe.

**Di pêvajoya komkujiyan a li Cizîra bota de di bodrûma wahşetê de bi ”wahşeta bodrûmê” a ku pêş bikeve re qatilkirina mirovan. Ev rewş, bo awayekî hovane hem bo tirsandin û tafisandinê bû û hem jî bo şikandina berxwedana ji nava civatê kurd bû. ....**

Li gelek deverên bajêr, gel, di bin malên xwe de bodrûm weke cihên xwe sipartinê hizirîbûn û xwe li wan girtibûn. Piştî ku hêrîşên polîs û leşkerên rejima tirk bi şitt li ser Cizîra bota destpêkir û pê de, li gelek deverên bajêr, kurdistanîyan bi girseyî xwe li wan bodrûmên di bin mal û xanîyê xwe de ku çêkiribûn li wan girtibûn. Hêzên rejima tirk jî, di

bodrûma de kî derdiket ew qatil dikir. Bo vê yekê ti kesek dernediket derve. Di bodrûmên di bin mal û xanîyan de mirov bi komî ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve dihatina qatilkirin. Bi rengekî hovane mirovan di wan bodrûman de qatil dikin. Pêşî mirovan dikujin û piştre jî, laşê wan dişawitênin. Bo vê yekê ya ku ew laşê mirovên ku di wan bodrûman de ku ew hatina qatilkirin, şawitîya. Bi vê re dema ku mirov wan laşên wan ê şawitî dibînin, êdî dibêjin ku ”hêzên tirk bi çekên kimyewî ew kuştina.” Gelek ji wan mirovên ku di bodrûman de ji aliyê polî û leşkerên tirk ve hatina qatil kirin, di laşê wan de cihê ti gûleyên ku hatina avêtin li wan û ankû hatî li wan raşandin, mirov rastî wê nayê. Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, ew şawitîna laşan jî, bi awayekî xweza di serê mirovan de dibê sedema pirsînê. Bo vê yekê, di gelek bodrûmên li Cizîra bota li binê mal û xaniyan de ku bi komî bi dehan mirov di wan de hatina qatilkirin de mirovan, hanîya ser ziman ku ”divê ku lêkolînek cidî were kirin. Ber ku nîşanakên wê hena ku çekên kimyewî hatina bikarhanîn. ” Yên ku ew laşê mirovên kuştî ê şawitî ku didît, digot ku ”ew bi çekna teybet hatîya qatilkirin.” Lê ew çekên teybet çi bûn û çawa bûn, di derbarê wê de ne xwediyê hizir û zanînê bûn. Rewşa ´wahşeta bodrûman” a li Cizîra bota, weke rewşek teybet û cidî derketibû li pêş. Raaydarên tirk jî, bo ku ser mijarê bigrin, ne dihiştin ku ew were rojevê. Di çapameniyê de jî ev rewş weke ”wahşeta bodrûmê” hat bi navkirin û hat hanîn li ser ziman, ne dixwestin ku ti kesek zêde li ser wê biaxifê û werêne ser ziman.

Î ro, hemû kurdistanî, li ser di "**wahşeta bodrûmê**" de qatilkirina mirovan diaxifê. Di dawîya hefteya pêşî a heyva sibatê de hêzên rejima tirk bi polîs û leşkerên xwe re hêrîşî kurdên sivîl ên ku xwe spartina ´bodrûmekê´ û wan qatil dikin. Berî ku ev komkuji bibê kirin, maxdûrên komkujiyê ku di wê demê de bi birîndarî xwe sipartina bodrûmê, bi telefonê têkilî bi weşanên tv´ya Stêrk-tv û Nûçe-tv re didanîn û dihanîn ser ziman ku ´gelek birindar hena û hêzên rejima tirk tên ku wan qatil bikin.´ Piştre wusa jî bû. Çend roj bi ser van çû, ti kesekî agahî ji wan bi dehan mirovên sivîl û birindar ên kurd ne girt. Bi wê re jî, rayadarên tirk, derdiketina berçapameniyê û digotin ku "di bodrûmê de mirov hena û ankû nîn in, kes nizanê." Di dewama gotina xwe de dibêt ku ´ti kesek ji bodrûmê de nebê jî." Ev gotinên Dawutoglu, nîşanaka wê bûn ku wê ew mirov hemû bi hatan qatil kirin. Ankû, nîşanaka wê bûn ku ew hatibûbûna qatilkirin. Di dema ku Dawutoglu ev gotin dihanîn ser ziman, weke ku bixwezê ser tiştna binûxûmênê, gotin dihanîn ser ziman.

Piştre, di dawîya hefteya pêşî a sibata 2016´an de nûçeyên ku ji Cizîra bota dihatin, di wan de dihat hanîn ser ziman ku "hemû mirovên di bodrûmê de hatina qatil kirin." Piştre ku seat li ser seatê re diçûn, dihat piştrast kirin ku polîs û leşkerên tirk, hemû mirovên sîvil øn di wan bodrûman de qatil kiribûn. Lê piştre, ku bûya weke kevneşopîyeka rejima tirk, di rojevê de bi politikaya komkujiyê, rojeve komkujiyê bi komkujiyên nû bide girtin´, bi wê re heman tişt bê. Heman rewş, wê di bodrûmeka din de wusa bibe. Ev jî, wê di çapameniyê de weke "**wahşeta bodrûmê a duyemin**" ku were ser ziman, wê were jin kirin. Rewşa ´wahşeta bodrûmê a duyemin´, piştre rewşa mirovên sivîl ku pirraniya wan birindar bûn û xwe sipartibûbûna bodrûma binê malekê û ku polîs û leşkerên tirk ew kifşkirin û oparasyon li wan kir û hemû qatilkirin û piştre, di bodrûma duyemin de ku hat rojevê, biqasî ku dihat ser ziman ku ser 60 mirovî û ankû zêdetir jî ku di wê de bûn, piştre bi heman rengî û bi hovîtîyek mazin ew tên qatilkirin. Ev rewş jî, piştî rewşa bodrûmê a yekemin û pê de bi çend rojan, di 8ê sibate 2016´an de bûbû bû. Ev mirovên ku di bodrûma duyemin de ku hatibûbûna qatilkirin, weke ku bi gazê û ankû çekên kimyewî hatibûbûna qatilkirin. Bo vê yekê, gelek mirovan ew mirovên ku di bdrûma duyemin de ku hatibûbûna qatilkirin ku ew û laşê wan dîdtin, digotin ku ”di laşê wan de cih û nîşanaka gûleyan tûna ya, lê hemû laşê wan şawitîya” bo vê yekê doza lêkolîneka cidî dikirin bo ku ev rewşa qatilkirina wan bi çekên kimyewî were piştrast kirin. Di nûçeyên ku pêşî dihatin de di wan de dihat gotin ku "ser 25 mirovan re ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve hatina qatilkirin û laşê wan hatîya şawitandin. Mirovên ku li wan şawitandina laşê mirovan dinerin, hinek gotinên din jî dihanîn ser ziman û digotin ku "çekên kîmyewî bikarhanîn a, ev şawat ya wê ya." Bo vê yekê, bang dikirin û digotin ku divê ku lêkolînek pirr cidî were kirin.

Gelek dordoran, dihanîn ser ziman ku dema ku lêkolînek cidî bihata kirin, wê biheta zanîn ku hêzên tirk li Cizîra bota li hemberî sivîlan çekên kimyewî bikarhanî ya. Lê hêzên dewletê, bi gotinên ku dikirin, dixwestin ku heya mirovan ji wê derê bidina Derek din û rojevê bigûharênin. Yanî, bi gotinek din, dixwestin ku ser komkujiyê binûxûmênin. Her timî, birhan û nîşanakên komkujiyan hatina windakirin. Bi wê re jî ne hiştina ku ti doz werina vekirin û biryar werina girtin di derbarê komkujiyên ku hêzên dewletê li bajarên kurdan kirina de.

Her wusa, di derbarê komkujiya li Cizîrê de ku mirov li wê dinerê, ya ku mirov didît ew bû ku rewş, çendî ku derdiket li holê û rastî dihat dîtin,

dihat fahmkirin ku ya ku dihat hizirîn û tefkîrkirin, ji wê zêdetirî rewşek xirabtir heya. Bi zihniyetek ku wehşetên di bodrûman de bi mirovan didin jînkirin, şer li dijî kurdan di sedsale 21´ê di sale 2016´an de didomî ya. Her wusa, rejima tirk, weke rêbazek din jî, kom bi kom bi sadan kurdên sivîl bi hevdû re qatil dikir û çar bi çar û ankû pênc bi pênc wê cenezeyên wan ji herêmê bibe deverên din. Di vê çerçoveyê de wê bixwezê ku wê dîmenê bide li berçav ku ew mirov bi hevdû re ne hatina kuştin. Yan jî, ku karibê, cihê ku ew li wê hatina qatilkirin, di mejiyan de bigûman bikira li ser meşandina şer li ser çapameniyê re êdî wê karîba bigota ku ew ne sivîl in û ankû di nava şer de ew hatina kuştin bi gûleyê kê hatina kuştin ew nayê zanîn. Ji xwe gotinên walîyê tirk ê şirnaxêku di bêje ku "li rex ya zûwa a şîn(´şil´) jî dişawitê." Bi vê gotinê, dixwestin ku vê întîbayê di mejîyan de bidina çêkirin ku ew di nava şer de hatina qatilkirin. Ji xwe, rojnemeyên tirk, di nivîsandin ku "ew çekdar in û biçek in." Çendî ku ev derew jî bû, ev gotin bi israrî dihanîn ser ziman.

Komkujiya li Cizîra bota dihat kirin, rayadarên tirk, dixwestin ku barî bajarên din ên kurdistanê jî bike. Wezirê karê hundûr Afkan Ala di 9ê sibata 2016´an de dihanî ser ziman ku "di rêzê de Nisêbîn û Hezex heya. Wê oparasyonên paqijkirinê li van jî bên domandin." Bi gotinê, dihanîn ser ziman ku wê şerê li Sûr û Cizîra bota, biherikênina li van bajaran. Plan û stretejiyek giştî a li hemberî civate kurd hatibû pêşxistin. Ev pêvajoya hikimetên AKPê ji sale 2001´ê heta sala 2016´an, di şibeha salên destpêka komare tirk ên sale 1923´an û heta sale 1937´an. Ji sale 1923´an û pê de, wê pêşî li bendê bisekin in ku heta ku peymana Lozanê were mohrkirin. Piştî ku ev peyman hat mohrkirin, êdî wê denezenan li dijî kurdan denezênin û bidest hêrîşê bikin. Piştre jî, wê asta hêrîşên rejima tirk ên li civate kurd bike ku kurd ji Agirî û heta serhildana şêx Seid wê heta sale 1925´an destpê bikin. Lê ev serhildanên kurdan wê bixwûnê werina tafisandin. Piştre dem bi dem, wê li herêmên kurdan oparasyon û seferên bixwûn ku di wan de bi hezaran û deh hezaran kurdan qatil dikin, wê bikin. Komkujiyên li dersimê wê xeleka dawî a van rêz komkujiyên ku rejima tirk dihênê serê civate kurd bê. Heta sale 1937´an, wê pirraniya kurdên li dersimê jî werina qatilkirin. Piştre jî, wê piştî vê komkujiyê bêdengîyek di ancama wanqas komkujiyan de li kurdistanê li ser serê kurdan xwe bide dîyarkirin. Li ser ancama wan komkujiyan re wê paxta sadabadê were li darxistin.

Di vê demê de jî, heman pêvajo dihê jîn kirin. Di destpêka hêrîşên DAÎŞê de T. Ardogan bixwe çûbû bû Îranê û bi rayadarên îranî re li qasra

sadabadê hatibûbû cem hevdû. Piştre jî, dixwestin ku heman ancamê bidest bixin. Bi wê aqilê û zihniyetê hêrîşî başûr û şengalê û rojava û kobanê kirin. Lê ancama ku di xwestin bidest ne xistin. Piştre jî, rejima tirk pêvajoya komkujiyê li bakûrê kurdistanê bi konsepta şer da destpêkirin. KOnsepta şer a ku li bakûrê kurdistanê dana destpêkirin, di aslê xwe de hêvî kiribûn ku berî wê li başûr û şengalê û rojava kobanê serkevtinê bi hêrîşên DAÎŞê û hwd bidest bixin û li ser wan ancaman re pêvajo û pêlên hêrîşê li bakûrê kurdistanê bidina destpêkirin. Çend ku ew ancam bidest ne xistibûn jî, dîsa pêvajoya hêrîşên li bakûrê kurdistanê dana destpêkirin.

Hêrîşên ku rayadarên tirk plan kirina ku bi wan li ser serê civate kurd ancamê bidest bixin, hêrîş û komkujiyên li bajarên kurdistanê ên weke Cizîra bota, şûrê û hwd, di ancama wê de dibê. Ev pêvajoyek hêrîşan a, ku li hemberî civate kurd giştî hatîbû birêxistin kiribû. Di aslê xwe de ev pêvajoya şer, herçar beşên kurdistanê kiribûbûna çerçoveyeka wê de. Di vê çerçoveyê de xwestibûn ku ancamê bidest bixin û jenosîda li ser serê civate kurd bibina sêrî. Ya ku ev plana wan xirakir berxwedana kurdan bû. Hêrsa wan jî, ji vê yekê ya. Ji ber vê yekê ya, bi hov hêrîş dikin û wahşetên mazin weke ku li Cizîra bota û hwd dikin, dikin ku werênina serê civate kurd. Bajarên kurdan, bi topbaran kavil kirina. Tûna kirina. Her wusa, bi wê re tişta ku bi kavilkirna kobanê re me dît, li bajarên bakûrên kurdistanê polîs û leşkerên tirk pêşxistin. Lê bi heman rengî jî, ew bi berxwedanê ku çawa ku kurdan li kobanê dîrok nivîsand, î ro jî li Cizîra bota, sûr û bajarên din ên bakûrê kurdistanê, heman dîrokê û destanê dinivîsêne.

.....

**Sîyeseta destavêtinê ya ku bi wê li Cizîra Duyemin rewşa EKIN WAN hat pêşxistin, ku hêrîşî rojava dike.** Ekin Wan, keçeka kurd a tekoşar bû. Di 10´ê tabaxa 2016´an de wê bi birîndarî bikeve destê leşkerên tirk de. Ew jî, wê êdî wê bi êşkenceyan qatil bikin û piştî ku qatilkirin û pê de, wê wêneyên wê bi laşê wê yê rûtkirî wê bikişênin û di çapameniya civakî de belav bikin. Ev rewş, di nava kurdan de weke rewşeka rengekî hêrîşên rejima tirk a li civate kurd û her wusa hêrîşa li rûmeta wê, wê bikeve nava rûpelên dîrokê de. Piştî ku bûûyar hat bihîstin û pê de, li hemû bajarên kurdistanê wê bi teybetî xwepêşandinên mazin di pêşengîya jin û dayikên kurd de bibe û wê vê rewşa ku leşkerên tirk kirî şermazar bikin. Jin û dayikên kurd, wê bi ´dirişma ”Ekin Wan,

rûmeta me ya rût a” wê xwepêşandinên girseyî li darbixin. Piştre bi çend heyvan, li Cizîra bota, wê bi heman rengî keçên kurd qatil bikin û rût bikin û wêneyên wê bikişênin û li ser çapameniya civakî belav bikin. **Ev rewşa ku li Cizîra bota dubare dike, wê di dawîya hefteya pêşî a heyva sibate 2016´an de wê bibê**.

Rewşa EKIN WAN çi bû.? Rewşa Ekin WAN, ew bû ku leşkerên tirk, keçeka kurd bi saxî bidest xistibûbûn û piştre ew bi êşkenceyan qatilkiribûbûn û piştre jî, ew rût kiribûbûn û wêneyên wê kişandibûbûn û li ser çapameniyê re belav kiribûbûn. Her wusa, Li Cizira bota jî, di destpêka hefteya duyemin a sibate 2016´an de heman rewş ji aliyê leşkerên tirk ve hat kirin. Ev jî, weke rewşa duyem a **EKIN WAN** hat bi nav kirin. Li wir, ew keça kurd ku dîsa sax dikeve destê leşkerên tirk de wê, bi saxî bi êşkenceyan qatil dikin. Piştre jî, laşê wê rût dikin û wêneyê rût dikişênin û di çapameniya civakî de belav dikin. Di aslê xwe de ev rewş û hemû rewşên bi vî rengî, nêzîkatîya rejima tirk a li civate kurd, baştirîn dide fahmkirin. Zihnyeta ku bi wê nêzîkî kurdan dibin, di vê çerçoveyê de ya.

Hêrîşên li bajarên kurdan, weke hêrîşên tûnakirina civate kurd jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, aliyekî van hêrîşan çandî heya. Bi teybetî, di çerçoveya armanca ji dîrokê birina civate kurd de ew hêrîş, li civate kurd dihên kirin. Li vir, divê ku mirov di dewama wê de vê jî, werêne ser ziman ku hêrîşên li hebûna civate kurd ên ku rejima tirk, dikê, hêrîşên bi armanca jenosîdkirinê na. Her wusa, wê çawa civate kurd ji dîrokê bibin, di wê çerçoveyê de hêrîş dikin.

Di destpêka hêrîşên DAÎŞ ên li ser rojava de rayadarên tirk, hêvî dikirin ku wê DAÎŞ, derbeyekê li kurdan bixe. Li ser wê derbeyê re jî, wê êdî bikin ku bi ´pêvajoyê´ jî bi ancam bikin. Lê ya ku dixwestin, weke wê nebû. Tevî hêrîşên giran û xûrixandinên mazin jî, kurd têkneçûn. Êdî pîştî wê re bidest hêrîşê li civate kurd kirin. Hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê di çerçoveya konseptek şer de kirin, divê ku mirov di dewama pêvajoya hêrîşên DAÎŞê de werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku rejima tirk, piştî ku dît ku wê bi DAÎŞê ancama ku dixwezin ku bidest nexin, êdî ew bixwe ket dewrê de. Hêrîşên ku ew nûha li bakûrê kurdistanê de dike û her wusa, hêrîşên li rojava jî, di nav de weke hêrîşên ku di çeçroveya planak şer a rejima tirk de dihê meşandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Rayadarên tirk, xwe weke "sûnnî" û nêzî Sûûdî nîşandina wan jî, armanca wê hin bi hin

bi gotinên weke bi hevdû re oparasyonekê bejehî li Sûrî kirinê de derdikeve li holê. Rayadarên tirk, dixwezin ku di çerçoveya oparasyonek bejehî de bikevina rojava de. Ev armanca wan heya. Lê ew, dixwezin ku bi Sûûdî re vê bikin. Ber ku ew nikarin bi teneserê xwe tiştekî wusa bikin. Bi gotinaka din, weke ku bixwezin, ku karibin ´bloka sûnnî´ di vê çerçoveyê de bikarbênin. Ji xwe, pêşxistina DAÎŞê, bi serê xwe ji vê aliyê ve bi awayekî weke bikarhanîna ´bloka sûnnî´ jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de weke ku Putin jî gotin rayadarên tirk "xwe misilman didina nîşandin" û hwd, tenê di vê çerçoveyê de wê xxwe nîşandinê, bikardihênin. Yanî, dixwezin ku xwe wusa bidin nîşandin û ii ser wê xwe nîşandinê re jî politikayên xwe "dij-kurd" jî bibîna sêrî û ancamê bidest bixin. Di çerçoveya politikayên xwe yên ´dij-kurd´ de dixwezin ku ancamê li ser wê xwe weke ´misilman´ dayin nîşandinê re bidest bixin. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ol, li herêmê, weke bîrdozîyek şer ya di vê çerçoveyê de ku pirr xirab li dijî civatên herêmê ji aliyê rejimên herêmê ve hatîya bikarhanîn a.

Di aslê xwe de rewşa şer a li rojhilat, piştî serdestbûna osmanîyan a li herêmê re ti carî dawî li wê ne hatîya. Wusa, dihê ditin û xûyakirin ku heta ku li herêmê xwedî hêz û serdest jî bin, wê dawî li wan şer û pevçûnên li herêmê newê. Di serî de divê divê ku mirov vê rastiyê di serî de werêne ser ziman. Zihniyetek ku hebûna civatên li herêmê ên dîrokê esas nagirê û rêz û hûrmetê ji xalk û civatên herêmê ên dîrokî re nagrê, bêgûman, wê li ser zihnîyeta desthilatdarî re bike û bixwezê ku xwe serdest bike û wan xalkan jî di vê çerçoveyê de ji dîrokê bibê. Pirsgirêka sereka a zihniyetê li herêmê, divê ku mirov li vir di vê xalê de, di vê çerçoveyê de li wê bigerihê.

Rejima tirk, pêşî hêvî dikir ku bi DAÎŞê ancamê bidest bixe. Lê ew ancama ku hizir dikir bidest nexist. Piştre jî, ku kurd li hemberî DAÎŞê û komên din ên tundrew ên weke ku wan pêşxistina û ajotin bi ser kurdan ku bi serketin û piştre, rejima tirk bi artişa xwe bidest hêrîşên li rojava bike. Ji Sibate 2016´an û pê de, topbaranên artişa tirk ên li herêmên rojava ên weke Afrîn, girê-sipî, halabê û hwd, wê were rojevê, Rayadarên tirk, politikaya xwe ya ku li ser bêstatû hiştina kurdan avakirina, di wê çerçoveyê de hem li rojava hêrîşan li kurdan li ser komên çete ên weke DAÎŞ, ahrar el-şam, cebetil-nasr û hwd re pêş dixe. Her wusa bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku hêrîşên rejima

tirk ên li bajarên kurdan ên bakûrê kurdistanê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman..

Heta roja me, li ser NATO, ewropa û amerika re politikayên xwe yên dij-kurd û di çerçoveya bêstatû hiştina civate kurd de meşandin. Lê dema ku ditin ku wê êdî nikaribin, li ser wan re êdî vê van politikayên xwe yên dij-kurd û di çerçoveya bêstatû hiştina kurdan bimeşênin, êdî bi pêşxistina komên tundrew ên weke DAÎŞ û hwd û pişta xwe dayîna rejimên herêmê ên weke Sûûdî, dikin ku van politikayên xwe bimeşênin. Di vê çerçoveyê de rayadarên tirk, têkilîyê bi Sûûdî re didênin û hewldidin ku bi wan re oparasyonên bejehî û hwd li rojava û Sûrî bikin. Di vê çerçoveyê de Di temenê de hemû sîyeseta rayadarên rejima tirk de, dij-kurdîtî û politikayên wan ên bi armanca li herêmê bêstatû hiştina kurdan hena.

Tirkiya, balafirgeha ´incillikê´ê, ji balafirên şer ên sûûdî re divekê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dixwezê ku şerê xwe yê li hemberî kurdan bimeşêne. Sîyeseta herêmê, ku li ser esasê bêstatû hiştina kurdan hatîya vakirin û ji dema şerê cihanê ê yekemin ve bi peymanên weke "**sykes-picot**" û hwd re temenê wan hatîya avêtin, di wê çerçoveyê de vê sîyesetê dikin. Î ro, di wê çerçoveyê de şerê xwe bi kurdan re dike.

Tirkiya li herêmê, her tiştê bi navê civate kurd, ji xwe re weke armanca hêrîşê dibînê. Di vê çerçoveyê de hêrîşên xwe li hemberî civate kurd dike. Her wusa, ev şerê ku di hundurê vê 40 salê ku bûhûrî de ku rejima tirk bi kurdan re kir, hemû jî li ser vê esasê bû. Nûha jî, di wê çerçoveyê de diçê bi ser kurdan de. Di vê çerçoveyê de di "xate ezazê" dixwezê ku pêşîya rizgarkirina wê bigrê. Her wusa, ev herêmên ku berê tirkiya li wê dixwest ku ´herêmek tampon´ ava bike, nûha jî, di vê çerçoveyê de dixwezê ku di filiîyetê de sîyeseta herêma tampon li wê bimeşêne. Pêşîya rizgarkirina wê girtin jî, hinekî divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Kurdan, heta roja me, çi proja pêşxistin bo çareserkirina pirsgirêka kurd, hemû jî vala derxistin. Herî dawî, pêvajoya çareserîyê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman, ji aliyekî ve nêzîkatîya li pêvajoyên ku kurdan dana destpêkirin ên weke ´pêvajoya çareserîyê´ û hwd, weke tercih û ankû ne tercihkirina tirkiya ku bi kurdan re bijî. Di aslê xwe de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman. Gotinên ´biratiyê´ û ankû ´birayê minê kurd´ û hwd, gotinên ku temenê wan li ser bişavtinê hatina avakirin in. Di temenê wan de ti rastî, têkilî û nêzîkatîyên bi rêz û hûrmet tûna na.

Di temenê hemû nêzîkatîyên ku bi wê rayadarên tirk nêzî kurdan bûna de projeyên wê yên bişavtinê hena.

Her wusa, bi vê re jî, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di rastiyê de di ti demê de rayadarên tirk, bi awayekî rast ku di çerçoveya ku hebûna kurdan herê bikin û bi wê nêzî kurdan bibin, nebûna. Ti carî, ne hatina vê astê. Her wusa, dema ku mirov li dîrokê jî binerê, mirov wê vê rastiyê bibînê. Di dema komkujiya zilanê ku di destpêka avabûna komare tirk de hat hanîn serê civate kurd û piştre heta komkujiya dersimê, nêzîkatîya ku rayadarên tirk ku bi wê nêzî kurdan dibûn, weke wê nêzîkatîya ku li keça kurd EKIN WAN hatî kirin û ankû weke nêzîkatîya wê ya ku li li Sûrê, Cizîra bota û hwd ku nêzî kurdan bûya ya. Ev rewş, rastî û rastteqînîya nêzîkatîya wê ya li kurdan bi rastî dihênina ser ziman. Di dema komkujîya dersimê de jî, dayikên kurd, leşkerên tirk, bi singên tifingan zikê wan diqalaştin û bi sazî zaroyên di zikê wan de derdixistin û dikuştin. Ji wê demê û heta roja me, ku mirov bi pirsê ku ka çi di nêzîkatîya raaydarên tirk a li kurdan de gûharîya, bersiv, wê ji wê demê û heta sale 2016´an, wê weke ku li Cizîra bota, Sûr û hwd bû, wê bi heman rengî bê. Wê hê xadartir bê. Wê hê bi hovtir bê. Wê nêzîkatî hê zêdetir zalîmane bê.

Ev sîyeseta ku bi wê rayadarên tirk, diçûna bi ser kurdan de û bi wê bi topbaranan hêrîşî rojava dikin, ew sîyeseta ku bi wê komkujiyên weke komkujiya zilanê, komujiya dersimê û hwd hatibû kirin bû. Her wusa bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku qatilkirina keçên kurd û rûtkirina laşê wan û wêneyên wan kişandin û di çapameniya civakî de parvekirin jî, weke ancama vê sîyesetê ya. Ev sîyeseta destavêtin û tecewûzê jî ya. Her wusa, bûyarên destavêtin û tecewûzê ku dem bi dem li bajarên kurdan û tirkan hatina hanîn li serê jin û keçên kurd jî, di ancama vê sîyesetê de bi awayekî bi plankirî hatîya pêşxistin. Di vê çerçoveyê de van bûyarên destavêtinê û tecewûzê û hwd re, divê ku mirov sîyeseta ku rayadarên rejima tirk bi wê hêrîşan li dijî civate kurd bi rêxistin dikin divê ku mirov fahm bike û werêne ser ziman.

Bûyara rewşa EKIN WAN û bi heman rengî ya ku dûbarê weke li Cizîrê hatibû pêşxistin û her wusa, hêrîşên li bajarên bakûrê kurdistanê û her wusa sîyeseta hêrîşkarî a rejima tirk a li hemberî rojavayê kurdistanê kurdistanê di çerçoveyekê de divê ku mirov bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman.

....

**Hewldana Tirkiya a di bin maskeya Sûûdî de ketina Sûrî, xate ezazê û bombardimana artişa tirk a li hêzên kurd ên rojava, li vir, divê ku mirov di dewama wê de werêne ser ziman. Heta ku mirov rewşa bombardimana artişa tirk a li hêzên kurdên rojava fahm nekê, mirov nikaribê rewşa wê ya nêzîbûna li Sûûdî jî bi hewldana wê ya parastina ´xate ezazê´ di destê çeteyên DAÎŞê û hwd de jî fahm bike. ..**

Di van rojên ku li Sûrî û rojava pêşveçûnên germ dijîn de tirkiya, bi têkiliyên xwe yên bi Sûûdî re dike ku xwe werêne li rojevê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Sûrî, weke pro-tîpa Rojhilat, dîmenekî dide dîyarkirin. Rejimên herêmê, dema ku li ser hêza xwe re nekarîn ku li herêmê hêza xwe bidina nîşandin, destavêtina nakokîyên mezhebî. Her wusa, nêzîkatîya tirkiya a li Sûûdî-arabîya, divê ku mirov divê çerçoveyê de werêne ser ziman.

Bi nakokîya nakokîya mezhebî, şerê nîjadperestî dikin. Her wusa, ya ku bi teybetî rejima tirk, dike jî ev a. LI Sûrî, pêşveçûnên ku dibin, didina nîşandin ku wê li herêmê êdî rewş û temenê sîyeset nû li herêmê bi afirê. Her wusa, sîyeseta ku heta roja me bi wê li herêmê sîyeset hatîya kirin, êdî bi wê nema tê karîn ku li herêmê sîyeset were kirin. Her wusa, ji dema şerê cihanê ê yekemîn ve li herêmê, sîyeseta ku hat meşandin, bi wê herêm hertimî hat kirin weke herêmek şer. Rejimên herêmê ên weke Tirkiya û hwd, li ser têgînîya desthilatdarîya xwe re bi sîyeseta nîjadperestitîyê hem komkuji hanîn serê gelên herêmê û hem jî şerên bi gelên herêmê re heta roja me hanîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman, ku bi sîyeseta xe re tirkiya, di nava sûrî û sîyeseta weyna nagativ a ku leyist, bi wê re bi sîyeseta xwe re li herêmê dawîya xwe hanî. Her wusa, sîyeseta ku li ser komên çete ên weke DAÎŞ, cebetil-nasr, ahrar el-şam û hwd re ku meşand, li herêmê hem gelek komkuji da kirin û hem jî, pêvajoya şerê li Sûrî bixwûntir kir. Di vê çerçoveyê de sîyeseta tirkiya a li Sûrî, di aslê xwe de bi rewşa Sûrî ve zêdetirî, divê ku mirov bi zihniyeta wê ya ku komare tirk bi wê avabûya re werêne ser ziman. Ya ku wê kir, vê rewşa xirab de ev zihniyeta wê ya. Sîyeseta dijminatîyê li herêmê li ser temenê nîjadperestitiyê meşand.

Êdî tirkiya hat wê astê ku nikarê vê sîyeseta xwe bide meşandin. Her wusa, di pêvajoya şerê Sûrî de xwe li ser xate ´sûnnî´ re nêzî Sûûdî kirin jî, hinekî bi armancên wê yên nîjadperestî ve girêdayî ya. Di vê dema ku bahse şerê sûrî dihê kirin de jî tirkiya, bahse ´mudalaheyeka leşkerî a bi

bejehî ku di hevkarîya Sûûdî re bike. Yanî, bi gotinaka din, di şerê xwe yê li herêmê ku bi kurdan re û ankû di çerçoveyên din de dimeşênê ku karibê Hebûna Sûûdî û têgîna ´mezhebîtîya sûûûnîtîyê´ ji wê re weke maske bikarbênê. Nûha jî, sîyeseta vê dike. Di vê çerçoveyê de bi vê armancê xwe de nêzî Sûûdî dike. Xwe nêzî Sûûdî-arabîya kirina tirkiya, divê ku mirov di çerçoveya armancên wê yên ku bi wan şer dimeşênê re hilde li dest û fahm bike.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku xate ezazê, ku dixwest ku weke ´xatek sûnnî´ bide hiştin jî, hinekî di vê çerçoveyê de divê ku mirov hilde li dest. Di vê çerçoveyê de li ser wê xate sûnnî re ku herêma halabê jî di nav de weke xatek sûnnî pêşbixe û li ser wê re şerê xwe yê bi kurdan re bide domandin. "Herêma ku ji firîna balafiran re girtî" ku bahse wê dikirin di çerçoveya têgîna ´herêma tampon´ de jî, divê ku mirov li ser vê herêmê re fahm bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de meşandina şerê nîjadperestî û desthilatdarî ku di bin maskeya şerê mezhebî de tirkiya, di vê çerçoveyê de dixwezê ku xwe nêzî Sûûdî bike û dike jî. Her wusa, vekirina balafirgeha ´incillikê´ ji balairên Sûûdî re, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hilde li dest.

Li vir, divê ku miirov di dewama wê de wê jî werêne ser ziman ku Ev rewşa şerê navxweyî a li Sûrî, ku weke maskeyekê ´mezhebîtî´ li wê hat kirin, wusa dihê dîtin ku dihê xwestin ku ev werê kûrtir kirin. Her wusa, tirkiya, di vê çerçoveyê de şerê xwe yê bi kurdan û hwd re, di vê çerçoveyê de di çerçoveya maskeya ´şerê mezhebî´ de dixwezê ku weke rengekî wê maskeya şerê Mezhebî xwe bi Sûûdî-arabîya re bide nîşandin.

Di vê dema ku tirkiya dixwezê ku şerê navxweyî ê li Sûrî kûrtir bike de Tirkiya, di wê çerçoveyê de topbaranan li herêmên rojava ên dinava sînorê Sûrî de dike. Her wusa, bo ku hêzên kurd û hwd, herêmên weke ezazê ji destê çeteyan rizgar nekin, wan hêrîşan dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tirkiya, piştî ku hêzên sûrîya demokratîk ku di pêşnegîya YPG´ê de berbi Halabê ve herikîn û herêma "**til-Rêfat**" ku dikeve başûrê ezazê de ku ji destê çeteyên DAÎŞê û hwd ku hat rizgarkirin û pê de, êdî tirkiya bi topbaranên xwe yên li rojava ku ew bi wan li rojava cihanê jî rûniştî, wê bike ku pêşîya wan bigrê. Herêma Til-Rêfat, weke gerêmek û gavek giring ya bi ber rizgarkirina herêma ezazê a ji destê çeteyên DAÎŞê ku pirranîya ji kontrayên ku ji nava tirkiya hatîya pêşxistina ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Tevlîbûna Rûsya

li nava Sûrîya, weke rewşa ku pêşîya tirkiya digirê ya. Her wusa, tirkiya, nikarê bi xwe hêzên xwe derbas bike li nava Sûrî. Dem bi dem di nava cilên çeteyên DAÎŞê û hwd de gelek kontrayên tirk hatibûbûna derbaskirin ku bi kurdan re li rojava şer bikin. Lê vê rewşê, têrê nekir ku tirkiya li wir rewşa xwe xort bike. Her wusa, nûha, di vê çerçoveyê xwe nêzî Sûûdî-arabîya kirina tirkya, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Dixwezin ku di bin maskeya Sûûdî-arabîya de di çerçoveya rengê ´maskeya sûnnî´tiyê de hebûna xwe li Sûrî bide domandin. Yanî, ev rewşa xwe nêzî kirina Tirkiya a li Sûûdî-arabîya, di çerçoveya hewldana ku tirkiya di bin maskeya Sûûdî de bikevê Sûrî de ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werêne ser ziman ku li ser maskeya sûnnîtiyê re û her wusa bi hewldana têkiliyên xwe yên bi sûûdî re parastina ´xate ezazê´ weke herêmek ´tampon´ di vê çerçoveyê de dixwezê ku pêşbixe. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tirkiya, piştî rizgarkirina herêmên weke Şîrîn, girê-sipî û hwd ên rojava ji destê DAÎŞê û hwd, êdî di vê çerçoveyê de zêdetirî xwe weke ku bi têkiliya xwe ya bi Sûûdî ve girêda. Li ser vê girêdanê re dixwezê ku nehêle ku ´**xate ezazê**´ bikevê. Hewldana pêşîya pêşketina kurdan girtinê, di vê çerçoveyê de tirkiya dixwezê ku bi wê têkiliya xwe ya bi sûûdî a ku wê bi maskeya sûnnî´tîyê re ku bikardihêne dixwezê bigrê.

Herêmê, têkiliyên kurd û araban pirr kevn a. Dîroka kurd û araban, ji ya kurd û tirkan û ankû arab û tirkan, pirr zêde kevntira. Ev, berî îslamiyetê jî û piştî îslamiyetê jî wusa bû. Di vê çerçoveyê de di vê demê de tirkiya, têkilî û rewşên mezhebî ên ku li ser ola îslamê re pêşketina li ser nakokîyên dîrokî re dixwezê ku bikarbênê û li ser wan re li gorî politikayên xwe yên desthilatdarî û nîjadperestî ancamê bidest bixe. Divê çerçoveyê de armancek wê heya. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman ku ne arab û ne jî faris, wê werina vê leyistika tirkiya a ku li ser maskeya mehebîtîyê re dileyizê. Dîrokên xalkên herêmê ên weke kurd, faris û araban, wê pirr kevn herê. Di serî de divê ku mirov wê rastîya dîroka van her sê xalkên herêmê ên pirr kevn bi awayekî pirr ciddî hilde li dest û fahm bike û werêne ser ziman. Ev dîroka wan ya li herêmê a civatî ku bi hevdû re hatîya nivîsandin, î ro rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku dixwezin ku li ser nakokîyên olî û hwd re wan bênin berhevdû, bêgûman wê negihijê armanca xwe.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li herêmê gelekî nezanîn heya û ev rejimên ku hertimî bûna sedema şer li herêmê, vê nezanîya mirovên herêmê jî biawayekî bêwijdanî li hemberî wan

bikardihênin. Li herêmê, wê xalkên herêmê dîroka xwe ji nû ve binivîsênin. Wê şariştaniyên xwe bi hevdû re ji nû ve li gorî demê pêşbixin û biafirênin û barî pêşarojê bikin, weke ku çawa ku di demên bûhûrî de kirina. Şerên ku di bin maskeya mezhebîtîyê de li herêmê dihê meşandin, biawayekî jî mirov dikarê weke rengekî hêrîşê a li vê dîroka herêmê a van xalkên kevn jî werêne ser ziman.

Tirkiya ku di vê demê de dixwezê ku li Sûrî pêşîya pêşketina kurdan bigrê, serî li her rê û rêbazê dide. Her wusa, sîyeseteka bi rengî makyawelîstî dimeşênê. Nêzîkatîya wê ya li Sûûdî jî, divê çerçoveyê de di çerçoveya îstismarkirina nakokîyên mezhebî û hwd a di çerçoveya berjewendî û politikayên xwe de ya. Her wusa, nêzîkatîya tirkiya a li cihana îslamê di vê çerçoveyê de ya. Ya ku di serî de ku divê ku mirov fahm bike û werêne ser ziman jî, ev a. Di aslê xwe de ya ku temenê hemû tundrewiyên mezhebî û pêşxistina wan a, di çerçoveya bikarhanîna wê de jî ev rengê politikaya weke ya ku rejima tirk li herêmê dimeşênê ya.

Abdusamet Yigit, adara 2016, **Cizîra bota, Kurdistan**. ...